# Niqutî Dilê Min

# RÊŞAD SORGUL

Sererastkirin û şêwr
Luqman Guldivê

Çavgerandin
Îkram Balekanî
Mîrhem Yigit

Rêşad Sorgul di sala 1968'a de li navçeya Amedê Çinarê li gundê Qerqatkê ji dayik bû. Dibistana seretayî, navîn û lîse li Amedê xwend. Di sala 1991'ê de çû paytexta Misrê Qahîrê. Sê salan li Qahîreyê ma. Salekê li zanîngeha Bêrûtê şaxê Iskenderiye beşê Huqûqê xwend. Du salan jî li zanîngeha Ezherê beşê dîrokê xwend. Di Îlona sala 1994'a de ji Qahîreyê derket. Piştre çû bajarê Elmanyayê Hannoverê. Di Gulana sala 1997'a de li MED-TVê dest bi xebatê kir.

**Berhemên wî bi xwe**

- Veger (Tîrmeh 2001 - Weşanxaneya Mezopotamyayê li Elmanyayê)
- Evdalkovî (Sibat 2004 - Weşanxaneya Mezopotamyayê li Elmanyayê)
- Seydayê Min (Sibat 2007 - Weşanên Belkî / Stenbol)

**Berhemên ku wergerandine kurdî**

- Bîranînên Gurbetê - 1999 / Weşanxaneya Mezopotamyayê li Elmanyayê (Gurbetelli Ersöz)
- Awaza Bilûrê - Çile 2000 / Weşanên Jina Serbilind li Elmanyayê (Berjin Haki)
- Gilgamêş - Sibat 2004 / Weşanxaneya Mezopotamyayê li Elmanyayê (Orhan Asena)
- Parastina Gelekî - Cotmeh 2004 / Weşanxaneya Mezopotamyayê li Elmanyayê (Abdullah Öcalan)
- Bazinê Nînattayê - Adar 2008 / Weşanxaneya Mezopotamyayê li Elmanyayê (Ahmet Ümit)
- Şaristanî - Tebax 2009 / Weşanxaneya Mezopotamyayê li Elmanyayê (pirtûka Abdullah Öcalan)

( 1 )

**Yê ava Nîlê carekê vexwe**
**Wê piştî heft salan careke din lê vegere**

Ez bi awayekî li demên berê xilmaşbûyî, çavên xwe li dora xwe digerînim. Di nava bêdengiya qehweya Fîşawiyê de li dem û dewranên xwe yên berê guhdarî dikim. Ez matmayî temaşe dikim ku çawa her tişt weke berê di cihê xwe de maye û neguheriye. Weke ku dem di cihê xwe de bist bûbe û çemê Nîlê neherikî be. Ez tevî ku bawer dikim ti tişt neguheriye jî, lê ez his dikim ti tişt weke berê bi min xuya nake. Yan jî ez di nava leylanên bîranînan de li hemberî her tiştî sêwî mame yan jî her tiştî sêwî dibînim. Hevala min mîna ku li vê sêwîtiya min hayil bibe, destê xwe li dora stûyê min bada, ez ji nava xeyalan kişandim û hişyar kirim. Qurteke qehweya mirr a Fîşawiyê jî kir ku ez bi ser xwe ve bêm. Li gorî gotina Misriyan mirovek ku carekê ji ava Nîlê vexwar, bivê nevê, wê piştî heft salan dîsa li vî welatî vegere. Her çend ji heft salan zêdetir bûbe jî ez niha ji ava Nîlê ya di qehweya mirr de vedixwim. Kalemêrê Misrî yê hilmên kûr li nargîleyê dide bala wî tê ser min û mîna bibêje: ‘Tu dîsa bi xêr hatî’ serê xwe dihejîne û silavekê dide. Ez jî bi girnijîneke xembar bersiva wî didim, destê xwe didim ser dilê xwe û silavê lê vedigerînim. Hevala min meraq dike ka ez kalemêrê Misrî ji ku nas dikim. Min jêre got: ‘Ez wî nas nakim.’ Hevala min hînê zêdetir matmayî ma. Min jêre behsa xislet û xusûsiyetên Misriyan kir ka çend xwîngerm û candost in. Nemaze jî eleqeyeke wan a taybet ji xerîban re heye. Lê ya rastî, kalemêrê Misrî mîna xemên min ên di dil û hinavên min de û hesretên min ên keyiyayî fêhm kiribin di nava dûman û hilma nargîlê de silava Xwedê li min kiribû.

Me piştî ku qehweyên xwe yên mirr li qehwexaneya Fîşawiyê vexwarin. Em rabûn li Meydana Husên geriyan û min ji dûr ve bi çavên melûlî li Mizgefta Ezherê û Rewaq El-Etrak a di ser wê re temaşe kir. Min ji xwe pirsî; gelo ez bi şens bûm ku min gellek demên xwe di nava van avahiyên dîrokî de bihurandibûn. Em derbasî aliyê din bûn û li ber Mizgefta Ezherê rawestiyan. Di wê navberê de ez lê hayil bûm ku dikana qamîşên qeseb hînê li cihê xwe yê berê ye, û ava qesebê difiroşe. Min bi destê hevala xwe girt û ew ber bi dikanê ve kişand. Ava qesebê di wê wexma germa Misrê de bi rastî têra xwe xweş bû û tîna mirov dişikand. Her tişt li cihê xwe bû. Mîna ku dem û dewran di gerîneka demê de asê mabin di cihê xwe de çikiyayî û bistbûyî mabûn. Li kêleka dikana ava qeseb, dikana jinekê hebû. Dikana wê mabû, lê ew tinebû. Xortek li şûna wê bû. Min xwe negirt û jê pirsî. Ji min re got, ew diya wî bûye û ji vê dinyayê beriya du salan bar kiriye û çavên xwe miçandine. Rewaq ango Mala Xwendekaran ên li dora Mizgeftê hemû hatibûn girtin û li turîzmê hatibûn vekirin. Em berê çûn Rewaq El-Ekrad ku ew di dema xwendekariya me de jî ji ber sedemên siyasî girtî bû. Paşê em bi pêlikên Rewaq El-Etrakê ve hilkişiyan. Her der bêdeng bû. Lê dengê xwendekarên mîna mêşên hungiv ders dixwendin bi ber guhê min dikevin. Ango guhên min jî mîna kewara mêşê di wê bêdengiyê de dikirin xumîn. Ez fena di nava dîrokê de rêwîbim dimeşiyam û hevala min jî mîna ev his kiribe kêm caran ji min pirs dikirin. Jixwe min berê jêre behsa van deran hemûyan kiribû û hema bêjin wê jî hinekî ev der nas dikirin. Jixwe demeke dirêj me plan kiribû û pere dabûn hev ji bo em bêne vê derê. Lê ew razî nîne ku ez ji vir û pêde gera xwe dewam bikim. Ji ber ku min biryar daye, ez piştî serdana Misrê biçim çiyayên Kurdistanê

gerîllayên PKKê ziyaret bikim. Ez û ew, em ê ji vir ji hev veqetin, lê ew naxwaze ji min veqete, serdaneke wisa jî li cih nabîne û ditirse ku tiştek bi serê min de bê.

Em wexta di deriyê Rewaq El-Etrakê re dikevin hundirê hola dirêj mîna morîka xewê ya di kerrika guhê tevahiya bîranînan de derketibe, xeyalên wan li ber çavên min govend girtin. Her kes mîna xêrhatina min bike radibe ser xwe. Em ber bi dawiya holê ve diçin. Ji ber ku li dawiyê, odeya ez lê dimam hebû. Di odeyan de hînê gellek alavên xwendekaran diman. Jixwe textên razanê hînê dernexistibûn. Diyar bû hînê nû li turîzmê vekirine. Ez ji Misriyê li ber Rewaqê dipirsim ka ji kengî ve Rewaq li turîzmê hatiye vekirin. Ew dibêje; du sal e ku xwendekar ji Rewaqan hatine derxistin. Rêveberiya Zanîngeha Ezherê cihekî nû daye xwendekaran. Û li gotinên xwe zêde dike ku xwendekarên Tirk êdî weke berê li Misrê nemane. Li odeya dawiyê jî hînê textên razanê û refên pirtûkan ên xwendekaran li cihê xwe bûn. Di refa pirtûkan de çend kitêbên peritî hînê mane. Li her derê toz û remilk heye. Diyar e, Şêxê El-Ezherê ji bo bi rêkûpêkirina van deran hînê tiştek nekiriye. Ez hinekî bi xemgînî li hawîrdorê dinêrim ku çawa her tişt li vir bêqîmet e. Her çend statuya Ezherê weke ya Vatîkanê be jî, lê ya rastî nehisguhî û guhnedana civata Îslamî ya asar û rûmetên xwe mirov xemgîn dikir. Min li pirtûkên di refê de nêrî. Di nava pirtûkan de defterek jî hebû. Wexta min dêhna xwe dayê, min dît ku bi kurdiya latînî hatiye nivîsandin. Xetên wê gellek delal hatibûn danîn. Kengî min baş bala xwe dayê min dît ku gellek gotinên balkêş têde hene. Ji lewra min xwest, wê bibim. Lê min dizanî wê Misriyê li me temaşe dikir, destûrê nede û jixwe wexta bibîne ez qîmetê didimê, wê xwe hînê girantir bike. Ji lewra min ji hevala xwe xwest ku ew biçe li cihekî din binêre û Misriyê dergevan mijûl bike ku heta ez defterê bixim tûrikê xwe. Hevala min ev xwesteka min baş bi cih anî û min ew defter xist tûrikê xwe. Ji ber ku ez bi dîtina defterê kêfxweş bûm, min deh gînê[1] dan dergevanê li ber Rewaqê. Paşê em derketin ser banê Rewaqê û me li Qahîreya Kevin temaşe kir. Em li binya minareya duserî ya Mizgefta Ezherê sekinîn ku hema raserî me disekinî. Minareya ez behsa wê dikim, resmê wê li ser bîst cuneytê Misrê heye. Avahiyên Qahîreya Kevin pirr zêde di zikhevdu de bûn û mirov mîna moriyan diçûn û dihatin. Li Qahîreyê rewşa hewaya sehrayê serdest bû. Ji lewra timî remilkeke hûr dibariya. Bi ser vê de jî ji ber wexma germê dikir ku kirasê li ser mirov bi canê mirov ve bizeliqe. Hevala min ji vê hewayê hilhilî bû. Ji ber vê jî zêde nikarîbû bala xwe bide agahiyên min ên der barê derdorê de didim wê. Berçavka xwe ya tavê ya li ser tembelîka xwe xist ber çavên xwe û bi vê westandina xwe nîşan da.

( 2 )

**Eger hezkirin hebe sedaqet jî heye**

Em tevahiya rojê li nava Qahîreyê geriyan. Wexma germa Qahîreyê mirov bi rastî gellekî diwestîne. Bi roj Qahîre sê çar mîlyonan zêdetir dibe û pirr zêde di zikhevdu de ye. Jixwe qelebalixiya wê nayê gotin. Bi serê xwe serêşiyeke mezin e. Em mîna qazên di germê de perîkên wan bi erdê re kaş dibin, gihiştin hotêla xwe ya nêzî Meydana Husên. Xwedêkirî li hotêla me şaneşînek hebû ku mirov karibe lê rûnê û xwe hênik bike. Piştî ku min li serşokê av li xwe kir, min xwest ez hinekî li wir rûnêm. Lê min dît hevala min bi hesret û bêrîkirinê li min temaşe dike. Nizanim lê mîna ku di çavên wê de ingirîn û hêrsek jî hebû. Min fêhm

[1] Cuneyt pereyê Misrê ye. Misrî ji ber ku 'C' weke 'G' dixwînin jêre dibêjin Gîne.

kiribû ku wexta çûyîna min a derekê dihat bîra wê, timî wisa dibû. Bi vê re jî timî rewşeke tengezar çêdibû. Gellek caran min qiyamet radikir û gotin li cih be min mehşera xêr û gunehan datanî. Min pîkola, cihê xwe xweş kir û xwest ji cihekî dest bi gotinê bikim. Lê min bi rastî nizanîbû ji ku dest pê bikim. Di rewşên wisa de gellek caran ez wer xeşîm dibûm ku fena zarokekî çarpîkan dimeşiya bi serê min de dihat. Lê wê li halê min ê şerpeze temaşe kir û ew ji cihê xwe rabû hat. Her du destên xwe avêtin stûyê min û serê xwe danî ser sînga min. Destên min jî weke gellek caran xwe li bejna wê ya tenik gerandin û tiliyên min xwe xistin nava porê wê yê xwe berdabû heta ser derzika pişta wê. Paşê ew bêhna wê, belkî jî bêhna parfuma wê bû, ez kirim nava pencên xwe. Min di ber xwe de got: ‘Na, dîsa wê ez zevt kirim.’ Lê wê jî bi pistepistê di bin guhê min de got: ‘Niha nepeyive.’ Bi gotinên wê re hilma wê ya mîna agirê devê tenûrê xwe li rûyê min û memika guhê min xist. Çirîskên agir xwe avêtibûn kadîna min. Kincê tenik ê li ser wê xwe berdabû mîna kefa sabûnê. Di himbêza min de xwe melisand û serê tiliyên xwe yên mîna findan li ser sînga min gerand. Agir bi nava dilê min xistibû û bendên li pêşiya agirê hez û şehweta min hilweşandibûn. Agirê bedena min xwe li wê gerand. Min destên xwe yên li ser derza pişta wê avêt kemaxê wê û ber bi xwe ve kişand. Serê xwe rakir û xwe dirêjî lêvên min kir. Mîna min daqurtîne maçî kir. Paşê xwe ji nişkê ve zîvirand û pişta xwe da min û destên min li stûyê xwe gerandin û destên xwe xistin nava destên min. Min xwest destên xwe bibim li nava wê bigerînim, devê xwe bixim bin guharên wê û gerdena wê maçî bikim. Lê destên min berneda û destûr neda ez dakevim bin guharê wê û got: ‘Ez naxwazim tu biçî.’ Min jî bi dengekî nerm got: ‘Em paşê bipeyivin.’

Diyar bû axaftin wê paşê nebûya, diviyabû niha bibûya. Ji ber ku paşê wê arzû û xwestekên me temirîbûna. Bi van his û arzûyan diviyabû me gotinên xwe daniya. Wer destên wê di nava destên min de û çena min li ser serê wê sekinîbû. Min hinekî ew şidand. Paşê ew hêdîka zîvirî û dîsa bi awayekî lavayî bike serê xwe sipart sînga min. Bi dengekî hêdîka got: ‘Tu mecbûr nînî biçî.’ Ji bo mirov bi hin kesan re bipeyive, ji bo ku mirov karibe bi berfirehî ji wan re rewşê vebêje û rave bike divê ew xerîb bin. Lê ew keçeke ne xerîb bû. Nezan û xeşîm jî nebû. Ji lewra jî axaftin zehmet dibû. Min jî li ser gotina wê pirsî: ‘Çima neçim?’ Pirsek ji rêzê bû yan jî wisa xuya dikir. Wê ji min pirsek bi vî rengî hêvî nedikir, lewma pirsa min ji rêzê nedît û li paşiya wê fikirî û paşê peyivî: ‘Tu bi rêyekê ve diçî mirin têde heye.’ Îcar dora ponijînê ya min bû. Erê, rast e. Mirin li her quncikê û di her kêliyê de veşartî yan jî eşkere li benda me bû. Em ê ji çi bireviyana. Ma her kêlî mumkîn nebû ku em qezayekê derbas bikin an jî bihulkumin û stûyê xwe bişkînin? Piştre min jî got: ‘Ma mirin li her quncikê jixwe li benda me nîne?’ Bêguman li gotinên min bi hêsayî serwext bûbû. Dizanîbû bi vî awayî dafik û feqa wê ya ji bo neçûna min danîbû wê bi kêr neyê. Ji bo vê jî xwest pirsên xwe dijwartir bike û pirsa herî dawî anî pêşiyê û got: ‘Ma tu ji min hez nakî?’ Bêguman min jê hez dikir. Ya rastî hezkirina min mîna ti hezkirinên serdeman nebû. Pirr hindik wê jî dizanîbû. Lê diyar bû wê qîma xwe bi zanebûnê nedianî û di qelsiyê de xwe li nezaniyê datanî. Ji bo wê jî min jêre got: ‘Ma eger ez hez bikim, divê ez neçim?’ Wê dizanîbû bi vê gotinê ez dixwazim bibêjim ku hezkirina min girê bide wê ji hezkirinê wêdetir koletî û tiştekî din be. **Jixwe hezkirin hebûya sedaqet jî her hebû.** Naxwe wê jî wexta destê xwe dabû destê min, dizanîbû hezkirina me wê bi parvekirina me ya hiss û ramanan bibe evîneke rastî. Ji ber van sedeman jî min jêre gotibû, tu yê ti carî nebî namûsa min. Eger hezkirin hebe, wê dilsoziya me ya ji têkiliya bedenan wêdetir têkiliya dost û hevalbendiyê be. Wê jî dizanîbû li welatekî mîna Kurdistanê dagirkirî û parçeparçekirî, hezkirin çawa dibe. Ji ber vê jî êdî dengê xwe nekir û nexwest gotinên ew jî jê bawer nake, bîne ziman. Lewma ji nişkê ve destên xwe avêt stûyê min û hişk ez maçî kirim. Dijwar bû ku ez bi vî zimanê wê bi kar anî, ez wê baş fêhm bikim. Paşê çû li şaneşînê rûnişt. Lê weke Îsayê mezin gotî: **‘Gotin heta ji qirika te dernekeve ew koleyê te ye, lê piştî ku ji devê te derket tu dibî êsîrê wê.’** Min jî ew gotina bibim êsîrê wê ji devê xwe dernexist û min ew di dilê xwe de rakir kulînê ku ez rojekê pê şa

bibim. Belkî mîna gatayên (gotinên) Zerdeşt ku pê gotin pîroz kiriye, min nexwest gotin ji qîzaniyê bikeve.

Piştre ji nişkê ve deftera min li Rewaq El-Etrakê bi xwe re anîbû hat bîra min. Min ew ji tûrikê xwe derxist û ez çûm li şaneşînê rûniştim. Berga defterê tinebû. Navê kesê nivîsî xuya nedikir. Lê ji xetan diyar bû ku kesê nivîsandî têra xwe jêhatî bûye. Ji rêzên destpêkê jî eşkere bû ku bi kurdiyeke rewan hatibû nivîsandin. Belkî jî yek ji şagirtên medreseyên kurdî yên li Ezherê xwendî, ev defter nivîsandibû. Bi meraqa ez wî di nava rûpelên çîrokê de zevt bikim, min dest bi xwendinê kir.

## ( 3 )

### EZ Ê XWEDÊ BIKUJIM

Li Amedê mellê êvarê bang dikir. Xêrî dereng mabû. Pirtûka wî di bin çengê wî de bi lez di nav kolanên taxa Deriyê Çiyê re baz dida. Kengî gihişt Mizgefta Kozlikê mellê banga xwe temam kiribû û hema dest bi nimêja mexribê kiribû. Xêrî bi lez pêlava xwe ji pê kir, rahiştê danî cihê pêlavan û zûka di refekî nimêjê de cih girt. Dilê wî li cih û xweş bû ku gihiştibû nimêjê. Diviyabû ew bê kêmasî li huzûra Xwedayê xwe amade bibûya. Wî her hewl dida karê xwe yê li riya Xwedê bêqusûr bikira. Ew bi xuşû û hurmet li pêşberî Xwedayê xwe rawestiyabû û her du destên xwe dabûn serhevdu. Bi sedema kêmasiyên xwe yê rojane bi çavên fediyokî li ber xwe dinêrî. Ya rastî wî bi xwe pirr guneh nedikirin. Lê dinya xirab bûbû. Gellek tişt diqewimîn û mirov digot qey êdî dawiya dinyayê tê. Piştî ku silav li rast û çepê xwe da, bi dengê muezîn melle Nûrî rabû ser xwe ji bo ku piştî sê rekaet nimêja mexrib du rekaet sunnetan bike. Wexta rabû çav li Seydayê xwe Melle Ehmed kir. Mîna nexwest ew beriya wî rabe, lewma xwe giran kir û hêdî rabû. Piştî du rekaet nimêja sunnetê jî ji Xwedayê mezin re selawat û dua hatin kirin. Xêrî wexta lavahî li Xwedayê xwe dikir, dilxweş bû. Jêre malavahî û şikir dikir ku rojê pênc caran dikarîbûn derkevin pêşberî wî û 17 rekaetên ferz ê nimêjê bikin. Dîsa pêxemberê Xwedê Hezretî Muhammed jî mehder û şefqet li wan kiribû, nimêjên sunnetê çêkiribûn. Xêrî ev nimêj hemû dikirin û carnan bi van jî qîma xwe nedianî hînê zêdetir dikir. Li cem Xwedê dixwest kewara wî her tijî be. Lewma piştî ku dua û selawat jî qediyan wî dîsa du rekaet nimêj kirin. Di vê navberê de Seydayê wî Melle Ehmed rabû û çû hucreya xwe ya bi mizgeftê ve. Mizgeft kevin bû. Ji kevirên reş hatibû çêkirin. Mizgefteke zêde mezin nebû. Di nava kolanên Deriyê Çiyê de bû. Bi qasî pêncî, şêst mirov têde bi cih dibûn. Lê roja nimêja înê mirov zêde dibûn têde hilnedihatin û li hewşa wê jî nimêj dikirin. Li hewşa wê dareke tûyê hebû. Ji bo destnimêjê jî di hewşa wê de cihê destavê û qedengehek hebû. Tarî ketibû erdê û lampeya hewşê vêketibû. Xêrî derket careke din destnimêj girt. Her cara av diavêt rûyê xwe mîna hemû qirêjî û gemariya li cîhanê ji rûyê xwe bibe, bi hez û şewqeke mezin destên xwe heta paşika guhê xwe dibirin. Tembelîka xwe şil dikir. Zend û lingên xwe bi kêfxweşî û dilekî têrtijî huzûr dişuşt. Xêrî ji bo destnimêjê qapqapik xistibûn pê. Ev şimik ji textan hatibûn çêkirin, bilind bûn ji bo mirov ji qirêjê biparêzin. Lê wexta pê dimeşiya gellekî deng jê dihatin. Xêrî hinekî lezand ji ber ku baraneke hûrik hûrik lê dikir. Zû ket hundirê hucreyê û silav da Seyda Melle Ehmed û muezîn Melle Nûrî.

Seydayê melle Ehmed gellekî bi emir bû. Li derdora heftê, heştê salî hebû. Melleyekî kurdî yê kevin bû. Ji medreseyan îcaze stendibû. Wî ne tenê duwanzdeh ilm xwendibûn, gellek ilmên wî yên din jî hebûn. Xislet û qabîliyetek wî hebû, li cem her alimî tinebû. Seyda xetatekî baş bû. Bi qelemên xwe yên taybet ên ji qamişan xetên erebî bi hostayî datanî û xelekên wan xweş li hev ba didan. Hosta û hunermendekî baş bû. Her weha ew Seydayekî kurmancî bû. Şaşika xwe jî bi kurdewarî girê dida. Gulavdûnkeke pîremêran li dora kumê xwe dipêça. Riheke wî ya sipîbozî hebû. Rûyê wî nûranî û milahîm bû. Di çav û rûyê wî de

nîşaneyên zanebûn, ilm û îrfanê xuya dikirin. Ji xwe razî, têr û tijî bû. Bêhnfireh bû û giran dipeyivî. Dibe ku yek ji sedemên giran axaftina wî kal bûn jî bû. Lê salên bihurandibûn, demûdewranên qulibandibûn ew têra xwe stewandibû û gihandibû. Ew maqûl û zanayê civata xwe bû. Ji cixarekişandinê pirr hez dikir. Lewma zêde dikuxiya û nerehet dibû.

Hucre piçûk û teng bû. Têde sobeyeke ceryanê hebû. Kursîquraneke Seyda hebû. Li ser kursîquranê kodika hubrê û qelemên xetatiyê yên ji zilan hebûn. Li dîwêr hinek ref hebûn û di nava wan de pirtûkên kevin ên rengên wan zerbûyî hebûn. Mînderek û balgiyeke Seyda hebû. Li erdê tenê tejikek hebû. Ji hucreyê bêhna kevinbûnê, dîrokî û dîndariyê dihat. Hucre jî bi serê xwe bazarek bû, êdî li her deverê tine bû. Belkî jî ya li vir diket mazatê jî li her cihî peyda nedibû. Mîna Beddîuzemanê Kurdî Seîdê Norsê gotî: 'Tenekeyeke dîrokî li bazara sobefiroşan pere nake, lê li bazara dîrokanasan buhayê wê zêde ye.' Ev hucre jî bazareke bi vî rengî bû.

Melle Nûrî jî li aliyekî din ê hucreyê li ser totikên xwe rûniştibû. Muezînê Seyda bû. Hê ciwan bû. Riheke wî ya kurt û firk hebû. Di wexta nimêjê de şaşik girê dida. Şaşikgirêdana wî bi awayekî şerîetxwazên nû bû. Piştî nimêj diqediya kefiya sipî boz a li dora kumê xwe dipêça vedikir, li nava xwe ba dida û kincê xwe bi ser de berdida. Şalekî jêre digotin, ê qadiyan, li xwe dikir. Li hin deveran ji wan şalan re yên bohtî jî dihat gotin. Lê şalê Melle Nûrî hinekî cihê ango taybet hatibû fesilandin û birrîn. Li şûna doxînê wî kember bi kar dianî û dora wî jî derzîdar dabû serhevdu, milmilî û bi qirme kiribû. Navrana wî jî kêm û sivik bû. Melle Nûrî dibistana Îmam Xetîban xwendibû. Di îmtîhana îmaman a dewletê de bi ser ketibû û mafê muezîntiyê bi dest xistibû. Bi mûçe û meaşekî kêm ev kar dikir. Hînê nezewicî bû. Têra xwe bi liv û lebat bû. Zêdetir bi siyasetê re mijûl dibû. Seydayê Melle Ehmed bi yên mîna Melle Nûrî ji dibistanên Îmam Xetîban mezûnbûyî ewle nebû. Bi henekî bûya jî carnan digot: 'Ev nîvîmamên pîjikî wê dîn xira bikin.'

Xêrî li ber sobeya ceryanî li ser totikên xwe rûniştibû û li bendê bû Seyda ji bo dersdanê bang lê bike. Seyda bi wan qelemên xwe yên taybet ên ji zilan hin xet datanîn. Xêrî devê pirtûka xwe ya nû anîbû vekiribû, lê bala wî jî li ser Seyda bû. Seydayê Melle Ehmed nuqteya xwe danî û di bin birûhê xwe yên stûr re li Xêrî nêrî û girnijî. Ew jî hayil bûbû ku Xêrî dilê xwe dibijîne wî. Ji lewra bi dengekî henûnî got: 'Em ji te re jî qelemekê çêkin, divê tu jî hîn bibî. Hewce ye hinek vî karî dewam bikin.' Xêrî bi vê kêfxweş bû. Bi rûkenî got: 'Seyda welleh ez jî bawer dikim ku ez ê baş bikim.' Seyda ji Xêrî xwest li teniştê rûnê û dest bi dersê bikin. Xêrî wê rojê derbasî pirtûkeke nû dibû. Seyda jê xwestibû pirtûkê ji kitêbxaneya li ber deriyê Mizgefta Mezin bikire. Xêrî pirtûka hatibû xwestin anîbû. Pirtûk Nehc ul-Enam bû. Bi Kurdî ji aliyê Melle Xelîlê Sêrtî ve hatibû nivîsandin. Melle Xelîl erê bi navê Sêrtî dihat hildan, lê belê di sala 1753an de li navçeya Bedlîsê Xîzanê hatibû dinê. Di sala 1841ê de li Sêrtê wefat kiribû. Pêşî Seyda rahişt pirtûkê û ji nêz ve li pelê pêşî temaşe kir û got: 'Xêrî tu dizanî divê ev pirtûk esas ji aliyê aliman ve were xwendin. Ji ber ku gellek kesên alim in, van xusûsên di vir de baş nizanin.' Seyda keserek kişand û xetên pêşî xwendi, paşê jî Seyda ji Xêrî xwest hevoka xwendî dubare bike, lê Xêrî hişê wî li gotina pêşî ya Seyda mabû. Gelo çima diviyabû aliman ev kitêb bixwenda? Gelo kitêbên ev çend girîng wî karîbû bixwenda? Ji ber vê yekê, Xêrî xwe negirt û ji Seyda pirsî: 'Seyda çima divê alim bixwînin?' Li ser pirsê, Seyda hinekî rawestiya bi tiliyên xwe hinekî riha xwe tevda û paşê ji melle Nûrî pirsî: 'Şertên îmanê çi ne? Melle Nûrî weke Seyda henekê xwe pê bike fikirî û hinekî bi guman sekinî. Nexwest bêhurmetiyê bike, lê bi dengekî nermik got: 'Seyda bersiva vê zarokek jî dizane.' Seyda girnijî û jê bersiv xwest. Tevî ku Melle Nûrî bi vê yekê nerehet bû jî bersiv da: 'Baweriya bi Xwedê, bi melayîketên wî, kitêbên wî, resûlên wî, roja axretê, bi qeder û qezayê.' Seyda bi vê bersivê gihiştibû merama xwe. Ji lewra bi awayekî Melle Nûrî jî neêşîne peyivî. Binêrin di van malikan de Seydayê mezin Melle Xelîl bal kişandiye ser ferqa di navbera erkan û şertan de. Yanî ruknên îmanê û şertên wan ji hev dike. Bala xwe bidinê me şert ji dest dane, em bi ruknan ketine. Gelo şertên îman û îslamê çend li cih in? Gelo ji bo em

îmanê bînin, em gihiştine (balixbûyîn), em hur in, (azad in) aqiltemam in, em xwedî derfet û îmkan in ji bo hin tiştan bikin, ewlewiyatên me sererast in?

Tu guhdêre nitq û beyana fesîh
Ji bo ferz û eynan e merdê melîh
Ku îman û islam û sewm û selat
Li ser malîdaran e hec û zekat
Li ser te ji ferzan e ey nûrî can
Bizanî tu erkan û şertê di wan'

Melle Nûrî û Xêrî li ser gotinan fikirîn. Seyda jî diponijî. Bêdeng bûn. Piştî kêliyekê Seydayê Melle Ehmed pirtûk danî erdê, pal da û got: 'Ez ê ji we re meseleyekê bi kurtî bibêjim.' Seyda car caran hin mesele digotin. Kêfa Xêrî pirr ji meseleyên Seyda re dihat. Ji ber ku di her meseleyeke wî de hîkmetek hebû. Wî jî baş dizanîbû ku Xêrî pirr bi hezeke mezin li wî guhdarî dike. Bi vê jî kêfxweş dibû. Wer bawer jî dikir ku sermayeya xwe dide destekî baş. Dîsa hin caran digot: 'Xêrî tu yê bibî alimekî mezin.' Bi vê jî dilê Xêrî hildiavêt û diket nav xeyalan ku bûye alimek an jî Seydayek ê li ser mînberan waz û nesîhetan dike. Seydayê Melle Ehmed ji wan re behsa çîrokeke nebî Mûsa kir. Xwedayê Mezin hin caran li Tûrî Sîna (Çiyayê Sîna) bi nebî Mûsa re sohbetê dike. Carekê jêre dibêje: 'Ka here hin ebdên min hene li halê wan bipirse, bê ka rewşa wan çi ye, ji wan çi bi serê te dikeve. Nebî Mûsa diçe cem ebdekî Xwedê dinêre bi şev û roj nimêj dike, rojiyê digre. Diçe cem yekî din dîsa wisa. Lê yê sisiya dibîne mîna delodînan e, bi çiyan ketiye. Xwe ji pişt kevirekî diavêje pişt kevirê din. Mûsa jê dipirse çi dikî, li çi digere. Ew ebdê Xwedê dibêje; ez li Xwedê digerim, ez wî bibînim, ez ê wî bikujim. Nebî Mûsa vedigere hal û ehwalên wan ji Xwedê re dibêje û ji Xwedê dixwaze aqûbeta van kesan li dinya din bizan e. Xwedayê Mezin dibêje; ew her du ebdên min ên pêşîn cihê wan agir e, lê yê din xwediyê mukafatên mezin e. Nebî Mûsa matmayî dimîne û hîkmeta meselê ji Xwedê dipirse. Xwedê jêre dibêje; wexta min tu şandî cem ebdê xwe yê pêşî, dareke wî ya hinarê hebû. Min her tim rizqê wî hinarek pêve dikir. Lê wexta tu çûyî min kir du hinar. Wexta pişta te ketê wî ew hinara din xist bin serê sicadeya xwe û veşart. Yê din jî heman tişt kir. Lê ebdê min ê dixwaze min bikuje, her tim min nanek dixist tûrê wî û roja tu çû cem wî, min du nan xistin tûrê wî. Wî jî her du nanên xwe derxistin û bi te re parve kirin. Ew li min digere û dixwaze xwe bigihîne min. Meraqa wî ji bo min heye.'

Di îslamê de ji van çîrokan re îsraîliyat digotin û durist nedihatin dîtin, lê dîsa jî gellek meseleyên melleyan ji gel re vedigotin îsraîliyat bûn. Çîrokê bala Xêrî pirr kişandibû. Bi taybetî jî ebdê Xwedê yê hewl dide wî bikuje baş bi serê wî neketibû, lê ji bo wî aliyekî cazib hebû. Ji ber ku wî jî dixwest xwe bigihîne Xwedê. Baş dizanîbû kes nikare Xwedê bibîne û îdrak bike. Ji ber ku Xwedê weke okyanûsekê bû û aqilê mirovan jî mîna şerbikekî bû. Mumkîn nebû okyanûs di şerbik de hilbihata. Lê ew li her derê hazir û nazir bû. Ew nehatibû zayîn û nezabû. Ew zindî bû, lê bêyî cih û mekan bû. Ew mezin bû, ne serî û ne jî dawiya wî hebû. Mirin an jî dawî jêre tinebû. Ew weke mirovan nebû, her tişt dizanîbû. Tiştek ji wî nedihat veşartin. Xêrî jî tiştek jê venedişart û di her duaya xwe de jêre her tişt digot. Jixwe Xwedayê Mezin a di dilê mirov de ditewirî jî dizanîbû. Ji ber vê yekê jî Xêrî bi hisa Xwedê jî bi wî dizane, di dilê xwe de xwesteka xwegihandinê dibihurand. Her çend hin melleyan fikirkirin û pirskirina Xwedê guneh didîtin jî Xêrî bi tevahî bi vê yekê îqna nedibû. Ji ber ku Xwedê her tiştên di dilê wî de ditewirîn baş dizanîbûn. Wî Xwedê nêzî xwe his dikir û bawer dikir ku xwe bigihînê. Bi van hisan wê êvarê jî eşqeke mezin ketibû dilê wî û gellekî gewz bû. Lewma jî wê rojê kêmqezenckirina xwe ji bîr kir û bawer kir ku wê Xwedê rizqê wî bide. Bêguman dizanîbû ku divê ew ji bo vê yekê li ber xwe bide û paşê tewekulî Xwedê bike.

Dereng bûbû û melle Nûrî çav lê şikand û xwest bi hev re derkevin.

## ( 4 )

### NE JI ME BÛYA WE NEDIKARÎ BIKEVIN DIYARBEKIRÊ

Xêrî û Melle Nûrî li bin barana hûrhûr dibariya bi lez dimeşiyan. Di serê quncika Deriyê Çiyê re fitilîn. Xêrî hînê nû li wir ji Melle Nûrî pirsî ka diçin ku derê. Melle Nûrî bêyî ku li Xêrî binêre got: 'Em ê biçin mêvandariya hin xwendekaran.' Xêrî ji hin aliyan ve hem dilê xwe dibijand Seydayê Melle Ehmed û ji hin aliyan ve jî dilê xwe dibijand Melle Nûrî. Lê heyecan, liv û lebata Melle Nûrî zêdetir bala Xêrî dikişand. Melle Nûrî baş bi Kurdî nizanîbû. Bi Tirkî baş dipeyivî û dizanîbû gotinên xwe lib bi lib bibêje. Ji Xêrî bi çend salan mezintir bû. Xêrî êdî sala dawî ya lîseyê dixwend. Eger ji bavê wî yê kal û diya wî ya pîr nebûya wî yê li medreseyeke kurmancî bixwenda û bûbûya alimekî mezin. Lê wan nedixwest ew ji wan dûrkeve. Wî jî nedixwest bêhurmetiyê li wan bike û guh nede wan. Ji ber ku Xwedê teala jî gellek caran li bawermendan ferman kiriye ji bo ji gotina dê û bavê xwe dernekevin. Bi taybetî jî resûlê Xwedê gotibû: 'Cennet di bin pê dayikan de ye.' Eger birayê wî yê mezin qebûl bikira, wê li dê û bavê wî binêre, wê karîbûya hinekî bi serê xwe tevbigere, biçe sohbetê aliman, li şevbêrkên wan rûnê, ji feyz û hîkmetên wan sûdê werbigire.

Li nêzî Eynzelê ketin avahiyek şeş qatî. Derketin çûn qatê jor ê dawî. Li derî dan û hema yekser derî vebû. Xortekî baş por û riha xwe kurkirî derî vekir û bi tirkiyeke xweş xêrhatina wan kir. Li hundir li derdora bîst sî xortên bi heman qilafetî hebûn. Li hola xanî gellek kursî danîbûn û bi nîzam rûniştibûn. Di tevgera xwe de pirr bi rêkûpêk bûn. Hinan ji wan li xaniyê malê xwarin amade dikirin. Xêrî û Melle Nûrî çûn li serê holê rûniştin. Li wir pirtûkek danîbûn ser kursîquranekê. Diyar bû wan û melle Nûrî hevdu baş nas dikir. Hinekî li hevdu pirsîn û paşê Melle Nûrî ji wan re destpêkir ji pirtûkê xwend û li hin cihan ji wan re tefsîr û şirove kir. Her kesî bêdeng guhdarî dikir. Melle Nûrî pirr baş dizanîbû xîtab bike. Axaftinên wî tesîr li hundirê mirovan dikirin. Qederekê xwend û di dawiyê de ji nişkê ve devê pirtûkê girt. Li xortên ciwan vegeriya û behsa tehlûkeya komînîzmê ya roj bi roj mezin dibe kir. Li hemberî vê rewşê bêgaviya xortên ciwan anî ziman. Lê xort jî di bin vê de neman û gotin: 'Kurdan deriyê xwe li komînîzmê vekiriye.' Bi vê gotinê melle Nûrî hinekî êşiya û bi tirkiya Diyarbekiriyan bersiveke hişk da: 'ûlan tirrolar ji me nebûya we nedikarî bikevin Diyarbekirê. Jixwe beriya 12ê Îlonê pêjna we li vir nebû. Piştre me deriyên vir li we vekirin. Ji tirsa komînîstan hûn di van aqaran re jî nediçûn.' Aliyê siyasî yê Xêrî zêde xurt nebû. Ji lewra nikarîbû mane bidiya van axaftinan. Wê şevê wî tenê guhdarî kir. Jixwe paşê li derketinê wê ji melle Nûrî bipirsiya mazûbanên wan kî bûn û ew ê hîn bibûya ku ew serbazên tirk in, li bajarê Kurdistanê dixwînin. Di nava artêşê de ev serbazên dîndar bûn. Li dijî komînîzmê bûn. Her çend Xêrî darvekirina Şêx Seîdê Kal ji aliyê artêşê bi bîr xist jî melle Nûrî jêre got: 'Şêx Seîd ji aliyê rejîma Kemalîzmê ve hatiye darvekirin.' Bawermend hemû birayên hevbûn û diviyabû pişta hevdu bigirtana. Naxwe kufra komînîzmê ya xwedênenas wê li her deverê cîhanê belav bibûya. Ma ne diviyabû ayetê Xwedê yê dibêje: 'heta dînê Xwedê li rûyê zemîn serdest bibe divê cîhad dewam bike' bi cih bihata. Cîhad jî jixwe ji cehd û xebatê hatibû û maneya wê ew bû ku bawermend bi şev û roj her tim û bi her awayî li ser riya Xwedê di nava zikir û îbadetê de bin. Di dawiyê de jî mukafat û diyariya mezin li cem Xwedê dihat

dayîn. Cennetên di wan de çem diherikîn, hûriyên siya wan nedida erdê, hewdên şîr û hingiv li benda bawermendan bûn.

Xêrî ji bo biçe malê dereng mabû. Hinekî dilezand. Mala wan nêzî Minara Çarling bû. Baranê jî êdî xweş kiribû. Di qatê binî yê apartmanekê de diman. Bavê wî dergevanê apartmanê bû. Bavê wî êdî kal bûbû û di karê xwe de lawaz bû. Xêrî pirrî caran alîkariya wî dikir. Piştî dibistanê jî li serê ênîşka Deriyê Çiyê nêzî Mizgefta Nebî gaza hesteyan dadigirt. Pirr zêde kar nedikir, lê dîsa jî Xwedê nesîb û rizqê wan dişand. Xêrî hêdîka ket hundir. Lê dît ku bavê wî jî destavê tê û wê biçe razê. Bavê wî lê vegeriya û bi bîra wî xist ku dereng hatiye. Jê xwest li xwe miqate be. Ji ber ku ji ber siyasetê gellek mirov dihatin girtin û di zindanan de dihatin kuştin. Bêguman Xêrî jî dizanîbû piştî 12 Îlonê gellek Kurdên komînîst hatine girtin an jî kuştin. Ew carnan li ber wan diket û digot: ‘xwezî ew kafir nebûna.’ Ji ber ku ew jî mirovên bi cesaret û edalet bûn. Lê mixabin îmana wan tinebû. Li cem Xwedê jî cihê wan agir bû. Lê hewce nedikir bavê wî biqirqiliya, ji ber ku tiştekî wî bibira zindanê tinebû. Her çî Xêrî bû, carnan xwe nedigirt û difikirî, çima hinek mirov li qatên jor rûdinên û kesên mîna bavê wî kal ji wan re bi wê pişta xwe ya xûzbûyî xizmetê dikin. Çima li kolanên Xançepekê mirovên xizan hebûn û heta hê li jêrê çima jin li cihekî bi navê kerxaneyê dihatin firotin? Lê dîsa jî Xwedê ji bo her tiştekî hîkmetek û sebebek çêkiribû. Ti tişt bêsebeb û illet nebû. Xêrî berî razê destnimêj girt û nimêja xwe kir. Destên xwe ber bi jor ve bilind kirin û ji Xwedayê Mezin xwest riya rast nîşanî wî bide, wî ji xirabî û nebaşiyan biparêze. Xêrî jî baş dizanîbû qencî jî û xirabî jî ji Xwedê ne, lê wî dixwest çêyî para wî bikeve. Lê hinek weswese diketin dilê Xêrî û tavilê xwe ji wan dadiweşand. Yanî carnan difikirî çi hewce bi van hemû nakokiyan hebû Xwedê afirandibû. Çi pêwîstî bi vê îmtîhanê hebû. Jixwe Xwedê serî jî û dawiyê jî dizane. Lê kengî hişê Xêrî bi nakokiyan tevlîhev dibû, bawer dikir ku mirov jixwe mexlûqekî aciz ê Xaliq e, lewma jî nikare li her tiştî serwext bibe. Ma ne hişê mirov bi qasî şerbikekî tinebû, li hemberî vê jî mezinahiya Xwedê weke okyanûsê bû. Çawa dibû ku okyanûs di şerbikê de bi cih bibe.

## ( 5 )

### XWEDÊ LI HER DERÊ YE

Keçeke pirr xweşik û delal bû. Navê wê nizanîbû. Dibe ku berê dîtibe. Nîvtazîbû. Çima li odeya wî bû nizanîbû. Bi heyecan dilê wî hildiavêt. Ji ber ku ber bi wî ve dihat. Ew jî bêgav di nav nivînan de bû. Hinekî jî hewa sar bû. Ew zeriya hat guhê nivîna wî rakir û xwe xist berê. Ew jî hîç li tiştekî din nefikirî û bi germa bedena wê kêfxweş bû. Xweşiya wî hatibû. Jinik ji nişkê ve ji nav nivînan bi kenekî bilind derket û pê keniya. Li ser milê xwe yê rastê vegeriya û jêre got: ‘Ez şeytan im. Min tu ji rê derxistî.’ Xêrî wexta hişyar bû dît ku avika jê çûye ew şil kiriye. Ew heram bûbû. Bi cenabet bû. Diviyabû xwe helal bikira. Ji ber ku wextê nimêja sibê jî nêzîk bûbû. Tevî ku şeytan pê keniya bû jî bi wê germahiyê şa bûbû. Hinekî poşman jî bûbû çawa şeytan karîbû wî di xewnê de bixapîne û pê bikene, henekê xwe pê bike. Destê xwe xist nav navrana xwe û bi tiliyên xwe li avika virçoqî neherî, di ber xwe de got: ‘Ev giş hêk in, zarok ji wan çêdibin.’ Gelo bi vî awayî ew dibû mêrkujekî zarokan. Ma çi gunehê wî têde hebû. Bi destê wî nebû. Di xewnê de tiştekî wî bikira nebû. Ji lewra Xwedê wê ew ji vê kirinê berpirsiyar negirta. Eger wî bi destê xwe xweşiya xwe bianiya

(masturbasyon) wê bibûya gunehkar. Lê wî ji çend caran zêdetir bi destê xwe xweşiya xwe neanîbû. Jixwe wexta wisa kiribû jî têgihîştî û serwext nebû. Lê dîsa jî hin aliman digotin heta can bi cenînê nekeve, mirina hêkan an jî jiberkirina cenînê guneh nîne. Gotinên van aliman jêre maqûltir bûn, lê jixwe hewce bi vê xweşî û şabûnê nebû. Ya girîng ew bû mirov li ser riya Xwedê xwe bigihanda şahî û bexteweriyê. Lê dîsa jî germahiya keçika bûbû mêvana xewna wî xweş bû. Nav cihê wî yê sar germ kiribû. Hê xwe negihandibûyê avik jê çûbû. Gelo xwe bigihandayê wê çend xweş bibûya. Bi vê re, carek din, bêyî vîna xwe, destê xwe bir nav şeqê xwe û bi kîrê xwe girt. Destê xwe birûanî, pê xweş hat û ev yek hînê bi lez kir. Keçika di xewna xwe de anî ber çavên xwe û avik jê çû. Pirr şa bûbû û xweşiya wî hatibû. Piştî ku av jê çû nizanîbû çima, lê xwe ji nû ve gunehkar his kiribû. Di ber xwe de got: 'ev yek wê cara dawî be.'

Xêrî rabû avê germ bike ji bo xwe helal bike. Lê tiştek nedît pê agir vêxe. Nexwest diya xwe jî nerehet bike. Jixwe fedî dikir û nexwest kes pê bihese ew serê xwe dişo. Lewma ew bi serê têliyan meşiya ket serşokê û ava sar li xwe kir. Ava qerisî ew bi ser xwe ve anîbû û bêhna wî hatibû ber wî. Tevî ku ji serma diricifî jî dilê wî gellekî li cih bû. Çû ser secadeyê û li pêşberî Xwedayê Mezin rawestiya. Bi eşq û şewqeke mezin destên xwe bi maneya teslîmbûnê bilind kirin û paşê bi maneya hurmetê destê xwe yê rastê li ser navika xwe danî ser destê çepê. Dest bi xwendina sûreya fatîhayê kir. Ji tiştên dixwendin tiştek fêhm nedikir. Tevî vê jî lefzên gellekî xweş bûn. Belkî ji wê bû her gotinek pirr bi mane xuya dikir. Gellek caran difikirî; gelo rojekê bibe alimekî mezin wê van gotinan û sirran fêhm bike.

Xêrî kengî silava xwe da û nimêj bi dawî kir. Diya wî bang lê kir ji bo taştê bixwe. Diya wî jêre hinek zeytûn xistibûn sênîkekê û du hêk jêre qelandibûn. Ji ber ku bi şev dereng hatibû, diya wî şîret lê kirin da ku ji bo li xwe miqate be. Bi pey kesên aqilê wan hatiye şuştin nekeve. Serhildana Şêx Seîd bi bîra wî xist û got: 'Binêre lawo yekî mîna Şêx Seîd efendî jî li ber dewletê rabû, lê nikarîbû. Îcar çend xortikên hînê mûyê heram li ber pozê wan wê karibin bi vê dewletê.' Xêrî bêdeng li diya xwe guhdarî dikir. Diya wî gellek caran ev gotin û şîretên xwe dubare dikirin. Bêguman dilê wê pêve bû û li ser wî diricifî. Dixwest kurê xwe ji xirabiyan biparêze. Di dema xwe de wan jî gellek zor û zehmetî kişandibûn. Pirr êş kişandibûn. Derdê zordar û zaliman pir dîtibûn. Ji lewra dixwest Xêrî jî zanibe li jor Xwedê û li jêr jî siya wî dewlet heye. Bi vê sedemê, nedixwest kurê wê bi pey şaşiyan bikeve û hinek bi hişê wî bilîzin. Jixwe ufareya wê ya binê bênderê Xêrî bû. Xuşkên wî dabûn mêr û birayên wî jî zewicîbûn ji malê cihê bûbûn. Ew berxikê malê bû. Jixwe darbeya eskerî ya 12ê Îlonê weke qirimekê di ser serê ciwanan re derbas bûbû. Darbeyê serê hinan ji wan birîbû û tayê serê hinan ji wan qut kiribû. Yê mayî jî bi tirsê pûç kiribûn. Lewma tirsa diya Xêrî jî tewş bê cîh bû. Bi van şîret û temiyan Xêrî rabû rahişt selika bavê xwe û bi lez çû dikanê pêdiviyên kesên li apartmanê rûdinên kirrî û li malan belav kir û bi lez berê xwe da dibistanê.

Xêrî ji bo xwe bigihîne nimêja înê ji mamosteyê xwe yê dibistanê destûr xwest. Mamoste destûr dayê. Li dibistanê bi giştî mamoste ji kesên dîndar re baş bûn. Xêrî para bêhtir li wazên Seydayê Melle Ehmed guhdarî dikir. Lê carnan wexta kuxikê Seydayê Melle Ehmed digirt, li şûna wî melle Nûrî derdiket xutbeyê. Wexta melle Nûrî jî xutbe dida pirr siyasî dipeyivî û ji ber vê, gellek kesên polês, esker û heta hin mirovên wisa bi rih û şaşik ango bi taybet bi karên dînî re mijûl dibûn dihatin mizgeftê. Diyar bû têkiliyên wî bi wan kesan re jî xurt bû. Têkilî û danûstendina di navbera wan de jî bi lez û xurt bûn. Ji ber ku wexta melle Nûrî xutbe bixwenda wan dizanîbû. Wê înê jî kuxikê Seyda girtibû û li şûna wî melle Nûrî derket xutbeyê. Pirr bi heyecan û zimanekî dijwar dipeyivî. Zêdetir li ser komînîzm û kufrê sekinî û hinekî jî emperyalîzma Emerîkayê rexne kir. Behs kir, çawa jiyana mirovan ber bi şêwazê jiyana Emerîkayê ve diçe. Pirr bi tesîr axivîbû. Li derketina ji nimêjê li dora wî xelekek ji mirovan çêbûbû. Şaşika li serê wî sipî boz bû. Rûyê wî bi ken û nûranî bû. Ji kenan diranên wî xweş xuya dikirin. Bi her du destan bi destê mirovan digirt û xwe bi dilnizmî li ber mirovan xwar dikir. Bi hinan re hînê germ tevdigeriya û ew himbêz dikirin.

Têkiliya biratiyê ya bawermendiyê baş datanî. Piştî nimêjê pirr neçû gotin; polêsên sivîl melle Nûrî birine nezaretxaneyê ji bo îfadeya wî bigirin. Li derdorê dihat gotin ku wê ji ber axaftina wî ya di xutbeyê de îfadê bide. Xêrî baş fêhm nekiribû ka gelo Melle Nûrî çi gotibû ku bûbû sedema binçavkirina wî. Pirr derbas nebû polêsan ew berda. Li mizgeftê çûnûhatineke bi heyecan hebû. Gellek kesan lê dipirsî û jêre digotin; derbasbûyî be. Lê melle Nûrî bi rûkenî û jixwe razî digot: 'Serketin a Xwedê ye.' Seydayê Melle Ehmed jî li hucreyê rûniştibû û ji ber kuxikê nebaş bû. Ji bûyera girtinê jî nexweş bû, lê tiştek nedigot. Mîna ku hinek tişt di dilê wî de hebûn û nikarîbû bibêje. Bêdeng bû. Lê carekê Xêrî şahidî kiribû ku Seydayê Melle Ehmed gotibû: 'Divê em karibin dîn û dewletê ji hevdu bikin.' Xêrî heyr mabû Seyda çawa wisa dibêje. Ma ne diviyabû dewleteke Îslamê jî hebûya. Lê Seyda gotibû: 'Dîn şêwazekî jiyanê ye. Dewlet awayekî rêvebirinê ye. Divê wekhev nêzî hemû bîrûbaweriyan bibe.' Ya rastî ev jî bi serê Xêrî neketibû. Dîsa jî van gotinên Seyda li quncikeke serê wî cih girtibûn.

Xêrî ji ber vê bûyerê dereng mabû biçe karê xwe. Bi lez çû, dezgeha xwe li fitla Deriyê Çiyê danî. Dezgeha wî zêde ne mezin bû. Hin cureyên gazên hesteyan hebûn. Kevirên hesteyan û hin aletên wî ji bo çêkirina hesteyan hebûn. Car caran cixareyên bi kalîte jî difrotin. Li ser rê gellek mirov diçûn û dihatin. Bi pirr kesan re danûstendina wî hebû. Ji vê yekê, Xwedê rizqê wî dida. Her çend zêdetir danûstendina wî bi dîndaran re hebû jî lê bi kesên din re jî têkilî datanî. Bi kesên çepgir re pirrî caran nîqaş dikir. Pirranî jî bi wan re li ser Xwedê guftûgo dikir û aqilê wî nedibirrî çawa ji Xwedê bawer nedikirin. Bi serê wî nediket, çawa bêyî Xweda dikarîbûn vê hebûnê bifikirin. Di ber xwe de gellek caran digot: 'ma qey serê xwe ranakin û li ezmanan temaşe nakin, kê çawa afirandiye. Ma tiştek bêxwedî hebû. Ma tiştek xweber pêk dihat. Ma ti tişt ji ber xwe diliviya. Çend nezanbûn ku nedifikirîn, pelên dara jî bêyî Xwedê ji darê qut nedibûn û nediweşiyan. Ma ne Xwedê gotibû; Xwedê kê bixe riya rast ew dernakeve derve û Xwedê kê ji rê derxe ew nakeve riya rast.'

Wê rojê hewa hinekî sar bû. Lê tavikê bi şermoke be jî li dinyayê dinêrî. Herçiqas tîna wê kêm bû jî dil û hinavên mirov xweş dikirin. Di wê hewayê de Selîmê Dîn weke gellek caran bi hemdê xwe dimeşiya. Selîm bala Xêrî dikişand. Selîm qirêjî bû, porê wî gijikî bû û gincola porê wî gemarî bû. Kincên li ser wî qetiyabûn û mîna komirê reş bûn. Tevî vê yekê jî gellekî giran û ciddî xuya dikir. Por û riha wî ya tevlîhev û dirêjbûyî ew mîna feylesofekî nîşan dida. Mirov digot qey ew pirr difikire û tim diponije. Xêrî carna dev diavêtê û bela xwe têdida. Dîsa wexta Selîm ji wê de dihat, jêre got: 'Binêre kincên te qetiyane, eyb e, em yekî ji te re bikirin.' Selîmê Dîn li Xêrî zîvirî û hinekî ingirî û got: 'Çima eyb e, ma xelkê giş qûna xwe belot kiriye eyb nîne, kîrê min eyb e.' Xêrî têde heyr ma, ji ber ku hin gotinên wî li gorî Xêrî jî rast bûn. Lê dîsa jî Xêrî got: 'Divê mirov ji Xwedê fedî bike.' Selîm bû fîqe fîqa kenê wî û li Xêrî temaşe kir û got: 'Kuro kîjan Xwedê, welleh tu jî hîn ciwan î, Xwedê nas nakî, lawo Xwedayê we giş bûye pere, bûye faîz û malê heram. Rast e, Xwedê li her derê ye, lê Xêrî em ê ji kîjan Xwedayî fedî bikin ha, ha ha.' Xêrî hinekî pêre xeyidî û got: 'Selîmê Dîn kufriya neke, Xwedê yek e, û li her derê hazir û nazir e.' Selîmê Dîn hêdî meşiya û destê xwe ber bi Xêrî li ba kir weke bibêje tu hînê xeşîm î û di ber xwe de got: 'Xwedê hazir û nazir e peh, tu nabînî, tu nabînî, tu nabînî…' Ji ber ku Selîm dîn bû Xêrî zêde aciz nebûbû û lê nedigirt, lê dîsa jî gotinên wî hem Xêrî fikirandibûn û hem jî hinekî êşandibûn. Li gorî Xêrî Selîm mîna feylesofekî peyivîbû.

Berêvarê Xêrî dezgehê xwe da serhev, pirtûka xwe derxist û ji bo dersê berê xwe da Mizgefta Kozlikê. Li ser rê dîsa çavên wî bi Selîm ketin. Selîm di wê sermayê de serê xwe danîbû ser kevirê rê û hewl dida razê. Xêrî di ber xwe de got: 'subhanellah çawa sermayê his nake û wer dikare razê.' Bihîstibû dîn gellek tiştan hîs nakin, lê dîsa jî can bû, ma çawa his nedikir. Bi vê rewşa Selîm a di hişê xwe de çû hucreyê, cem Seydayê Melle Ehmed û jêre behsa rewşa Selîm û gotinên wî kir. Seyda hinekî ponijî û piştî ku kesereke kûr kişand, got: 'Ya rastî, gotinên Selîm îro gellek kesên biaqil nikarin bibêjin. Belkî jî Xwedê bi wî dide gotin. Ji ber ku bi rastî, ji bo gellek kesan Xwedê pere ye, hêz e, aqilê ûqela ye, û yan jî jin e.'

Seyda demekê bêdeng rawestiya û Xêrî jê pirsî: ‘Seyda gelo yên mîna Selîm li wê dinyayê cihê wan ku der e? Seyda kêliyekê li Xêrî bi girnijîn temaşe kir û got: ‘Tu dizanî rojekê feqiyekî mîna te ji Seydayê xwe dipirse; gelo wexta zarok dimirin li wê dinyayê diçin cennetê yan cehennemê. Seyda jî jêre dibêje ew diçin cennetê. Feqî dîsa dipirse; dibêje lê yekî kafir bimire diçe cennetê yan cehennemê. Seyda jî dibêje, ew diçe cehennemê. Feqî dîsa dipirse; dibêje lê eger ê kafir jî bibêje; ya Xwedê wexta ez zarok bûm te canê min jî bistenda û ez nexistima vê cehennemê. Li ser vê yekê Seydayê wî bêzar dibe û jêre dibêje; rabe ez te ezil dikim. Li ser vê yekê, Feqî ji Seyda re dibêje; Seyda kera te ketiye heriyê, te girtiye bi teriyê. Paşê ew Feqî mezhebê mutezîle dadimezirîne.’ Li ser meseleya Seyda gotî serê Xêrî jî tevlîhev bûbû û navê mezhebekî nû bihîstibû û wî heta wê demê navê mezhebê Şafiî, Henîfî, Malikî û Hembelî dizanîbû. Dîsa bihîstibû ku mezhebê Wehabî li Erebîstana Suûdî heye. Jixwe mezhebê Şîa jî ji rêderketî didît. Ji bo wî mezhebên rastî yên Ehlî Sunne bûn. Ji ber vê jî Xêrî ji Seyda pirsî; mezhebê mutezîle îro li kîjan deverê heye. Seyda hevdeyên riha xwe bi nermî kişandin û got: ‘Mutezîle û hin mezhebên din ên weke wan ji aliyê siltanên zalim ve hatin qedandin.’ Piştî vê Xêrî dîsa pirsî: ‘Seyda ma ew jî misilman nebûn?’ Seyda bala xwe dayê wê pirsên Xêrî dûrûdirêj biçin û hinek bi hêrs got: ‘Erê ew misilman bûn, lê hinek xîlafên wan bi mezhebên din re hebûn, dev ji van berde ka kitêba xwe bîne em dersa xwe bixwînin.’

Piştî dersê Seyda pala xwe da dîwêr û pelikên çavên xwe miçandin û qederekî ponijî. Xêrî jî ji xwe re lê temaşe dikir. Wexta Seyda pelikên çavên xwe hêdî rakirin, bala xwe dayê ku Xêrî li wî temaşe dike, girnijî û got: ‘Xêrî tu dizanî Selîm piştre dîn bû, yanî berê ne dîn bû. Ew melle bû. Ew melle Selîm bû.’ Xêrî matmayî ma. Yekser, lê bi dengekî nermik pirsî: ‘Çima ew dîn bû, çi ew dîn kir?’ Seyda hinekî bi keser bersiv da: ‘Wî ji dotmama xwe hez kir. Eşqê wê bû. Piştî ku dotmama wî bi kesekî din re zewicî, wî jî dev ji her tiştî berda, dev ji xwe jî berda. Yanî piştre dotmama wî hat jêre got; tu hema çi bêje bila weke te be, lê wî destê xwe jêre li ba kir û tenê got; çû. Piştî vê gotina Seyda li hucreyê bêdengiyeke kûr ket xwarê. Li wê hucreyê mîna çilexaneyên derwêş û evdalan giranî û xilmaşbûna li fikrê xwe berdabû xwarê. Hewaya li hucreyê dihênijî û ditengijî ji barê maneyeke navlênekirî. Xêrî difikirî, gelo çima Seyda bi vê bûyerê ew çend xemgîn û hezîn bû. Gelo ew li ber çi diket? Li ber melle Selîm an jî Selîmê Dîn. Belkî jî li ber xwe diket. Heye ku dilê xwe dibijande dînîtiya melle Selîm. Ji ber ku Seyda pirrî caran mikur dihat ku ew li hemberî rejîma dewleta Tirk a kafir çend zelûl û stûxwar mane. Ew wer kirine ku bûne civakeke ji aqil bêpar û ji kirasê xwe derketî. Dînîtiya Melle Selîm dînîtiya wî bû. Ew dîn bû. Di nava piraniyê de ew dîn bû. Ew bi qasî her kesî paqij û nişmî nebû. Weke her kesî nedikeniya, fena her kesî nedipeyivî. Ew nola her kesî nebû. Ew dîn bû. Her kes weke hevdu bûn. Ji hevdu razî bûn. Di hevdu re nediçûn. Ew weke hevdu bûn.

Seyda westiyayî xuya dikir. Ji Xêrî xwest bi destê wî bigire û rabin biçin. Sihet û tenduristiya Seyda baş xuya nedikir. Xêrî bi destê wî girt û hêdî hêdî derketin hewşa Mizgeftê. Seyda li hewşê xwe spart dara tûyê û hinekî bêhna xwe da. Li derve hewa hênik û nişmî bû. Dengê şirikên avdestxaneyê xweş dihatin. Lampeya bi dara tûyê ve hatibû kirin tenê vêketî bû. Rohniya wê li aliyekî rûyê Seyda dixist. Aliyê din ê rûyê Seyda mîna ezmanê hêşîn kûr û tarî xuya dikir. Li aliyê tarî kulmozeke ponijandinê hebû. Xêrî jî zoq û bi meraq lê dinêrî. Dixwest xwe bigihîne wan sirrên li rûyê Seyda di çilexane û hucreyan de reh berdane. Dixwest tîna nezanîna xwe bi awirên wî yên zanînê bişkîne. Ji ber vê jî Xêrî xwest wê şevê pirsa xwe ya dawî bike. Ya rastî dudil bû ji ber ku Seyda nexweş bû û gellekî westiyayî xuya dikir. Lê dîsa jî xwe negirt û pirsî: ‘Seyda ma mirov ji bo jinekê dîn dibe?’ Kêfa Seyda ji Xêrî re dihat. Bawer dikir ku Xêrî wê bibe alimekî mezin. Ji ber vê jî dixwest hin tiştan jêre bêje û bidiyê. Lê Seyda jî dizanîbû hinek tişt wexta dema wan neyê divê neyên gotin. Her tiştekî wexta xwe hebû. Lê wê êvarê, dilê wî tev rabûbû û hisên wî yên rehberdayî hakimên şevê bûn. Dilê wî yê keliyayî di ser re çûbû û emrê zêde nikarî wî zevt bike. Destê xwe avêt stûyê

Xêrî û bi keserkişandinên kûr dest bi peyvê kir: 'Însan qels û lawaz e. Zanîn eşq e, mirov pê bi firrê dikeve. Aşiq heye û maşûq heye. Eger hezkirina aşiq nebe delaliya maşûqê qîmeta xwe nîne. Lewma aşiq di kûreya agirê xwe de dipije. Ji ber vê ye, meqsûd û kabeya heyî ji hevdu dûr dikevin. Aşiq ew kes e, di agirê xwe de dişewite. Yanî ya melle Selîm dixwaze bigihîjê belkî ne dotmam, heqaniyet be. Wexta nûra heqaniyetê dakeve dilê mirovan ew wesîleyekê yan jî kabeya xwe diafirîne.' Seyda hinekî bêhna xwe da û navber xist axaftina xwe û bi girnijîneke şîrînane got: 'Ma ne tê bîra te, me di pirtûka Feqiyê Teyran de di çîroka wî ya Şêxê Sinaniyan de ev beş xwendibû, malika dawî tê bîra te;

Miksî ji eşqê sohtiye
Ev qewl bi şêx ve nohtiye
Halê xwe tê da gohtiye
Ji xeyn û lamê di hicretê.'

## ( 6 )

EZ BI PEY WAN KESAN KETIME KU BÊ SER Û ŞÛN ÇÛNE

Li Amedê yek ji gellek berhemên balkêş û nadîde, yek jî minara Çarling bû. Ev minare di dema Aqqoyîniyan de hatiye avakirin, bi pêncsed sal temenê xwe, li ser lingên xwe disekine. Li gorî bîrûbaweriyê; eger hûn di bin minara Çarling re derbas bibin, Xwedê miradê we dike. Hinek jî dibêjin; mirov divê heft caran derbas bibe. Xêrî serê sibê wexta rabû biçe li şûna bavê xwe yê kal pêdiviyên apartmanê bigire di binê minarê re derbas bû, tevî ku dizanî ev bîrûbawerî xurafe ye. Dîsa jî girnijî û di ber xwe de got; ka em binêrin wê çi biqewime. Ji ber ku wî dizanîbû di dîn de cihê baweriyên bi vî rengî nîne. Minare bi kevirên reş û spî hatiye lêkirin. Ango belek e. Mîna felsefeya reş û spî ye. Yên din qebûl nake. Lê çima çar lingê wê hene ew jî nayê zanîn.

Li nêzî Minara Çarling fileyekî bi navê Yaqûbo hebû. Mirovekî xişr û alavên bi destan hatibûn çêkirin difirotin. Dikaneke wî ya piçûk hebû. Mirovekî bêdeng bû. Rih û porê wî tevlîhev bûn. Kincên wî zêde paqij nebûn. Timî bi hin tiştan re mijûl dibû û dilebikî. Dikana wî jî li ser esasê kevin û bi kevirên reş hatibû çêkirin. Devê dikana wî nîvxelekî bû. Cihekî dîrokî bû. Tiştên xwe yên difrotin, li vir datanîn. Deriyek diçû hundir û li wir jî hêwanek hebû. Ew ji kesên derve zêde xuya nedikir. Alavên firotinê yên Yaqûbo zêde bala biyaniyan dikişandin. Bi taybetî jî wêneyên wî çêdikirin. Xêrî pirrî caran di ber wî re diçû silav didayê, lê zêde pirr danûstendina wî pêre nebû. Belkî jî bi sedema Yaqûbo fileh bû, Xêrî neksa xwe jê kort dikir. Her çend Xêrî dizanîbû divê ji Ehlê Kitêban re bi hurmet be jî lê dîsa ji vexwarina wan a şerabê bêzar bû. Di Qurana Pîroz de Xwedê gotibû: **Bêguman ji yên îman anîne; yanî ji Cihû, Xirîstiyan û Sabiînan, kê bi rastî ji Xwedê û roja Axiretê bawer kirine û karên qenc kirine, li cem Rebê wan ji bo wan diyarî hene. Ji bo wan tirs tine ye. Ji bo wan xem nîne.** (Beqere 62) Tevî ku dizanîbû resimçêkirin gunehe jî resmên Yaqûbo carnan bala wî dikişandin. Hinek şikil û awayên di tabloyên Yaqûbo de mîna hin tiştan bibêjin û nikaribin

bipeyivin hebûn. Fena hin meramên bizdiyayî ku xwe bi îşaretên destan bînin ziman. Xêrî dîsa di ber dikana Yaqûbo re weke gellek caran derbas dibû. Li xişr û tabloyên li ber derî temaşe kir. Li hêwanê jî Yaqûbo resim çêdikir. Firçeya wî di destê wî de sekinî bû, mîna li tiştekî bigere. Ji nişkê ve dît, Xêrî lê temaşe dike. Hinekî girnijî û bang li Xêrî kir. Xêrî çû hundir û weke bibêje; keremke, sekinî. Yaqûbo li Xêrî nêrî û paşê zîvirî li tabloyê temaşe kir. Paşê ji Xêrî re got: ‘Tu jî ji resman hez dikî?’ Xêrî jî hinekî li tabloya wî temaşe kir û got: ‘Di dînê me de resim çêkirin guneh e.’ Yaqûbo ji ber ku bi salan xirîstiyanan ji destê misilmanan kişandibû bi baldarî û hostayî nêzî van meseleyan dibû. Ji lewra bêyî xwe bixeyidîne, xwe li xeşîmî danî û pirsî: ‘Gelo tu dizanî çima guneh e?’ Xêrî yekser bersiva wî da û got: ‘Ji ber ku mirovan di dema cahiliyê de pût û wêneyên bi destê xwe çêdikirin ji wan re îbadet dikirin.’ Yaqûbo hinekî riha xwe tevda, girnijî û got: ‘Ez îbadetê ji tabloyên xwe re nakim, lê ez pirr qîmetê didim wan. Ez pirr ji wan hez dikim. Mîna ku her yek ji wan mîna zarokeke min be.’ Li ser van gotinan Xêrî weke kêmasiyeke Yaqûbo dîtibe got: ‘Lê tu wan difiroşî.’ Yaqûbo pirsa Xêrî li cih dîtibû û bi xemgînî bersiv dayê û got: ‘Tu dizanî pirranî xerîb li tabloyên min temaşe dikin û dikirin. Lê ev yek min pirr kêfxweş nake. Lê eger yekî weke te, kurdek, kesekî ji Diyarbekirê eleqe nîşanî resmên min bide, ez pê pirr kêfxweş dibim.’ Piştî van gotinan Yaqûbo dûrûdirêj li tabloyê temaşe kir û çend caran firçeya xwe bir û anî, paşê jî boyax bi tiliyên xwe belav kir. Xêrî jî li wî temaşe kir û pirsî: ‘Çima yekî mîna min?’ Yaqûbo his kir ku wî bi Xêrî re têkiliyeke henûn û milahîm daniye, bi vê kêfxweşiyê hilma xwe kişand û got: ‘Ez bi pey wan kesan ketime ku bê ser û şûn çûne. Li vê tabloyê binêre tu çi dibînî?’ Xêrî bala xwe dayê û got: ‘Mirovên dîlan dikin hene. Gund hene xira bûne. Li dora wan qebir xuya dikin. Çiya bi mij û moran in. Balkêş e, melleyek jî Quranê dixwîne li ber serê qebran.’ Yaqûbo hinekî keniya û fêhm kir ku Xêrî dixwaze bibêje; xirîstiyan çawa melleyekî Quranê dixwîne biresmîne. Xêrî sekinîbû. Yaqûbo dewam kir: ‘Bi ya min her tişt weke xuya dike nîne. Tu kesên dîlan dike dibînî, lê ez wan kesan weke kesên zikir dikin dibînim.’ Xêrî li ser vê gotinê yekser ket navberê û pirsî: ‘Çawa zikir? Yaqûbo kêfxweş bû, ji ber ku didît Xêrî xistiye nava meraqê. Lewma kursiyek ji xwe re û yek jî ji Xêrî re danî, berê xwe da tabloyê, bi serê firçeya xwe îşaret kir û got: ‘Li vî welatî ku pirr kevn e, dîlan ji bo kêfê nehatiye kirin.’ Liv, lebat û nîşaneyên jiyana kevnare ne. Mirovan berê derd, kul û şahiyên xwe wisa dianîn ziman. Belkî jî şiklekî îbadetê bû. Ji bîr neke, li ser van erdan pirr dîn û diyanet derbas bûne. Hin hûrik û parçeyên ji ber wan mayî xwe xistin nava dîn û baweriyên piştî wan hatin.’ Li ser vê şîroveyê gotineke Xêrî tinebû. Ji ber ku zêde di vê meseleyê de tiştekî bianiya ziman nebû. Lewma ket navberê û li melleyê Quranê dixwîne pirsî. Li ser vê Yaqûbo hinekî bi fikar got: ‘Li welatekî bûye mîna qebristanê melle tenê dixwînin.’ Yaqûbo piştî vê gotinê rawestiya û xwest bibîne ka Xêrî çi dibêje. Gotin gellekî bi serê Xêrî ketibû. Ji ber ku wî jî li gorî xwe fêhm kir û got: ‘Rast e, melleyên me tenê dibêjin, lê pêk naynin.’ Xêrî li saeta xwe mêze kir û bi lez got: ‘Divê ez biçim, lê ez dixwazim tiştekî din bipirsim. Tu çima hewce dibînî resman çêkî?’ Yaqûbo li ser pirsê keniya û got: ‘Pirsa herî xweş mirov ji resamekî bike ev e. Lewma divê tu hinekî din bisekinî ku ez bersivê bidim. Lê ne zêde tenê divê tu pênc deqeyên xwe ji min re veqetînî.’ Xêrî qebûl kir pênc deqeyên din jî bisekine. Yaqûbo cihê xwe xweş kir, destê xwe avêt qevda riha xwe û bi xweşzarî got: ‘Li vê dinyayê gellek tişt hene mirov dixwaze bike, lê pirraniya wan mirov nikare bike. Belkî jî qet nikare bike. Xewn û xeyalên mirov hene. Hêvî û bendewariyên mirov hene. Ez van hemûyan dikarim li ser tûwalê pêk bînim. Ez hemû meram û meqsedên xwe bi van tabloyan tînim ziman. Ez bi zimanê kerr û lalan dipeyivim. Tablo zimanekî cîhanî ne. Ma ne te got di vê tabloyê de mij û moran heye. Rast e, ez bi wê dixwazim balê bikişînim ser hesret û hêviyên li pişt tirsê tepisokî mane. Ew nemirine diricifin. Hêza xwe nînin. Dilebitin. Bi çavekî li ber mirovan bigerin li benda alîkariyê ne.’ Ji nişkê ve Xêrî lê hayil bû ku Yaqûbo gellekî xweş bi Kurdî jî dipeyive û ji Yaqûbo pirsî: ‘Tu gellekî baş bi kurmancî dipeyivî. Ma zimanê we nîne?’ Yaqûbo li nava çavên Xêrî nêrî, hinekî sekinî û weke bibêje; gelo ez bibêjim an na, yan jî tu yê çend

têbigihêjî ji bo ku ez bi te ewle bibim. Hinekî sekinî û got: ‘Erê ji zimanê me re filehî dibêjin. Em Asûrî ne. Em bi Kurdî jî xweş dipeyivin. Em bi hezaran sal in, bi hev re ne. Ev welat ê me hemûyan e. Em giş xwîşk û birayên hev in. Lê em bi hev dan şikandin û qirkirin. Gellek fileh kuştin. Ji bo dest deynin ser mal û namûsa wan qetla wan helal kirin. Divê mirov fêhm bike, mirovên bi hezar salan bi hev re bûn, çawa bi hevdu ketin.’ Yaqûbo sekinî bêdeng bû, deng jê qut bû. Xemê xwe li ser dengê wî danî. Xêrî jî xemgîn bûbû û ji nişkê ve hat bîrê divê biçe. Wexta xwest biçe, Yaqûbo jêre got: ‘Bisekine! Eger tu bixwazî, hez dikim vê tabloyê bidim te.’ Xêrî hinekî dudil sekinî. Yaqûbo fêhm kir ku Xêrî li gunehbûna wê difikire, lewma jêre got: ‘Binêre ev, ew tişt nîne, tu jêre îbadetê bikî. Ez bawer nakim ku îslamê jî ev yek bi vî rengî gotibe.’ Xêrî li tabloyê temaşe kir. Kêfa wî jêre hatibû. Êdî li rûyê wê gellek mane jî didît. Dîsa hinekî sekinî û got: ‘Temam kengî tu temam bikî, ez ê wê bigirim.’ Xêrî derket derve û fikirî, gelo resim bi rastî bi vî awayî guneh bû. Ji ber ku Xêrî jî baş dizanîbû her pêxemberekî şerîetek xwe hebû. Yanî li gorî şert û mercan, li gorî zeman û mekanan, li gorî pêdivî û hewcedariyan, her peyxemberekî, Xwedê şerîetek dabûyê. Şerîet diguherîn. Jixwe dema illet ango sedema gunehê ji holê rabûya, guneh jî ji holê radibû. Însanan gellek tişt bi destê xwe çêdikirin, lê nedibûn ebdê her tiştî, lê hinek tişt bi destê xwe diafirandin û dibûn berdestiyên wan. Belkî jî ya guneh ev bû. Di dema cahiliyê de mirovan bi destê xwe pût çêdikirin û paşê serê xwe li ber wan ditewandin. Kole û ebdên xwe bûn. Tevî pirs û hin meraqan jî Xêrî jî kêfxweş bû ku di hin meseleyan de serwextir bûbû.

## ( 7 )

### JI BO TOBEYÊ DIVÊ HÛN PÊŞÎ ÎKRAH BIKIN

Li hucreyê, çend mirov li ser totikên xwe li pêşberî Seydayê Melle Ehmed rûniştibûn. Zoq li devê Seyda dinêrîn û lê guhdarî dikirin. Xêrî li ber deriyê hucreyê rawestiya û nexwest gotina Seyda bibirre. Mîna destûra ketina hundir bixwaze sekinî. Di heman demê de jî guh li axaftinên hundir girtibû. Jê xuya bû ku Seyda bi awayekî taybet bi wan mirovan re dipeyive. Seyda li ber xwe dinêrî û diaxivî. Lewma bêhnekê li hatina Xêrî hayil nebûbû. Wexta ku dît Xêrî li ber derî disekine, bi destê xwe îşaret kir ji bo derbasî hundir bibe rûnê. Xêrî derbasî hundir bû, li ser totikên xwe rûnişt û pirtûka xwe danî erdê. Seydayê Melle Ehmed axaftina xwe dewam kir: ‘Binêrin tobekirin karekî cîddî ye. Tobe tenê ew tişt nîne ku mirov dest ji tiştekî dikişîne yan jî ber dide. Ji bo hûn ji tiştekî tobe bikin divê hûn pêşî ji wî tiştî îkrah bikin. Paşê destberdan qonaxa duyemîn e. Ji ber ku mirov li gorî taqeta xwe dikare hin tiştan berde û bi hin tiştên din bigire.’ Seyda bîstekê bêdeng ma. Ew mirovên hatibûn jî bêdeng disekînin. Seyda hûrûkûr difikirî. Diyar bû pirr diponijî. Mîna xwe ji wê noqbûna kûr a fikrî derxîne, ji nişkê ve serê xwe rakir û got: ‘De Xwedê we muwefiq bike.’ Bi vê gotinê, civatê jî fêhm kiribû ku divê êdî rabin. Wan jî destûra xwe xwest û yek bi yek bi destê Seyda girtin. Her yekî ji wan xwe dirêjî destê Seyda dikir ji bo ku destê wî maçî bikin. Seyda destûr nedida wan. Bi taybetî yekî pirr israr kir û destê Seyda maçî kir û Seyda jî serê wî maçî kir. Seyda di ber xwe de bi dengekî gellekî nizm jêre got: ‘Xwedê te efû û mexfîret bike.’

Piştî ku ew civat çû Seyda girnijî û got: ‘Xêrî, diyar e, divê em dersa xwe bixwînin. Lê tu dizanî, di tevahiya jiyanê de ji bo me ders tijîne. Tenê divê em zanibin van dersan bixwînin.’ Xêrî pirr ji dil guhdêra gotinên Seydayê xwe û jê pirsî: ‘Li ser tobeyê gotinên te gellekî girîng bûn.’ Seyda bi têgihiştineke jixwe razî girnijî û xwest bi niyeta dersê hinek tiştan ji Xêrî re bibêje. Belkî jî Xêrî weke warisê xwe didît. Seyda hinekî cihê xwe xweş kir û paşê peyivî: ‘Te ew mirov dîtin. Yekî ji wan gellekî şaşî û xirabî kirine. Hatibû li ber destê min tobe bike. Ya rastî mirov li ber destê Xwedê tobe dike. Lê wî xwest min bike wesîleyek ji bo vê yekê. Bêguman ez jî kêfxweş dibim ku bibim deriyekî xêrê. Lê ya min xwest wan lê serwext bikim ew bû ku divê mirov zanibe xwe ji xirabiyê qut bike. Bi pey nefsa xwe ketiye. Hefsar ji destê xwe berdaye. Nefsa wî berê wî dide ku diçe wir. Ji ber ku zewqa wî, dilê wî li aliyê din e. Yanî hem dibêje; xirab e, û hem jî kêfa wî jêre tê. Ma tiştekî xirab kêfa mirov jêre tê. Ma dibe ku tu bibêjî; şerab vexwarin xirab e, û tu ji vexwarinê hez bikî. Eger tu jê hez bikî, tu xirab nabînî û tu jê qut nabî. Welew tu tobe jî bikî û eger dilê te hînê li cem be, tu jê qut nebûyî. Ji ber ku tu xwe ji xirabiyên bedenî dûr digirî, lê xirabî bi hemû wucûdiyeta xwe di hundirê te de cih digire.’ Xêrî bêdeng guhdarî dikir. Lê wexta Seyda sekinî yekser pirsa xwe kir: ‘Gelo Seyda eşq jî wisa ye? Mirov kesa jê hez dike, tim wê ji dûr ve di dilê xwe de hildigire?’ Xêrî pirsa xwe baş nehûnandibû. Lê ji bo Seyda zehmet nebû meram û mebesta Xêrî fêhm bike, lê nexwest bi wî re zêde dakeve mijarên ciwantiyê û xwest bi awayekî sofîtî bersivê bide û ji bo wê jî dîsa serî li Feqiyê Teyran da û got: ‘Te Feqiyê Teyran baş nexwendiye. Ez malikeke wî bînim bîra te:

> Aşiq tu yî, dilber tu yî,
> Nazir tu yî, menzer tu yî,
> Ruhê ruhan gewher tu yî,
> Misbah û durra qîmetê…

Xêrî ji bo di binî de nemîne û berê meselê ji kêmasiya xwe ya di dersan de biguherîne dîsa pirsî: 'Seyda ma tu şêx nînî, çima hatin li ber destê te tobe kirin?' Seyda mîna ku bibêje ez ê te çawa serwext bikim keser kişand û peyivî: "Seydayê Cîgerxwîn dibêje: 'Dîn me be, ew ne dîn e.' Yanî kirasekî teng li dînê Îslamê hatiye kirin. Hema bêje; bi navê dîn, ti tişt nemaye nehatiye kirin. Di Îslamê de du çavkaniyên girîng hene. Yek jê pirtûka pîroz Qurana Kerîm e. Ya din jî Sunneta Resûlê Xwedê ye. Li ser van du çavkaniyên bingehîn alema Îslamê meşiya. Lê piştî Xelîfeyên Resûlê Xwedê di gellek waran de saziyeke bersivê bide pêdiviyên civakî ango şerîetek çênebû. Saziya bi navê Îslamê jî tevdigeriya êdî ket destê siltanan. Jixwe dînê Îslamê jî li cografyayeke gellekî mezin belav bûbû. Gellek reng û dengên cuda ketibûn mîhwera Îslamê. Bi kuştina Osman re jî meseleya Şîa û Xariciyan destpêkir. Yanî şêwazekî partîbûyîna îro derket holê. Paşê jî kengî ev mezheb bûn dûvikên siltanan, mirovan hêviya xwe ji wan jî birrî û îcar terîqet derketin. Lê pirr neçû ew jî bûn dûvikê desthilatdaran. Jixwe Xwedê di Qurana Pîroz de dibêje: '**Hûn hemû xwe hişk bi benê Xwedê ve bikin. Cihê nebin, ji hev neqetin.'** Îcar îro bala xwe bidê cîhana Îslamê çawa ji hev parçeparçebûyî ye, û çawa bi navê Îslamê dijminatiya Îslamê dikin. Ji destê desthilatdarên çavbirçî, têrnebûyî û çavnebar zirareke mezin li dînê Xweda bû."

Xêrî wexta li Seyda guhdarî kir, ji dil his kir ku çend nizane û divê hînê pirr tiştan hîn bibe. Paşika stûyê xwe xurand û ji Seyda re got: 'Diyar e, divê ez hînê gellek tiştan hîn bibim.' Seyda cixareya xwe dipêça û bi serê lêvên xwe kaxizcixare şil dikir û bi diranên xwe pirtik pirtik jê dikirin diavêtin erdê. Bêyî ku serê xwe rake got: 'Ilm û îrfan behr in. Zanîn ji Xwedê ye. Dawî lê nîne. Ya girîng fazîlet û feraset e.' Xêrî li van gotinên naveroktijî mane û bi tevahî nikare li wan bigihîje, heyran dima. Lê ji xwe zivêr dibû, wê kengî li wan serwext bibe û çawa fêhm bike. Gellek caran li herfên Quranê temaşe dikir, li pît û herfên li hev badayî dinêrî û xem dixwar wê kengî van rûpelên îlahî fêhm bike. Hin caran jî wer bêtaqet dibû, hîç bawer nedikir ku karibe li wan serwext bibe. Ji dil his dikir ku divê riyekê bibîne ji bo karibe xwe bigihîne rastî û heqaniyetê. Vê wexma çareserî têde nebû, gewdê Xêrî hinekî giran kiribû. Ew derket hewşa mizgeftê û hilmeke dirêj kişand. Li hewşa mizgeftê Melle Nûrî miswaqê xwe di nav diranên xwe de dibir û dianî. Rewşa Xêrî ya hinekî zivêrbûyî dît û li halê wî pirsî. Xêrî xwesteka xwe ya ji bo hînbûna ilm û Îslamê ji melle Nûrî re jî anî ziman. Melle Nûrî bi awirekî biryardar li Xêrî temaşe kir û jêre got: 'Her tiştek berdêla xwe heye. Eger tu ilm û îrfanê dixwazî divê tu jêre xizmetê bikî. Di tarîxa Îslamê de alim hene ji bo gotinekê hîn bibin bi rêya ketine. Şev û roj li xwe herimandine.' Xêrî yekser ji melle Nûrî pirsî: 'Yanî divê ez çi bikim?' Melle Nûrî destê xwe da ser milê Xêrî û got: 'Biçe Misrê li zanîngeha Îslamê El-Ezherê bixwîne.' Xêrî berê jî xwestibû biçe cihekî wisa bixwîne. Lê hem ji aliyê aborî ve û hem jî ji ber tinebûna kesekî wî li wan deran nikarîbû biçe. Ev sedemên xwe ji melle Nûrî re jî anîn ziman. Melle Nûrî jî jêre got: 'Eger tu bixwazî misilmanekî dewlemend heye. Ew hez dike xortekî misilman ji kîsê xwe bide xwendin.' Xêrî bi vê yekê pirr kêfxweş bûbû û bazkên wî hebûna wê bifirriya. Bêyî ku bifikire yekser qebûl kir. Melle Nûrî her weha jêre got li Misrê xwendekarên ew nas dike hene, wê wî bişîne cem wan. Êdî zêde pirsgirêk nemabûn. Ew li bav û diya xwe jî nedibû bar. Jixwe wan jî dixwest Xêrî bibe alimekî mezin. Erê ew bi tenê bûn, lê birayê wî yê mezin wê car caran serî li wan bidaya.

## ( 8 )

Hezkirina welat ji îmanê ye

Xêrî ji bo çûyînê dest bi amadekariyan kir. Serî li Mudîriyeta Polêsan a Amedê da. Mudîriyetê jê xwest ku kaxizekê ji şaxê eskertiyê bîne ku bibêje pirsgirêkeke wî ya eskeriyê tine. Li şaxê eskeriyê karmend çû deftereke mezin anî û lê temaşe kir. Paşê awirek li Xêrî veda û got: 'Tu bi xwe yî?' Xêrî got: 'Erê.' Karmend li kaxizê hin tişt nivîsandin û got: 'Înşalla tu ji eskeriyê narevî.' Xêrî yekser bersiv da û got: 'Na tiştekî wisa tine. Ez diçim zanîngehê dixwînim.' Karmend bêyî ku li Xêrî binêre kaxiza nivîskî danî ber û got: 'Ez virde wirde nizanim. Gellek kes êdî ji eskeriyê direvin.' Xêrî zêde mane nedabû axaftinên karmend, lê kêfxweş bûbû ku karê wî li rê meşiya bû. Êdî wê xatir bixwesta, lê jêre gellekî zehmet bû. Ji ber ku wê yekem car hem ji dê û bavê xwe, hem jî wê ji bajarê xwe yê şîrîn Amedê veqetiya. Belkî jî wê cara pêşî hesret tehm bikira. Pêxemberê Xwedê jî wexta ji Mekkeyê neçar veqetiya bû gellekî xemgîn bûbû û ji ber wê yekê gotibû: 'Hezkirina welat ji îmanê ye.' Jixwe Xêrî wexta li vê yekê fikirî, bawer kir ku hesret gellekî zehmet e. Ji ber ku dûrî û hesret li yekî mîna pêxember jî giran hatibû. Lê pêxember tevî hesret û hîcranê bi serketin li bajarê dilê xwe vegeriyabû. Ew jî bi vê xeyalê rabû. Destê dê û bavê xwe maçî kir û ket ser rê. Seydayê Melle Ehmed kaxizek jêre nivîsand, dayê û got: 'Tu kengî Erebî hîn bûyî, vê kaxizê veke û bixwîne.' Melle Nûrî ew bir termînala Amedê ya li Seyrantepe û bi rê kir. Berê otobusê li Enqerê bû. Ji ber ku berê hîç rêwîtiya riyên dirêj nekiribû, xewa wî nedihat. Gellek xeyal û fikir di hişê wî de dizîzikîn. Her kes di otobusê de razabû, lê pelikên çavên wî xwe ber serhevdu nedidan.

Li Enqerê mirovekî Melle Nûrî ew tembîh kiribû çû pêşiyê. Zilamî Xêrî girt, bir li taxa Qizilayê li otêlekê bi cih kir. Ji ber ku karê zilêm hebû zû veqetiya. Zilam riya sefareta Misrê û riyên din wê bişopîne hemû nîşanî wî dan. Xêrî bi tenê mabû. Tehma devê wî nexweş bûbû. Av vedixwar pê tehl dihat. Xerîbî yekem car his dikir û lê pirr giran dihat. Derket derve geriya, lê zû westiya. Çû hotêlê xewa wî nehat. Wî dixwest pirr bi lez bibe sibe da ku biçe sefaretê vîzeyê bigire û berê xwe bide Misrê. Jixwe xeyala wî ya bibe alimekî mezin nebûya wê ji nîvê rê vegeriya. Lê eşq û şewqa wî ya ji bo zanînê ew bi rê ve dibir. Di dilê xwe de his dikir ku bi pey rastiyê ketiye û Xwedê wê miradê wî bike. Ji ber ku ji bilî xwegihandina rastiyê ti armanceke wî nebû. Ji bo vê jî ketibû ser riyan, bêguman wê hinek cewr û cefa bikişanda. Ma ne şêx û ewliya çil rojî bi yek zeytûnê diketin çilexaneyê ji bo nefsa xwe terbiye bikin, bi vî awayî li cem Xwedê bibin xwedî paye û bibin ebdekî qenc. Her çî wî dizanî bû ku Xwedê ferman kiriye, divê her dil ji bo wî lê bide û gav li riya wî bêne avêtin.

Li deriyê ketinê yê sefareta Misrê çend xortikên Tirk rûniştibûn. Xêrî silav da û ji wan re got; ew ji bo çûyîna Misrê vîzeyê dixwaze. Xortikên li rûyê wan hînê mûyên heram hebûn, rengên wan bi ser xortikên misilmanên rûnûranî ve diçûn. Ji Xêrî pasaporta wî xwestin û yekî ji wan hinekî li pasaportê temaşe kir û bi girnijîneke şinnek got: 'Ji Diyarbekirê ha! Cihê terorîstan.' Bi van gotinan Xêrî nerehet bûbû. Dîsa jî dengê xwe nekir û li benda bersivê ma. Ew xortê şinnek bi şêwazê xwe yê mirovan bêzar bike, gotinên xwe dewam kirin: 'Tu yê ji bo çi biçî Misrê?' Xêrî jêre got; ew ê biçe, li Misrê li zanîngeha Ezherê bixwîne. Bi vê xortik kêfxweş bû û pirsî: 'Gelo şensê te heye?' Bêzarbûna Xêrî ji rûyê wî xuya dikir, lê dengê xwe nekir û tenê got: 'Nizanim.' Xortik ji Xêrî 80 hezar pereyê tirkiyê girt û gotê; divê sibê were. Wexta fikirî wê rojeke din li Enqerê bimîne têra xwe bêzar bû. Mîna ku di eyarê wehş de be, aciz bûbû. Ji bo wê jî derket û çû li nava Enqerê geriya, li baxçeyê Îsmet Înonî rûnişt û li evîndarên bi destên hevdu girtibûn temaşe kir. Li kal û pîrên derketibûn xwe bidin berrojkê nêrî. Bala xwe da dar û gulên bi hostayî li baxçe hatine danîn. Li avahî û xaniyên mezin mêze kir ku çend qehîm hatine lêkirin. Li bajarê wî Amedê, bi taybetî jî li ber Minara Çarlingê jiyan

dijwar bû. Mîna li vir aram xuya nedikir. Gellek çîrokên bi êş, jan û keser, têra xwe serhatî û qewmînên xemgîr hebûn. Zêde zêde şerm û tirs di nava dilan de çikiyabûn. Ma ne hezretî pêxember gotibû: 'Xizanî di derî re bikeve malekê îman wê di pencerê re derkeve.' Li bajarê wî qismet di devê şêr de bû. Hema li binya mala wan li kerxaneyê mirov dihatin firotin. Parsek di nava kolanan de û li ber deriyê Mizgeftan tijî bûn. Belkî pirsgirêkên vî bajarî jî gelek bûn, lê bajarî wî û vî bajarê lê weke du dinyayê cihê û cuda xuya dikirin. Bala xwe didayê karmendê li saziya eskertiyê ew weke yekî bireve didît û xortikê li ber deriyê sefaretê jî ew terorîst dihesiband. Gelo li Enqerê rengê wî cuda xuya dikir? Lê ya rastî ew tenê ne esmer bû. Pirr kesên din di rengê wî de hebûn. Lê wî jî xwe li Enqerê xerîb his dikir. Mirovên li hawîrdora xwe jî cihê didîtin. Her çend hemû bawermend bira bûn jî dilê wî li mirovên li hawîrdora wî germ nebûbû. Nikarîbû fêhm bike, gelo ew zêde ji dîn dûr ketibûn an jî ev bajarê dilê wî lê germ nedibû? Gelo wan zêde pêdiviyên dîn bi cih dianîn ku gelek pirsgirêkên wan ên serî ji ber wan bitewînin hebûn an jî ev bajarê hînê kêm xwedî pirsgirêk pêdiviyên dîn bi cih dianîn?

## ( 9 )

ZANÎNGEHA EZHERÊ

Xêrî roja din ji bo panzdeh rojan vîze girt û ji bo biçe paytexta Misrê Qahîreyê çû bilêta xwe birrî. Şensa wî hebû, hema roja din balafir difiriya. Êdî hinekî bêhna wî fireh bûbû. Ji ber ku berê hîç li balafirê suwar nebûbû, hinekî jî bi tirs bû. Ji ber vê, serê sibê zû rabû û li taxa Ulûsoyê çû cihê otobusên rêwiyan dibin balafirgehê. Ji wir jî derbasî balafirgehê bû. Bala xwe dida her tiştî û nedixwest kes bibîne ku ew xeşîm e. Li dora xwe temaşe kir ku hin xortikên din jî hene, diçin li Qahîreyê dixwînin. Nizanîbû ew çend ciwan ji Tirkiyê li Misrê dixwînin. Hinekî guhê xwe da wan da ku baş piştrast bibe, bi rastî ev kes xwendekar in. Lê hê wî hewl nedabû ji bo ew wan nas bike, xortikekî rûnûranî destê xwe dirêjî wî kir û got: 'Bira tu jî diçî bixwînî?' Bi vî awayî Xêrî ket nava koma xwendekaran. Paşê hemû li balafirê suwar bûn û berê xwe dan Qahîreyê. Di balafirê de hejmara xwendekaran têra xwe hebû. Hin ji wan weke Xêrî nû bûn. Hin ji wan jî çend sal bûn li wir dixwendin. Mîna ku her tişt li dora Xêrî bigerin, matmayî bû. Di demeke kin de gellek tişt di jiyana wî de diguherîn. Ji erdekî diçû erdekî gellekî dûr. Gellek mirovên nû ku hîç nas nedikirin, li hawîrdora wî tijî bûn. Heyecaneke mezin xwe li dil û hinavên wî bada bû. Piştî çend saetan wê li Qahîreyê daketa û gellek mirovên nû nas bikira. Di jiyana wî de wê qonaxeke nû dest pê bikira.

Li balafirgeha Qahîreyê gellek kes hatibûn pêşiya nas, heval û hogirên xwe. Her kes bi kesek an jî kesên din re diçûn. Xêrî jî diviyabû telefonî mirovê melle Nûrî jêre salix kiribû bikira û bihata pêşiya wî. Ji bo vê jî pêşî çû hin pereyê xwe li bankeyê quliband pereyê Misrê cuneyt. Li Misrê ji bo tu bi telefonan bipeyiviya diviyabû te pere biavêtiyê û kengî hemberî te bigota 'elo' diviyabû te pê li bişkokekê bikira. Lewma Xêrî bi zehmetî telefon vekir heta Misriyekî alîkariya wî kir. Lê fêhm kiribû ku telefona wî girtiye, guherî ye. Ango Xêrî li naverastê mabû û nizanîbû wê biçûya çi deverê. Bala xwe dayê, xwendekarên din jî hêdî hêdî diçin û kêm kes dimînin. Ji ber vê, ew jî çû cem çend xortikên din û xwest ew jî bi wan re biçe. Wan xortên din jî qebûl kirin û gotin; divê hinekî rawestin heta hevalên wan bên û wan bibin. Bîsteke din xortekî bi rih hat û bi lez xêrhatina wan kir û got: 'De bilezînin em biçin. Wexta dît Xêrî jî bi wan re dimeşe, pirsî: 'Ev bira kî ye?' Piştî ku xortikên din rewşa Xêrî rave kirin. Xortê bi rih hinekî sekinî û got: 'Wê wextê divê em maşîneke din bigirin. Ji ber ku

em giş di erebeyekê de hilnayên.’ Xortê bi rih li Xêrî vegeriya û pirsî: ‘Bira tu ji ku yî?’ Wexta Xêrî jêre got: ‘Ez ji Amedê me.’ Ew hinekî girnijî û got: ‘Ez jî Çerkez im.’ Piştre hemû li erebeyan suwar bûn û xortikê çerkez ji şifêr re got: ‘Hey Sabiî’ (Kolana Heftan) Li wir sekinîn û her kesî bahola xwe girt. Derketin avahiyeke xweş raxistî û bi rêkûpêk. Di nava wan de kesekî rihdirêj hebû û bi çavekî mezin li xwe dinêrî. Xêrhatina kesên nû kir. Her kesî xwe da naskirin. Xêrî jî xwe da naskirin. Ew kesê ku weke berpirsê malê xuya dikir, ji Xêrî pirsî ka wê biçe cem kê. Xêrî jî navê Yûsiv da û got: ‘Ez ê biçim cem wî.’ Bi telefonan ji xwendekarên din pirsîn. Kesî ew nas nekir. Paşê Xêrî kaxiza Melle Nûrî dabûyê ji bêrîka xwe derxist û got: ‘Ew li Rewaq El-Etrak dimîne.’ Wexta Xêrî weha got, xortikê rihdirêj girnijî û got: ‘Ma tu çima nabêje Yûsiv ê Kurd e. Ew PKKyî ne, terorîst in.’ Xêrî mat ma, sekinî. Ma melle Nûrî ew şandibû cem PKKê. Paşê ji nişkê ve got: ‘Na, Yûsiv PKKyî nîne.’ Xortikê rihdirêj israr nekir û got: ‘Ma ne ji Amedê ye.’ Xêrî got: ‘Rast e.’ Xortê rihdirêj li xortê çerkez nêrî û got: ‘Tu sibe wî bigire, bibe cem wan.’

Serê sibê Xêrî û xortikê çerkez bi hev re derketin. Li Heya Sabiî (li Herêma Heftan) li tramvayê suwar bûn. Li nêzî Meydana Husên daketin û meşiyan. Rengê tevahiya avahiyan zer mîna qûmê bû. Fena ku her tiştî rengê xwe ji rojê girtibe. Ji lewra her tiştî kevin xuya dikir. Ji Xêrî wer hat ku di perdeya sînemayê re ketibe nav serdemeke dîrokê. Li derdorê mirov di halê xwe de xuya dikirin. Li guhereke cîhanê mirov mîna ji her tiştî bê xeber kerr û lal xuya dikirin. Mirovên bi celabiye zêdetir xuya dikirin. Derdor zêde bi toz û gemar bû. Xortikê çerkez li Xêrî zîvirî û got: ‘Meydana Husên li Qahîreyê cihekî meşhûr e. Li gorî gotinê serê Hezretî Husên li vir veşartî ye.’ Xêrî jê pirsî: ‘Ma ne Hezretî Husên li Kerbelayê hatibû kuştin çawa serê wî anîne vir?’ Li ser vê pirsê, xortikê çerkez got: ‘Li gorî rîwayetê, duwanzdeh eşîran li ber hev dane û her yekê ji wan xwestine serê wî bibin cem xwe. Di dawiyê de li hev kirine ku duwanzdeh darbestan amade bikin û her yek ji wan rahêje yekê û bibin.’ Xortikê çerkez li ber devê dikaneke ava mêweyan difiroşe sekinî û bi henekî ji Xêrî re got: ‘Ka ji me re du qedehan ava qesebê bikire. Tîna mirov dişkîne.’ Xêrî ji bêrîka xwe pereyên xwe derxistin û li wan temaşe kir. Hînê pereyên Misrê baş nas nedikirin. Xortikê çerkez ji nav pêncî quriş derxist û da dikandar. Li hemberî Meydana Husên li aliyê din ê rê, Mizgefta Ezherê û rewaqên xwendekaran hebûn. Bi qasî sêsed metroyan ji wir jî dûr, Zanîngeha Ezherê hebû. Riya di ber rewaqên xwendekaran re derbas dibû, navê wê Riya Kurdan bû. Lê li ser destwerdana dewleta Tirk navê rê hatibû guhertin û kiribûn Riya Tirkan. Gellek Kurd di demên berê de li Qahîreyê bi cih bûbûn. Jixwe li dora Qahîreyê bi qasî sîh gundan bi navê Qura El-Ekrad (Gundên Kurdan) dihatin naskirin. Ji Zanîngeha Ezherê jî bi qasî kîlometreyekê wêdetir Keleha Selahaddîn Eyûbî heye.

Xêrî û xortikê çerkez derbasî aliyê din ê rê bûn. Di ber deriyê Mizgefta El-Ezherê re derbas bûn û ketin ser riya ber bi rewaqan û Zanîngeha Ezherê ve diçe. Xêrî serê xwe rakir û matmayî li kevirên sipî yên dîwarên mizgefta Ezherê temaşe kir. Kevirên sipî pirr baş hatibûn verotin û neqişandin. Fatimiyan di sala 971’an de, wextê hîmê Ezherê weke medreseyekê danîn û di sala 988an de kirin zanîngeh, bîr nebiribûn wê Kurdekî bi navê Selhadîn Eyûbî vê zanîngehê di sala 1171’ê de ji destê wan bigire û bike navenda têgihîştina mezhebê sunnî. Ya rastî Fatimiyên şîa nikarîbûn xwe li ber xaçperestan bigirin û ji ber vê yekê Eyûbî xwedî li desthilatiya Îslamî derketibûn. Xêrî niha li ber vê zanîngeha hezar salî bû. Heyecana xwe nikarîbû bi aniya ziman. Xortikê çerkez jî li rewşa Xêrî hayil bûbû û xwest hin agahiyan bidê û got: ‘Li zanîngeha Ezherê ji dehan welatan bi qasî 15 hezar xwendekarên biyanî dixwînin. Lê tevahiya xwendekarên wê bi qasî 400 hezarî hene. Ji Tirkiyê jî 3 hezar xwendekar li vir dixwînin. Lê Ezher niha du beş in. Beşê li pêşiya me Ezhera kevin e. Bi giranî dersên îçtîmaî û dînî dide. Lê beşên wê yên tib, fizîk, kîmya, matematîk, hendese, zireat û her wekî din hene.’

## ( 10 )

REWAQ EL-EKRAD

Xêrî û xortikê çerkez di kolanên teng ên mîna xançepekê re dimeşiyan. Di wê hewaya germ de mirovên kal û pîr li ber dîwaran li kuçeyê rûniştibûn. Dikanên derdorê ji yên Amedê zêde cudatir xuya nedikirin. Her der dîrokî bû û bêhna kevinbûnê ji keviran û heta ji mirovan dihat. Xortik bi destê xwe avahiyên li derdora mizgefta Ezherê nîşan da û got: ‘Tu van avahiyan dibînî. Ev hemû rewaq in. Rewaqên Tirkiyê, Sûdanê, Lîbyayê, Sûriyê, Filistînê û welatên din hene.’ Li wir ketin deriyekî. Di pêlikeke li dora xwe dizîvirî re derketin jor. Li qatê pêşî xortikê çerkez bi destê xwe nîşan kir ku rewaq a Sûdaniyan e. Li qatê din jî rewaqa Lîbiyan îşaret kir û ji bo ya li hember jî got: ‘Ev a me ye.’ Li ser Rewaq El-Etrak dinivîsand. Li ser deriyê odeya pêşî jî Şêx El-Etrak nivîsandî bû. Xortikê çerkez di deriyê odeyê re serê xwe dirêjî hundir kir û pirsî: ‘Gelo odeyên Kurdan kîjan in? Dengê ji hundir hat got: ‘Odeya kêlekê.’ Li odeya kêlekê xortekî xwe li ser nivînê dirêj kiribû. Wexta Xêrî û xortikê çerkez li derî dan, ew rabû ser xwe û xêrhatina wan kir. Xort xwe da naskirin û got: ‘Navê min Şewket e.’ Xêrî çend roj bûbû hîç bi Kurdî nepeyivîbû. Wexta bi Şewket re ket xeberdanê xortikê çerkez ji bîr kir. Wexta li xwe hayil bû, jê lêborîna xwe xwest û jêre got: ‘Zehmet e, mirov demeke dirêj bi zimanê xwe yê dayikê nepeyive.’ Kurikê çerkez tiştek negot, destûra xwe xwest û rabû. Xêrî li Yûsiv pirsî û Şewket jêre got: ‘Heval derketine derve wê di demeke kin de vegerin.’ Şewket her weha ji Xêrî xwest ku êdî xema nexwe. Li vir hemû kes heval in. Şewket ji Xêrî re behs kir ku di nava Rewaqa Tirkan a 12 ode de 3 ode yên xwendekarên Kurd in. Xêrî pirsî: ‘Gelo çima rewaqa Kurdan nîne?’ Şewket xem xwar û got: ‘Di nava Rewaqan de ya herî mezin a Kurdan e. Bi qasî 40 odeyên wê hene. Hema li vir bi ser Rewaqa Tirkan ve ye. Rewaq El Ekrad di dema Selhedîn de ji bo xwendekarên Kurd hatiye avakirin. Lê ji ber sedemên siyasî hatiye girtin. Şewket ji Xêrî re behs kir ku ew xwendekarên Kurd bi hev re, bi tifaq tevdigerin. Şêwr û mişêwra wan yek e. Tev radibin û rûdinên, tev dixwin û vedixwin. Ji bo wê jî di nava hemû xwendekarên welatên din de mînak in. Şewket bi serbilindî ji Xêrî re anî ziman ku ew di nava xwendekarên Îslamî de yên herî zîrek û jêhatî ne. Xêrî gellekî kêfxweş bû. Bawer dikir ku li cihê rast e. Ji ber vê jî di dilê wî de huzûreke bêpayan hebû. Bazkên wî hebûna wê ji kêfa bifiriya. Li Şewket zîvirî û pirsî: ‘Hûn çend xwendekar in, û hûn hemû misilman in? Şewket hinekî li vê pirsê şaş mabû û got: ‘Em bi tevahî bîst xwendekarên Kurd hene. Bêguman xwendekarên Kurd wekî din jî hene, lê hemû ji xwe re nabêjin; em Kurd in. Yên em bi hev re hemû Kurd in. Lê di nava me de Millî Goruşçî, Nûrcî, û heta Hîzbullahcî hene.’ Xêrî jê pirsî: ‘Xwendekarên ez li mala wan bûm ji bo Yûsiv gotin; ew PKKî ye.’ Şewket keniya û got: ‘Na, li vir PKKyî nînin. Lê xwendekarên Tirk me weke PKKyî dibînin. Kî ji xwe re bibêje; ez Kurd im, wî weke PKKyî û terorîst dibînin. Lewma jî li hemberî bîst xwendekarên Kurd sê hezar xwendekarên wan ditirsin.’

Şewket û Xêrî hînê dipeyivîn komek xort ketin hundir. Şewket wan bi hev da naskirin. Yek ji wan Yûsiv bû. Bi hatina Xêrî ew jî kêfxweş bûbûn. Li wan yek zêde bûbû. Yûsiv di nava komê de weke mezin dihat hesibandin. Xortekî pirr dîndar û giran bû. Ji navçeya Amedê pîranê bû. Tevî zazakî zaravayê kurmancî xweş dizanîbû. Li ser hatina Xêrî, Yûsiv piçûkê wan Ehmo şand jêr ji bo hinek hinaran bikire. Hinarên li Qahîrê dihatin firotin pirr xweşmize bûn. Ji Xêrî pirsîn li welat çi heye çi nîne. Heta derengiya şevê sohbet kirin. Ehmo ji wan re strana bi zazakî Ezoyê Çewlikî ‘Wî day wî day wî dayê’ got. Bêhna hesret û veqetînê ji stranê dihat. Hewa germ bû. Li Qahîreyê hewce bi sobeyê nebû. Lewma pencere vekirîbûn. Hin ji wan bi atlêtan digeriyan. Piştî ku têra xwe sohbet kirin. Yûsiv cihek nîşanî Xêrî kir û got: ‘Tu li vir razê, em ê paşê ji te re cihekî çêkin.’ Li ser maseya li ber nivînê pirtûka Frantz Fanon a bi navê ‘Rûyê Reş Maskeya Spî’ hebû. Pirtûkê bala Xêrî kişandibû. Rahiştê û hinekî çav lê

gerand. Lê pirtûkê ew kişand û xist nava rûpelên xwe. Xew neket çavê Xêrî mîna di mejiyê wî de pencereyên nû vebin. Matmayî mabû, çi bi serê reşikan de hatibû. Lê pirr balkêş bû, pirtûkê behsa reşikan dikir, Xêrî xwe têde dît. Li dibistanan wan jî her sibe derew li xwe dikirin û digotin em tirk in. Ango maskeyek dixistin rûyê xwe. Ji xwe û rastiya civaka xwe fedî kiribûn û dûr ketibûn. Bi destavêtina dagirkerên xwe şa bûbûn. Ji mêrkujên pêşiyên xwe hez kiribûn. Kêlikên qebrên dapîr û bapîrên wan wenda bûn. Ew berê hîç wisa nefikirîbû. Çi seyr bû, nivîskar bi xwe jî li Franseyê mezin bûbû. Tevî pirr hatibû asîmîlekirin, wexta li Cezayîrê weke bijîşkekî li rewşa reşikan rast tê, bi ser xwe ve tê û di wê rê de dibe têkoşerekî mezin. Xêrî tevî ku pirr westiyayî bû jî, heta nimêja sibê raneza, pirtûk xwend. Bi dengê banga sibê re bi ser xwe ve hat. Rabû destnimêj girt û nimêja xwe kir. Dilê wî xweş û aram bû. Bi dil û can his dikir ku li ser riyeke rast e. Bala xwe didayê ku pirsên wî zêde dibin. Ev jî jêre nîşane bû ku li ser riya ilm û îrfanê ye. Yûsiv jî rabû nimêj kir û ferq kir ku Xêrî ranezaye. Yûsiv ji Xêrî xwest hinekî çavê xwe germ bike û jêre got: ‘Em ê piştî nîvro biçin Pîramîdan û êvarê jî Şeva Husên heye.’

## ( 11 )

REWAQ EL-ETRAK

Rewaq li dora Mizgefta Ezherê hatibûn avakirin. Jixwe rewaq hola sergirtî ya li kêleka mizgeftan bû. Gellek caran li ser stûnan bilind dibû. Li gorî werz û mewsima welatê lê, aliyekî wê vekirîbû. Şagirt û evîndarên zanînê piştî îbadetan li van deran diketin tefkîrê û diponijîn. Li vir rewaq weke mala xwendekaran bû. Bi demê re awa, şikil, şema û erka wê guherîbû. Rewaqên li vir bi rêveberiya Şêxê Ezherê ve girêdayî bûn. Ezher di nava Misrê de xwediyê statuyeke xweser bû. Lê ji ber rejîmên ne demokratîk ên welatên misilman, bivê nevê, Ezher di bin bandora siyaseta Misrê de dima û ji vê xweseriyê dûr diket. Ji alî aborî û çapa xwe ve zanîngeh têra xwe dewlemend bû. Li ser erdekî berfireh hatibû avakirin û di cîhana Îslamê de berdêla Vatîkanê bû. Ji lewra jî gellek zanîngehên hatin avakirin îlhama xwe ji vê zanîngehê girtin û li hin deveran jî xeyalên wê man. Bedîuzzeman Seîdê Norsê dixwest du zanîngehên mîna Ezherê, bi gotina wî xuşkên Ezherê li Amed û Wanê ava bike. Xeyala Norsê jî di bin nîrê siltan Ebulhemîd de nikarî xwe ragire û bû sedem kelamvanê navdar Norsê xwe li ber hekîmê timarxanê bibîne. Zanîngeha Ezherê bi sedsalan bi deh hezaran xwendekar perwerdekiribûn. Seyda û alimên mezin gihîhandibûn. Lê mîna cîhana Îslamê Ezher jî di wexmeke giran de bû, nikarîbû hilmê bistîne. Barê ketibû ser milê wê ranedikir. Ne karîbû hêza afirandin û nûkirinê di xwe de bibîne, ne jî karîbû xwe ji destê mêtingeriyê xilas bike. Mîna keys û firsend ji dest berdabe xuya dikir. Li benda mehdiyekî jî nebû, ji ber ku ew bawerî jî ji mezhebê şîa re hiştibû. Di hundirê xwe de dikeliya, lê xwe nedigihand encamê. Fena xwe di hundirê xwe de bikeritîne. Azanên dihatin xwendin mîna miriyan bibin gorê bi huzn û bêhêvî bûn. Êdî ji bo vê dinyayê tiştekî bihata kirin zêde nebû. Her tişt ji bo dinya din bû. Lewma dinya ku diviyabû lê jiyan û heyat hebûya miçiqî bû, hişk bûbû. Telqîna mirinê ya vê dinyayê dihat xwendin. Li seriyê din, dinyayeke din li benda her kesî bû, lewma hewce nebû ku kes xwe ji bo vê dinyayê biwestîne. Xwedayê Mezin her tişt ji bo eşref el-mexlûqat afirandibû, lê wî mexlûqatî her tişt ji bo Xwedê dikir. Hew nizanîbû, Xweda hewcedarî wî nîne, ew hewcedar e. Xwe kiribû barek û xistibû devê deriyê Xwedê. Li dinyayê jiyan nehiştibû, lewma dinya din cihek bû ku mirovan rojekê berî rojekê dixwestin koç bikin. Zanîn, zikir û hostekariya hezar salan dawerivîbû her şaneya Ezherê. Alimên wê bi vê zanîn û ponijînê westiyayî bûn. Lê dîsa jî hînê bi deh hezaran mirovî xwe li vê şujikê digirtin û

dixwestin ji çortanê wê dewekî îmanê çêkin. Bi deh hezaran kes hînê bi xeyalên bibin alimekî mezin û li ser riya xwedê bigihîjin şabaşa herî mezin, xwe li gellek zehmetî û hesretan radigirtin. Li vir deriyên îçtîhadê yên Îmamê Xezalî li ser xwesteka siltanan girtibû, êdî vekirî bûn. Li vir mentiq, civaknasî û felsefe heta cihê diçê dihat axaftin. Li vir gellek çand di zikhev de bûn. Li vir herçî nesx û mensûx bihata zanîn jî di bin nîrên siyasî û mêtingeriyê de zêde bi kêr nedihatin. Her tişt fena li halê xwe bigirî di şînê de bû. Bi dengê azana vê şînê Xêrî çavên xwe yên miçandî vekir. Lê hêviya bi Xwedê nediqediya.

Ji bo xwarinê bixwin, Yûsiv bang li Xêrî kir. Ew ê her du biçûyana dîtina pîramîdan. Her sê pîramîdên mezin bi navê Keops, Kefren û Mîkerînos an jî bi navê li wir têne gotin; Xofo, Xefra û Munkera. Li cem van her sê pîramîdên mezin ên li kêleka Qahîreyê, her weha sfenksekî balkêş hebû ku ji wî re jî dibêjin; Ebû El-Hol. Cihê lê hatibûn avakirin hinekî ji cihê bajêr bilind bû. Yûsiv û Xêrî daketin jêr û xwe berdan nava mirovan. Mîna moriyan mirov tevdigeriyan. Qahîre bi rojê gellekî qelebalix bû. Qahîreya 17 mîlyon bi roj dibû 20 mîlyon. Ango çaryeka Misriyan bi roj li vî bajarî digihîştin hevdu. Li ber deriyên mirovan gellek îxtiyaran nargîle dikişandin. Hin kesan ji wan esrar jî datanîn ser agirê nargîlê û lewma ji xwe diçûn. Wexma hewaya germ jî dibû sedem ku mirov ji xwe biçin. Yûsiv û Xêrî li otobuseke şaredariyê suwar bûn. Lê otobus gellekî teng bû û di wê germê de ew ji xwêdanê şil bûbûn. Yûsiv ji Xêrî re got: ‘Hay ji xwe hebe. Dibêjin; divê mirov ji sê tiştên Misriyan bitirse. Ji keçikên wan, ji mêşên wan û ji dizekên wan. Di diziyê de gellekî hoste ne. Keçikên wan jî xortan bi rihetî ji rê derdixin. Talibên hatine vir bixwînin, pirê wan xurifîn ji rê derketin.’ Xêrî hem li Yûsiv guhdarî dikir û hem jî hewl dida xwe bi hesinê otobusê bigire. Di wê germê de demekê otobus çû. Li keviyê bajêr ket rêyên sape û teng. Piştî ku hinekî fitilî serê pîramîdan xuya kir. Xêrî matmayî ma. Berê jî der barê pîramîdan de hin agahî li dibistanê hîn bûbûn û wêneyên wan dîtibûn, lê di rastiyê de pirr bi heybet bûn. Ew çend bi heybet bûn ku her mirov didan fikirandin, gelo çawa bi destê mirovan hatine lêkirin. Xwedê dizanîbû ka çend kole û benî di lêkirina van berhemên mezin de can dabûn. Ji lewra jî gellek kesan bawer dikir ku van asarên beriya zayînê bi sê hezar salan ji aliyê fîrewnan ve hatine avakirin, heye ku bi zanîneke payebilind hatibin çêkirin. Ji ber ku gellek dîroknas hemfikir bûn ku ev asarên nadîde teknîk û zanistek li pêş nebe, nabe ku bêne çêkirin. Xêrî jî wexta temaşe kir, xwe negirt û ji Yûsiv pirsî; gelo ev pîramîd çawa hatine lêkirin? Yûsiv jî jêre got: ‘Kesên xwe mîna Xwedayan bibînin û bi Xaliq re bikevin qayişê, li ser xwîna mirovan berhemên wisa ava dikin. Ma ne Xwedê di Quranê de jî behsa van kesan dike; çawa her tiştê wan bi serê wan de hedimandiye. Her can di dawiya dawî de wê mirinê tahm bike.’ Yûsiv û Xêrî ber bi sfenksê nîvmirov û nîvşêr ve meşiyan. Bala Xêrî kişand ku pozê sfenks şikiyaye. Hê wî nepirsî Yûsiv jêre got: ‘Dibêjin wexta Napolyon hatiye vir. Bawer kiriye ku di pozê vî sfenksî de zêr heye. Daye ber topan lê tenê karîbû pozê wî bişkîne.’ Yûsiv ji Xêrî xwest ku li deveyên li ber pîramîdan suwar bibe. Lê Xêrî newêrîbû suwar bibe. Ji bo xwe ji vê jî xilas bike got: ‘Ez kengî Erebî hîn bibim, ez ê suwar bibim.’

Li vegerê Xêrî û Yûsiv li ser çemê Nîlê ji otobusê daketin û bi meşê ber bi Meydana Tehrîrê ve meşiyan. Sura bayekî hênik ji Nîlê xwe li derve dixist. Li ser çemê Nîlê gellek pir hatibûn avakirin. Di nava Nîlê de gellek kelek diçûn û dihatin. Li kêleka Nîlê jî gellek cihên xweş yên bêhndanê hatibûn çêkirin. Nîl, avek wê ya girrokî hebû. Li derveyî bajêr di ava Nîlê de tîmsah jî hebûn. Çemê Nîlê ku li cîhanê çemê herî dirêj bû di nava vê çolê de heyat bû. Jixwe gellek kesan bawer dikir ku çemê Nîlê yê ji nava Etyopyayê derdiket nebûya wê Qahîre jî nebûya. Li Meydana Tehrîrê gellek mirovên ji welatên cihê yên cîhanê hebûn. Yûsiv îşaret bi wan mirovan kir û got: ‘Ji ber vê, ji Misrê re dibêjin; dayika dinyayê.’ Yûsiv dîsa îşaret bi avahiyekê kir û got: ‘Ev methefa Tehrîrê ye. Em ê seriyekî bidin vir jî û paşê biçin Rewaqê.

Li ketina muzeyê heykelekî mezin ê çarmêrkî rûniştî hebû. Di hundir de hewayeke kevnare û mîstik hatibû afirandin. Belkî jî nehatibû afirandin, bi rastî her tişt kevin bû. Gellek peykerên giranbuha di muzeyê de hatibûn bicihkirin. Ji Pisîka Reş û kûçikê Fîrewn bigire,

heta serê Tutankhamon ê zêrîn, gellek parçeyên nadîde hebûn. Kûçikê Fîrewn ê 7 hezar sal emrê wî hebû, hînê mîna li mirov binêre disekinî. Hê hûrê wî jî kun nebûbû. Fîrewn di ilmê hişkkirin an jî mûmkirinê de pirr pêşketî bûn. Pirr eşkere her yekî ji wan tiştek digot. Lê xwendin û fêhmkirina wan karê mirovên hoste û ehil bûn. Yûsiv û Xêrî bêdeng dimeşiyan. Hinek caran Yûsiv hin heykel bi Xêrî didan naskirin. Li pêşberî hin kevalan sekinî û got: ‘Ev nameyên di navbera Mîtanî û Fîrewnan de ne.’ Yûsiv hinekî girnijî û dewam kir: ‘Ji bo Mîtaniyan jî dibêjin Zaza ne. Jixwe di dîroka fîrewnan de tê gotin; ji 36 malbatên fîrewnan malbatên çardeh, panzdeh û şanzdehan Mîtanî ne. Lewma ev beşê dîroka fîrewnan tarî ye.’ Piştî van gotinan li qatê jêr Yûsiv û Xêrî bi aliyê milê rastê ve meşiyan. Yûsiv peykerê jineke di bejna wan de nîşanî Xêrî kir û pirsî: ‘Tu dizanî ev kî ye?’ Peyker ê jineke gellekî bedew bû. Ew çend delal bû, Xêrî wexta lê temaşe kir hinekî fedî kir. Ji ber ku jina peykerê wê hatibû çêkirin rûtî tazî bû. Yûsiv fêhm kir ku Xêrî bi şermî li peyker dinêre. Yûsiv nêzî peyker bû û got: ‘Navê vê xanimê Nefer Tîtî ye. Di dîroka Misrê de jina herî bedew e. Navê wê yê rastî Tadukhepaye, jixwe bi zimanê kevin Nefer Tîtî yanî ‘Jina bedew hat’ e. Li gorî hin dîroknasan Nefer Tîtî Mîtanî ye. Ev jina bedew bi fîrewn Akhenathon re zewicî ye. Dîsa li gorî dîroknasan Akhenathon jî diya wî jineke Mîtanî bû. Ji ber ku ji bilî dayika Akhenathon zarokê kur ê fîrewn çênebûne. Akhenathon li ser textê bavê xwe rûniştiye. Îcar kengî bi Nefer Tîtî re zewiciye, sulale hemû bûye Mîtanî.’ Xêrî li Yûsiv bi rûkenî temaşe kir û got: ‘Yanî tu dibêjî fîrewn jî ji nav Kurdan derketine.’ Yûsiv jî yekser bersiv dayê: ‘Ma tenê Fîrewn, Nemrût jî ji Kurdan e.’ Yûsiv paşê hinekî sekinî û got: ‘Lê ji bîr neke li cihê Nemrût hebin, yên mîna Hezretî Brahîm jî hene. Li cihê fîrewn hebin ên mîna Hezretî Mûsa hene.’ Gotinên dawî yên Yûsiv xweş bi serê Xêrî ketibûn. Bi vê atmosferê, dîrok û atmosfera wê bi Xêrî xweş hatibû. Bi vê tehma dîrokê dayê ji Yûsiv pirsî: ‘Gelo li Ezherê beşê dîrokê heye ez bixwînim?’ Yûsiv fena mitale bike hinekî sekinî û got: ‘Ya rastî heta niha kesî li vî beşî nepirsiye. Her kes dikeve beşên dînî.’ Li ser van gotinan Xêrî got: ‘Ma di hemû beşên Ezherê de dîn tine ye?’ Yûsiv jî got: ‘Rast e, tu bi rastî bixwazî em kes nefikirîbûn. Fikrek xirab nîne. Kesek ji me dîrokê bixwîne pirr baş e.’

Wexta ji muzeyê derketin gellekî westiyayîbûn. Li firoşgehekê hinek ava qeseb vexwarin. Nava dilê xwe hênik kirin. Yûsiv jê pirsî û got, ‘Eger tu pirr newestiyayîbî em dikarin bi meşê di taxa Etebe re biçin Meydana Husên.’ Xêrî dixwest derdorê zû nas bike. Lewma xwest bimeşin. Ji Meydana Tehrîrê heta Meydana Husênê bi meşê nîv saet dikişand. Li ser riya xwe li heykelê Muhammed Elî Paşa rast hatin. Yûsiv ji Xêrî re got: ‘Binêre ji bo vî kesê Misr ji destê Osmaniyan rizgar kiriye dibêjin; ji Diyarbekirê ye.’ Piştî ku li dora heykel zîvirîn û Xêrî bi balkêşî li heykel nêrî ji bo hin nîşaneyên Kurdîtiyê têde bibîne, Yûsiv dewam kir: Gellek kesên derbeder bûyî li Misrê bûne xwediyê cih û navên mezin. Ji bo şairê şairan Ehmed Şewqî yê Misrî û gellek kesên din jî dibêjin Kurd in.

# ( 12 )

ŞEVA HUSÊN

Meydana Husên bi navê Mizgefta wî tê hildan. Li gorî bîrûbaweriyê gora serê Husên têde di nava mizgeftê de ye. Meydana Husên di navika bajêr de ye. Ji bo dîtina biyaniyan, ev mekanê di nava Qahîreya kevin de çaralî bi cihûwarên girîng xwe qehîm dike. Belkî ne tenê ji bo biyaniyan, her weha ji bo Misriyan û Cîhana Ereb jî. Li aliyekî Mizgefta Ezherê, li jêra wê Xan Xelîl û hema li kêleka wê Qehweya Fîşawî heye. Li gorî gotinan qehwexaneya Fîşawiyê li bajêr qehweya herî kevin e. Timî bi dev re tijî ye. Kesên navdar û ne navdar her kes li vir rûdinê. Ne ku li vir bêhna xwe didin, li vir mirov kurmên xwe dişkînin. Nargîlê dikişînin û bi dengekî bilind dipeyivin. Jixwe çarşiya Xan Xelîl wer qelebalix e mirov bi zehmetî lê gavê diavêje. Wexta Yûsiv û Xêrî ji Meydana Tehrîrê gihiştin Meydana Husênê êdî hal di wan de nemabû. Yûsiv li Xêrî vegeriya û got: 'Di ser vê westandinê re wê aveke mango xweş biçe.' Li ber dikana ava mêweyan difiroşe sekinîn û her yekî ji wan qedeheke ava mangoyê bi ser xwe de dakirin. Yûsiv li Xêrî vegeriya û pirsî: 'Eger tu birçi yî, li vir Fûl û Teamiye heye em bixwin. Yanî tiştekî mîna Sandiwîçê ye. Yan jî li jor cihek heye, lê Koşerî heye, em dikarin bixwin. Tu rastî bixwazî xwarinên wan nayên xwarin, lê dîsa jî Fûl û Teamiye xirab nîne.' Xêrî li Yûsiv zîvirî û got: 'Ma ez çi bêjim, tu çêtir dizanî.' Piştî ku Fûl û Teamiye xwarin, Yûsiv ji Xêrî re got: 'Were em herin hinekî li Qehwexaneya Fîşawiyê rûnên. Binêr, rûniştina vê derê bi destê her kesî nakeve.' Yûsiv ji bo xwe û Xêrî qehwa mirr (tal) xwest. Ya rastî Xêrî jê hez nekir. Lê dîsa jî ji bo hinekî karibe bêhna vî welatê nû bike, dixwest gellek tiştan biceribîne. Xêrî meraq kir, çima qehwexaneya lê rûniştine navdar e. Ji ber ku di neqebeke teng de bû û zêde balkêş nebû. Xêrî ev yek pirsî û Yûsiv jêre got: 'Bi min jî xweş nayê, lê bawer dikim ku Misrî li vir li rojên xwe yên kevin vedigerin. Tîna xwe dişkînin.' Yûsiv fêhm kiribû ku kêfa Xêrî ji Fîşawiyê re nehatiye. Li ser vê yekê ji Xêrî re got: 'Rabe, em biçin, ji ber ku vê êvarê Şeva Husên e, kes nikare li vir gav biavêje, tu xweliyê biavêjî nagihîje erdê. Em ê êvarê bên li vir hinekî bigerin.'

Li meydana Husênê berêvar bû û amadekariyên ji bo Şevê jî destpêkiribûn. Ji ber ku wê şevê gellek gundiyên derdora Qahîreyê wê li meydanê kom bûbûna. Ji lewra ji êvar de her kesî tedarikê xwe dikirin. Ew vegeriyan û derketin ser banê Rewaq El-Etrakê û li Qahîreya kevin temaşe kirin. Li ser kursiyên xwe rûniştin û lingên xwe dirêjî caxan kirin ên ku bi hostayî hatibûn lêkirin. Ji ber germa zêde ya Misrê gellek kes li ser xaniyên xwe radizan. Li ser ban xwendekarên ji welatên curbecur ji vî serî diçûn seriyê din. Mîna şagirtên medreseyên li Kurdistanê ders dixwendin. Diçûn û dihatin. Piranî jî wexta Quran jiberkirin, weha tevdigeriyan. Ji ber ku her xwendekarê Ezherê herî kêm diviyabû nîviyê Quranê ji ber bikirana. Jixwe eger ereb be, divê tevahiya Quranê ezber bike. Ezher zanîngeheke hêsan nebû. Xêrî jî wisa difikirî û li avahiyên kevin temaşe dikir û bêhna zanîn û ilmê ji wan dikir. Lê hêdî hêdî pê dihesiya ku gellek şaşî û rastî ketine zikhevdu. Belkî ew jî êdî mîna Omer Xeyam difikirî: 'Di destekî de Quran, di destê din şerab, karekî me heram, karê din helal, li vê nîvdinyayê, em ne temam kafir, ne jî temam misilman in.' Ji bo vê jî belkî mîna Seydayê wî jêre gotî divê li Xwedê bigere û xwe bigihînê. Roj li ber avabûnê bû. Ji ser rewaqê xweş xuya dikir wexta roj diçû ava. Belkî ew jî dibû sedem ji bo şagirtên Ezherê li tefkîrê kûr bibin.

Piştî ku roj çû ava, Yûsiv û Xêrî ji ser Rewaqê daketin jêrê ji bo şîvê bixwin. Li odeya ku li aliyê hewşa Mizgefta Ezherê dinêrî xwarin dixwarin. Xwendekarên din ên Kurd li odeyê kom bûbûn. Yûsiv ji Xêrî xwest biçin odeya dawiyê, berî xwarinê cihê wî yê nû nîşanî wî bide. Bi hev re çûn odeya dawiyê. Yûsiv ji Xêrî re got: 'Şerîf li vê odeyê dimîne. Ew îro çû cem hinek hevalên xwe yên berê. Hûn ê bi hev re li vir bimînin.' Di odeyê de dolabek hebû. Yûsiv deriyê wê vekir û ji Xêrî re got: 'Aliyekî wê tu bi kar bîne, aliyê din jî bila Şerîf bi kar

bîne.’ Yûsiv bi van gotinên xwe re hin kincên Şerîf ên di aliyekî dolabê de da aliyê din. Wexta kinc rakirin kaxizek ji nava wan ket xwarê. Xêrî li kaxiza ket xwarê hayil bû û rahiştê hinekî bala xwe dayê. Di kaxizê de navê xwendekarên Kurd ên li Rewaqê diman hebûn. Ji bo Xêrî jî çend xet hatibûn nivîsandin û hatibû gotin: ‘Xortekî din bi navê Xêrî hatiye. Dûrî kurdîtiyê ye. Dixwaze bibe alimekî mezin...’ Xêrî veciniqî û tam mane neda kaxizê û dirêjî Yûsiv kir. Yûsiv hinekî lê temaşe kir û ponijî. Hînê Xêrî ji Yûsiv nepirsîbû, Yûsiv peyivî: ‘Diyar e van raporan ji sefaretê re dinivisîne.’ Yûsiv hêrs bûbû û nizanîbû wê çi bike. Hinekî bi çavên velîstî li dora xwe virde wirde zîvirî û vegeriya ser Xêrî û pirsî: ‘Tu dibêjî çi, divê mirov çi bike?’ Xêrî jî berê bi bûyerên wisa re rûbirû nebûbû, lê têra xwe zîrek bû. Careke din kaxiz ji dest Yûsiv girt, lê temaşe kir û got: ‘Niha em bi Şerîf dizanin, ma ne wisa?’ Yûsiv serê xwe hejand û bi meraq li Xêrî guhdarî kir. ‘Erê em pê dizanin, lê ew bi me nizane. Em wî zêde têkilî karê xwe nekin, naxwe em wî biavêjin, sefaretê timî li yekî din bigere.’ Xêrî piştî gotinên xwe sekinî û weke ji Yûsiv re bibêje: ‘Ya rastî fikra min xweş e.’ Gotinên Xêrî gellekî bi serê Yûsiv jî ketibûn û pê xweş hatibû ku hevalê wan ê nû ev çend zîrek e. Yûsiv ji Xêrî re got: ‘De, em herin xwarinê bixwin, heval li benda me ne. Lê divê tu li vî kurikî miqate bî. Ew ji nav Millî Goruşçiyan hatibû nav me.’ Li derketinê baholeke kevin ê li ser dolabê bala Xêrî kişand û ji Yûsiv pirsî: ‘Ev bahola kevin a kê ye? Yûsiv keserek kişand û bersiv da: ‘Ew a mamoste Şukrî ye. Xortekî navsere bû. Ji Sêrtê bû. Heşt salan li vir xwend. Çû Tirkiyê venegeriya. Me xeber jî jê nestend. Eger heta saleke din neyê em ê bahola wî ji wir deynin.’ Yûsiv hinekî di derketina ji derî de sekinî û dîsa got: ‘Şukrî mirovekî delal bû. Gellekî bi cesaret bû. Comerd bû. Ji tirkan sefet û hîletê wî diçû. Lê tevî vê yekê alîkariya her kesê hewce dikir. Yanî kesek tirk bûya jî alîkariya wî dikir. Ji ber vê, heta niha Tirk jî pirr bi başî behsa wî dikin.’

Wexta li ser şîvê rûniştin. Rojnameyên Serxwebûn û Berxwedanê yê li bin xwarinê hatibûn raxistin bala Xêrî kişandin. Wêneyên gerîllayên ARGKê di rojnameyan de xweş xuya dikirin. Xêrî lê nêrî hinekî bêdeng temaşe kir. Nizanîbû çima pê xweş nehat ku kesên ji bo welatê wan ê bi navê Kurdistanê şer dikirin, li ser resmên wan xwarin bixwarana. Xêrî li Yûsiv zîvirî û got: ‘Ma rast e, em li ser van rojnameyan xwarinê dixwin?’ Hînê Yûsiv bersiv nedabû. Celal ê ji Erziromê û zanîngeh qedandibû wê êdî vegeriya Tirkiyê got: ‘Ez çend sal in, ji wan re dibêjim guh nadin min. De Xêrî çavê min belkî tu wan razî bikî.’ Piştî Celal wisa got, ‘Yûsiv di ber xwe de got: ‘Ya zêde meselê mezin nekin, ma hûn dibêjin qey pîroz in.’ Xêrî ev gotin ji Yûsiv hêvî nekiribû. Xêrî bi milahimî got: ‘Erê, lê ew welatê em bêriya wî dikin, ev mirov ji bo wî şer dikin.’ Rast e, bîrûbaweriya me yek nîne, lê ew jî zarokên welatê me ne.’ Yûsiv hinekî sekinî û di ber xwe de got: ‘Baş e, îcar em çi li bin xwarinê raxin. Celal rabibû li ber neynika li dîwêr pirzikek di rûyê xwe de diguvaşt got: ‘Min berê jî gotibû divê hûn her roj rojnameyeke misrî bikirin, bixwînin û paşê li bin xwarinê raxin.’ Xêrî serê xwe li vê gotina Celal hejand û got: ‘Rast e.’ Xêrî hem serê xwe dihejand û hem jî çavê wî li nivîsek di rojnameya Berxwedanê de aliqî. Nivîs ji aliyê Sekreterê Giştî yê PKKê Abdullah Ocalan ve bi ser navê ‘Îxanet û welatparêzî’ ve hatibû nivîsandin. Xêrî pariyê nan ê ketibû ser nivîsê rakir û bi nivîsê ve çû. Yûsiv lê temaşe kir û got: ‘Xêrî ji van rojanameyan dolab tijî ye. Tu kengî bixwazî dikarî bixwînî.’ Xêrî hê çavên wî li nivîsê bêyî hemdê xwe got: ‘Na lo, vê nivîsê bala min kişand.’ Yûsiv dîsa jêre got: ‘Ji wê hejmarê di dolabê de heye.’ Xêrî rabû li wê hejmarê geriya dît û bir odeya xwe ji bo paşê bixwîne. Xwendekarên din jî hêdî hêdî ji ser şîvê rabûn û xwe amade kirin ji bo dakevin Meydana Husênê. Xêrî rojnameya Berxwedanê danî odeya xwe û vegeriya cem Yûsiv. Li odeyê Şêxê Rewaqê Mehmed ê ji Dîlokê rûniştibû bi Yûsiv re dipeyivî. Mehmed endamê MHPê bû û bi salan şêxtî (serokatî) ya Rewaqê dikir. Xêrî wexta pê hesiya ku axaftin hinekî taybet û resmî xuya dike, xwest paşve vegere, lê Yûsiv îşaret pê kir û xwest ew jî rûnê. Mehmed ji Yûsiv re digot: ‘Hilbijartina ji bo şêxtiya Rewaqê nêzîk dibe û dixwest xwendekarên Kurd jî dengê xwe bidin wî û eger vê yekê bikin wê karibe odeyekê bide wan.’ Lê belê Yûsiv pêşniyara wî baş nedidît û digot: ‘Mehmed guh nade

pîvanên Îslamî, gellek caran dengê radyoyê bilind dike, ji lewra wê nikaribin dengê xwe bidin.' Mehmed kir û nekir nikarîbû Yûsiv razî bike û paşê rabû derket derve. Xêrî li Yûsiv temaşe kir û got: 'Ez jî dixwazim fikra xwe bibêjim.' Yûsiv keniya û got: 'Bêguman' Xêrî jêre got: 'Bi ya min diviyabû te pêşniyara wî qebûl bikira. Ma wê yê bê ji wî çêtir be.' Yûsiv li Xêrî bi rûkenî nêrî û got: 'Rabe em jî dakevin, tu vî qebîhî nas nakî. Yekî misilman ji wî çêtir e.'

Tarî ketibû erdê û hêdî hêdî dengê erbaneyên li Meydana Husênê bilind dibûn. Zikir û îbadet. Liv û lebat. Sewtên qesîde û xwendina Quranê bi yekahengê dimeşiyan. Koma xwendekaran jî xwe ji Rewaqê berdan û ketin nava lehiya Misriyên li ber erbaneyan kil dibûn. Li her quncikekê konek hatibû vedan. Li binê her konê hin mirov hebûn. Hin ji wan ji gundan hatibûn. Lewma xwarin û vexwarina xwe jî bi xwe re anîbûn. Li bin hin konan jî melleyên dengxweş rûniştibûn û mirovan li dora wan xelek çêkiribûn. Lê piraniya mirovan li bin konan li ber dengê erbaneyê zikir dikirin. Şewket jî ket nava wan û xwe kil kir. Xêrî fedî dikir. Ji ber ku bi rastî zikrên wan weke reqsê bûn. Bi Misriyan jî xweş bû, wexta kesên biyanî diketin nava wan. Ji ber ku gellek mirov ji gundên derdorê hatibûn te xwelî biavêta li erdê nediket. Jixwe di kolanên teng de zehmet bû mirov gav biavêta. Gellek kesan nargîle dikişand. Yûsiv digot: 'Di van kolanan de bi nargîlê re esrar jî tê kişandin' Zaza Ehmo jî li wî zêde kir û got: 'Di nava van kolanan de baz didin serhevdu.' Xêrî li van gotinan, li liv û lebata bi navê îbadetê ya li hawîrdorê matmayî mabû. Bala wî kişandibû ku pirraniya van mirovan gundiyên xizan bûn. Fikirî; gelo misilman hemû feqîr bûn an jî ev misilman xizan bûn? Îşaretên pirsê di serê Xêrî de li destpêka vê çîroka jiyana wî zêde bûbûn. Ji xwe dipirsî: gelo rastî û ya heyî çend nêz an jî dûrî hev in? Ma cih ji heqîqetê re nebû bijî yan jî ya heyî bi xwe jixwe heqîqet bû? Çi karîbû bikira ji bo vê perdeya rastiyan dinuxumîne rake? Bawer nedikir ku Xwedayê wî pê îman anîbû ji van bûyerên diqewîn hemûyan razî bûya. Gelo bi rastî ev mirovên ji xwe diçûn û îbadet dikirin, xwe digihandin Xwedê? Kulmoza pirsan serî li Xêrî kiribûn kewara mêşan. Tevî ku Xêrî di nava ev çend bûyer û pirsan de gêj bûbû jî kêfxweş bû ku wê karibûya li zanîngeha Ezherê xwe bigihanda hemû bersivan.

## ( 13 )

### ŞAGIRTÊ NÛ YÊ ZANÎNGEHA EZHERÊ

Serê sibê Seydayek bi navê Melle Mistefa hatibû Rewaqê. Ew û Yûsiv rûniştibûn sohbet dikirin. Yûsiv Xêrî bi Melle Mistefa da naskirin. Melle Mistefa mirovekî navsere bû û ji Çewlikê bû. Mirovekî muhterem xuya dikir. Tevî pîreka xwe û du zarokên xwe hatibû Misrê dixwend. Bi rûkenî li Xêrî nêrî û got: 'Kekê tu yê çi bixwînî?' Xêrî jêre got: 'Ez jî nizanim, lê dîrok bala min dikişîne.' Melle Mistefa jî matmayî ma, li Yûsiv vegeriya û pirsî: 'Ma heta niha kesî xwe li beşê dîrokê nivîsandiye?' Yûsiv jêre got: 'Seyda welleh min nebihîstiye, lê beşê dîrokê heye.' Ehmedê me yê ji Kobanê pirsiye, hinekî bexşîşê dixwazin. (Li Misrê navê bertîlê bexşîş e) Melle Mistefa piqînî pê ket keniya û ji Xêrî re got: 'Kekê ez te pîroz dikim. Welleh min bi xwe bîr nebiriye ez xwe li beşê dîrokê binivsînim. Baş e, êdî ji me jî yekê dîrokê bixwîne. Ez pirr kêfxweş bûm.'

Xêrî û Yûsiv bi hev re daketin biçin navê Xêrî li zanîngehê binivsînin. Li ber derî Misriyê bi navê Amr hebû û nargîleya xwe dikişand. Çavên Amr merixîbûn. Ji kişandinê bêvil û rûyê wî xwe berdabûn xwarê. Ew û Yûsiv hinekî bi Erebî peyivîn Xêrî ji wan tiştek

fêhm nedikir. Xêrî meraq kir û ji Yûsiv pirsî ew Misrî çi dibêje. Yûsiv got; Amr dibêje; Misrî hemû qehp in. Ma hûn çima tên li vir dixwînin? Xêrî di ber xwe de got: 'Diyar e, ew jî xurifî ye.' Paşê Yûsiv û Xêrî ber bi jor ve di nava kolanên teng ên mîna Amedê de meşiyan çûn Zanîngeha Ezherê. Bi hezaran xwendekar li avahiyên zanîngehê dikeliyan. Ji hol û odeyên zanîngehê bêhna zanîn, ilm û îrfanê dihat. Lêgerîn û lêkolîna li sirrên nepenî xuya dikir. Eşq û evîna xwegihandina nûra Xwedayê mezin a di dilê bawermendên ciwan de xwe li rûyê wan dida der. Bêhna giraniya xeyal û hedefên mezin ji talibên li ser riya heqaniyetê dihat. Ji bo gihîştina menzîlê, xwe li her zor û zehmetiyê, li her cewr û cefayê radigirtin. Ji hezkirina heq xwe li neheqiyê radigirtin. Ji xwesteka wehdaniyetê li xweperestiyê bêhnfireh bûn. Ji bo sefaya îlahî razîbûn cefayê bikişînin.

Xêrî bi baldarî li hawîrdora xwe temaşe dikir. Ji bo xwe bigihîne ilm û sirra di dîwarên Ezherê de razayî, heyecana di demarên xwe de bi kelecanekê his dikir. Bi vê heyecanê, bi hêvî bû ji alim û zanayên bi salan di zanîngehê de pijiyayî û ilmê ji hezar salî vir ve tînin dewr bigire.

Xêrî li dersan guhdarî kir bêyî fêhm bike. Ji ber ku fêhm nedikir, pirr aciz û zivêr dibû. Ji lewra Yûsiv ew bir li Diraset Ormanê nivîsand. Ev mektebeke Wezareta Karê Derve ya Misrê bû. Bi buhayeke gellekî kêm biyanî hînî Erebî dikirin. Xêrî li vir pirr bi lez hînî Erebî bû. Mamosteyê li vê dibistanê bi taybetî ji bo Xêrî eleqe nîşan dida û jêre digot: Neviyê Selhedîn, divê tu ji her kesî zêdetir bixebitî. Ji ber ku pirsgirêkên we gellekî mezin in. Berpirsiyariyên we zêde ne. Xêrî jî pirr dixebitî û bawer dikir ku wexta ziman jî hîn bibe wê êdî bi hêsayî karibe xwe bigihîne wê zanebûn û ilmê lêdigere. Ji bilî dersan li cem Yûsiv jî ders dixwend û carnan jî dadiket Rewaqa Sûdaniyan li cem wan zimanê hîn dibû tetbîq dikir. Bi vê re dostaniyeke wî ya baş bi xwendekarên reşik ê Sûdanê re çêbûbû. Di nava xwendekarên Sûdaniyan de herî zêde kêfa wî ji Adem re hatibû. Bi saya Adem xweş hîn dibû, reşik çawa difikirin. Wexta sohbet bi wan re dikir, ferq dikir ku Frantz Fanon bi rastî çend tespîtên xurt kirine. Bala xwe dida Adem ê reşik ku xwe seyidî dihesiband û çawa dîsa di mejiyê wî de gellek tişt rengê xwe reş in. Lê tevî vê yekê, Adem ji rojnamevaneke spî ya Emerîkî hez kiribû. Adem her behsa wê dikir. Qala wê dikir çawa ew gerandiye û çawa bi hev re peyivîne. Ji bîr nedikir. Radibû rûdinişt, navê wê digot. Reşik dewleta wan hebû, lê dîsa xwe bindest dihesibandin. Ew li vê cîhanê bindest bûn. Lewma bi kesî re nedibûn dost. Belkî tenê bi bindestan re dibûn hevalbend. Ji xwendekarên Tirk zêdetir bi xwendekarên Kurd re heval bûn. Bawer dikirin ku kesên din henekên xwe bi wan dikin û ji lewra timî tengezar bi wan re tevdigeriyan. Kesî nizanîbû çima, lê xwendekarên Kurd jî xwendekarên Sûdanê bindest didîtin. Belkî jî ya nedihat dîtin ew bû ku bindestî weke karekterekî di derûniya reşikan de cih girtibû. Belkî jî bindestiya reşikan ne ku ji serdestiya spiyan dihat ji tinebûna ji destê wan bû. Tevî ku li Sûdanê (gotinek ji Erebî tê û bi maneya welatê reşan e) bi sedan zimanên qebîleyan hebûn jî Sûdana Jor xwe Ereb dihesiband û Sûdana Jêr jî ji ber ku mêtingeha Xiristiyanan bû bi Ingilîzî dipeyivî. Zimanên xwe û çanda xwe tiştek nedihesibandin û nikarîbûn li ser kokên xwe hêşîn bibin. Belkî jî bindestî di vê qonaxê de veşartî bû.

Xêrî Adem nêzî xwe didît. Adem ji gundekî herêma Kurdevanê ya Sûdanê bû. Adem behsa hebûna Kurdan a li Sûdanê dikir û Xêrî jî henek pê dikir û digot, pir dengê xwe nekin, eger hûn pirr zêde dengê xwe bikin, wê mintiqa Kurdan Kurdevanê ji wan bistînin. Bi hişê Xêrî nediket ku Adem çawa xwe seyîdî dihesibîne yan jî dikare xwe wisa bifikire, ji ber ku Adem reş mîna qetranê bû. Bêyî neksa xwe ji Adem kort bike, ji Adem ev yek pirsî û Adem matmayî sekinî û got: 'Welleh birayê Xêrî ez hîç li vê nefikirîbûm. Ji ber ku rast e, peyxemberê Xwedê silav û silawat li ser bin, rengê wî gûn esmerî bû.' Piştî vê matmayînê Adem got: 'Dev ji vê berde ez pêkenokeke li ser reşik û spiyan ji te re bibêjim. Adem cihê xwe xweş kir û got: 'Rojekê yekî spî û yekî reş li hev didin. Yê spî hulmikên xwe baş li yê reş dide.' Adem di heman demê de bi destê xwe mîna pevçûnê dikir. Adem dewam kir: 'Lê paşê

dikevin odeyeke tarî û yê reş xuya nake û ew têra xwe li yê sipî dide, lê wexta yê reş ji kêfan re dikene, yê spî hulmekekê li ser çavê yê reş dide.' Adem jî bi vê encamê re dikene, diranên wî yên spîbozî fîq dibin.

## ( 14 )

NIQUTÎ DILÊ MIN

Li Ezherê mamoste û ustadên pijiyayî zanebûn û têgihîştina xwe ya ji dem û dewranan wergirtibûn. Bi hostetî û rêbazên aqilane didan xwendekarên xwe. Di warê gotin û bêjeyê de xwediyê fesahet û belaxetê bûn. Mîna alimên duwanzdeh ilm nebûn, ew her yek ji wan di qada zanîna xwe de mahir û pispor bûn. Ew xwediyê gellek ilm û îrfanan bûn. Ew çend di warê xwe de pijiyayî bûn, hinekî jî westiyayî xuya dikirin. Belkî jî zanîn û ilmê wan bûbû mîna avek di golekê de bimîne û neherike nava erdên terikî û tîbûyî bû. Mîna aveke kevzgirtî bû. Ew jî di navê de weke beqên dikirin qurequr xuya dikirin. Ji bo payîzên dînoke dengê wan xweş dihat, lê rê nedida îmana di dilan de ji nava qefesa dil derkeve. Xêrî êdî ji dersan dernediket, ji ber ku Erebiya xwe pêşxistibû û li axaftinên mamosteyan serwext dibû. Bi taybetî mamosteyê wî yê Dîroka Qedîm a Iraqê pirr bala wî dikişand. Mirovekî zeîf bû. Ji Seîdiyan bû. Seîdî pirr nedişibiyan Misriyan. Pirr serhişk bûn. Ji aliyê fizîk û bedena xwe jî cihê bûn. Bêtir porzer û çavhêşîn bûn. Di dersan de xwendekarên Misrê zû diwestiyan û serê xwe datanîn ser maseyan û zêde nikarîbûn guh bidin dersan. Ji ber ku tevahiya wan zarokên xizanan bûn û taqeta wan a bunyewî qels bû. Lê Xêrî bi tîbûna xwe ya ji ilm û zanînê re guhê xwe mîçkirî guhdarî dikir. Meraq û heza Xêrî ya ji bo dersan bala mamoste jî kişandibû.

Mamoste weke gellek caran ket dersê û mijara xwe li textê reş nivîsand. Li ser texte nivîsand ku mijar destana Gilgamêş e. Mamoste bala xwe da sinifê û dît ku ji Xêrî bêtir pirr kesekî eleqeder xuya nake. Mamoste berê pêşî xwest behsa qewmên li herêmê bike, paşê derbasî Sumeriyan bibe û behsa Destana Gilgamêş bike. Lewma behsa qewmên Mîtanî, Sûbarû, Nayirî, Hûrî, Omerî, Zaza û hin qewmên din kir û hemû xistin nav xelekekê û got: 'Ev hemû qewmên aryanî ne. Ji wan re dibêjin; Qewmên Çiyê.' Wexta Xêrî gotinên mamoste bihîstin bi heyecan bû. Ji ber ku pirr eşkere bû ku Mamoste bi zimanekî pirr zelal behsa qewmên kevin ên Kurdan dikir. Lê belê gotina Kurd bi kar nedianî. Xêrî jî heta wê rojê di dersan de ranebûbû û Erebiya xwe neceribandibû. Ji ber ku hînê ji xwe piştrast nebû. Lê xwest rabe û ji mamoste re bibêje; mamoste qewmên tu behsa wan dikî, ma gelo ew Kurd nînin ku îro li Bakurê Iraqê dijîn? Jixwe mamoste wexta behsa dersê dikir li wî dinêrî. Xêrî ji nişkê ve destê xwe rakir û mamoste jî yekser mafê axaftinê da wî. Xêrî pirsa xwe kir, lê mamoste xwe li kerriyê danî û mîna Xêrî tiştekî din pirsîbû, behsa tiştekî din kir. Lê kurekî misrî yê li pêşiya Xêrî rûniştibû rabû ji Mamoste pirsî: 'Mamoste ma çi eleqeya Etrak (Tirkan) bi Bakurê Iraqê re heye? Ji ber ku bi Erebî gotina Ekrad û Etrak nêzî hevdu bûn, xwendekarê misrî Ekrad weke Etrak fêhm kiribû. Xêrî dîsa yekser rabû û got: 'Ez nabêjim Etrak, ez dibêjim Ekrad.' Mamoste ji Xêrî re got: 'Kurê min ma tu dawa çi dikî. Ma tu nizanî mijara Kurdan mijareke siyasî ye.' Li ser vê Xêrî nerehet bû û got: 'Mamoste ez jî Kurd im, yanî ez siyasî me?' Mamoste bi rûkenî nêzî Xêrî bû û pirsî: 'Ez gellekî kêfxweş bûm. Ma tu Kurdê kîjan welatî ye.' Xêrî jêre got, ew Kurdê Tirkiyê ye û ji bajarê Diyarbekirê ye. Mamoste her kêfxweşiya xwe bi gotina li pey hev a Neviyê Selhedîn, tu bi xêr hatî dianî ziman. Mamoste paşê dersa xwe dewam kir û berî derbasî Destana Gilgamêş bibe, behsa dîrokçeya kin a gotina Ellah kir. Mamoste gotina Ellah koka wê weke gotina El-Îl destnîşan

kir, rîşe û şaxên wê birin heta dema Kenaniyan. Paşê çawa di dema Cihûyan de weke Elohîm hatiye bilêvkirin û di Erebiya îro de çawa bûye Ellah. Mamoste xwe ji bîr nekir û got; heye ku têkilî di navbera ela yanî bilindbûn û elleh de hebe. Xêrî fêhm nekir ku çima mamoste beriya destana Gilgamêş behsa gotina Ellah dikir. Lê di dersê de nuqutî dilê wî ku mamoste dixwaze tiştekî bibêje. Gelo mamoste çi dixwest ji wan re ya rastî ji wî re vebêje. Ji ber ku mamoste tenê ji wî re weke bipeyive ders dida. Mamoste wexta derbasî çîroka Gilgamêş bû, bi henekî got; Seyîdîna Gilgamêş (Efendiyê me Gilgamêş) Paşê lêborîna xwe xwest û got: ‘Min nexwestibû wisa bibêjim, zimanê min aliqî.’ Lê Xêrî wisa bala xwe dabû dersê, ferq kir ku mamoste bi şaşî negot. Jixwe xwendekarên din, êdî ji taqet ketibûn û bala wan li dersê nebû. Mamoste behsa Gilgamêş kir, têkiliya wî ya bi Qewmên Çiyê re destnîşan kir û got: ‘Heye ku navê wî jî ji aliyê qewmê çiyê ve lê hatibe kirin.’ Wexta mamoste wisa got, Xêrî êdî bawer kir ku ew gotina gamêş ya di navê Gilgamêş de ji Kurdî hatibe. Wexta mamoste behsa mezinbûn û girsbûna Gilgamêş kir, Xêrî di ber xwe de got; Erê, ew Girgamêş e. Ji ber ku Xêrî dizanîbû di Kurdî de gellek caran herfa L û R qelbî hevdu dibin. Mamoste wexta vî mirovê girs û gir ê bi navê Gilgamêş dikir ew weke qiral û nîv-xweda bi nav dikir. Xêrî baş lê serwext nebû ka mamoste çawa wisa mirovekî bi nav dike. Ma ne mamosteyê dersa Dîroka Kevin a Misrê jî ji bo Fîrewnan digot; ew mirovên wisa bûn ku xwe xwedê dizanîbûn. Lê Xwedayê heq li wan hatibû xezebê. Gotinên Melle Selîmê Dîn hatin bîra Xêrî û di ber xwe de keniya û fikirî ku bi rastî li cîhanê her xwedayên sexte û xwedayekî heq hebûye. Piştre pê hesiya ku li gellek deverên cîhanê Xweda bi gellek navan têne hildan. Lê di Îslamê de jêre Ellah dihat gotin û jixwe mamoste behsa kok û eslê vê gotinê kiribû. Gelo meqsûd û menzîl, meram û heq, heman tişt bû? Pirseke dijwar xwe li dilê Xêrî da. Ew hînê wisa difikirî mamoste ders qedand û got: ‘Em ê paşê dewam bikin.’ Xêrî bi heyecan rabû çû li ber derî mamoste zevt kir û xwest jê çend pirsan bike. Xêrî ji Mamoste re got: ‘Mamoste du pirsên min hene?’ Mamoste keniya û got; ez ê kêfxweş bibim ku tu pirsan bikî, lê ka pêşî pirsekê bike.’ Xêrî hewl da hevokên xwe rast deyne, lewma gotinên xwe bi zimanekî kitêbî yanî fusha gotin: ‘Mamoste we behsa Ellah kir, em jêre dibêjin; Xwedê heta hinek li cem me jêre dibêjin Homa û bawer dikim li hin deveran jî bi navekî din. Gelo ev hemû Ellah îfade dikin?’ Mamoste hinekî li ber xwe neherî û got: ‘Ka pirsa xwe ya din jî bike.’ Xêrî dewam kir: ‘Te behsa Destana Gilgamêş kir, ev bûyer û bûyerên weke wê hene beriya Îslamê ne, gelo têkiliyek di navbera wan û qisseyên Quranê de hene?’ Mamoste careke din li ber xwe nêrî, bi awayekî devliken ji Xêrî re bi fusheke tinazan bike got: ‘Ez niha nikarim bersivên te bidim.’ Xêrî mat ma û pirsî: ‘Çima?’ Mamoste li jor mêze kir û tiliya xwe ya îşaretê bilind kir û got: ‘Ji ber ku em di dilê Ezhera Şerîf de ne.’ Xêrî ji bersiva mamoste baş fêhm nekiribû û dîsa got: ‘Çima?’ Mamoste destê xwe avêt dora stûyê Xêrî û hinekî pêre meşiya û bi zimanekî Xêrî karibe fêhm bike û hêdî got: ‘Kurê min binêre. Dîrokeke dûrûdirêj a mirovatiyê heye. Ji bo em vê fêhm bikin, pêşiyan gellek tişt ji me re li pey xwe hiştine. Em bi awayekî dikarin wan fêhm bikin. Berhemên wan îşaret in rê nîşanî me didin. Her tişt li destpêka xwe vedigere. Eger tu karibî bifikirî, tu yê karibî xwe bigihînî, hebûn û tinebûnê. Ji bo em dîrokê baş fêhm bikin, divê em ji civaknasî, felsefe û ilmê derûnî jî baş fêhm bikin. Naxwe em ê nikaribin fêhm bikin ka mirovan çawa bawer kiriye û çawa Xwedê nas kirine. Ji bo tu nas bikî divê tu karibî bifikirî û bizanibî.’ Mamoste piştî gotinên xwe xatir ji Xêrî xwest, kêfxweşiya xwe dubare kir û xwest têkiliya wan dewam bike. Xêrî ji bersivê têr nebûbû, lê nuqutî dilê wî ku mamoste jê dixwaze ku ew hînê zêdetir bifikire û bizanibe. Her weha serxwet bûbû ku ilm û zanebûn sînorên xwe gellekî berfireh in. Xêrî di nava kulmoza pirsan de diponijî û nizanîbû çawa vegeriyabû Rewaqê.

# ( 15 )

## JI BAHOLÊ PIRTÛK DERKET

Hewa Qahîreyê weke gellek caran dîsa pirr germ bû. Dikir ku mirov zivêr bibe. Xêrî li odeya xwe nêrî, bawer kir ku divê hinekî paqij bike û bide serhevdu. Cihê dolabê pê xweş xuya nedikir. Di dilê xwe de got, ji niha çêtir wext nîne ji bo ez cihê vê dolabê biguherînim. Ji bo vê jî diviyabû bahola kevin a Şukrî ku hevalan pirr behsa wî dikir, ji ser dolabê daniya. Xêrî wexta rahiştê bahol ji hev de ket û di nava lepên wî de ferikî, ket xwarê. Alavên di navê de hemû li erdê belav bûn. Xêrî rahişt perçeyên baholê û alavên li erdê belavbûyî dan serhevdu. Çend kincên bêkêr û çend pirtûk di baholê de hebûn. Pirtûkekê bala Xêrî kişand. Bêhna kevinbûnê jê dihat û pelên wê yên zerbûyî pîroz xuya dikirin. Wexta destê xwe da rûpelên wê hiss kir ku ji kevinbûnê dinalin û mîna bibêjin, eman, bala xwe bidê û min biqelibîne, riziyayî û hizhizî bû. Li pelgê pêşî ala Kurdistanê, li dora wê simbil û xencerek hebû. Pirtûk bi herfên gellekî delal ên kofî hatibûn nivîsandin. Xetên pirtûkê gellekî xweşik bûn. Xêrî wexta hewl da bixwîne dît ku pirtûk bi Erebî nîne. Pirtûk bi Osmanî bû. Di sala 1928an de ji aliyê Cemiyeta Xoybûnê ve bi sernavê 'Li Tirkiyê Komkujiyên Kurdan' hatibû nivîsandin. Balkêş bû, pirtûk li 'Çapxaneya Ereb a Misrê' hatibû çapkirin. Xêrî pêde çû û dît ku giran be jî pirtûkê fêhm dike. Bala wî ket ser û dest jê berneda. Xwest fêhm bike ka di sala 1928an de Kurdan çi gotiye. Her ku pêde diçû mûyên canê wî sîxsîxî dibûn, tevzînok bi canê wî diketin. Pirtûkê behsa gellek bûyeran dikir û bi zimanekî gellekî xurt hatibû nivîsandin. Pirtûkê behs dikir ku wexta topên Herba Umûmî li ezmanê cîhanê kirine gurmîn, Tirkan jî pîlanên xwe yên di rewşa aştiyê de amade kirine û destpê kirine bi cih anîne. Li naverastê çar pênc mîlyon mirov bi navê Kurdan hebûne. Çavên wan birriye ku bêyî berteraf bikin bi qewmê nijada Tirk re bikin zikhevdu û bihelînin. Bi vî awayî Tirk fikirîne ku nûneriya nijada Kurdan bikin. Ji van hevokên pirtûkê jî diyar bû ku Kurdan pirr êş û azar kişandibûn. Ji lewra jî bi zimanekî pirr tûj behsa Tirkan dikir. Li gorî pirtûkê Xelîfe û Siltan d Reşatê 5. hîmên vê siyasetê bi pênc û deh xalên qanûneneke bi dizî îmze kirine. Li gorî vê qanûnê Kurdên li Kurdistanê rûdinên hemû ji gundan wê bêne rakirin û li wîlayetên Tirk bêne bicihkirin. Kurdên bêne şandin wê li bajaran bêne bicihkirin û hejmara wan ji sedî pêncê şêniyên wî bajarî derbas neke. Bi taybetî jî eşrafê tenê li bajar û navçeyan bêne rûniştandin û wê ji têkiliya bi ferdên malbatê dûr bêne girtin.

Bi vî awayî dixwazin milletê Kurd di nava Tirkan de belav bikin û ji holê rakin. Piştî nifşekî li bendê ne ev milletê li nava Tirkan belavbûyî zimanê xwe wenda bike û wê navê Kurd bi tevahî ji nexşeya cîhanê rabe. Bi vê yekê, difikirin bi derbekê du nîşanan hildin. Bi vê yekê, pîlan dikin ku milletê Kurd ji holê rakin, li şêniyên Tirk çar pênc mîlyonî zêde bikin. Diyar bû di rastiyê de ev nîzamnameya behsa wê dihat kirin xistibûn pratîkê. Li gorî qeydên Mudîriyeta Muhaciran a wê demê ku bi vê meseleyê re mijûl bûye, ji bo bişînin wîlayetên Tirkan, ji Kurdistanê li derdora 700.000 Kurd ji gundên wan hatin derxistin. Tehcîra Kurdan bi qetlîama Ermeniyan re meşandine, lê ji ber kêmasiya amûrên çûnûhatinê û hin pirsgirêkên ji ber herbê bi tevahî pêk nehatine. Kurdên ji cih û warên wan hatin kirin, beşek ji wan li ser riyan ji ber sefalet û birçîbûnê mirine. Beşê din jî di dema şandinê de di rê de li ber sungûyên cerdevan, esker û jendermeyên Tirk hatine hiştin ku ew esker, cerdevan û jenderme bi munasebeta qetlîema Ermeniyan weke avê hînî vexwarina xwîna mirovan bûne. Di dema seferberiyê de kesên bi trênê di çiyayên Torosê re çûne, dîtine ku li gellek deveran hin mirovên weke di xew de yan jî bêhn didin xuya dikin hebûne û nêzî wan bûne dîtine ku ew muhacirên Kurd in ji serma, sefalet û birçîbûnê mirine. Dîsa pirtûk behs dike ku şaredariya Mûsilê bi maşînên şaredariyê rojê bîst heta pêncî cenazeyên muhacirên Kurd ji nava bajêr berhev kirine.'... Dîsa Artêşa Tirk a bi navê Artêşa Îslamê şandiye Azerbegcanê, fermandarê

wê ji bêalîbûna Îranê wîlayetên Hetek û Tebrîzê seranser talan kiriye û bi zêrên ji guh û gerdena keçên Ermeniyan kirine şevên kêfê li dar xistine û gotine: **'Wexta em çûn me ZO qedandin, li vegerê jî em ê LO'yan biqedînin[2].'**

REWAQ MODELEKE PIÇÛK A TIRKIYÊ BÛ

Xêrî li nivîsên dixwend matmayî bû. Bêhna wî çikiya û lê hayil bû ku êdî berêvar bû. Meha Remezanê bû. Rojiyê jî ew hinekî westandibû. Di vê mehê de dewleta Kuweytê li ser Rewaqê xwarin li xwendekaran hemûyan belav dikir. Lewma kesî xwarin çênedikir. Ji bo wê jî gellek xwendekar li ser xênî radiwestiyan. Hem çav li dewr û dersên xwe digerandin, hem jî hinekan ji wan li radyoyê guhdarî dikir. Xêrî jî derket ser Rewaqê û çû cem Yûsiv. Ji Yûsiv re behsa pirtûkê û baholê kir. Yûsiv jêre got: ‘Tiştek nabe.’ Yûsiv guhê xwe dabû radyoyê, li nûçeyên tirkî yên BBC’yê guhdarî dikir. Radyoyê ragihand ku artêşa dewleta tirk 18 gerîllayên Kurd kuştine. Rengê rûyê Yûsiv qelibî û bêhna wî teng bû. Lê dengê xwe nekir. Xêrî bi dengekî nizim ji Yûsiv re got: ‘Ev çawa biratî ye, van bênamûsan her Kurd kuştine û hînê dikujin. Wer biçe wê Kurdan qir bikin.’ Yûsiv bi destên xwe rûyê xwe firkand û got: ‘Rast e, lê doza Kurdan a îro jî komînîstî ye, eger wisa nebûya wê serketîtir bûya.’ Serhildana Şêx Seîdê Kal ket bîra Xêrî, lê nexwest bibêje. Ji ber ku fikirî, wê rewşa tengezar nexweştir bibe. Êdî wexta belavkirina xwarina fitarê hatibû. Xwendekar ketibûn dorê. Ji ber ku xwendekarên Kurd bi hev re xwarin dixwarin yek ji wan li ser navê hemûyan diket dorê. Lê xwendekarên din, her yek ji bo xwe diket dorê. Ji nişkê ve li cihê dorê aloziyek derket. Mistefa yê ji Amedê qêriya û bazda jêr. Pirr bi lez ji jêr di destê wî de cunehek derket jor û qêriya: ‘Kurê qehpê tu kî yî, ji min re bibêje oglim (kurê min). Ez Amedî me, tu çawa dikarî bi min re wisa bipeyivî.’ Mistefa ji Amedê bû û Zaza bû. Wexta rojî digirt bêhna wî bi tevahî teng dibû. Xortekî bi lep bû. Timî çoyekî wî li pişt dolaba wî hebû. Her tim digot; bi van bêbavên tirkan bawerî nabe, divê mirov bi tedarik be. Xwendekarên Kurd ji Mistefê re digotin: ‘Miçê’ Li Amedê zêdetir navên Mistefa wisa dihatin hildan. Mistefa bi cinehê xwe ket nav xwendekarên Tirk. Her yek ji wan bi deverekê ve pekiya. Reviyan jêr. Yekî ji wan dest ranekir, desthilneanîn. Tenê Şêxê Rewaqê Memed ket navberê. Li ber çavên Miçê dinya tarî bûbû, dora xwe nedidît. Çoyê xwe daweşand Memed jî. Xwendekarên din ê Kurd jî ketin navberê. Bi zor û zehmetî xwendekarên Kurd bi Miçê girtin û kaşkirin odê. Lê Miçê xwe ji nav lepên wan xilas kir û derket li nava hola Rewaqê qêriya: ‘Kurên qehpan, ez Amedî me, hûn nikarin bi min re wisa bipeyivin.’ Yûsiv bi Miçê girt û xist hundir. Miçê ji xwe çûbû, wexta Yûsiv ew xist hundir ji Yûsiv re got: ‘Min berde ûlan.’ Yûsiv hêrs bû û sîleyek lêda. Miçê veciniqî û diyar bû, bi ser xwe ve hinekî hat. Şewket Miçê da rûniştinadin û got: ‘Hevalno hinekî bêhna xwe bidin. Em li vir xwendekar in. Temam şerek çêbû, lê em eqlê selîm bernedin. Bawer dikim ku wê piştî kêliyekê Mudîrê Polêsan ê Ezherê bê. Berî ew bê, divê em bi Şêx Memed re bipeyivin.’ Her kesî fêhm dikir ku Şewket çi dibêje. Ya maqûl digot. Lewma kesî dengê xwe nekir. Ji ber ku ewlekariya Ezherê ji nakokiya di navbera xwendekarên Kurd û tirk de bêzar bû. Di nava salan de çend carên din bûyerên bi vî rengî qewimîbûn. Lewma fikar hebû ku hin xwendekar ji ber van pirsgirêkan ji zanîngehê bêne avêtin. Ji ber vê, kesî nedixwest tiştekî wisa biqewime. Yûsiv ji Şewket xwest ew û Xêrî biçin cem Memed. Her du çûn odeya Memed. Li wir jî atmosfereke nexweş hebû û hinekî jî tirsiyabûn. Lê Memed mirovekî aram bû. Hinekî gazinên xwe kirin, lê di dawiyê de qebûl kirin ku diviyabû xwendekarê Tirk gotina ‘oglim’ yanî ‘kurê min’ ji Miçê re negota. Lê di heman demê de gotin; Miçê gellek xwendekar êşandine. Wexta Memed ketibû navberê, destê wî jî êşiyabû. Di dawiyê de qebûl kirin ku xwendekarê Tirk ji Miçê lêborîna xwe bixwaze û

[2] ZO ji bo Ermeniyan û LO jî ji bo Kurdan digotin.

her kes biçe rûyê hevdu û li hevdu bên. Ji ber ku meha Remezanê jî bû, her kesî hevdu da xatirê rojiya meha Remezanê û bûyera nexweş a qewimîbû ji bîr kirin.

## ( 16 )

MEZINÊN MEZELAN

Di rojên meha Remezanê de xwedanxêr gellek bûn. Li xwendekaran ji bilî xwarinê pere jî belav dikirin. Di germa dijwar a nîvrojê de yekî qapût lixwekirî pere li wan belav kirin. Bêrîkên wî tijî desteyên pereyan bûn. Hîç nedipeyivî tenê ji hin xwendekaran dipirsî gelo hînê zêdetir dixwaze yan na. Xêrî piştî ku pere jê girtin, jê pirsî kî ye, û çima peran belav dike, lê wî tenê bi girnijîneke xembar nêrî û bêyî bersivê bide li riya xwe meşiya. Zilamekî girs û çor xuya dikir. Xêrî ji Yûsiv jî pirsî, lê wî jî got: ‘Kes nizane.’ Paşê li gotinên xwe zêde kir û got: ‘Ew her sal van wextan tê, wisa peran berhev dike û bêdeng diçe.’ Xwedanxêrî weke her carê kir. Bêyî ku bipeyive dîsa li riya xwe çû. Xêrî xwestibû fêhm bike, çi meram û meqseda vî mirovî heye. Lê diyar bû ew ji zanîn û naskirinê dûr bû. Wexta bi vê yekê jî hesiya, hinekî li ber xwe ket. Pirr zêde di hundirê xwe de nebir û neanî, avêt pişt guhê xwe. Jixwe gellek şop hebûn û ew hînê bi ser wan ve jî nebûbû. Ji bo bûbûya şopbirekî baş hînê diviyabû gellek bixwenda û gellek tişt nas bikira.

Li Qahîreyê gellek şop û rengên Kurdan hene. Di dîrokê de Kurdan pirrî caran xwe li vî welatî girtiye. Lê êdî ji çend malbat û kesayetan wêdetir li Qahîreyê kes nemabû. Yek ji van kesan jî keça Celadet Bedirxan Ûşeymeyê bû. Ya rastî Ûşeyme ji Celadet bi xwe nebû. Ji mêrê pêşî yê Rewşenê bû. Lê li ber destê Celadet mezin bûbû. Ûşeyme li Qahîreya Nû rûdinişt û keseke dewlemend bû. Hal û wextê wê xweş bû. Ji bilî wê êdî di malbata wê de kesî bi Kurdî nizanîbû. Ji dema ku pê hesiyabû xwendekarên Kurd li Zanîngeha El-Ezherê dixwînin, car caran ew vedixwendin û bi sohbeta bi wan re bêhna xwe dida. Ji ber ku meha Remezanê bû, xwendekarên Kurd vexwendibûn fitarê. Yûsiv ji xwendekaran re got: ‘Xwe amade bikin, keça Celadet Bedirxan Ûşeymeyê em dawetî fitarê kirine.’ Li ser vê yekê, Ehmedê Zaza bi heyecan rabû û destê xwe da ser zikê xwe û got: ‘Welleh me îro kêf kiriye. Ûşeymeyê gellek xwarinên xweş çêdike. Bi Xwedê li cem me li Çewlîkê gellekî xwarinê xweş çêdikin, lê kes bi qasî Ûşeymeyê nizane çêke.’ Ûşeyme, zilamê wê kesekî dewlemend bû. Ji

ber vê yekê xaniyekî wê têra xwe bi konfor hebû. Mîna qesreke hemdem bû. Ji ber vê, xwendekarên Kurd wexta çûna mala wê kincên xwe yên xweşik li xwe kirin.

Ûşeymê li ber derî xwendekar pêşwazî kirin. Yek bi yek rûyê wan û çavê wan maçî kir. Mîna serdemên begtiya Bedirxaniyan, bi gotinên delalî û ciwaniyê xwendekar himbêz kirin. Ji her yekî re digot: 'Bavê mino, çavê mino, bi qurbana te bim vedixwend hundir.' Xwendekar wexta çûn hundir pîrejineke porsipî dîtin. Tayekî reş di porê wê de tinebû. Pîrejineke hizhizî bû. Taqet têde tinebû. Ûşeymeyê ji xwendekaran re got: 'Zarokno ev diya min Rewşen Xanim e. Bi Tirkî jî dizane, yên Zazakî dipeyivin û nizanin bi kurmancî dikarin bi Tirkî pêre bipeyivin.' Xwendekarên Kurd yek bi yek çûn destê Rewşen Xanimê. Ûşeymeyê piştî ku xwendekar bi diya xwe dan naskirin bang li xulamên xwe kir û got: 'Destê xwe nedin tiştekî, ez ê bi destên xwe ji zarokên xwe re xwarinê çêkim.' Paşê li xwendekaran zivîrî û got: 'Hûn bi diya min re sohbetê bikin ez ê xwarinê amade bikim.' Xwendekar li dora Rewşen Xanimê kom bûn û destpêkirin jê pirsîn: 'Hûn li ku dimînin?' Rewşen bi zehmetî dipeyivî û got: 'Ez li Şamê dimînim.' Wexta behsa Şamê kir, Xêrî jî jê pirsî: 'Gelo hûn serokê PKKê Abdullah Ocalan dibînin?' Rewşen Xanim guhê wê giran bûbûn û pirsî: 'Te got Evdillah?' Piştî ku Xêrî serê xwe hejand wê dewam kir: 'Evdillah du caran hat serdana min. Min jêre got; lawo dewleta Tirk demokratîk bûye. Ma tu dawa çi dikî? Tu çima zarok û jinan dikujî?' Piştî van gotinan Rewşen Xanimê bêhnek da axaftina xwe. Li ser vê Xêrî bi rastî bersiva Ocalan dayî meraq kir û dîsa jê pirsî: 'Baş e, Abdullah Ocalan çi got?' Rewşen li ser vê pirsê got: 'Tiştek negot, tenê keniya.' Rewşen Xanim ji pîrbûnê hizhizî bû. Di nava porê wê de tayekî reş jî tinebû. Xwîna di demarên wê de kişiyabûn. Her cara dipeyivî paşê bêhna xwe dida. Piştî ku Rewşen Xanimê bêhna xwe da ji xwendekaran hinek pirs kirin. Ji wan pirsî çend kes in. Çawa debara xwe dikin. Ji kîjan bajarên Kurdistanê ne. Li vir çawa dimînin. Lê pirsa wê ya 'li vir mezinê we kî ye?' kir ku xwendekar li hev binêrin û nikaribin bersivê bidin. Dîsa kir ku xwendekar li ser vê dabaşê bifikirin. Bi qasî 20 xwendekarên Kurd ên ji Amed, Çewlîk, Qers, Erzirom û Kobanê, li vî welatî debara xwe bi bûrs û mînheyan dikirin. Lê bîr nebiribûn ku mezinekî wan jî divê hebe.

## ( 17 )

### Mezinên wan mezinên mezelan bûn

Wexta xwendekaran xwarin dixwar zilamekî girs ji odeyeke din bi celabiyê ket hundir. Xwendekaran xwest ji ber wî rabin, lê wî tika kir ku kes ji cihê xwe ranebe. Bi Erebî xêrhatina wan kir û tenê li Xêrî nêrî û bi Kurdî got: 'Bixwe! Naxwe ez ê li te bixim' Paşê keniya û got: 'Ez tenê bi Kurdî vê dizanim.' Piştî ku ew derbas bû. Uşeyme xanimê got: 'Ew bi eslê xwe ji Diyarbekirê ye. Li Sûrî gellekî dewlemend bû, lê piştî ku wî û dewletê li hev nekir. Em ji ber dewletê hatin vir.' Wexta Ûşeymeyê ev gotin digotin li ber xwe dinêrî, mîna li ber xwe ketibe dipeyivî. Piştre serê xwe rakir û ji Xêrî pirsî: 'Kurê min tu xelkê ku yî? Wexta Xêrî got: 'Ez ji Amedê me.' Pirr kêfa wê hat û got: 'Amedî camêr û hêja ne.' Paşê Ûşeymeyê ji Xêrî re got: 'Kurê min tu çi dixwînî?' Xêrî jêre got: 'Ez beşê dîrokê dixwînim.' Ûşeymeyê piştî ku pariyê xwe cût û xwar weke li cihê mabû dewam kir: 'Tu çima dîrokê dixwînî?' Xêrî ji Ûşeymeyê hez kiribû û mîna jineke Kurd a dilşo dîtibû. Lewma jî bi serbestî axivî û bersiv dayê: 'Ez ji bo gelê xwe dixwînim. Ez dixwazim bibim alimekî mezin. Yanî gellek tiştên nayên zanîn hene, ez dixwazim xwe bigihînim wan. Belkî jî em xwe nas bikin,

em hînê zêdetir rastiyan hîn bibin. Ma ne em yek ji ayetê Xwedê ne.' Ûşeymeyê bi baldarî lê guhdarî dikir. Xêrî pirr tişt digotin. Zêde jî guh nedida rêûresmên bûrjûwaziya nîvfeodal. Hînê heyecan û mîmîkên xwe yên xwezayî yên Kurdistanê wenda nekiribûn. Ji ber vê jî kêfa Ûşeymeyê jî jêre hatibû. Ûşeyme bi temenê xwe yê di ser pêncî salî re têra xwe pijiyayî bû. Kêfa wê ji heyecana Xêrî re hatibû. Lê dixwest tiştekî jêre bibêje; ji bo karibe pêşî lê veke. Bi hêsayî nikarîbû bipeyive. Rewşa xwendekaran a dînî li ber çav digirt. Pirr bala xwe dida axaftina Xêrî û pê dida hiskirin ku gellekî girîng dibîne. Piştî Xêrî jî li xwe hayil bû zêde peyiviye, hinekî bêhn da axaftina xwe. Ûşeymeyê bi rûkenî lê temaşe kir û got: 'Tu xweşsohebet î kurê min. Hêvîdar im tu di xwendina xwe de muwefiq bibî. Mirov carnan bi ayetan dikare xwe bigihîne Xwedê, carnan jî dikare ji Xwedê xwe bigihîne ayetan. Ji bîr neke, ayet rênîşanek in, me digihînin heqîqetê. Ew jî meram û meqsûd e, mirov pê bextewer dibe. Her tişt ji bo mirov e. Lê meqsûd em her li pê ne.' Piştî ku hinekî xwarin xwar bi çavekî dayikê li xwendekarên din jî nêrî û dîsa gotina xwe bi Xêrî re dewam kir: 'Xwendin baş e, bixwîne, lê ji bîr neke, eger tu ji bo gellekî bixwînî divê tu bikeve nava wan, naxwe xwendin bi serê xwe nabe armanc û hedef. Em siyasetê di nava malê de hîn bûn. Naxwe mirov siyasetê hîn nabe.' Ûşeymeyê hinekî keser kişand û dewam kir: 'Mîr Celadet her tişt hînî min kir. Ji rabûna min heta rûniştina min. Ji min re digot; divê ez çawa di nava civatekê de bimeşim. Di nava civatê de bang li min dikir û digot; ez nizanim, ew dizane. Bi zanebûn li min wisa dikir.' Dîsa hinekî bêdeng bû û bi dengekî nizmiktir got: 'Mirov di nava malê de hînî siyasetê dibe'. Ji bo wê jî divê rêûresmek berê hebe, naxwe siyaset meşandin zehmet e.'

Xwendekar piştî xwarin û sohbeteke xweş rabûn, lê bi xwe re pirsek jî anîbûn. Gelo çima mezinekî wan nebû. Ya rastî tifaqeke wan hebû. Hin pîvan û rêzikên wan ji rêûresmên berê yên beriya wan danîbûn hebûn. Her çend hin rêxistinên Îslamî yên mîna Partiya Îslamî ya Kurdistanê PÎK, Hîzbullaha Kurd û Nûrciyên Kurd li dora wan çûbûn û hatibûn jî ew her bi serê xwe mabûn. Ew xwendekarên Kurd bûn. Misilman bûn. Xêrî pirsa Rewşen Xanimê careke din ji Yûsiv kir: 'Çima mezinekî me nîne, çima xwedanekî me nîne?' Yûsiv ji Xêrî re anî ziman ku berê li vir xwendekaran gellek caran ji bo yekîtiyê hewldaye, lê bi serneketine. Gellek caran daweya mezinatiyê li hev kirine. Xislet û taybetmendiyên kesayetiyê rê nedane ku li hev bikin û ji nava xwe kesekî weke mezin qebûl bikin. Heta hin caran hewl dane bi serê xwe rêxistinek an jî partiyekê saz bikin, lê kesekî jê piştrast bin û hemû li dora wî bicivin nedîtine. Jixwe eger hebûna wan a li Rewaqê nebûya, belkî ew koma wan jî nebûya. Dijbermayîna wan bi xwendekarên Tirk re ew neçarî hevgirtineke xurt dikir. Jixwe li gorî gotinê; xwendekarên Kurd ên pêşî hatine bixwînin li bin pira Etebê bi cih bûne. Paşê bihîstine li Rewaqa Tirkan cihên vala hene. Yek ji van xwendekaran jî Şukrî bûye. Mirovekî delodînî bûye. Xwe li hundir qelibandiye û gotiye: 'Ma em jî ji Tirkiyê ne, çima em ê li derve bimînin. Li vir cih heye. Em ê jî li vir bimînin.' Li odeya dawî yanî odeya niha Xêrî têde ye, bi cih bûye. Ji wê demê ve komikeke xwendekarên Kurd li dijî xwendekarên Tirk heye. Yanî li ser hîmê dijberiyê komek çêbûye û dewam dike.

Tevî van agahiyên Yûsiv dan hemûyan jî Xêrî îqna nebûbû ku Kurd nikaribin tifaqekê çêkin. Ji Yûsiv xwest careke din hewl bidin ji bo yekîtiyeke baş ava bikin. Yûsiv jêre got: 'Ez zêde bawer nakim ku ji vê zêdetir em tiştekî karibin bikin, ji ber ku kesekî ku em karibin hemû li dorê bicivin nîne.' Li ser vê, Xêrî Melle Mistefa bi bîr xist û got: 'Çima nebe?' Yûsiv jêre got: 'Bêguman mirovekî baş û durist e, lê bawer nakim ku qebûl bike.' Xêrî dixwest ew careke din xwe biceribînin.

Melle Mistefa ji ber ku zarokên wî hebûn, ji xwe re li Heya Samin xaniyek kirê kiribû û têde rûdinişt. Ji ilmên îslamî hez dikir û disîplîneke xwe ya medreseyê hebû. Bi cefayeke mezin xwendibû û heta wê rojê hatibû. Lewma jî qîmeta xwendinê dizanîbû. Ji xelkê xwe hez dikir û bi tirkan baweriya wî kêm bû, lê alîgir nebû ku qewmiyetperestiyê bike. Wexta Yûsiv û Xêrî çûn serdana wî gellekî kêfxweş bûbû. Ew terbiye û edeba îslamî li hinarkên rûyê wî yên şermok xuya dikir. Li pêşberî wan li ser totikên xwe rûnişt û li halê wan pirsî. Melle

Mistefa xwedî tecrûbe û ezmûn bû û wexta li rewşa wan temaşe kir, fêhm kir ku ji bo tiştekî hatine. Lewma ji wan pirsî ka xêr e. Yûsiv jêre behsa çîroka xwe kir û di dawiyê de ji bîr nekir û got: 'Hevalê Xêrî ji bo vê pirr israr kir.' Melle Mistefa dengê xwe nekir rabû çû çay anî danî ber herduyan. Weke ku nizanibe wê ji ku dest pê bike difikirî. Piştî ku hinekî keniya û bi dilnizmî got: 'Kekê, ya hûn jê behsê dikin zehmet e. Em mirovên gundî ne, nikarin siyaseteke wisa kûr bimeşînin. Em ehlê ilm in. Em ji siyasetê fêhm nakin.' Hinekî navber da axaftina xwe û paşê dewam kir: 'Hûn jî siyasî ne. Binêrin hûn ji min re pêşniyar dikin ku ez bibim mezinê we. Yanî ez ê bibim mezinê we lê hûn ê min bi rêve bibin.' Tevî ku Yûsiv û Xêrî bi taybetî jî Xêrî li ber Seyda geriyan jî pere nekir. Paşka stûyê xwe xurandin û ji mala wî rabûn. Xêrî ji rewşê kêfxweş nebû. Wexta bi otobusa şaredariyê ya bi dev re tijî ber bi Meydana Husên ve diçûn, bêdeng li goristana Qahîreyê temaşe dikir. Goristaneke mezin a Qahîreyê heye. Li gorî gotinê ji 17 mîlyon şêniyên Qahîreyê bi qasî 2 mîlyon kesên xizan di nava vê Qebristanê de dijiyan. Eger jêre jiyan bihata gotin. Qebrên Misriyan hinekî li gorî serdemên fîrewniyan bûn. Her malbatek qebreke xwe hebû. Qebir xaniyek bû. Di nava hewşa xanî de qebrek hebû. Di binê wê de jêrzemînek hebû. Her kesê ji malbatê dimir, ferşên ser qebrê radikirin û li heman gorê bi cih dikirin. Xêrî li goristanê temaşe kir, fikirî û di dilê xwe de got; Li binê goran mirî û li ser goran bedenên guvaştî yên ruh ji wan hatine derxistin.

Li daketina ji otobusê Xêrî ji Yûsiv re got: 'Tu here, ez ê herim hinek qût bistînim ji bo xwarinê.' Xêrî çû cem Amr hinek nok û nîskan bikirre. Dikana Amr hema li ber avahiya Rewaqê bû. Amr xwe li ser kîsên qût û zadê difirot dirêj kiribû. Nargîla wî jî di destê wî de bû. Xêrî li halê wî pirsî. Amr jêre got, gellekî westiyayî ye. Xêrî li sedema westana wî pirsî û Amr jêre got: 'Li her deverê cîhanê şer heye.' Xêrî li ser vê ji Amr re got: 'Ma te çi jê?' Amr li ser vê pirsê xwe hinekî zivêr kir, rabû ser xwe û got: 'Wa! Çawa min çi jê ye. Ew birayên me ne. Li Afganistan, Bosna Hersek û gellek deverên din şer dikin.' Xêrî bi henekî dîsa jêre got: 'Baş e, ew şer dikin tu çima diwestî?' Li ser vê yekê Amr hedîsa pêxemberê Xwedê yê silav û selam li ser bi bîr xist: 'Bawermend mîna yek wucûdî ne, wexta azayek biêşe wucûd hemû pêre nerehet dibe.'

## ( 18 )

### BÊ XWEDÊ DIBE, BÊ XWEDÎ NABE

Li ber deriyê Rewaqê maseyek hebû û li ser wê kartoneke piskuwîtan hebû. Posteyê nameyên ji xwendekaran re dihatin dixistin vê kartonê. Li her kesî vekirîbû. Ji ber ku netenê nameyên xwendekarên Rewaqê her weha nameyên xwendekarên li derveyî Rewaqê li malan jî diman dihatin vê derê. Xwendekarên li derve diman, wexta zanîngeh diqediya piraniya wan vedigeriyan û hinek ji wan diman. Lewma her tim navnîşanên wan diguherîn. Ji Xêrî re kesekî name bişîne tinebû, lewma jî li qutîkê nedinêrî. Rojekê Yûsiv ji Xêrî re got: 'Ji te re nameyek hatiye.' Xêrî jê bawer nekir. Fikirî ku Yûsiv henekê xwe pê dike. Lê wexta Yûsiv name dirêjî wî kir, mat ma. Li ser zerfê tiştek nedinivîsand. Bi lez zerf vekir û kaxiz jê derxist. Her xwend madê wî xirabû. Yûsiv jî bi meraq lê dinêrî. Yûsiv wexta dît deng jê nayê, jê pirsî bê ka çi qewimiye? Xêrî jêre got: 'Name ji Melle Nûrî hatiye. Dibêje; Seydayê Melle Ehmed wefat kiriye.' Hinekî bêdeng bûn. Paşê Xêrî hinekî ji Yûsiv re behsa Seyda kir û got: 'Ew mîna behrê bû. Xwedî ilmekî mezin bû. Belkî jî mîna marekî reş ê binê zinaran bû. Haya kesî jê nebû. Min timî his dikir ku di dilê wî de gellek tişt hene, nikare bibêje. Ez gellek tiştan ji wî hîn bûm. Xwedê rehma xwe lê bike.' Xêrî kêliyekê bêdeng ma, paşê ji nişkê ve veciniqî û got: 'Ez berî bêm vê derê kaxizek dabû min û xwestibû, ez kengî Erebî hîn bibim vekim û bixwînim.' Xêrî yekser bazda çû odeya xwe û kaxiza Seyda dabûyê derxist. Guh dabû gotina

Seydayê xwe û heta wê rojê ew kaxiz venekiribû. Niha ji bo wî ew kaxiz gellekî bi mane bû û meraq dikir, ka Seyda jêre çi nivîsandiye. Seyda bi wan xetên xwe yên dahiyane û delal li ser kaxizê ser û pozên herfan xweş li hev badabûn. Li ser kaxizê tenê du rêz hebûn. Wexta Xêrî bala xwe dayê, dît ku nivîs bi Erebî nîne, lê kurdiyek bi herfên erebî ye. Xêrî ji ber ku çend pirtûkên bi Kurdî yên bi herfên erebî li ber destê Seydayê Melle Ehmed xwendibûn, jêre zehmet nebû bi Kurdî bixwîne. Lê ji ber ku Seyda ji bo nivîsê xweş bike, herf gellekî li hev badabûn û vê yekê jî dikir ku Xêrî giran bixwîne. Xêrî wexta hevoka pêşî xwend veciniqî: 'Bê Xwedê dibe.' Sawek li dilê wî ket û serê xwe rakir û yekser li kaxizê neherî û dewam kir: 'Bê xwedî nabe.' Mat ma. Di ber xwe de got; yanî çi? Hê jî di ber xwe de difikirî. Gelo Seyda çima bi Kurdî nivîsandibû? Ma ne diviyabû bi Erebî binivîsanda? Ya din jî Seyda çima gotinek bi vî rengî nivîsandibû. Ji ber ku gotin mîna ku ji xeta bawerî û îmanê derketibe xuya dikir. Bêguman Xêrî ji bo Seyda nedixwest tiştekî wisa bifikire, lê Seyda bi vê xwestibû çi bîne ziman. Xêrî di hişê xwe de hinekî birûanî, ji nav derneket û rabû xwest ji Yûsiv jî bipirse. Yûsiv wexta pêşî xwend got: 'Ev gotina pêşiyan e.' Xêrî jê pirsî: 'Tu çi jê fêhm dikî. Yanî çawa bê Xwedê dibe, bê xwedî nabe.' Yûsiv hinekî li ber xwe nêrî û got: 'Bi ya min Xwedê û xwedî yek tişt in. Li gorî ku Seyda gotiye, ew jî bi vê maneyê radibe û xwestiye balê bikişîne ser girîngiya xwedanekî.' Xêrî bi vê şiroveya Yûsiv hinekî dilxweş bûbû, lê dîsa jî wî guman dikir ku Seyda dixwaze hînê tiştekî hûrûkûr jêre vebêje. Lewma diviyabû li ser bifikiriya. Pêjna rûyê nûranî yê Seyda li ber çavê wî çêbû. Seyda pêre digirnijî, ew jî di ber xwe de girnijî û careke din got: 'Xwedê rehma xwe lê bike.'

## ( 19 )

**Xwedê cara ewil ji sirra hezkirina xwe**
**gewherekî sipî afirand û kotreyek afirand**

Îmtîhan nêzîk dibûn û hewcedariya Xêrî bi alîkariyê hebû. Ev yek jî ji Yûsiv re anî ziman. Yûsiv jî jêre behsa Kurdekî Başûrê Kurdistanê kir û got: 'Ji Hewlêrê ye. Navê wî Şêrko ye. Di warê dîrokê de doktora dike. Lê zêde têkiliya wî bi kesî re nîne. Mirovekî zana ye. Jixwe ji Kurdên Iraqê weke xwendekar ew tenê ma.' Xêrî bi vê yekê kêfxweş bû û bi Yûsiv re lêxistin çûn mala Şêrko ya li Hey Samin (Taxa Heştan).

Mirovekî bejin kinik û rûken derî li wan vekir. Kincên kurdî yên bela wela lê bûn. Şalê wî gellekî jêre mezin bû û ji bo nekeve nav lingên wî bi aliyekî ve girtibû dikişand jor. Bi xweşhalî xêrhatina wan kir. Tevî ku li hundir kursiyên wî hebûn jî ew li erdê rûnişt û ji Yûsiv û Xêrî jî xwest ew li erdê rûnên. Bi soraniya xwe ya nîvkurmancî xweş dipeyivî. Zarxweş û devliken bû. Ji şêl û rûyê wî zanebûn û têgihîştina wî diyar bû. Yûsiv piştî ku merama serdana xwe jêre got, bi serê çavan li Xêrî temaşe kir û got: 'Kake tu jî ji Amedê yî?' Xêrî serê xwe hejand û got: 'Belê' Paşê Şêrko ji Yûsiv re got: 'Kake, eger karê te heye, tu here bila Xêrî îşev li cem min bimîne.' Li ser vê yekê Yûsiv destûra xwe xwest û rabû.

Diyar bû, di nava Qahîreyê de Şêrko bi tenê bû. Ji rabûn û rûniştin, reng û deng, çand û rêûresmên kurdî pirr hez dikir. Ji hundirê odeya wî jî ev yek diyar bû. Bêhna kurdî ya ji Xêrî dihat yekser his kiribû û xwestibû vê hesreta xwe pê bişkîne. Eleqeyek wî ya taybet ji kesayetên Amedê re hebû. Mîna dixwest dîrokê di şêl û şemala wan de bibîne. Bi dîtina Xêrî pirr kêfxweş bûbû û ev yek her anî ziman û paşê ji Xêrî pirsî: 'Kêfa te ji dîrokê re hat?' Xêrî hezkirina xwe ya ji dîrokê re anî ziman û got: 'Ez dixwazim zêdetir li meseleyan hûrûkûr bibim.' Şêrko jêre got: 'Baş e.' Û yekser rahişt pirtûkên Xêrî hinekî çav li wan gerand. Paşê

pirtûk danîn serhevdu û got: ‘Niha van pirtûkan ji bîr bike. Ji ber ku wexta tu guhê xwe didî hemûyan, tu tevlîhev dikî. Em ê bi xetên sereke bigirin û biçin.’ Şêrko jêre xal bi xal li ser kaxizan rêz kir. Pirr bi zimanekî hêsan vedigot û heta carekê Xêrî jêre got: ‘Kake ma wisa bi hêsanî dibe?’ Şêrko keniya û got: ‘Kaka, hêsan nîne ez hêsan dikim.’ Di nava saetekê de Şêrko pirtûka dersekê bi tevahî ji hev derxist. Xêrî bi vê gellekî kêfxweş bûbû û pê hesiya ku di dersdanê de rêya Şêrko şopandî gellekî balkêş bû.

Piştre Şêrko dîsa bi destekî bi şalê xwe girt kişand jor û rabû xwarinê çêke. Ji Xêrî re got: ‘Ez ê îro xwarineke xweş a Hewlêrê çêkim.’ Di ber re jî dengê muzîsyen Tahir Tewfîq dihat û digot: ‘Ne ji bo mirdin, bimre bo jiyan.’ Xêrî jî rabûbû li pirtûkxaneya Şêrko temaşe dikir. Gellek pirtûkên bi Erebî, zaravayê Kurdî Soranî û çendek jî Ingilîzî hebûn. Paşê li ber deriyê aşxaneyê sekinî li çêkirina xwarinê temaşe kir. Şêrko pêşî goştê mirîşka xwe xist qûşxaneyê û paşê du serî pîvaz hûrkirin û avêtin navê. Bîstekê goştê mirîşkê keliya û pîvazên di navê de heliyan. Piştre birinca xwe ya ji Qeterê anîbû bera ser da. Agirê binî kêm kir. Di vê navê de hinek mewîjên xwe di nava rûn de sor kirin. Hinek baharat jî tevlî kir. Qûşxaneya xwe bermeqlûb berda ser tepsiyeke fireh û hînê keldûman jê radibû, mewijên xwe yên sorkirî rijandin ser. Şêrko bi serê tiliyên xwe libên birinca germ avêtin devê xwe, zoq li jor nêrî û got: ‘Himmm, tehma wê xweş bûye.’ Paşê hinek goşt û birinc li nava nanê lewaş ê misrî gerand û dirêjî Xêrî kir. Li rûyê Şêrko gellek mîmîk û livên manîdar hebûn. Xêrî pê kêfxweş bû. Li hemberî xwe mirovekî zindî dîtibû. Xêrî ji nişkê ve pê hesiya ku ji bo nimêjê dereng bûye û rabû nimêj bike. Şêrko şuşdeya li quncikê raxistî îşaretî wî kir. Bala Xêrî kişand ku Eskerî nimêjê nake. Ji bo jê bipirse neksa xwe jê kort kir, lê nikarîbû bi meraqa xwe û pirsî: ‘Ma tu nimêj nakî?’ Şêrko bêyî ku li rûyê Xêrî temaşe bike got: ‘Ez carnan dikim.’ Lê wî jî dizanîbû bersiva Xêrî li bendê ye ev nîne. Lewma hinekî sekinî û wî ji Xêrî pirsî: ‘Mirov çima xwarinê dixwe?’ Xêrî ferq kiribû ku Şêrko ji bo merama xwe jêre bibêje pirsê dike. Lewma xwest bersiveke pê nehulkime bide. Bêhnekê fikirî û got: ‘Mirov ji bo pê bijî û xwe îdame bike.’ Muhamed Eskerî bi kêfxweşiyek ku bersiva li bendê girtibe got: ‘Bala xwe bidê, sedemên tiştan hene. Mirov bêsedem tiştan nakin. Hewcedariya mirov bi hin tiştan heye. Xwedê dibêje: ‘Nimêj we ji tiştên qedexe û xirab diparêze.’ Eger sedem rabe, wê wextê hukim betal dibe.’ Şêrko hînê dipeyivî, Xêrî ket nava axaftina wî û got: ‘Tu jî weke Fena Fîllahan difikirî.’ Şêrko girnijî û gotinên xwe dewam kir: ‘Na na, fenafillah berî mirinê xwe mirî dihesibînin. Xwe bi Xwedê re yekbûyî difikirin. Lewma bawer dikin ku nefsa xwe kuştine. Wexta wisa difikirin jî bawer dikin ku êdî li ser wan ti tişt ferz nîne. Lê ez wê nabêjim. Ez dibêjim; eger xwarin te têr neke, hewce nake tu xwarinê bixwî.’ Şêrko ji nişkê ve rabû ser xwe, şalê xwe kişand jor û çû aşxaneyê çaydank danî ser agir. Bi lez piştre vegeriya û got: ‘Were em li şaneşînê rûnên û li wir çaya xwe vexwin.’

Li şaneşînê Xêrî ji Şêrko pirsî; gelo di çi warî de doktorayê dike. Şêrko jêre got: ‘Ez li ser dîroka kevnare radiwestim û bi taybet jî ez li ser bîr û hafiza civakê lêkolîna xwe hûrûkûr dikim.’ Piştî bêhndanekê Şêrko li Xêrî zîvirî û pirsî: ‘Te çima beşê dîrokê hilbijart?’ Xêrî jî weha lê vegerand: “Ya rastî, min dixwest ez bibim alimekî mezin. Lê wextê ez hatim vê derê min got ez hem dikarim bibim alim û hem jî dikarim beşê dîrokê jî bixwînim. Ji ber ku min timî xwest xwe bigihînim rastiyê û hînê jî ew xwesteka min heye.” Şêrko rabû bazda çû çaydan anî û piştî ku qedeh dagirtin bi girnijîn got: ‘Ew hisa te gellekî baş e. Jixwe mirov li rastiyê negere hînî tiştekî nabe. Rastî jî timî guherbar e. Li gorî şert û mercan xwe çêdike. Lewma dibêjin; rastî gotineke îzafî ye. Yanî guherbar e.’ Piştî ku Şêrko qurtek li çaya xwe xist û bêhn da axaftina xwe Xêrî yekser pirs kir ka çima ew li ser bîra civakî hûrûkûr dibe. Şêrko bi vê pirsê kêfxweş bûbû. Wî jî dixwest behsa lêkolînên xwe bike û got: ‘Bêguman ez zêdetir li ser dîroka kevnare ya Kurd û Kurdistanê hûrûkûr dibim û diponijim. Li gorî lêkolînên min ên heta niha Kurd yek ji gelên kevnare yê herêma Mezopotamyayê ne. Beşekî mezin ê bîr û hefizeya civakî bi têgîna Xwedê heye. Em bi zaravayê Soranî jêre dibêjin Xwe. Hûn bi kurmancî dibêjin; Xwedê. Hinek Zaza yan jî Dimilî dibêjin; Homa an Heq. Baş bala

xwe bidê, ev gotinên Kurd bi kar tînin beriya Îslamê ne, û ji têgîna Ellah vediqetin. Ez niha lêdikolim gelo ji van têgînan çi di bîra Kurdan de maye. Di dîrokê de gelê Kurd hîmê şaristaniyê danî. Yekem car gund ava kirin. Pez û dewar kedî kirin û xwedî kirin. Destar çêkirin. Genim çandin û hêran. Civakeke xwezayî ye. Xwe bi xwezayê re nas dike. Bi wê re xwedî li xwe derdikeve. Lewma jî xwedî lê derdikeve. Bi wê jî dîsa xwe dibîne. Yanî pênaseya Kurd e. Ev gelê di dîrokê de pirr şop hiştî piştî hin heyaman lanet lê tê barandin û weke qewmekî gunehkar her tim tê kuştin û talankirin. Lê di dîroka Kurdan de cihê çiyan jî gellekî girîng e. Kurdên Êzdî, Elewî, Yaresanî û heta Durzî bermahiyên vê belayê ne. Kes hînê bi temamî nizane dîrokê guneh, qeda û bela li çi barand. Gelo ya guneh, kîjan rastî bû? Lê tam rastî nayê zanîn. Gelo agirê pîroz kirin guneh ku agir rastî û zanînê îfade dike? Dîroka Kurdan dîrokeke welê ye, di tariyê de hatiye hiştin. Tevgerên ji ber belayê mane jî batinî ne. Yanî di zikê xwe de mane. Em tenê dikarin bi bîr û hafiza gihiştiye me pê derxin û bizanibin. Ew jî ji çîrok, çîvanok, berhemên dîrokî, jiyana heyî ya dewam dike û kilamên kurdî tê fêhmkirin.' Şêrko piştî qurtek li çaya xwe xist dewam kir: "Ji bo têza xwe ez îsal diçim Başûrê Kurdistanê. Ez ê li herêma Şêxan li Laleşa Nûranî hin lêkolînan bikim. Eger tu bixwazî em dikarin bi hev re biçin." Xêrî di cîh de qebûl kir. Ji vê yekê Şêrko jî kêfxweş bû û bi vê kêfxweşiyê rabû ji pirtûkxaneya xwe hinek pirtûk danîn. Bi rûkenî li Xêrî temaşe kir. Rahişt pirtûkekê û ji Xêrî re got: "Tu dizanî ev Tewrat e. Binêre di beşê afirandinê de çi dinivsîne. **Xwedê li Adenê baxçeyek çêkir. Ademê afirandibû jî danî wir… Ji nava Adenê çemek derdikeve, baxçe av dide û vediqete çar milan. Navê çemê ewil Pîşon e. Navê çemê diduyan Gîhon e. Navê çemê sisiyan Dîcle ye. Navê çemê çaran jî Firat e.** Bala xwe bidê pirtûkên pîroz jî weke cennetê behsa Kurdistanê dikin. Ma ne Quran jî dinivsîne ku keştiya Nûh xwe li serê çiyayê Cûdî daniye. Niha tu fêhm dikî Xêrî ez bi pey çi ketime. Ez bi pey vî welatê ku di pirtûkên pîroz de weke cennetê tê binavkirin ketime. Bêguman, ez ne bi pey cografyayê, ez pey mirovên wê ketime. Binêre di Tewratê de wekî din çi dibêje; Xwedê ji Adem re ferman kiriye ku li Baxçe (cennet) tu dikarî her mêweyê bixwî, lê ji mêweya zanînê ya dihêle tu qencî û xirabiyê ji hev bikî, nexwe. Eger tu bixwî tu yê bimirî. Ez meraq dikim, li vê cennetê çi qewimî. Agirê pîroz li vir hilat û heta qesrên Zerdeştiyan çû. Lê çima ev çend lanet li serê vê cennetê yan jî qewmî hat barandin. Çi bi qewmê cennetê hat. Eger ev kurd in, çima wilo lanet li wan hatiye barandin." Şêrko bêdeng bû û fena ku hişê wî çû ser tiştekî din sekinî. Ji nişkê ve destê xwe avêt pirtûkeke din û got: "Tu zanî ev çi pirtûk e?" Xêrî hînê bersiv nedabû wî dewam kir û got: "Ev yek ji pirtûkên Êzîdiyan **Mishefa Reş** e. Weke pirtûka Şêx Hadî tê qebûlkirin. Lê keşeyekî ji ber devê Êzîdiyekî nivîsandiye. Pirtûkeke piçûk e. Pênc şeş rûpel in. Binêre çend xalên wê gellekî balkêş in. Li ser afirandinê weha dibêje; **Xwedê cara ewil ji sirra hezkirina xwe gewherekî sipî afirand û kotreyek afirand. Navê wê Enfer danî û gewher danî ser piştê û çil hezar salî li ser rûnişt.** Binêre di xaleke din de jî dibêje; **Beriya hatina Îsa ya vê cîhanê diyanetek me hebû jêre digotin pûtperestî. Cihû, Xiristiyan û Îslamê dijberiya diyaneta me kirin û Eceman jî kir.** Balkêş e, ne wisa? Lê tu dizanî ez dîsa jî yek bi yek bi gotinên van pirtûkan ewle nînim. Ji ber ku her tiştê li ser Kurdan bi destê xelkê hatiye hûnandin, tehrîf têde hene." Şêrko dîsa bêdeng bû û ponijî. Xêrî bi dengekî nizm ket nav vê ponijînê û jê pirsî: 'Ma tu bawer dikî ku tu bersiva pirsên xwe li Laleşê bibînî?' Şêrko girnijî, rabû pirtûk xistin pirtûkxaneyê û got: "Eger hemû nebin jî ez bawer dikim ku ez ê hinek tiştan peyda bikim."

## ( 20 )

LALEŞA NÛRANÎ

Berêvar bû. Erebeya Xêrî û Şêrko dibir li ber xaniyekî sekinî û şifêr ji Şêrko re got: "Kake ev der mala Pîr Şeref e." Şêrko pirranî ji Xêrî re behs nedikir wê ji ku çawa biçin kîjan deverê û li ku bimînin. Xêrî jî zêde rê nedidît ji bo bipirse. Şêrko mîna ku ji Xêrî re bike suprîz tevdigeriya. Zilamekî por, rih û simbêlên wî dirêj derket ber derî û ew pêşwazî kirin. Bi hesret xêrhatina Şêrko kir. Piştre bi çavên gumanbar li Xêrî temaşe kir û got: "Ev kî ye?" Şêrko bi kêfxweşî jêre got, ew jî hevalekî wî ye. Pîr Şeref mêvanên xwe birin hundir û got: "Destûra min bidin ez ê nimêja êvarê bikim." Pîr Şeref pêşî destnimêj girt û paşê berê xwe da rojê û got:

Ya siwarê rojhilatê, rojavayê
Hûn bidene xatira dotê û dayê
Hûn me xilas kin ji qedayê, ji belayê
Hûn bidene xatira kaniya sipiyê
Ya şêşims tu halê mala xwe bipirsî û me jî vê carê
Hûn bidene xatira erş û kursî Ga û masî
Heyat, li kursî …

Pîr Şeref mirovekî mutedeyîn bû. Rojê pênc caran nimêj dikir. Nimêja berê sibê, nimêja rojhilatinê, nimêja nîvro, nimêja êvarê û nimêja rojavabûnê dikir. Tevî vê yekê, Pîr Şeref qewlên Êzîdiyan baş ji ber bû. Kurdiyeke xwe ya xweş hebû. Xweşzar û xweşsohbet bû. Kesekî serwext û têgihiştîbû. Hay û baya wî ji dinyayê hebû. Mêvanperwer bû. Ji ber vê yekê, gellek misilmanan jî jê hez dikir. Li ser Êzdayetiyê jî têra xwe xwedî agahî û zanîn bû. Haya wî ji dînên din jî hebû. Jixwe ji vê bû, Şêrko hatibû serdana wî. Dixwest lê guhdarî bike û bersiva gellek pirsên xwe li cem wî bibîne. Xêrî jî matmayî li rûyê nûranî yê Pîr Şeref temaşe dikir. Bi awayekî wisa lê temaşe dikir, mîna mirovekî hewl bide ji bo nivîsên li ser zinaran bixwîne bala xwe dabû rûyê Pîr Şeref. Xêrî nizanîbû çima lê di rûyê Pîr Şeref de xetên heyî pirr esrarengîn his dikirin. Nizanîbû nav li wan bikira, lê dibûn sedem di bin bîra wî de hinek tiştên bi wan dernexistiye bilebitin.

Pîr Şeref jî dizanîbû Şêrko çima hatiye cem wî. Lewma li ber xwe nêrî, hilmek li cixareya xwe xist û bi rûkenî dest bi qewlekê kir.

Mestim sikranim
Nêçîrvanê bazanim
Aşiqê surra giranim

Xwedawendê me tiştî dinasî,
Durra kasê jê kir esase,
Jê peyda kir mêrê xase,

Xwedawendê me rehmanî,
Kasa surrê ji adem ra anî,
Av ji kasê vexwar, vejiya,
Cîda mest bû, hejiya,[3]

[3] Ji pirtûka Yezidism-Its Background, Obersevances and Textual Tradition a kurdolog Philip G. Kreyenbroek hatiye girtin.

Di vê malikê de Şêrko veciniqî û ji nişkê ve, bi heyecanekê, bi awayekî li usûlê nebe, got: “Pîrê min bibexşîne, di vê malikê de mebest ji kaseyê çiye?” Pîr Şeref li ber veciniqîna Şêrko matmayî nema û dîsa bi girnijîneke têrtijî û kamilbûyî got: “Dînê me, dînekî surrê ye. Mirovî timî nêçîrvanê wê ye. Eve hemû surrên Xwedê ne.” Şêrko xwe negirt, xwe dîsa çeng kir û pirs kir: “Erê Pîrê min, lê ez dixwazim bizanibin tu ji wê gotina kaseyê çi fêhm dikî?” Pîr Şeref ji ya xwe nehat xwarê û bi heman awayî gotinên xwe dubare kirin. Şêrko hinekî bêgav û neçar bû. Li ya digeriya bi temamî nedigihiştê. Diyar jî nebû, ew li tiştekî digeriya û dixwest bibîne yan jî bi ser tiştekî nû ve dibû. Di wê navberê de Pîr Şeref bêhnek da û bi cixareya xwe re mijûl bû. Xêrî jî bi meraq di vê bêhndanê de keys dît ji Şêrko bipirse bê ka ji wan malikan ew çi fêhm dike. Şêrko bi dengekî nizm jêre got: “Di diyanetên Cihû û Mesihiyekan de Kase bi maneya tasê tê gotin. Lê tê gotin maneya wê ya rastî jin e. Ez niha dixwazim bizanibim, gelo li vir bi heman maneyê tê fêhmkirin. Durra kase jî jê hatiye çêkirin baş nayê fêhmkirin, heye ku ew gewherê mirovî jê hatiye afirandin e.’ Piştî ku Şêrko lê hayil bû, Pîr Şeref li benda wan e, ji bo ew gotinên xwe biqedînin ji Xêrî re got: “Em paşê biaxivin.” Pîr Şeref ji eleqeya Şêrko kêfxweş bû. Lewma xwendina qewlên xwe dewam kir. Ew şev bi qewlan û axaftinên li ser Ezdeyatiyê bihurî. Ji ber ku qewlên dihatin xwendin bi kurdî bûn û dişibiyan malikên Feqiyê Teyran li wî xweş dihatin û bala wî dikişandin. Tehmeke xweş di kurdiya qewlan de hebû. Bêhna kevinbûn û sirran ji wan dihatin. Mîna ku rîşên wan bigihîjin binyad û kokên nepenî hatibin hiştin.

Berî ne qelem hebû ne lewhe
Me yarek divê vê herfê şiro biket...

Nûr ji nûrê şifqî
Sibhane ji te xaliqî
Meleke li ber tifqî...

Miskîno jaro Ademo
Ev dinya mestxane ye
Wek xewna şevane
Her ro yara hinane...

Ew surra min dikuje
Dest û ser û pê û qalib nijî
Miskîno bîn Ademo hil û bijî... [4]

## ( 21 )

Li geliyê Laleşê perestgeheke piçûk. Mîna ku xwe avêtibe bextê çiyê. Stargeheke qewmê çiyê. Çend ferman rabûne kes nizane, lê her tim heftê û du ferman tê gotin. Mîna şopeke Xwedê li vir maye. Kesî tiştek nenivîsiye. Yekî ji yê din re gotiye û hatiye. Sirrên dilan, dilan hilgirtine. Belkî ji tirsan be, herfek li dawiyê nehiştine. Belkî jî nûra nûran di rohniya çavan de yan jî di rohniya dilan de hilandibin û hebandibin. Qewlên Ezdahiyê.

[4] Ji pirtûka Yezidism-Its Background, Obersevances and Textual Tradition a kurdolog Philip G. Kreyenbroek hatiye girtin.

Qewlên bi surran barkirî. Ji heyamên cihê tên. Ji her serdemekê gotinên nû yên pîroz li qewlan hatine barkirin. Di nava bêhndanên wan de nefes hebû. Her nefes û hilmek sirreke xwedayî bû. Mirov jî nêçîrvan û şopgerê vê sirrê bû. Bazên sirrê, çavên xwe dijwar bûn. Durr nas dikirin û dizanîbûn bi ser ve bibin. Ji sirra hezkirina Xweda kaseya jiyanê hatibû afirandin û mirov bi vexwarina ji wê vejiyabû. Ehlên sirrê, qewlên sirra jiyanê li wan barkirî tenê ji ber kiribûn û pirraniya wan ji bîr kiribûn. Ji lewra jî xem nexwaribûn û hin qewlên şapinêzê bi nav ve kiribûn. Avahiya Laleşa Nûranî jî weke qewlan pînekirîbû. Heyam bi heyam kevir li hîmên xwe zêde kiribûn.

Li ber deriyê Laleşa Nûranî Şêrko û Xêrî pêlavên xwe ji pê kirin û dergevanê li ber perestgehê da pêşiya wan. Li milê rastê yê deriyê ketinê li ser keviran şiklê marekî reş hebû, bala Xêrî kişand. Ji dergevan pirsîn û ji wan re got: “Marê Reş li cem me pîroz e, nayê kuştin.” Diyar bû, dergevan ji vê yekê zêdetir nizanîbû. Ji nişkê ve hat bîra Xêrî ku diya wî jî behs dikir, marê reş pîroz e, û kuştina wî guneh e. Li serê gellek quncikan çirayên agir ên bi zeytê vêdiketin hebûn. Feqîrek li ber agirekî çirayê sekinîbû û îbadet dikir. Şêrko li ser milê xwe li Xêrî zîvirî û got: “Di çanda kevnare ya Mezopotamyayê de cihê agir û rojê gellekî girîng e. Lewma ji bo xaliq gellek caran Nûra Nûran hatiye gotin. Bîne bîra xwe melekê Xwedê yê ji agir ango ji nûrê kîjan e?” Şêrko pirr bi lez hînê Xêrî nepeyivîbû, dengekî nizim di bin guhê Xêrî de got: “Eman tu navê wî nebêje. Êzîdî aciz dibin.” Şêrko paşê axaftina xwe dewam kir: “Binêre ew melekê ji Nûrê yan jî agir hatiye afirandin paşê gunehekî mezin lê tê barkirin. Jixwe di Quranê de jî melekê em behsa wî dikin, ji Adem zanetir tê qebûlkirin. Dîsa bîne bîra xwe ku di Tewratê de jî Adem û Hawa ji mêwa zanînê dixwin û pê gunehkar dibin. Bala te dikişîne di vê nûr û agirî de zanîn heye. Zanîn bi gunehekî mezin hatiye rûreşkirin. Bi tevahî dînên ezmanî, nalet lê barandine. Çawa ehlên Zendayê bi zendeqeyî hatine gunehbarkirin. Her weha çawa hin mirov bi durzîtiyê xirab têne nîşandan. Dîsa belkî ehlê Manî bi manyaqiyê. Di vê gunehkariyê de para bingehîn dikin a jinê.” Şêrko hem bi baldarî li mîmariya Laleşê temaşe dikir û têbînî dinivisîn, hem jî bi Xêrî re dipeyivî. Xêrî bi tevahî mane nedida gotinên wî, lê hin meraqên wî jî di serê wî de dizîzikîn û ew li bendê bû di bêhndanên Şêrko de wan bipirse. Yek ji wan meraqên wî jî fîgurê marê reş bû. Ji lewra ji Şêrko pirsî: “Gelo çima heywanekî bi jehr pîroz dibe?” Şêrko hinekî sekinî; “Ez baş nizanim, lê dibêjin; bi sedema ku mar kirasê xwe diguhere, tê bawerkirin ku ew namire, lewma çavkaniya jiyanê yan jî weke jiyanê dihat dîtin.” Muhamed Eskerî hinekî mîna bêhnê negire û nede sekinî û paşê got: “Hinek jî dişibînin jinê.” Dergevan ew birin cihê Ava Zemzemê. Li kêlekan gellek kûzên zeytê hebûn. Ji zeyta wan agirên li hemû quncikan dihat vêxistin. Xêrî meraq kir ka çima Ava Zemzemê di bin erdê de ye. Lê ya dilê xwe nepirsî û zîvirî riya din a baramberê riya Ava Zemzemê pirsî. Dergevan jêre got: “Ew cihê xelwetê yê Şêx Adî ye.” Dergevan li pêşiyê û Şêrko li pey wî çûn Ava Zemzemê. Lê Xêrî bêyî karibe bi lingên xwe ket riya Xelwetê û çû hundir. Cihê xelwetê dihişt ku mirov bifikire. Xêrî jî ew bêhna fikirandinê ji hucreyê kir. Gellek mijar di serê Xêrî de tevlîhev bûn. Eger gellek tişt sembol in, gelo heye ku Teyrê Sîmir û Marê Reş ên di çîroka diya wî de marê reş ê îro û Melekê Tawis bin. Xêrî difikirî û pêre pêre dengê qewlan di guhên wî de dikir xumîn. Li aliyê din, ayetên Qurana pîroz li ber çavên wî rûpel bi rûpel qulibîn. Paşê Ehda Qedîm û Ehda Cedîd û heta gatayên Zerdeşt, gellek pel û pirtûk daketin xwarê. Mîna şevbêrka dîn û diyanetan bigere. Xumam û xumînek bi hundir ketibû. Li quncikeke tarî ya hucreya xelwetê tiştekî dibiriqî li ber çavê Xêrî ket. Her ku Xêrî nêzî wê bû, rohniya wê zêde bû. Mîna roja Şemsiyan li çavê wî bide dibiriqî. Xêrî bala xwe dayê ew durrek bû. Wexta tilliyên xwe dirêjî wê kir, durr hînê zêde birriqî û bi terka erdê de çû xwarê. Xêrî her xwe dirêjî wê kir, ew jî pêde daket xwarê.

# ( 22 )

**Her tişt li cewherê xwe vedigere**

Bi qedandina çîrokê re ez veciniqîm û hilçenîm. Ez bi çîrokê ve çûbûm xwarê. Di nava rêzan de mîna Xêrî di terka erdê re biçe xwarê ez jî di nava pelên defterê de noq bûbûm. Di tevahiya çîrokê de min nasnameya nivîskar peyda nekir. Lê ji nivîsê diyarbû ew çîroknivîsekî xurt bû. Bi hostayî li gotinên xwe mane barkiribûn û bi zimanekî rewan nivisîbû. Min di dilê xwe de got; xwezî min ev camêra nas bikira. Ji ber ku bi rastî gelek deverên ez lê mabûm, wî bi hostayî anîbûn ziman û qal kiribû. Di warê hûnandin, lihevanîn, fesilandin û ramanê de jî têra xwe serketîbû. Gelo çima çîrokeke welê li pey xwe hiştibû. Yan jî ew weke gelek Kurdan bi ku ve teriqîbû, derbeder bûbû. Nivîskarê çîrokê ji min re bû kulek û meraqek ket dil û hişê min. Heye ku yê di terkê re çûbû xwarê ew bi xwe bû. Lê dîsa jî ez ji vê yekê piştrast nebûm. Ji ber ku di gelek xetên wî de ez bi xwe hebûm. Ne tenê ez, gelek sîmayên reng dabûn wan ji yên ez bi wan re mabûm, bi wan re dabû û stendibû, bi wan jiyabûm dûr nebûn. Ji lewra di nava çîrokê de min rengê wî nedidît. Lê ji fikr û hizra wî ya di çîrokê de min ew weke mirovekî maqûl anî ber çavê xwe. Wexta min li Qahîreyê dixwend, gelek mijarên wî behsa wan kirine, min nikarîbû lê serwext bibim. Bi vê têgihiştina xwe çawa li vir di qalikê xwe de hilatibû. Belkî ji vê bû, mirov xwe nedigirt û li aqûbeta wî difikirî. Tevî ku ez gelekî westiyabûm, mîna ku ez bi xwendina çîrokê bi ser xwe ve hatibim, bi berê sibê ve tevzînok hatin min. Ez rabûm ser xwe û min dît ku hevala min jî xwe nîvtazî li ser nivînê dirêj kiriye. Min li wê dûvdirêj temaşe kir. Min xwe gunehkar his kir. Ji ber ku ez wer hizirîm ku êvarê min dilê wê hiştiye. Min xwe hê jî mafdar dizanîbû. Lê wexta min xwe dixist şûna wê, min heq dida wê jî. Bêguman bi vê jî ez diêşiyam. Di xew de çend bêguneh û bêqusûr bû. Bedena wê ya têr jî mîna karxezalekê şayîk bû. Destên min dixwestin xwe lê bigerînin û wê xurt his bikin. Lê dilê min rê nedida ku destên min li bejna wê bigerin û wê ji rewşa bêguneh rakin. Deng bi melleyên mizgeftên Qahîreyê ket. Bi deng re wê xwe devrû dirêj kir. Mîna karxezalekê zivêr nekim, min bi tirs xwe hinekî vekişand. Paşê ez dîsa hêdî hêdî nêzî wê bûm. Destên min ji wê nedibûn. Binkiraskê xwe yê tenik û rengesor li xwe kiribû. Ji ber ku min timî jêre digot; rengê te yê sor min dixirîne, ev binkiraskê sor li xwe dikir. Bi rastî jî belkî ji wê be Kurdan gotiye: “Bila sor be, pênc qurişê wî zêde bin.” Binkiraskê wê kişiyabû heta ser kemaxên wê. Gulokên kemaxên wê têra xwe li hev bûn. Binkiraskê wê jî heta derzika wê ya serpiştê vekirîbû. Min hêdî destê xwe bir navmilên wê û hêdî daxist heta ser derzika pişta wê. Bi awayekî lê xweş hatibe xwe hêdî livand. Min destê xwe ji derzika nav pişta wê dîsa bir heta navmilên wê û ji wir jî min destên xwe li nav porê wê gerand. Pêre min hinekî din jî xwe nêzî wê kir. Bi şeveqê re surra hênik tevzînok û girîzok bi nava mirov dixistin. Ji lewra germahiya bedenan têra xwe ji dil û manedar bû. Min xwe li kêleka wê dirêj kir û destê xwe li ser pişta wê ya mîna masî bir û anî. Wê jî xwe mîna mihînekê qeliband û piştî kêliyekê destên xwe avêtin stûyê min. Ez hêdîka ber bi xwe ve kişandim. Bedena wê bi germahiyeke şîrîn barkirîbû. Kincên li min bi hostatiyeke hunerî ji min kirin û kir ku hisên min ên şehwetê yên harbûyî jî bimelisin û mîna wê bi nermî tevbigerin. Min jî mîna wê kir û binkiraskê wê yê sor, bêyî ku wê biêşînim ji wê kir. Bedena wê ya dişewitî ez mîna miqnetîzekê kişandim.

Piştî ku agirê tenûra bedenên me bi hevdu temirîn, ji nû ve ez ponijîm û min serê xwe mîna zarokekî danî ser sînga wê. Wexta wê bi tiliyên xwe yên narîn porê min tev dida ez fikirîm; em ê pişta xwe ji bo demekê bidin hevdu û veqetin. Belkî bi awayekî di destê me de nebû em ê veqetiyana. Nizanim lê diviyabû hinek tişt biqewimiyana. Min nizanîbû ez ê çawa hinek tiştan karibim jêre bibêjim. Li her deverê ben û tayê mirov pêve dibe hene, yan jî bi wan ve girêdayî ye. Mirov bêyî wan nahewe û bi wan jî debar nake, natebite. Mîna ku ne ava sar û ne jî ava germ li mirov bê. Ez li dora xwe dizîvirîm, her tiştê min bi wan re dem

bihurandî, stûxwar li min temaşe dikin. Mîna bibêjin tê bêriya me nekî? De were ez ê vê bêrîkirin û hesretê çawa rave bikim. Şerîta filmekî li ber çavên min diçe û diçe. Her diçe li arşîva min an jî kewara bîra min zêde dibe. Xwedawo! Ma ez bîroke bibûma gelo wê baştir bibûya? Dewrûber ji min nagerin. Têra xwe bi min re bûne yek an jî ez û wan ketine zikhevdu. Belkî jî ji mêj ve ez û ew yekbûn û dîsa gihîştine hevdu. Lê aliyekî din min ber bi xwe ve dikişîne û ew alî jî ji wan kevintir û kûrtir e. Heye ku gotina **Her tişt li cewherê xwe vedigere** bi serê min de tê. Ez bêyî wan nabim û ez bi wan jî xwe kole û benî his dikim.

Ez bi salan e nikarim behsa wî agirê nava dilê xwe bikim. Di nava dilê min de agirek mîna yê şopgeran heye. Ne ji bo hûn jî ji min fêhm bikin, divê ez hinekî behsa şopgeran bikim. Şopger hene. Ew li pey şopa ne. Wexta ew dimeşin, ew jî şopan li pey xwe dihêlin. Şopgerî hostekariyeke her bala min kişandiye. Belkî ji wê ye jî meraqa min a ji bo rojnamevaniyê zêde bû. Erê, çawa stêrkşînas li ezmanan tevger, liv û lebat, nîşane û elametên li ezmên rave dikin, ew jî şop, gav û rengên li erdê fêhm dikin û pê xwe digihînin rastiya hinekî li pê ne. Ew ne tenê li erdê, di nava hewayê de şopê digerînin û mîna kûçikan bêhnê dikin. Xisletek wan heye li dilê min rûnanê. Ew jî ew e, sirra xwe bi kesî re parve nakin. Ango ne hinekî lê gelekî çavnebar in. Mîna sihêrbaza ne. Sirra xwe bi kesî re parve nakin. Ew bi sirra xwe hene. Lê zanyar û stêrkşînas, zanîn û têgihîştina xwe raberî civatê dikin. Lê ya rastî sirr û agahiya nehênî mirovan ber bi xwe ve dikişîne. Fena çavên delalekê ku mirov nikaribe maneyê bidê. Mîna kewgîrekî dafikê datîne û zewqa wî kêm tê fêhmkirin.

Bi ponijînê re, ez hênijîm û li ser sînga hevala xwe xilmaşî xewê bûm.

## ( 23 )

***Ya qelem binvîs, bi emrê padîşah***
***Ez çi binvîsim bi ferman, ya îlah***

Ez wexta ji xew rabûm min dît, ez tenê di nava nivînan de me. Hevala min li aliyekî din ê odeyê pirtûkekê dixwîne. Min fêhm kir ku li benda rabûna min e. Dilê wê negirtiye min hişyar bike. Lê min his kir ku ew li benda min e, ez pêre bipeyivim. Belkî jî min wisa his dikir. Yanî belkî min xwe neçarî axaftinê his dikir. Min nizanîbû, bi rastî gelo diviyabû ez jêre behsa hisa şopgeriyê ya di hundirê xwe de bikim. Ez jêre bibêjim, ez ji ber wê hisê di eyarê xwe de hilnayêm û his dikim ku hin tişt hene min tengav dikin. Bayekî nikarim nav lê bikim xwe li min ba dide û min dide ber xwe, dibe. Li gelek diyaran, li nav gelek newal û geliyan, li nav gelek xeyal û leylanan digerîne. Ez bibêjim min li nav stêrkan û ezmanên bêserûbinî digerîne, bawer bikin. Ev bayê nikarim navekî lê bikim û dibe ku paşê navek xwe lê deyne, hişê min jî dike mîna kulmoza mêşan. Zingîn û vingîniyê bi serê min dixîne. Nola hemû şaneyên min xistibin nav ricifandinê û zikrê. Ji ber vê, xebat li min giran dibe. Dîwarên li hawîrdora min bi ser min de tên. Mase û kursî ditewin, dihilhilin. Ez li ber wan diherişim, dikevim û mîna di xewneke bêhnçikandî de bim, diqîrim. Êdî bes e. Hewce dike, ez paçikê teresiyê ji ser xwe biavêjim. Divê gavekê ber bi zeviyên beyar ên li benda ajotinê ne biavêjim. Gîsinê xwe berdim zikê axa rewa. Pêwîst e, ez xwe hilkim, berê xwe bidim a min ber bi xwe ve dikişîne. Erê diviyabû min ji hevala xwe re ev hemû bigotana. Lê hinek tişt hebûn min jî hînê baş ji hevdu dernexistibûn.

Min nizanîbû ew çi ye di can û rihê min de bahozê radike. Ew çiye min ber bi xwe ve dikişîne. Ji bo bersivê diviyabû ez şopgerekî baş bûma, lê ne şopgerekî çavnebar. Ji ber ku eger ez dilê xwe nexim destê xwe û bi we civata hazir re parve nekim, ez ê qîma xwe

nikaribim bi tiştekî din bînim. Ji ber ku karê min rojnamevanî bû. Erê diviyabû min behsa rojnamevaniyê bikira ka çiqasî mîna şopgeriyê ye. Yanî hûn her roj dikarin gelek nûçeyan bixwînin û mirovan agahdar bikin. Lê bawer bikin, wexta hûn vê bikin, heye ku haya we ji dinyayê û heta haya we ji we tinebe. Wê wextê qiyamet e, hûn serê xwe radikin û dibînin ku serê we li kevirê gorê ketiye. Wê wextê hûn bi hêsayî hayil dibin ku yê mirî hûn bi xwe ne. Li ser vê, ez rabûm min serî li rêveberiyê da û xwest destûrê bide min ji bo ku ez biçim Kurdistanê. Li serê çiyan, li newal û geliyan, li gir û baniyan, li dol û kepiran, li qelaç û qirmeyan, li rûbar û çeman, li qûç û şikêran, li deşt û nav deviyan bigerim. Li kok û reh, li rîş û binyada vê tofana îro jî diqewime bipirsim û şopa wê biajom. Belkî jî min ew kulmoza mêşên hingiv ên di hişê xwe de li wir berdana. Yanî min dixwest nûçeya xwe ya bi we civata hazir re parve bikim, amade bikim. Naxwe ez ê netebitîma. Min jî dixwest weke çîroknivîsê navê wî nizanim û çiqasî xweber bi ser nivîsa wî de çûm, çîroka xwe bigota yan jî nûçeya xwe ragihanda.

Ez li odeyê, li rastiyê vedigerim û dibînim her tişt weke xwe li benda min e. Ez dibînim ku bi qasî gotinên xwe yên giregir bi hêz û taqet nînim. Lê naxwazim ew çend jî neçar û bêgav bim. Min berê xwe da hevala xwe û hewl da bipeyivim. Wê jî tenê bi carekê serê xwe ji xwendina pirtûkê rakir û li min mêze kir, paşê dîsa li xwendina xwe vegeriya. Ez wer sekinîm û dîsa di nava cîhana xwe ya hundir de ponijîm. Min dizanî bû, sirr di cewher de ye. Di xumamê û şîlo de ye. Meraq û kakûnî li cihê nediyar e. Sirr nebe em ê bi pey çi bikevin. Zanebûn sînorê xwe nîne û çawa hêvî jê tê kirin ku qîma xwe bi ya heyî bîne. Eger tu bi pey nekevî tu yê çawa zeft bikî û xwe bigihîniyê? Wexta mirovan berê xwe da nav daristanên tarî û daketin kûrahiyên wan bi tirs û heyecan bûn. Dema berê xwe dan deryayên bêserûbinî nizanîbûn çi li pêşiya wan heye, bi meraq bûn. Hissên wan, liv û lebatên wan yên derûnî ew diajotin. Lê baş nizanîbûn ber bi kîjan bayî ketine. Pêşiya xwe nedidîtin. Mij û moran bû. Bi xeyalên xwe, bi destpelînê dimeşiyan. Bi çarpîkan dimeşiyan. Yên li pey wan, hem henekê xwe bi wan dikirin û hem jî ji wan tirsonektir li pey wan diçûn. Yan jî carnan li pey wan diman û dimirin. Şopgerê sirrê bi tenê ye. Ew li pey xewn û xeyalên xwe ye.

Min cihê xwe xweş kir ku ji hevala xwe re bibêjim; Wexta mirov a bi tenê bimîne pirr kêm e. Ez li demekê yan jî deman digerim ji bo tenê bimînim û çend rêz û gotinan li ser xetên lênûsê deynim. Ez dixwazim tenê bimînim ji bo ku ji germoleya bûyeran dûr bikevim û bi cewherê bûyeran re bigihim hevdu. Ango bi rêya tenêbûnê xwe bigihînim pirraniyê. Bi rêya ferê xwe bigihînim cotê.

Gotinên di mejiyê min de rabûbûn govendê bi serê min jî neketin û ez ji wan geriyam. Jixwe xwesteka min a nivîsandinê gelek caran dudil e. Carnan mîna mirovekî dinyayê bi tevahî bibînim hewce pê nabînim. Carnan di ber xwe de dibêjim ma pirr hewce ye, pirr girîng e? Ji xwe dipirsim ma gotineke te ya nû heye, yan jî peyvên te yên lihevhatî û xweşzar hene? Mirov hin caran xwe nagire û dipirse, gelo tu ji bo çi dinivsî? Ma tu yê tenê ji bo binivsîne pênûsê bilebitînî? Ji bo tu bibî nivîskarek an jî dixwazî derdor û dewrûber ji te re bibêjin mamoste? Naxwe tu bi hubra nivîsandinê avis î? Êş û keserên li qirika te geriyane hene? Bûyerên nahêlin tu hilmê bigirî xwe li te badane? Rast e, gelek bûyer li dinya tu lê dijî diqewimin. Roj nîne kuştin, talan, dagirkerî, destavêtin, lêdan û şêlandin nebe. Jixwe ev hemû diqewimin û her kes dibîne. Baş e, ez ê çima binivsînim. Bi vê, ez ê tiştekî çareser bikim? Gelo ez ê tenê pê ber dilê xwe xweş bikim? Jixwe gelek mirov zivêrin du xetan bixwînin, belkî jî bi rastî hêja nîne mirov evçend nivîsê bixwîne û wexta xwe heyf bike. Ma wext a me bû ku heyf bibûya? Em nediliviyan, di cihê xwe de bist bûbûn. Her tişt diherikî, dibihurî û em li cihê xwe çikiyayî mabûn. Belkî em tenê mîna kelemperê bi ber bayê ketibin. Em nameşin, me dimeşînin. Ji lewra em Xwediyê demê nînin. Eger dem a me bûya, gerdûn û jiyan ên me bûn. Di vir de mirin para me ye. Wexta jiyan a mirov nebe, mirov tenê li benda mirinê ye. Kalekî li rawestgehê li benda axretê ye. Ha wê wextê mirov heq dide gotina pêşiyan; **Xwezî mirin hebûya, kalbûn nebûya.**

Ez nizanim hevala min li benda axaftina min bû, yan jî ez li benda xwe bûm bipeyivim. Çi li benda çi bû min jî nizanîbû. Dinya digeriya û belkî jî diviyabû mirov destê xwe nediyayê. Belkî jî Xwedê çawa teqdîr kiribû wê wisa bibûya? Bêguman em li Xwedayê xwe digeriyan û em ê bi pey biketana. Em kî bûn û çi bûn? Pirsên yeman û dijwar in? Mirov dikare dereweke li xwe bike û jê bawer bike. Qelsî û lawazî neçarî derewê ne, ji bo kuna vebûye biseyînin. Diyar e me tirs û fikarên xwe bi derewan seyandine û heta me hin ji wan şapinêz kirine. Lewma em bûne şapînozên demûdewranan. Gelo em ê karibin li xwe mikur bên? Dibe ku em velîzin û çavên serê me bilîzin. Li hemberî rastiyên şapînoziya me hilweşînin, em matmayî bimînin. Dibe ku me bitirsînin, ji ber ku em ê qûtîrût belot li naverastê bimînin.

Heye ku xemsariya me ya ji qelsî û lawaziyê, me çavkorî û serkorî bike? Heye ku em ji gewîbûna xwe danekevin bi tirsa em ê gewîbûna xwe ji dest bidin. Ma em ê nefikirin ku şîn û şahiyên me jî derew in? Em li gorî çi dikenin û digirîn? Gelo hevîrtirşê dilê me çi ye û me bi kîjan destan straye û havên kiriye?

Ez li cihê xwe wer mam û mam heta hevala min got; rabe em ê dereng bimînin. Gelo em ji çi dereng diman min nizanîbû. Ez dizanim wê sibê balafira min a me ji hev veqetîne ber bi Hewlêrê bi rê bikeve. Lê niha rojek li pêşiya me bû. Hînê jî min nikarîbû ez a dilê xwe vebêjim. Belkî jî ya dilê min a dilê her kesî nebû û her kesî qîma xwe pê nedianî. Belkî jî min nikarîbû ji hehavala xwe re bigota; xeyalên min ji min mezintir in û lewma min li pey xwe dibin.

**KESÊ DU ROJÊN WÎ MÎNA HEVDU DI ZIRARÊ DE YE**

Dibêjin dem û wext diherikin. Gelo mirov nelebite, ma dem dilive? Belkî jî bi rastî dem bi liv û lebatê çêdibe. Min got ez li dorê dizîvirim yanî roj mîna hevdu ne, dem sekiniye, yanî mirin, jiyan tine ye.

Min şaqûla xwe danî û piyaleyeke ava tirî ya sor ku li ber lampeyê fena xwînê xuya dikir bi ser xwe da kir. Her tişt mîna leylanan li ba bû. Ji rengekî diketin rengekî din. Gelo ew ew bûn yan jî ez ew nebûm. Ez rastî bûm yan jî ew. Çi bûbû xapînok çi bûbû rastî? Gelo ya diviyabû bihata dîtin a çavan didît bû, yan jî vediziyayî bû? Gelo ez serxweş bûm an jî ew? His li pêşiya aqil bûn û ez li pey hestan bûm. Di nava xeyalên gizrokî yên hestan de bi destpelînê dimeşim û bi hin tiştan derdixim û pêdihesim. Ez li ber rabûm û min got; Ji bo Tu bibî Tu, Ez ê bibim Ez.

Min his kir ku hevala min, li ber rewşa min dikeve û nizane wê ji bo min çi bike. Tengasiya ketimê ew jî tengav kiribû. Bêguman min nedixwest ti tişt ji min zivêr bibe û ji rûyê min berbend bibe. Herî zêde jî min nedixwest hevala min xemgîn bibe. Ji bo kêliyekê min xwe û ew ji bîr kir.

Zeratên li dora min giş lebitîn û govend girtin, meyger hat û yê serxweş ez bûm. Min biryar da, ez bikevim nav leylanên demê û mîna ruhberekî di malzarokê de li ser xetên jiyanê bilebitim. Min xwest xwe noqî xeyalan bikim. Rastî û nerastiyê ji hev bikim. Her tişt bi awayekî hebû. Her tişt bi awayekî dihat dîtin. Ew her rastî bûn. Xeyal û xewn jî rastî bûn. Em bi awayekî ji awayan ji wan dibûn. Di dilopekê de jiyanek, gerdûnek hebû. Em wan bi çavên serê xwe nabînin. Eger hin wesita nebûna ji bo dîtina wan em kor bûn. Ango ji bo dîtinê em qels in, kêm in. Ev jî rastiya me bû. Bi vê rastiyê rabûm. Bi her hebûna rastî bû rabûm. Wî wextî **Cumle zeratê cîhan da ev nîda, kirin gazî pêkve gotin merheba.**[5]

[5] Ji mewlûda kurmancî ya melleyê Batê

## ( 24 )

### WEZ ÇI BÊJIM ÇI BEYAN KEM
### MEXFIYETA DIL EYAN KEM

Di nava kêliyê de ez û hevala xwe li bexteweriyê geriyan. Şadî û kamûraniya di kêliyê de bi qurteke demê re çû xwarê û bihurî. Ji siberoj û paşerojê me behs nekir. Belkî jî me nikarîbû em dahatûyê ji hev derbixînin. Ji lewra jî me di bêdengiyê de li hev kir an jî me xwe neçarî wê kir. Heye ku em radestî wê jî bûbûn. Herçî min dizanîbû, li vê dinyayê ti tişt misoger nîne, lê min nizanîbû çima me ji ber vê veqetîna ji bo demekê dinya xira dikir. Gelo ji hezkirina me bû yan jî ji qelsiya me bû. Jixwe mirov di nava rihberan de cureyê herî qelsbû û hêza xwe ji vê yekê digirt. Belkî jî hêz û qelsiya hestên me di zikhevdu de bû. Lê bêyî em li vê yekê bipirsin, me pişta xwe da hevdu û berê xwe da xêrê. Ji ber ku rastiyên min bi qasî roja hiltê û heman roja diçe ava mezin nebûn.

Di Tîrmehê de balafira min ji Qahîreyê di ser Dubaî re firiya Hewlêrê. Li wir kesekî berê pêre peyivîbûn ji bo bê pêşiya min, radiwestiya. Wî kesî ez birim çiyayê Qendîlê. Wexta ez li Hewlêrê daketim hînê dinya tarî bû. Em hê negihiştin Qendîlê şeveqê avêt, dewrûber rohnî bû. Cihên em têre derbas dibin şifêr yek bi yek ji min re behsa wan dike. Ew bi xwe ji Mexmûrê ye. Hinekî jî behsa cewr û cefaya xelkê kampê kişandiye dike ka çawa bi salan li ber xwe dane. Ez soz didim ku li vegerê derfet û îmkan hebin, ez ê seriyekî li kampê bidim. Paşê şifêr bi meraqa rojnamevanekî pirs ji min kirin. Wexta min got, ez ji Amedê me, keniya û got: “Amedî jêhatî ne.” Hinekî bêhna xwe da û pirsî: “Ez ne şaş bim te li Ezherê xwendibû, ma çi karê te li wan deran hebû?” Min jêre got: “Bavê min mirovekî dîndar bû pirr dixwest ez li wir bixwînim, min jî nexwest ez wî bişkînim û ez çûm.” Pirsa li pey bihata min texmîn dikir û hê wî nepirsî min bersiv da: ‘Bavê min dixwest ez beşekî dînî bixwînim, lê min beşê rojnamevaniyê xwend. Heta demekê haya wî jê tine bû. Paşê min jêre got.’ Diyar bû wê hê pirs bikara û ez li bendê mam. Pirsa wî hat: “Îcar tu çawa çûyî Ewrûpayê û tu çawa ketî televîzyonê?” Min bala xwe dayê pirr hindik çîroka min dizane û ew zêdetir dixwaze hîn bibe yan jî agahiyên xwe yên dizane piştrast bike. Min jî ev mirovê xweşsohbet neşikand û bersiv dayê: ‘Bavê min mirovekî xweşhal bû. Paşê min xwest ez herim Ewrûpayê xwendina xwe temam bikim. Herçî bavê min destpêkê razî nebû jî, lê paşê min ew razî kir. Ew ditirsiya ez li Ewrûpayê bixirim û ji rê derkevim. Ji hin aliyan ve jî min paşê heq dayê.’ Wextê em diçûn min bi meraq li dora xwe temaşe dikir. Lê diyar bû şifêr gelekî bala xwe dabû ser axaftina min. Çawa min bêhn da axaftina xwe wî pirsî: ‘Te negot tu çawa çûyî televîzyonê û bûyî pêşkêşvan.’ Ez lê vegeriyam û bi girnijîn jê re got: ‘Tu rojnamevanekî baş î, tu dizanî pirsan bikî.’ Ev gotinên min pê xweş hatin, lê ew li benda bersiva xwe bû. Min dewam kir: ‘Wexta min li Elmanyayê dixwend, di nava civaka me Kurdan de dihat gotin ‘Kurd wê televîzyonekê vekin’ ya rastî wê wextê me kesî bawer nedikir, lê fikreke wisa bû mirov pê bi heyecan dibû. Paşê min bihîst ku li pêşkêşvanan digerin û dixwazin Kurdiya wan baş be. Ya min jî Kurdiya min xirab nebû. Paşê jixwe tu jî dizanî di 30’ê Adara 1995an de televîzyona MED-TV dest bi weşanê kir.’

Piştî van bersivên min demekê em bêdeng bûn. Min bi hesret li derdora xwe temaşe dikir. Mîna ku bala wî jî kişandibe pirsî: ‘Ev cara pêşiye tu yê biçî çiyê?’ Min serê xwe hejand û got: ‘Rast e.’ Hinekî girnijî û dîsa pirsî: ‘Ma çend sal bûye te welat nedîtiye? Wexta min jêre got, 17 sal, matmayî pirsî: ‘Çima tu neçûyî, ma sûcekî te heye?’ Ez jî keniyam wexta wî

behsa sûc kir û min got: ‘Na sûcê min nîne, pêşî min nedixwest ez biçim, paşê ez ketim nava van karan û niha jî ez firarê eskeriyê me.’ Bû tiqetiqa kenê wî û got: ‘Sûcê te ew e tu neçûyî eskeriyê?’ Bi vê xwest bibêje; ma tu henekê xwe dikî lawo, tu bi salan di televîzyonê de li dijî dewleta Tirk nûçeyan didî, welleh tu bikevî nava lepê wan wê te bixwin.

Ji ber ku ez ji qalikê xwe derketibûm, ez bi heyecan dipeyivîm. Bawer dikim ku ji guhertina hewayê bû, hinekî jî ez cangiranî bûm. Bi vê re hinekî bêdeng bûm. Wexta behsa MED-TVê jî bû gelek tişt hatin hişê min. Têra xwe bîranînên hêja yên dema MED-TVê hebûn. Wexta min di pencerê re li derve dinêrî pêjna rûyê Stêrkê hat. Pirr demeke kin min ew li MED-TVê nas kiribû. Ji Kurdên Erzîncanê bû. Pirr kêm gotinên Kurdî dizanîbû û bi kelecaneke mezin dixwest biçe çiyê. Berî biçe çiyê bi rojekê heta derengiya şevê me sohbet kir. Behsa eşqekê dikir min tam fêhm nedikir. Qala bahozeke di hundirê xwe de dikir ku wê çawa dikişîne çiyê. Min gotibû ew miroveke zêde îdealîst e, lê ne keseke nezan û xeşîm bû. Ji ber ku wexta behsa eşqê dikir, gelek mînak didan û ji ber ku dizanîbû min li Ezherê xwendiye gotina Mewlana ya ‘Li vê cîhanê her tişt qal û qîl e’ mînak dida. Lê ez tam lê serwext nedibûm. Eger biryara dida, biryareke dijwar nebûya belkî min ê axaftina wê zêde ji dil nedîta. Rûyekî wê yê gelekî delal hebû. Çavên wê mîna yên karxezalan bûn. Ji aliyê cinsî ve bang li mêrekî nedikir, lê weke avek zelal a mîna bibêje were min vexwe bang li mirov dikir. Gelek ji dil bû û ez niha nêzî wê dibûm. Piştî ku çû me xeber jê nestend. Lê her tim mîna dengekî bû, bang li min dikir. Nizanim, dibe ku wê jî ez kişandibim heta van deran. Ez bi hêvî bûm wê li vir bibînim û axaftina me ya nîvco mayî pêre temam bikim. Belkî jî li vir min ew zêdetir fêhm bikira. Min keserek kişand û di dilê xwe de got: ‘Mîna aveke zelal e ya bang li mirov bike û bêje min vexwe.’

Şifêr dîsa ji nişkê ve pirsî: ‘Tu yê li çiyê çi bikî?’ Min jî jêre got: ‘Ez dixwazim li ser perwerdeya PKKê lêkolînekê bikim û ev yek ji aliyê rayedaran ve hat qebûlkirin. Lewma ez ê biçim li çiyê beşdarî perwerdeyekê bibim.’ Şifêr bi meraq li min guhdarî dikir û piştî vê bersiva min hinekî di bin çavan re li min nêrî û mîna gumanê bike bêdeng bû. Lê min dewam kir û got: ‘Ez dixwazim fêhm bikim ka rêxistina PKKê ya mohra xwe li 30 salên dîroka nêz a Kurd xistiye çawa mirovan perwerde dike.’ Paşê şifêr hilmek li cixareya xwe xist û got: ‘Kêm zêde perwerdeya PKKê tê zanîn, lê ya rastî her kes vê perwerdeyê baş fêhm nake. Lewma perwerdeya PKKê li her kesî vekirî nîne. Ne ku qedexe ye, tirs heye kesê li derveyî PKKê mijar û dabaşan baş fêhm neke û nikaribe rake. Ya din jî PKK bi her karî her kesî gavekê yan jî bostekê dixe bin berpirsiyariyê.’ Min bala xwe dayê şifêr têra xwe serwext û zana ye. Piştî kêliyekê ew li min vegeriya û got: ‘Dewreyeke perwerdeyê dest pê kiriye.’ Ez bi vê kêfxweş bûm, lê min xwestibû ez ji destpêkê ve amade bibim û ji serî heta dawiyê perwerdeyê bişopînim. Bi qasî ku haya min jê hebû, perwerde jî li gorî deman û beşan diguherîn. Li çiyê perwerdeyên şervanên nû û perwerdeyên jinan ên taybet hebûn. Perwerdeyên kadroyan ên ji bo sê mehan heta heşt mehan hebûn.

Em nêzî çiyan dibûn. Serê Qendîlê xuya dikir. Ji dûr ve bi heybet bû. Mirov her nêzîk dibû ew pan dibû û ji hev radikişiya. Mîna dêwekî mirov bikeve zikê wî. Tu her diçûyî ew wenda dibû û di nava wî de hûrik dibû. Li Başûrê Kurdistanê di Tîrmehê de hewa germ e, lê hewa çiyê xweş û hênik bû. Em êdî ketibûn zikê Qendîlê. Bi tevahî her dever şên bû, dar û hêşîn bû. Şifêr dibêje: ‘Em li ser riya xwe seriyekî li Qebristana Şehîdan a Qendîlê bidin.’ Bêguman min jî hez dikir ez zêde deveran û kesan bibînim, lewma min bi xweşî qebûl kir. Li pala çiyê qebristaneke mezin hatibû çêkirin bi qasî 150 cenazeyê gerîllayên şehîd li vir hebûn. Li aliyekî jî wêneyekî Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan li çiyê hatibû neqişandin. Min ji hevalê li ber qebristanê pirsî: ‘Evqas gerîlla li kîjan deverê û di kîjan şerî de şehîd ketine?’ Ji min re got: ‘Me cenazeyên van hevalan her yekî ji deverekê aniye. Her yek bi awayekî û di şerekî de şehîd ketiye.’ Hinekî bêhn da axaftina xwe, girnijî û got: ‘Me wextê qebristana şehîdan çêkir, pêşî çend cenazeyên hevalan hebûn paşê me cenazeyên hevalên li van derdoran definkirî giş anîn vir û veşartin. Weke hûn dibînin hejmar gihişt sedûpêncî. Îcar

gundiyekî ji me re got; hûn PKK yeman in. Ev feqîr ji destê we xilas nabin. Şehîd dikevin jî hûn bela xwe ji wan venakin dîsa tînin cem hevdu.' Yanî bi vê xwest ji me re bibêje; PKK tevgereke civakî ye, û bi awayekî komik û bi hev re dijîn. Ew şehîd jî bikevin ji hev naqetin. Ji lewra jî gotina bavê şehîdekî di merasîma sersaxiya kurê xwe de bi bîr xist û got: 'Bavê şehîd gotiye; ez cenazeyê kurê xwe ji çiyê naynim wî ji hevalên wî venaqetînim.' Kesê li ber şehîdgehê keserek kişand û got: 'Hevalo! Li her girekî hevalekî me şehîd ketiye, mîna Ebdullah Pêşew gotî; her devereke Kurdistanê goristaneke eskerê meçhûl e. Tu dikarî bejna xwe li ber bitewînî.' Kurdistan cihê gelek kovan, keser, kul û axînan bû. Ji kezeba dilovan a mirovên Kurd zêde zêde êş hilatibûn û mîna ayetên Mishefa wendabûyî hatibûn nivîsîn.

Em di rêyên mîna maran li çiyê badayî de diherin. Maşîna me mîna hêstirekê bi çiyê û kaşan re hildikişe. Her deverek heybetek xwe heye. Her dîmenek weke tabloyekê li pêşberî mirov disekine. Çiyayên welatê me, ji bo min naşibin her çiyayî. Her çend ez bi xwe deştî bim jî ez his dikim ku ez çiyayî me. Di kûrahiya dil û hinavên xwe de pê dihesim ku çiya ji bo Kurdan pirr girîng in. Belkî ji serhatiyên dîrokî pê derdixim ku di dil û lêgerîna me de cihê çiyan cuda dibînim. Belkî jî ji meznahiya çiyê be. Ji ber ku Kurdan ji zilma neyaran, ji zordestiya dagirkeran, ji hovîtî û barbariyê xwe avêtine bextê mezinê bi tenê, xwe avêtine bextê mezinê mezinan çiyê. Ji lewra jî mîna qesîdeyên bi hilm û nefesê, kilamên dengzîz jî li serê çiyan hatine gotin. Çend gotin, çend awaz, çend deng û peyv li bejna çiyê hatine fesilandin. Gelek govend û sema li mezinahiya çiyê hatine edilandin. Li cihekî Kurd ne minêkar û ne minetdar be, ji xwe piştrast û dilfireh be çiya ne. Heye ku çiya mîna textê mîr û keyan bin. Meznahiyek hem dilovan û hem jî xedar.

Em bi çiyan re hilkişiyan, me xwe li bedena wan bada. Paşê em serberjêr daketin. Carnan em berwar, neşûvî û carnan jî hevraz çûn. Di dawiyê de me xwe berda zikê dolekê. Di tevahiya dolê de ji jor ve ava kaniyekê diherikî û seranserê newalê li ber avê darên biyê hebûn. Li jor holikeke mezin ji darên çilo xuya dikir. Şifêr bi aliyê holikê ve îşaret kir û got: 'Diyar e hevalan dest bi dersê kiriye.' Me çend gav avêtin hevalek hat pêşiya me û ez paşê hînbûm ku ew nobedarê li derveyî dersê ye û di heman demê de jî di desteya rêveberiya dibistanê de cih digirt. Navê wî jî Enwer bû. Serê wî hinekî keçel bû. Li ser reşika çavê wî weke ku çilkek hebe xuya dikir. Qayişeke berfireh li ser şûtika wî bû. Ji Şirnexê bû û hînê xweş bi devoka herêma xwe dipeyivî. Ez ê paşê hîn bibûma ku Enwer jêre Enwer Ûmyanûs jî dibêjin. Enwer navê birayê xwe yê şehîd ketî li xwe kiribû. Enwer hat pêşiya me û xêrhatina me kir. Wexta çav li min ket girnijî û bi kêfxweşî got: 'Ez te nas dikim?' Hevalê Enwer gelek kêfa wî ji min re hatibû û gotibû: 'Kurdiya te xweş e, mirov bi hêsanî jê fêhm dike.' Paşê got, 'Ka were hînê heval belav nebûne ez cihê te nîşanî te bidim.' Hevalê Enwer ez birim mangeheke ji darê çilo çêbûyî û got: 'Alavên xwe deyne wê quncikê û tu dikarî li wir êdî bimînî.' Hinekî li min temaşe kir, dît ku ez westiyayî xuya dikim û got: 'Hez dikî xwe dirêj bike, paşê tu dikarî hevalan bibînî.' Min ji vê pêşniyarê re negot na, ji ber ku bi rastî ez têra xwe betilîbûm û min dixwest hinekî xwe dirêj bikim. Lewma min pêşniyaz qebûl kir. Min xwe dirêj kir û ez bi lez fikirîm ka ez çawa dikarim hinek tiştan binivsînim. Min xwest serborî û serhatiyên xwe li defterekê deynim. Min dizanîbû mirov pirr zû bîroke dibe. Ji lewra jî min gelek tiştên xwe dinivîsîn. Belkî jî ji karekterê rojnamevaniyê bû.

# ( 25 )

**Çi dibe bila bibe PKK dest ji perwerdê bernade**

Bi qasî pêncî şêst hevalî ji bin holika çilo derketin û çûn cihê jêre kamelye digotin. Kamelye cihê çay û xwarinê bû. Hevalê Enwer û çend hevalên din jî ber bi min ve hatin. Min deftera xwe danî û ez ji ber wan rabûm. Hevalê Enwer ew bi min dan naskirin. Yek ji wan navê wî Cemîl bû. Yê din jî navê wî Welat bû. Cemîl fermandarê taximê bû û Welat jî fermandarê yekîneyê bû. Ji ber êrîşên di demên dawî de, hêzên gerîlla xwe yekîne bi yekîne dabeş kiribûn. Enwer ji min re got, ‘Tu yê êdî di nava yekîneya hevalê Welat û taximê Cemîl de cih bigirî.’ Paşê salix da min ku her du heval jî xwedî tecrube û têgihiştî ne. Bi vê yekê, xwest piştrast bim û bi asayî tevbigerim. Hevalê Enwer ji ber ku dizanîbû ez ji bo çi hatime cihê perwerdê, ez dam kêleka xwe û bi lez dest pê kir, rojek çawa dibihure û nîzamê jiyanê çawa ye anî ziman: ‘Her sibe hêzên perwerdê saet di çar û nîvan de bi fermana ‘rojbaş’ şiyar dibin. Saet pênc kêm çarîk îçtîma heye. Yanî sibe di îçtîmayê de bi duruşmeya ‘Yan serketin Yan serketin’ dest pê dike. Piştî îçtîmayê bi giranî her kes diçe êzingan berhev dike. Hinek jî diçin hin karên din. Birrîna darên ter qedexe ye. Divê her kes darên hişk yanî êzingan bîne. Kesên birîndar an jî rewşa wan a tenduristiyê li cih nîne, naçin êzingan. Saet di şeşan de taştê tê xwarin û saet di heftan de ders dest pê dike.’ Hevalê Enwer piştî ku ev agahî dan got: ‘Jixwe tu yê sibê tevahiya van tiştan bi xwe bibînî.’ Paşê min jê pirsî gelo kîjan dersan wê bibînin. Hevalê Enwer got; di vê perwerdê de wê zêdetir li ser dîroka partiyê û demokrasiyê rawestin. Lê tevî van dersan, girîngiya perwerdê, paradîgmaya nû, pirsgirêka jin û zilam, hunerê şer û parastina rewa, felsefe û dîrok, dîsa gelek semînerên bi van mijaran ve girêdayî di nava cetwelê dersê de cih digirin. Tevahiya dersan ji aliyê komîsyonan ve têne dayîn. Yanî her kes hem mamoste û hem jî şagirt e. Lê carnan li gorî mijaran, kesê ji meselê zêde fêhm dike yan jî xwedî tecrube ye tê dersan dide. Hevalê Enwer mînak da û got: ‘‘Hevalê Cûma wê dersa dîroka partiyê bide û hevalê Karasu jî wê dersa demokrasiyê bide.’ Hevalê Enwer ez teslîmî hevalê Cemîl û Welat kirim û çû. Hevalê Cemîl hevalekî navsere bû. Bejna wî kinik bû. Gewdê wî tijî bû. Mirovekî qut û qalind bû. Cansivik bû. Rûken bû. Diranên wî zer bûbûn. Ji diranên wî yên pêşî yek ketibû. Diyar bû ji fermiyetê zêde hez nedikir. Destê xwe li pişta min xist û got: ‘De em biçin xwarinê bixwin, em ê paşê cihê te çêkin.’ Welat li cem wî zêde dengê xwe nedikir. Kifş bû ku Welat ji axaftina zêde hez nedikir. Kedkar û emekdar xuya dikir. Bi zimanê gerîlla ew zêde pratîkvan bû. Em bi hev re daketin cihê xwarinê yanî kamelyayê. Hinek maseyên ziravik hatibûn çêkirin û her kesî xwarin şipiya dixwar. Her kesê li wir bû, me bi destê hevdu girt. Wan ez nas dikirim, lê min ew yek bi yek nas nekirina jî weke gerîlla min jî ew ji dîmenên dihatin televîzyonê nas dikirin. Zarokên welatê min bûn û her yek ji devereke welatê dagirkirî hatibûn. Xwarina êvarê şorbe bû. Li ber jî pîvaz, mendik û tûzik hebû. Wextê çav li tûzikê ketim, matmayî mam û min pirsî tûzikê ji ku tînin. Ji ber ku min dizanîbû tûzik li ber ava kaniyan çêdibe. Keniyan û ji min re gotin: ‘Ji bîr neke navê vir Kanîqirêjê ye. Her der tijî kanî ne. Lê ava wê timî kêm û qirêj e.’ Min wexta kevçiyê xwe li şorbê xist û xwar, min xwe negirt û got: ‘Min ji zarokatiya xwe ve nîskek wisa bi tahm nexwariye.’ Hevalan li min nêrî, bawer nekirin û gotin: ‘Na lo, Xwedê dizane hûn li Ewrûpayê çi xwarinên xweş dixwin.’ Min got: ‘Welleh ev nîsk tahma wê weke ya gundê me ye.’ Wan jî got: ‘Welleh em nizanin tahm ji ku tê, lê nîskên me ji Bakur tên.’ Paşê min got: ‘Rast e, li Ewrûpayê her xwarin heye, lê tahm tine ye.’

Piştî xwarinê em diçin çaya li ser agirê qurmê daran keliyayî vexwin. Qedehên gerîlla bi kar tînin mezin in. Her kes pirr şekir jî bi kar tîne. Ez wexta qurtê li çayê dixim, ez êdî fedî dikim bibêjim; bi rastî çay jî li vir tahm xweş e. Tevî ku ez bi giştî ji çayê zêde hez nakim, lê wê êvarê çay têra xwe bi tahm bû. Dar û ber, telpên ewran û surra bayê hênik ê rûyê mirov

dalast, dengê xwezayê û ahenga rengan dest didan hevdu tahmek xweş çêdikirin. Bi gotineke din, tehma vê çayê di bin qurmê zimanê min de ma.

Em paşê li ber televîzyonê rûniştin û me li nûçeyan guhdarî kir. Di ber re jî her kesî der barê televîzyonê de hem hin tişt pirsîn û hem jî rexne kirin. Bawer dikim ku bi sedema gelek pirs, rexne û eleqeyeke mezin hebûn, hevalekî ji rêveberiyê got: 'Belkî tu rojekê bi giştî agahiyan der barê karê xwe de bidî wê baştir bibe.' Min bala xwe dayê her kes zêde zêde bi televîzyonê re eleqedar e. Ji pêşkêşvanan bigirin heta xebatkaran der heqê gelek kesan de agahiyên wan hene. Bêguman xwediyê gelek agahiyên şaş in jî. Lê min normal dît û hewl da bersiva wan bidim. Piştî ev çend pirs û germoleya axaftinan ez û hevalê Cemîl rabûn çûn mangehê. Cemîl cihê min nîşan da û got: 'Tu dikarî li vir razê.' Piştre min dît Cemîl ji derdorê hinek hejik dan hev û min pirsî wê çibike. Got: 'Em ê li vir ji xwe re çayekê çêkin.' Cemîl agir xweş kir û çaydankekî piçûk ê tenîgirtî çû tijî av kir û danî ser êgir. Em li dora agir rûniştin. Hevalên din hînê ji ber televîzyonê nehatibûn. Cemîl di ber re jî timûtim cixare dikişand. Min jê pirsî ji kengî ve di nava refên gerîlla de ye. Hilmeke baş li cixarê xist û got: 'Ez ji sala 1983an ve bi gerîlla re me.' Ez matmayî mam û min yekser jê pirsî: 'Min wer dizanîbû ku gerîlla ji sala 1984 ve heye.' Cemîl keniya û got: 'Ew bi awayekî fermî wisa ye. Lê beriya wê xebatên gerîlla dest pê kiribûn. Fermandar Egîd li her derê digeriya û zemînê gerîllatiyê amade dikir. Ez wê çaxê diçûm lîseyê.' Min pirsî: 'Yanî tu jî ji Farqînê yî?' Keniya û li min vegerand: 'Mirovên Farqînê jêhatî ne. Wextê em diçûn mektebê berî 12ê Îlonê mamosteyên me baş bûn. Pirranî şoreşger bûn. Ji me re behsa gelek tiştan dikirin. Lê piştî esker hatin ser desthilatiyê rewş guherî. Eskerên sivîl diketin gelek dersan. Dixwestin me bikin dîndar. Mamosteyan kesên dîndar teqdîr dikirin. Lê meraqa min ji topê re hebû.' Cemîl xweş dipeyivî, lê min meraq kiribû ka çawa Fermandar Egîd nas kiriye. Ez ketim nava axaftina wî û min pirsî. Cemîl dewam kir: "Wê wextê her rêxistinek cihekî xwe hebû. Lê cihê PKKê li ser riya Farqîn û Batmanê bû. Holikek bû. Semawerekî wan hebû çay didan. Ez û du hevalên xwe çûbûn. Egîd li wir bang li me kir û got: 'Ka werin.' Em li cem wî rûniştin. Dest pê kir ji me re behsa PKKê û sosyalîzmê kir. Digot: 'Kurdistan tenê bi şer rizgar dibe û divê em xayînên hevkariyê bi dijmin re dikin, em wan ji nava xwe paqij bikin.' Welhasil ji me re gelek tişt gotin, paşê ji min re got: 'Min û birê te di dibistana navîn de bi hev re xwendibû. Ji dûr ve jî em dibin mervê hevdu. Ka bibêje; tu li ser PKKê çi difikirî?' Min li hal û hereketên wan dinêrî, hurmet û rêza wan ji hev du re tesîr li min kiribû. Min jî got: 'Gelek partî û rêxistin hene, lê eger tiştekî bike wê PKK bike. Ji ber ku PKK çi dibêje wê dike.' Wextê min wisa got Egîd keniya û got: 'Tu xortekî rûrast, deqerû û dobra yî, bi cesaret xuya dikî. Mirov ji te quwetê digire. Tu kinik î jî mîna Apê Ho yî.' Gotinên wî ez kêfxweş kiribûm. Di dawiyê de ji me re got: 'bên û biçin em sohbet bikin.' Em jî paşê timî çûn û hatin. Pirr neçû darbeya eskerî ya 12ê Îlonê çêbû. Faşîzm bi tevahî desthilaldar bû. Li her deverê teror dimeşandin. Li naverastê êşkence li mirovan dikirin. Li serê her quncikê tirs afirandibûn. Wisa kiribûn ku mirov tepisandibûn. Di rewşeke welê de her kes neçar bû. Yanî çavên me li hevalan digeriyan. Bavê min bi xwe jî îsyan dikir. Li ber Xwedê radibû û gazin dikirin. Ji Xwedê re digot: 'Madem tu mezin î, tu çima çavên vî Kenan Evrenî dernaxînî.' Lê ew jî neçar bû. Tiştek nedikir û nikarîbû bikira. Lewma jî pirsgirêka xwe dixist dawa Xwedê. Di vê rewşê de min hîç nedixwest ez bixwînim. Li Dibistanê li ser maseyan û li derve me li ser dîwaran 'bijî PKK' dinivîsand. Em komeke xwendekar bûn. Em ketibûn bin tesîra fermandar Egîd. Me hevdu nas dikir. Li dibistanê carekê ez hatim girtin. Mamosteyekî esker bû. Ji min û hevalê min Ekrem Guven re got: 'Hûn kurdîtiyê dikin, hûn terorîst in.' Li ser vê yekê Ekrem bi ser mamoste de çû û lêda. Mamoste ket û serê wî hişk li erdê ket. Me got qey mir. Lewma Ekrem di pencerê re reviya. Ez girtim û birim. Gelekî êşkence li min kirin. Gef dixwarin. Digotin: 'Bibêje tu Mahsûm Korkmaz nas dikî? Têkiliyên te bi wan re hene?' Wexta min digot: 'ez nizanim.' Digotin: 'jixwe PKKî hemû dibêjin em bi tiştekî nizanin.' Pirr li min dabûn. Ez tevizî bûm. Lê piştre polêsekî sivîl ket hundir û got: 'Ez vî xortî nas dikim. Ew fûtbolvanekî

baş e. Ew tiştên wisa nake.' Li ser vê ez berdam. Hema ez çawa hatim berdan. Min çavên xwe li hevalan gerand. Min xeber stend ku heval li derdorê hene. Ji me re gotin; li baxçeyên binya Farqînê heval wê li benda we bin. Bi şev em çûn. Hînê ji dûr ve min dengê hevalê Egîd nas kir. Erê bi vî awayî me xwe gihand hevalan. Sal 1983ê bû. Hevalê Egîd ji me re got; em ê êdî hem li bajaran û hem jî li derveyî bajaran bi şêwazê gerîlla têkoşîna xwe bimeşînin."

Cemîl bi darikê di destê xwe de agir tevda û got: 'Rabe em razên dereng bû.' Lê ya rastî, erê min Cemîl bêdeng guhdarî kiribû, lê gelek pirsên min hebûn, min jê bikira. Ji bo min pirr girîng bû, ez bi kesekî ji dema Fermandarê Mezin Egîd mayî re li ser wan demên taybet rawestim. Li aliyê din jî bi rastî dereng bû û diviyabû em razana. Me cihê xwe xweş dikir ku em razên, ji nişkê ve dengê teqîneke mezin ji pişta Çiyayê Şekîfê hat. Bi vê re, di nava kampê de sê caran gulle hat berdan. Cemîl ji nişkê ve çeng bû û ji min re got: 'Rabe, întîşar e' Gurmîna topan dewam kir. Em wekî taximekî li binya tatan li cihekî mîna berqefê bi cih bûn. Dengê topên dijmin li ezmanên welatê min bi dijwarî dikirin gurmîn û xumîn. Ez nizanim çima, lê bi dengê topan re ez cangiran bûm. Hevalên taximê jî di nava xwe de dipeyivîn û texmîn dikirin ka gelo çi top e û kîjan welat diavêje. Di dawiyê de hemfikir bûn ku top ne ji Îranê, ji aliyê Tirkiyê ve tên û topên obus in. Em hinekî wisa sekinîn. Min pirsî gelo: "Em ê heta kengî wisa rawestin?" Hevalan got: 'Kengî heval careke din fîşekan berdin, em ê li cihên xwe vegerin.' Ji ber ku her tişt ji bo min nuh bû, bêguman min gelek pirs dikirin û min dîsa berê xwe da Cemîl û min pirsî: 'Gelo sibe perwerde wê dewam bike? Cemîl got: 'Çi dibe bila bibe PKK dest ji perwerdê bernade.' Pirr neçû dengê topan qut bû û dengê sîlehên hevalan ên em li bendê bûn hat.

## ( 26 )

ROJBAŞ HEVAL

Hînê tarî li erdê bû, bi dengê 'rojbaş heval' nobetdar em hişyar kirin. Hevalên rabûn ji min re gotin: 'Tu îro mêvan î, tu dikarî neyê îçtîmayê.' Wexta hevalan wisa got, min careke din xwe dirêj kir û ez li bendê mam dinya gewr bibe. Min kêliyekê pelikên çavên xwe germ kirin. Piştre tîrêjên roja zêrîn li palên çiyê xistin. Di doleke li Kanî Qirêjê de jiyana gerîllayan, an jî gerîllayên perwerdê bi liv û lebat destpê kir. Ez rabûm min av li rûyê xwe kir û hêdî hêdî ber bi jêr ve daketim. Mangehên perwerdê di dolê de li derdora cihê perwerdê hatibûn çêkirin. Mangeh bi çilo mîna holikan hatibûn avakirin. Cihê perwerdê jî bi çilo hatibû çêkirin. Kamelya hema li binya cihê perwerdê bû. Hevalan dest bi taştê kiribû. Ez hêdî hêdî daketim ber bi kamelyayê. Qedehên çayê di teşteke tijî av de hatibûn danîn. Xirtomek avê jî serê wê di nava teştê de bû. Timî av diherikî ser teştê. Kê bixwesta çay vexwarana qedeha xwe ji wir digirt. Ava germ jî hema li kêlekê dikeliya. Ez wexta çûm, hevaleke kincên wê gelekî bi

rêkûpêk, serşuştî û guliyên wê hûnayî, li ber agirê ava çayê germ dikir rûniştîbû. Wê di şûna çayê de tiştekî din vedixwar. Min bala xwe da qedeha di destê wê de, wexta ew li vê yekê hayil bû, çavên wê yên cîncoqî keniyan. Yekser destê xwe dirêjî çaydankê li ser agir kir û got: 'Min çaya şîlanê çêkiriye tu dixwazî ji te re jî dagirim?' Ew çend rûyekî wê pak ê mîna kulîlkên çiyê hebû, belkî jî jehr bi destê xwe bidiya mirov ê nikarîbûya bigota na. Erê, min di şûna taştê de bi çaya şîlanê dest bi rojê kir. Min paşê navê wê hevalê pirsî û ji min re got: 'Rojda.' Ez di ber xwe de keniyam. Ji min pirsî ez çima dikenim. Min got: 'Min bi Rojdayê dest bi rojê kir.' Ew jî girnijî û got: 'Kurdiya te xweş e.' Ez jî keniyam û min got: 'Ev kurdiya ROJ-TVê ye.'

Hêdî hêdî heval li dora me kom bûn û gotin: 'Hevalê Cûma îro tê, der barê girîngiya perwerdeyê de dersekê dide.' Ji lewra her kes radiwestiya. Dema dersê hat û her kes ket bin holikê. Li pişt dîwanê wêneyekî mezin ê Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan hebû. Li cem wî jî ala Koma Civakên Kurdistanê KCKê daliqandîbû. Dîsa wêneyê hevalekî di şer de şehîd bûyî hebû ku perwerde li ser navê wî dihat lidarxistin. Ji lewra ji dewreya perwerdê re digotin; Dewreya Şehîd Behzat. Dîwan berî dersê agahiyên xwe yên der barê jiyanê û rewşên nû de dan û paşê pirsî ka kesek tiştekî dibêje yan na. Hê dîwan dipeyivî, endamê Konseya Rêveber a KCKê Cemîl Bayik bi navê di nava tevgerê de Cûma tevî parêzvanên xwe hat. Pêşî dîwanê ew pêşwazî kir û der barê dersê û hejmara beşdaran de agahî danê. Cemîl Bayik ket hundir û her kes ji ber rabû. Min gelek caran ew di dîmenan de dîtibû. Lê ji di dîmenan de cihê xuya dikir. Tayên porên wî pirranî sipî bûbûn. Mîna ku nerehet be, xuya dikir. Li dora xwe temaşe kir. Çav li min ket, lê mîna nebîne, tevgeriya. Bawer dikim ku bi vê xwest nîşan bide her kes li cem wan mîna hevdu ne. Paşê Bayik di dersê de behsa cihê perwerdê di dîroka PKKê de kir û got: 'Di dîroka me de cihê perwerdê girîng e. Perwerde karekî îdeolojîk e. Lewma Serokatiya me digot; nabe ku mirov karên îdeolojîk bide destên duyemîn. Em jiyanê bêyî perwerdeyê qebûl nakin. Li cem me her kes hem perwerdekar e, û hem jî şagirt e. Temenê hînbûnê nîne.' Cemîl Bayik dûrûdirêj behsa girîngiya perwerdeyê kir. Pirr bi hostayî gotinên xwe hildibijartin. Lib bi lib dipeyivî û timî bi yek tonî diaxivî. Timî bi awa û şêweyekî fikrên xwe dianîn ziman. Wexta behsa bîranînên xwe dikir, mîna noqî wan bibe li erdê dinêrî û disekinî. Dersê dirêj ajot û hema bûbû nîvroj. Bayik dersa xwe qedand û yekser derket û çû. Ji ber dersa dirêj her kes têra xwe westiyabû. Piştî Bayik çû dema bêhndanê bû. Di her navberê de çay dihat çêkirin. Di dema bêhndanê de beşdarên perwerdê li ser dersan guftûgo dikirin. Behsa bîranînên xwe dikirin. Her kes xwedî gelek tecrûbe û ezmûneyan bû. Her kes mîna pirtûk an jî romaneke nehatibe xwendin disekinî. Min jî bi baldarî dişopand ka ez ê çawa karibim ji vê lewh mehfûzê sûdê bigirim. Lê carnan min guman dikir, gelo ez çend dikarim bibêjim; min sûd werdigirt an jî ji vê Lewha Mehfûzê didiziya. Bêguman min nedixwest ez bibim dizekê vê xezîneyê. Min dixwest ez bi awayekî bigirim û bidim ku nebim firsendperestekî ji jiyana mirovan dixwe.

Bêhndana nîvro dirêj e. Di navbera kamelya û dibistanê de çend dar hene. Em li binya wan rûdinên û çayê vedixwin. Hevalek li kêleka min rûnişt û lingê xwe yê çêkirî derxist. Ez matmayî mam. Eger wî lingê xwe dernexista min ê nizanîbûya lingê wî yê texte ye. Ev hevalê bi navê Egîd jî weke pirraniya hevalan henûn bû û pirr zû ez pêre ketim nav sohbetê. Jixwe di nava gerîllayan de mirov ji roja pêşî xwe xerîb his nake. Têkilîdanîna bi hevalan re zehmet nîne. Jixwe tu bixwazî jî tu nikarî bi tenê bimînî. Ji sedî sed wê yekê nêzîkî te bibe û bipirse: "Heval tu çima bi tenê yî." Yanî mîna ku tenêbûn guneh be. Ez bi Egîd re sohbetê dikim û di vê sohbetê de hîn dibim ku ew jî gerîllayekî kevn e. Egîd yekser dikeve nava bîranînên xwe û pêde diçe: 'Em Payîzê di sala 1994an de çûn herêma Garisa. Girêdayî Erûhê ye. Gundê cerdevanan bû. Em ji mintiqa Çarşiyê çûn Garisa. Navê gundê wan Binêve bû. Di nava Garisa de li Bakur Herekol, li Rojhilat Pîro, li Başûr Girê Nîska, li Rojava jî Çarşiyê heye. Pêve girêdayî Erûh û Erûh a kevin heye. Me li Çarşiyê plana xwe çêkir ji bo em biçin Binevê. Em

taximek bûn yanî em bi qasî bîst kesan bûn. Me dixwest em çalakiyekê pêk bînin. Wexta em çûn tavhîv bû. Şeveke tam em meşiyan. Me xwe nêzî gund kir. Me keşif kir. Eger hebûya me yê pez jî bianiya. Piştî avdaniyê, bi qasî çar keriyan pez li pişt gund mexel kirin. Me jî xwe kir du beş. Me plana xwe çêkir. Hevalê Rizgar plana giştî çêkir. Her keriyekî pez du sê kes li ber bûn. Ez çûm min ew bêtesîr kirin. Hevala jin jî bi min re hat. Kûçik jî hebûn, lewma me sîr xwaribû. Kûçik ji ber sîrê nikarin bêhnê bikin. Şivanê keriyê pêşî rûniştibû stran digot. Wexta min destê xwe da milê wî got: 'El Xinas.'' Ez ketim navbera axaftina Egîd û min pirsî 'El Xinas yanî çi?' Egîd bi lez got: 'Ew herhal ayetekî Quranê ye' Egîd ev şîrove bi lez kir û ji cihê mayî dewam kir: 'Paşê jî li ber me geriya. Lavahî kirin û got: 'Em mirovên baş in.' Şivanê duyemîn bacan hûr dikirin. Li kêleka wî çifte hebû. Min hêdî çifta wî kişand pêre lê hayil bû, şok bû. Xwest xwe biavêje bextê hevala jin. Ez wexta çûm keriyê duyemîn reşek bi ber çavê min ket. Min dît kûçik e. Min ji hevalan re got; hûn bisekinin, ez ê vî kûçikî bêtesîr bikim. Min demançe xist destê xwe û min lingekî xwe rakir û mîna segan çûm. Ew tirsiya reviya. Pez jî hinekî veciniqî xwe da serhev. Şivan jî hat ez rabûm ser xwe û ew girt.' Egîd pir bi heyecan behsa çîroka xwe dikir û min xwe negirt ez dîsa ketim nava axaftina wî û min pirsî: 'Çima kûçik nehat te û reviya?' Egîd sekinî mîna nedixwest hevokên xwe yên piştre bên ji bîr bike, dîsa bi lez got: 'Berê tiştekî wisa nedîtibû.' Egîd bi vê gotinê re keniya û bi lez dîsa ji cihê mabû dewam kir: 'Me heft şivan tevî keriyan bi xwe re birin. Me sê ji wan tevlî gerîlla kirin. Ji wan sisiyan jî yek Welat bû.' Min jêre got: 'Yanî ev Welatê me?' Egîd bi serbilindî keniya û got: 'Erê, yanî fermandarê te yê tîmê.' Egîd bi tiliya xwe hevalekî din jî îşaret kir û got; Yek jê jî ev Osman bû. Hevalê din jî şehîd ket. Egîd lingê xwe dîsa xist cih û dewam kir: 'Ji ber ku erazî berê şewitîbû bi meşa pez re toz û dûman radibû. Pez bi qasî du hezarî hebû. Me pez ji Binevê di ser çend gundan re bir Çarşiyê. Li Çarşiyê gundên dewletê xirakirine hene. Çarşiyê bi xwe jî dikeve pişt Erûhê. Ev mintiqe û Çirav jî li hemberî hev in. Riya ji Erûhê diçe Şirnexê di navbera Çiravê û Garisa re derbas dibe. Me pez daxist Deşta Çarşiyê.' Egîd hînê dipeyivî heval ji bo dersa piştî nîvro kom bûn. Hevpeyvîna min bi Egîd re nîvco ma. Careke din firsend nebû em vê meseleyê temam bikin. Jiyaneke bi liv û lebat, têr û tijî ye. Rê nade ku tu têra xwe tiştekî bikî.

Em ê bikevin dersê, lê fermandarê me Welat ji ber ku Egîd behsa wî kir, nêzî min bû û got: 'Min ji wan re wê wextê jî got; erê hûn me dibin hûn çima pezê me dibin. Bi Xwedê wê wextê bavê min cerdevan jî nebû. Jixwe paşê bavê min hat çiyê cem hevalan û got: 'Temam min fêhm kir we kurê min bir, lê we çima pezê me bir?' Egîd li gorî qanûna eskeriyê ya îcbarî ya PKKê Welat tevlî gerîlla kiriye. Welat ev yek qebûl kiribû, lê hînê jî qebûl nedikir ka çima hevalan pezê wan aniye. Tevî ku sêzdeh sal derbasbûne jî Welat hîn jî dibêje: 'Hevalan neheqî li me kir.' Welat ji pez pirr hez dike û dibêje: 'Eger rojekê Kurdistan bi temamî azad bibe, ez ê keriyekî mezin ê pez xwedî bikim.' Hinekî dikene û dibêje: 'Eger Partî qebûl bike ez ê ji bo wê xwedî bikim.' Ev sohbeta bi min gelekî xweş hatibû li binê darê dimîne û dîsa ders destpê dike.

## ( 27 )

**gelek tişt hene li cem me, lê tahm di wan de nîne**

Piştî şîvê em li dora agirê çayê civiyabûn. Hevala Rojda dîsa di çaydankekî piçûk de çaya şîlanê dabû ser agir. Min jî xwe dabû benda çaya wê. Hevalek jî di destê wî de radyo li nûçeyên Dengê Mezopotamyayê guhdarî dikir. Di nûçeyan de digot; Nivîskarê Kurd Mihemed Uzun wefat kiriye. Min got: 'Rehma Xwedê lê be, ew jî çû.' Rojda li kêleka min bi tinazî got: 'Diyar e, tu gelekî li ber ketî. Ji ber ku ew jî mamoste ye?' Min got: 'Gelek

xizmetên wî di warê çand û pêşketina zimanê Kurdî de hebûn.' Min hê gotina xwe temam nekiribû Osmanê me yê Şirnexê xwe çeng kir û got: 'Dibe ku xizmetên wî ji bo ziman hebin. Binêre em jî ji bo ziman xebatê dikin. Ne tenê ji bo ziman, em ji bo welat xizmetê dikin.' Min fêhm nekir Osman ji çi gazinan dike û min pirsî: 'Osman tu ji çi gazinan dikî?' Osman bi devoka xwe ya Şirnexê pirr xweş û nerm diaxivî. Piştî ku qurtek li çaya xwe xist weha got: 'Serok Apo çend caran ji zindana Îmraliyê jêre silav şandin. Tembîh li gel kir ji bo xwedî lê derkevin, lê wî rojeke Xwedê du gotin ji bo Serok negotin.' Ya rastî gotinên Osman ji aliyekî bi serê min ketibûn û lewma ez bêdeng mam. Osman ê bêdengiya min dît, keysa wî çêbû û pêde çû: 'Yanî Rewşenbîriya wî bi qasî ya diya min jî nedibû. Wexta ez tevlî bûbûm. Ya rastî wexta hevalan ez bi qanûna îcbarî tevlî kirim.' Wexta Osman wisa got, min yekser pirsî: 'Ma ne, Egîd tu jî tevlî kiribûyî?' Osman di bin simbêlan re keniya, çavên xwe li derdorê gerandin ka Egîd heye yan na û paşê got: "Erê, wî malkambaxî ez tevlî kirim." Hevalên li dora me hemû keniyan û Osman dewam kir: 'Gundê me li Gabarê li palekê dikeve. Tev daristan in. Mîna cennetê ye. Cihekî avî û bi dehl e. Ez kurê malê yê mezin im. Mala me feqîr bû. Bavê min di sala 84 û 85an de mehkûm bû. Ji ber vê yekê têkiliyên bavê min zû bi partiyê re çêbûn. Paşê çûnûhatina hevalan hebû. Lê me nizanîbû ew heval in. Bavê min ji me re digot; ew xwazgîniyê xuşka te ne. Paşê li cem me cerdevanî zêde bû. Wexta malbata me bi ser min de dihat min digot: 'Ez ê tevlî hevalan bibim. Diya min wê wextê digot ew ji me re nabe kur. Diya min jineke biaqil bû. Bavê min digot em jêre jinekê bînin bila pêve bê girêdan. Lê diya min digot em bîla sedem mesrefê xwe nekin ew ji me re nabe. Hevalan ji gundên derdorê re digotin bila sîlehên xwe deynin. Lewma hevalan carekê avêt ser gundê me. Hevalek bi navê Hozan ji Nisêbînê li wir şehîd ket. Hevalan ez bi xwe re birim ji bo ez rê nîşanî wan bidim. Lê careke din ez venegeriyam. Ez 19 an jî 20 salî bûm. Paşê diya min û bavê min bi pey min ketin. Paşê çûnûhatina diya min çêbû. Diya min jî ji hevalan pirr hez kir. Me li herêmê çalakiyên baş çêkirin. Em wextê dadiketin gundên me nas dikirin. Wexta em bi kincên gerîlla didîtin heyran diman. Li herêmê ji ber ku ez dihatim naskirin, eskeran bi diya min girtin û anîn ser cîhazê û jêre gotin; bang lê bike bila were teslîm bibe. Lê diya min got; lawo binêre ez ji te re nabêjim were teslîm bibe, lê li aliyekî partî heye û li aliyê din jî dewlet heye, cihê xwe rast destnîşan bike. Lê ez dixwazim tu ji vê herêmê veqetî, ji ber ku tadeyê li me dikin. Welleh li ser gotina diya xwe min cihê xwe guhert.' Osman pêde diçû û xweş behsa xwe dikir. Ez yeqîn dikim ku bi sedema bawer dikir, ez wî baş guhdarî dikim pirr tişt li ser hev digotin. Min fêhm nekiribû çima van tiştan hemûyan vedibêje. Min got: 'Osman min fêhm nekir çi eleqeya van tiştan bi Mehmed Uzun re heye.' Osman got: 'Ez behsa diya xwe dikim. Dijmin jêre li ser cîhazê digot bibêje bila kurê te teslîm bibe wê digot ez ji te re wê nabêjim. Tu kîjan alî baş dibînî li wir bimîne. Paşê diya min wexta hînî hevalên jin bû, ji wan hîn bû ku di nava partiyê de perwerde heye. Diya min wê wextê ji min re got; lawo Osman tu çûyî perwerdê? Min jêre got; na yadê. Diya min got tu jî biçe perwerdê. Li ser salixdana diya xwe ez yekem car çûm Perwerdê, jixwe di nava 17 salan de ev perwerdeya min a duyemîn e.' Osman xweş behsa xwe dikir, lê bi rastî min hînê têkilî di nava diya wî û Mehmed Uzun de nikarîbû daniya. Lewma min xwe negirt û dîsa got: 'Osman min dîsa fêhm nekir.' Wexta min wisa got, piqînî bi hevalan ket û bû tiqtiqa kenê wan. Lê Osman di ya xwe de israr kir û got: 'Ma tu çi fêhm nakî, pepûkeke mîna diya min ku paşê bavê min cerdevanî qebûl kir, digot kîjan alî baş e li wir be û timî alîkariya gerîlla dikir, yekî mîna Mehmed Uzun qaşo rewşenbîrê Kurd e, li ser gerîlla du gotinan tu nikarî ji deva bibihîsî.' Bi gotina dawî ya Osman re min fêhm kir ku em li ser rewşenbîrî an jî ronakbîriyê dipeyivin. Ez dikarim li xwe mikur bêm ku min dereng fêhm kiribû. Ji ber ku tarî êdî ketibû erdê min korfêhmiya xwe di navê de veşart û careke din li çaydanê şîlanê vegeriyam. Çavên cîncoqî yên Rojdayê keniyan wexta ku min xwe dirêjî çaydankê şîlanê kir. Ew pirr kêfxweş bû ku min ji çaya wê ya şîlanê vedixwar. Çirûskên bizotên agir li ser rûyê narîn ê Rojdayê govend digirtin. Ji ber vê jî rûyê wê bi qasî yê periyekê di xeyalên me de bedew û bêguneh bû. Bi herdu destên xwe qedeha

xwe şidandibû. Gulîkên wê xwe heta ser derzika pişta wê berdabûn. Berê xwe da min û îşaret bi çaya şîlanê kir û pirsî: ‘Tiştên wisa li cem we jî hene?’ Min bi darikekî hinekî agir tevda û got: ‘Ya rastî, gelek tişt hene li cem me, lê tahm di wan de nîne.’ Rojda bi girnijîneke gelekî şîrîn got: ‘Ji bilî te hevalên din ji çaya şîlanê zêde hez nekirin.’ Min jî bi xweşî da ber û got: ‘Ma kî çêdike, ew girîng e.’ Bi vê gotinê re em bêdeng bûn û me bi hev re li nava çavê agir temaşe kir. Stêrk hat bîra min, lê nizanim çima min nexwest behsa wê bikim û lê bipirsim. Min ew jî di quncikeke tarî ya dilê xwe de hiland ji bo rojeke din. Fermandarê me Cemîl hat ev bêdengiya me xira kir. Dîsa destê xwe li pişta min xist û got: ‘Rabe em herin mangehê.’

## ( 28 )

### Gelek kêliyên erd û ezman di wan de lerizîn
### di gelî û newalên kûr de qewimîn

Fermandarê taxima me Cemîl, heval gelekî behsa wî dikin. Her kes jê gelekî razî ye. Behsa mêrxasiya wî û dilsoziya wî ya bi PKKê re dikin. Li gorî gotina hevalan, di nava partiyê de weke Apocî Cemîl jî tê naskirin. Wexta behsa wî dikin jî herî zêde behsa demûdewranên wî yên dijberiya wî ya bi Şemdîn Sakik re dikin. Şemdîn Sakik jî paşê teslîmî dewleta Tirk bûbû. Dibêjin yek ji wan kesan bû, li pêşberî tabûrekê demançe xistiye serê Şemdîn Sakik. Ji ber bejna wî ya kin jî hin hevalan jêre gotiye; Napolyon. Tevî ku gelek sal li çiyê bihurandine û di gelek şeran de cih girtiye hînê jî ji sîlehê têr nebûye. Hînê jî mîna şervanekî nû tevlî nav refên gerîllayan bûye, ji sîleha xwe hîç qut nabe. Sivik e, zû ji cihê xwe çeng dibe. Serboriyên xwe ji bîr nake û diyar e, ew wî li ser lingan digirin. Ji lewra jî xweş behsa serhatiyên xwe dike. Ji cixarekişandinê û vexwarina çayê re pirr kêfa wî tê. Nemaze bi xwe agirê çayê dadide û çaydanê xwe datîne ser. Porê wî şahîk e, û xwe ber ser rûyê wî dide. Ji temenê wî yê navsere ye, ji çi ye nizanim, lê bêhna mehkûmên berê jê tê.

Di nava PKKê de zêdetir her kes behsa kêmûkurtiyan dike. Başî û tiştên çê weke yên partiyê têne hesibandin û kêmasî jî mîna yên kesan têne qebûlkirin. Ji ber ku her kes xwe di mezinahiya rastiyê de dibîne, vê yekê bi hêsanî fêhm dikin. Belkî ji vê be, endamê Konseya Rêveber a KCKê Mistafa Karasu demên berê gotiye; Ez li şaşiyên PKKê jî xwedî derdikevim. Di nava PKKê de şerê çînî û cinsî bi dijwarî tê meşandin. Bi gotina Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ji sedî 95 têkoşîneke navxweyî tê meşandin. Di vê têkoşînê de kesên weke tasfiyekar jî hatine qebûlkirin hene. Di vî warî de ji têkoşîna dijber re jî xeta tasfiyeker tê gotin. Fermandar Cemîl pirr behsa vê yekê dike û bi xwe jî li dijî vê yekê li ber xwe daye. Dibêje: ‘Van kesên tasfiyeker gelek keç û xortên ciwan dan kuştin. Ez bi xwe jî heta îro çawa mame nizanim, lê ez dibêjim qey bi xêra wêrekiyê ye.’

Ez û fermandar Cemîl dîsa li jor bi tenê ne. Hevalên din li benda nûçeyan mane. Agirê binê çaydên tev dide, pif dike û ji nişkê ve serê xwe radike û dibêje: “Di şer de cesaret girîng e.” Ez dibînim reşika çavên wî diteyise. Paşê keniya û dîsa bi agir re mijûl bû. Dûman ketibû çavên wî. Xwe ji agir dûr kir. Hinekî li min nêrî û got: ‘Ez van teva ji te re dibêjim; belkî tu rojekê binivsînî.’ Min bi bîra wî xist ku gelek bîranînên gerîlla yên nivîskî hene. Ew bi gotina min keniya û got: “Bawer bike, heta niha tiştên hatine nivîsandin çaryek jî nînin.” Ji meraqa xwe min jê pirsî bê gelo çima wisa difikire. Kesereke kûr kişand û peyivî: ‘Gelek keç û xort di

nava refên gerîlla de tevî xeyalên xwe cih girtin. Lê di nava van refan de qehremanî û îxanet cêwî bûn. Haya gelekan ji wan ji vê yekê nebû. Gelek kêliyên erd û ezman di wan de lerizîn di gelî û newalên kûr de qewimîn. PKKê di nava xwe de pirr nîqaş kirin. Lê tenê PKKê guftûgo kir, ji ber ku ji wê zêdetir kesî nikarîbû, kesî nikarîbû vî barî hilgire.' Cemîl bi van gotinên xwe rawestiya û zoq li agir temaşe kir. Piştî bêdengiyeke di nava xwe de dikeliya got: 'PKK jî mîna agir e.' Ez hinekî li ser gotinên wî fikirîm. Hinek tişt tam bi serê min neketibûn. Min ew jê pirsîn: 'Tu dibêjî; nivîsandina PKKê zehmet e, lê tu ji min re dibêjî binivsîne. Di heman demê de tu dibêjî; tenê PKKî dikarin guftûgo bikin.' Min hînê pirsên xwe rêz dikirin ew ket navê û got: 'Bêguman, lê tiştek wexta yekalî were nivîsandin timî kêm e. Belkî ne yekalî, divê sêalî û nizanim çaralî were nivîsandin. Tu zêde xerîb nînî. Tu jî dikarî aliyekî din binivsînî.' Wexta wisa got, min dîsa pirsî: 'Ma ne te got PKK her tiştî guftûgo dike, bila wî aliyê din jî binivsîne.' Dema min wisa got rûyê wî şidiya, ciddî bû û got: 'PKK di nava xwe de vê yekê dike, lê ji derve re nikare bike. Ji ber ku dijminên PKKê pirr in û fikaran dike li dijî wê bêne bikaranîn, jixwe li Kurdistanê şerê herî mezin, şerê taybet e, tê meşandin.' Min jêre got: 'Belkî ew fikarên PKKê li cem min jî hebin.' Wê wextê pirqîna ken pê ket û got: "Welleh wê wextê tu jî nikarî baş binivsînî. Tu yê yekalî binivsînî." Me hînê wisa xweş sohbet dikir. Dijminan dîsa top berdan me. Ew bêdengiya xweş a şevê dîsa herimî. Beq û çirçirkên dola Kanî Qirêjê jî li ber dengê topan veciniqîn û derketin întîşarê yanî li eraziyê belav bûn.

## ( 29 )

**tiştekî tine be, em çima behsa wî dikin**

Ji nişkê ve gurmîn dîsa bi ezmên ket. Em ji cihê xwe çeng bûn. Min li saeta xwe mêze kir ji wexta 'rojbaşê' re jî demeke kin maye. Min di ber xwe de got; tu dibêjî qey rojbaş a me bi topavêtinê dikin. Me da pey fermandarê xwe û em çûn nuqteya xwe ya ji bo întîşaran hatibû destnîşankirin. Em li wir rawestiyan. Dijminan topên xwe bi navberên kin diavêtin. Ji ber ku danê sibê bû dengê topan zelal dihat. Ji roja ku ez hatibûm cihê perwerdeyê û vir ve hema bêje her roj top dihatin avêtin. Ji ber ku havîn bû jî gelek cihên top lê diketin agir bi daristanan diket. Gelek qadên nêzî me, li ber çavên me şewitîn. Hevalan digot; eger agir xwe negihîne qurmên daran tişt nabe, biharê wê ji nû ve kat li wan bikevin. Wexta top dihatin avêtin, hevalan hewl dida rewşê şîrove bikin û digotin; dijmin xwe amade dike di erdê re jî bikeve herêmên gerîlla yên li Başûrê Kurdistanê. Ji hêzên herêmê yên Kurd fikarên wan hebûn ku alîkariya dijmin û dagirkeran bikin.

Topên vê carê hatin berdan li nêzî me ketin. Hinek ji topan jî di ser serê me re derbasbûn û li palên pêşberî me ketin. Agirê bi daristanan ketibû xweş xuya dikir. Wexta mirov li şewata daristanê temaşe dikir û nikarîbû tiştekî bike, kizînî bi dilê mirov diket. Kîn û nefret, rik û xezebeke mezin diket dilê mirov. Çawa bihiştek bi vî rengî agir lê dihat barandin û li gelek deverên wê bi mîlyonan mayîn hatibûn çandin. Ji xwe re li vê kêmaqiliyê binêrin, van erdên şên û xweş, van erdên bi xêr û ber, van erdên ser û binî dewlemend di destê kê de bûya, wê debara deh welatan pê bikira. Lê van dewletên dagirker ên ji dil û mejî mehrûm, çawa ji heq hatibûn ku bihiştekê bikin mîna cihennemê. Mirov xwe nagire û di ber xwe de dibêje; Xwedê nehêle.

Topavêtin timî dibû sedem perwerde di dema xwe de dest pê neke. Lê nedibû sedem perwerde betal bibe. Tenê dihat gotin; eger dijmin di erdê re bikeve herêmê, wê kesên di

perwerdê de li nuqteyên stratejîk bêne bicihkirin. Li gorî gotina hevalan topavêtina dijmin rengê perwerdê jî guhertiye. Ango naveroka perwerdeyê hînê xurtir bûye. Jixwe li gorî hevalan şer, çê û neçê, qehreman û tirsonek, çewt û durist ji hevdu derdixîne û zelal dike. Lê ji dersan diyar dibe ku ji sala 1984an destpêka şerê çekdarî û vir ve, li ser têgihîştina şer guhertinên girîng çêbûne. Berê şer mîna armancê bûye. Ji lewra jî pîroz bûye. Lê bi demê re hatiye fêhmkirin, ji bilî rewşa parastina rewa şer qetil û qutûl e. Gerîlla di çarçoveya paradîgmaya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan destnîşankirî de têgihîştina xwe ji nû ve dihûne. Ji lewra jî ji bilî şerê çekdarî baweriya xwe bi hêza demokrasî, jin û ekolojiyê heye. Bi van jî bawer dike hin guhertinan bike. Tevî hebûna dewletên dagirker, baweriya xwe heye ku civakeke demokratîk biafirînin. Lê tevî gelek teorî û hêmanên îdeolojîk, guhertina kesayetê li Kurdistanê ji her tiştî girîngtir tê dîtin. Ji ber vê hindê her kes bi tirs, ji destpêkê ve xwe amade dike ji bo platforman. Berî van platforman her kes der barê xwe de dûrûdirêj raporê dinivsîne û di rojên dawî de li pêşberî koma hevalên perwerdê rexneyan li xwe digire. Di dawiyê de ji bo destpêkeke nû sozê dide. Ji bo vê yekê jî tespîta Ocalan a digot; li vir ne kes civak, ne kêlî dîrok tê analîzkirin, weke kilîta zêrîn a vê rastiyê her tê bibîrxistin.

Rayedarên PKKê wexta amadekariyên perwerdê dikin, ji her dever û tebeqeyên civaka Kurd û Kurdistanê mirovan tînin cem hev û bi vê hewl didin perwerdeyê dewlemend bikin. Ew weha li rewşê dinêrin; Kurdistan û kesayeta Kurd ji aliyê dagirkeran ve hatiye parçekirin. Ev rewşeke neyênî xuya dike, lê eger mirov rast nêzî rewşê bibe û bi şêwazekî durist bi ser de biçe, dikare vê rewşa neyênî bike erênî û heta dikare weke dewlemendiyekê jê sûdê bigire. Ev rêbaz di nava PKKê de tê şopandin û rewşên neyênî hemû di parzûnkê xwe re derbas dike. Bi vê yekê kesayeta li Kurdistanê hatiye qelskirin, xurt dike. Bi kurt û kurmancî mirov dikare bibêje; perwerdeyên PKKê mîna klînîkên derûnî ne.

Piştî ku roj bejnekê hilat, dengê topan jî qut bû. Piştî kêliyekê me xwe berda cihê perwerdeyê. Hevalê Enwer ji ber ku meraqa min a dîn dizanîbû ji min re got: ‘Wê êvarê hevalek ji PKKê bê, semînera li ser dîn û dewletê bide.’ Li ser vê min jî pirsî: “Çawa di dersa xwe de jêhatiye?” Enwer got: ‘Welleh nas nakim, lê dibêjin baş dersê dide.’

Ez di dersê de li dawiyê rûdiniştim. Bi vî awayî min dikarîbû baştir dersê bişopînim. Bi min re Xemgîn jî timî li dawiyê dima. Her tim bêdeng rûdinişt. Wexta dersê dest pê dikir hema destê xwe diavêt bêrîka xwe hebên qizwanê derdixistin û bi derzî û kêra xwe ji wan tizbî çêdikirin. Ti carî ranebû beşdarî dersê nebû. Min rojekê jêre got: ‘Xemgîn hema rojekê tu jî rabe çend gotinan bibêje.’ Li ser vê yekê, Xemgîn keniya, derzî di kuna heba qizwanê re rakir û got: ‘Tu rast dibêjî, lê ez karê lojîstîkê dikim. Ji bo lojîstîkê hewcedarî bi dersê nîne.’ Paşê destê xwe avêt bêrîka xwe û tizbiyeke qedandibû derxist. Tizbî dirêjî min kir û got: ‘Mamoste min ev tizbî ji bo te çêkiriye. Morîkên wê kêm in. Eger morîk hebûna min ê xweştir çêkira.’ Min tizbiya Xemgîn girt û malavahiya wî kir. Tizbiya xemgîn bi nûra çavan hatibû çêkirin. Min tizbiya wî xist bêrîka xwe û jêre got; Ez ê vê tizbiya te weke yadîgarekê hilînim.

Ji ber ku dersa nava rojê li ser dewlet û demokrasiyê bû. Êvarê semîner wê li ser Dewlet û Dîn bûya. Piştî şîvê em li benda semînerê bûn. Lê hevalê semîner bidiya hînê nehatibû. Digotin; wê bê, lê heye ku hinekî dereng bikeve. Em hemû li cihê xwe rûniştibûn. Her kes bi yê kêleka xwe, hinekî bi yê pêşiya xwe re ketibû sohbetê. Hevalê nobedar ji nişkê ve got: ‘Hişyar bin.’ Em bi hev re rabûn. Hevalekî rûyê wî gulover û esmerî çû dîwanê. Bejna wî ne kurt û ne jî dirêj bû. Li ser eniya wî hinekî xwêdanê dabû der. Ji ber bi lezhatinê hînê jî bêhna wî çikiyayî bû. Hundirê sinifê zêde rohnî nebû. Piştî ku ji me re got: ‘Kerem bikin rûnên’ hinekî çavên xwe li nava sinifê gerand û paşê deftera xwe ji bêrîka xwe derxist. Piştî ku çav li têbîniyên xwe gerand, hêdî serê xwe rakir û bi gotina ‘Hevalno dersa me li ser Dîn û Dewletê ye’ dest pê kir. Piştre mîna çavên xwe li tiştekî bigerîne, car din serê xwe rakir û li hevalên di sinifê de temaşe kir. Hinarkên rûyê wî keniyan û got: ‘Berî ku em dest bi vê dersê bikin, divê em hinekî li ser dîroka xwedawend û xwedayan rawestin.’ Hevalê ku min hînê navê wî nizanîbû, şêwe û awayekî xwe yê cuda hebû. Devliken bû. Mîna diponijî xuya dikir.

Diyar bû xetîbekî baş bû. Gotinên xwe pirr baş dicûtin û ji devê xwe derdixistin. Hevalê ez navê wî nizanim dest bi dersê kir: ‘Di dîrokê de xwedawend û xweda hene. Di hucreyên mirov û civakan de genetîzma xwedê heye. Ev hisa em behsa wê dikin û di şaneyên mirov de cih girtiye ji xwezayê tê. Di dîrokê de jî qonax bi qonax guheriye. Li qonaxa pêşî ya mirovatî hînê li qumatikê bû û di dergûşê de bû, bandora xwezaya bi rih li ser gelek bû. Her tiştekî di xwezayê de ji bo mirovan xwedî maneyekê bû. Bi vê yekê mirovan qencî û xirabî ji hev kirin. Dayika zarok dianî, şîr dida û diparast di nava komê de xwedî rûmeteke mezin bû. Bi vê têgihiştina ji xwezaya dida, dayika dida, bû xwedawenda civakê. Li dora vê dayika dida civak ava bû û têkilî li gorî wê çêbûn. Lê belê mêrê nêçîrvan bi demê re xurt bû û ji vê mezinbûna dayikê çavnebarî kir. Her nirx û buhayên dayikê afirandibûn, ji çavnebariyê berevajî kir. Ji lewra çîrok û çîvanokên dûrî aqilan li hev çêkirin. Beriya her tiştî qebûl nekir ku jin zarokan tîne û mirovatî jê zêde dibe. Ji lewra got; jin ji parsûyê mêr çêbûye û ji bo sebra mêr pê bê hatiye rûyê dinyayê. Ji zanîna wê çavnebarî kir û got; yê nûra vê dinyayê vemirandiye jin e. Ji lewra di pirtûkan hemûyan de îdîa kir ku ya mêr xapandiye jin e. Paşê jî jixwe hûn dizanin ji 124 hezar pêxemberan yek jî ne jin bû. Her tişt li ser navê mêrê qerase hat avakirin. Lê eger hûn li heykelên kevin binêrin hûn ê bibînin giş yên dayika xwedawend in. Bihevrebûna bi jinê re pîroz bû û bexteweri bû. Li vê jî xwe ranegirt, her liv û lebata wê ya rûsipîtî bû, wî kir orûsipîtî û weke karên xirab ên mêr ji rê derdixîne bi nav kir. Bi kurtî mirov dikare bibêje; mêrê bû xweda bi xisletên ji dayika xwendawend girt, dilovanî û zordestiya xwe gihand hevdu. Li hêza xwe hêz zêde kir. Bi mêr re jî mirov dikare bibêje hîmê dewletê hat danîn. Berî ku em behsa sîstema dayikê demokrasî û sîstema zilam, dewletê bikin, di vê mijarê de pirsa kesî heye.’ Pirr bi kurtî gelek tişt hatibûn gotin. Meraqa min jî li ser vê mijarê gelekî hebû. Her çend gelek pirsên min hebûn jî min yekê ji wan bikim. Ji ber ku ez ji ekranê nas dikirim, min çawa destê xwe bilind kir yekser mafê pirsê da min. Min pesnê têrûtijîbûna dersa wî kir û pirsî: ‘Li ser gotina Hallacê Mensûr a dibêje; ez Heq im pirr tişt têne gotin, gelo fikra te li ser vê yekê çi ye?’ Dersdarê me bi vê pirsê kêfxweş bû û got: ‘Bawer dikim ku bi bersiva vê pirsê wê dabaşa me çêtir bigihîje encamê. Hallacê Mensûr di salên 900î de dijî. Di van heyaman de desthilatdaran bêhn li civatan çikandiye. Sofiyên li medreseyan, şêxên di çilexaneyan de, muçtehîd û alim li rê û rêbazan digerin. Ji xwedayê heyî razî nînin. Serî rakirine. Dixwazin deriyekî vekin mirovatî pê bêhna xwe bide. Guftûgoyên gelekî xurt têne kirin. Jixwe li gorî fikra tesawifê ya Wehdet ul-Wicûdê xweda her der zevt kiriye. Ji lewra jî her kes bi awayekî qebûl dike, gerdûna heyî rengê xwedê ye. Xaliq û mexlûq di zikhevdu de ne. Mîna Melayê Cizîrî gotî:

Ferq e wahid ji ehed lê di meqamê semedî
Bi heqîqet ko yek in herdu çi wahid çi ehed
Yek e derya tu bizan qenc-i çi mewc û çi hebab
Di esil da ko hemî av e çi av û çi cemed
Afitabê ehediyyet di xwe da girtiye kewn

Bi vê re têgihiştina qederê jî ketiye ber nîqaşan. Di vê qonaxê de Hallac dibêje; eger mirov parçeyek ji wucûdiyetê be, wê wextê mirov bi xwe jê ye. Yanî ew bi xwe ye. Eger wisa be, çawa dibe ku mirovê ji xweda, yanî bi şeref wisa bi birçîbûnê û zordestiyê piçûk were xistin. Jixwe li hemberî vê helwesta serîrakirî, Îmamê Xezalî weke horsekî desthilatdaran di sedsala 12an de li serê ilmê dikeve. Deriyê îçtîhadê digire.’ Dersdarê me wisa bi kurtî nuqteya xwe li dawiya bersivê danî û bi awayekî ji xwe razî got: “Erê bi kurtî mirov dikare wisa bibêje.” Dersdarê me diyar e ji ber kêmbûna demê û berfirehbûna mijarê kurtebir bersivan û dersê dide. Mirov dikare mikur bê ku bi rastî di warê bersivadana kurtebir de têra xwe hoste bû. Ev şêwazê wî jî meraq û kakûniya mirovî sor dikir. Lê diyar e di sinifê de ji bilî min jî meraqdarê vê dabaşê gelek in. Ji ber vê yekê jî her cara dersdarê me dibêje; eger pirsên we

nebin em ê derbasî mijara xwe ya esasî bibin dîsa dest ji bo pirsan bilind dibin. Xemgîn ê li kêleka min ku hîç di ti dersê de ranedibû û nedipeyivî ji bo pirsê bike destê xwe bilind kir. Xemgîn kurt pirsî: 'Heval ma em Kurd ji çi bawer dikin?' Hevalê dersdar got: 'Ez bawer dikim ku te xwest tu bibêjî me Kurdan di dîrokê de ji çi bawer dikir?' Xemgîn mîna hevok bêyî dilê wî be, serê xwe bi maneya erê hejand. Dersdarê me bersiva vê pirsê jî weha da: 'Têkiliya Kurdan bi xwezayê re xurt e. Kurd ew mirov in, di dîrokê de yekem car gund û şaristanî li Mezopotamyayê afirandine, yanî li van rêze çiyayên Zagrosê yên em niha lê ne, civak li dora nirx û buhayên muşterek anîne cem hev. Zêdetir nêzî dînên xwezayî ne. Li gorî jiyana Kurdan roj û agir gelekî girîng in. Çanda agirgedetiyê li ser gelek civakan û dînan bandora xwe kiriye. Ji zerdeştiyan bigirin heta fîrewnan belav bûye. Li qesrên Sasaniyan agirê dihat dadan ê agirgedeyan bû. Xweda Ra yê li Misrê, xwedayê Ro bû. Ji ber ku Kurdan di desthilatdariyê de cih negirtin, zêdetir bi dînên xwezayê re bûn. Rîşê dînên Kurdan xwe berdan nava gelek dînên batinî. Li Harranê Henîf hebûn. Dînê Îbrahîm lewma balkêş e. Zerdeşt û Manî bi vê radibûn. Lê dînê Kurdan ê xwezayî kengî li qesran bi cih bû, ji Kurdan qut bû. Ji ber ku gelê Kurd ti caran di qesran de bi cih nebû. Yanî bi kurtî dînên Kurdan di dîrokê de dînên xwezayî bûn, lê paşê dînên ezmanî hatin û her tişt bi ya xwe kirin. Dîsa jî îro hûn dikarin gelek rîşên dînên kevin ên Kurdan di roja me ya îro de bibînin. Mînak di zarokatiyê de belkî we gelek kesan bi rojê sond xwariye û we gotiye a bi vê rojê.'

Ders bi pirsan dirêj dibû. Dersdarê me jî bi lez bersiv dida û dixwest dersa xwe temam bike. Bi bersivên kin û têrtijî dizanîbû agahiyan li gorî armanca xwe rêz bike. Ji nişkê ve zend û bendên xwe badan û got: 'Hevalno! Wexta me li ber qedandinê ye. Divê piştî dersê em yekser derkevin û biçin. Lê bi kurtî dixwazim çend tiştan bibêjim û biqedînim. Di civaka dayikê de her kes bi xwe hebû. Bi vê yekê hay ji xwe hebû. Lê her çend mirov xweperest bû, bêguman em behsa mêrê xweperest dikin. Qral xweda û fîrewnên mezin di dîrokê de derketin ser dikê. Di roja me ya îro de kapîtalîzmê her kes kiriye xweperest û ferd ji xeleka civakê qut kiriye. Bîrûbaweriyek li ser hîmê çanda dayikê dîsa ji mirovatiyê re pêwîst e. Çawa dayik zarokên xwe hemûyan himbêz dike, bîrûbaweriyek her kesî himbêz dike hewce ye. Em ji vê re dibêjin; demokrasiya komînal. Civak bêyî wijdan nabin. Ji ber ku têkiliyeke ji hev nabe di navbera bîrûbaweriyê û wijdan de heye. Çawa têkiliyeke ji hev nabe di navbera civak û ferd de heye. Ji bîr nekin, di dîrokê de egoîzma mezin bi qral xwedatiyê dest pê kir. Me xwedayên mezin kuştin, lê xwedayên piçûk li her deverê peyda bûn. Pêşiyên Kurdan jî dibêjin: 'Bê Xwedê dibe, Bê Xwedî Nabe.' Dersdarê me piştî van gotinên xwe bi lez deftera xwe xist bêrîka xwe û ji me re got: 'Şevbaş.' Gotina wî ya dawiyê mîna birûskekê li mijiyê min xistibû û bîra min a razayî hişyar kiribû. Gelo heye ku ev ew bû. Ji ber ku ez li dawiya sinifê bûm, heta ez derketim min dît dersdarê me û parêzvanê wî dane palê diçin, min lezand û ez çûm gihiştimê, min silavek dayê. Bêhna min çikiyabû. Helkhelk bi min ketibû. Tarî bû, me rûyê hevdu nedidît. Min got: 'Ez dizanim divê hûn dereng nemînin. Lê min xwest bibêjim dersa te gelekî baş bû.' Ew bi vê kêfxweş bû û wexta xatir xwest min bi lez navê wî pirsî. Keniya û got: 'Heval em te nas dikin, lê tu me nas nakî, navê min Xêrî.' Ez matmayî mabûm navê Dersdarê me Xêrî bû. Navê xwe got û mîna di çîrokê de di terka tarî ya şevê de çû xwar û wenda bû.

Piştî vê dersê min li ezmên temaşe kir. Li ezmanê bê serûbinî. Li ser hebûn û tinebûnê ponijîm. Mîna dersdarê me Xêrî gotibû; tiştekî tine be, em çima behsa wî dikin. Tiştek û gelek tişt hene. Lê înkar nabe. Belkî ya rast ew e, divê em li ser çawa hene bifikirin. Divê em rast nas bikin. Belkî xwedawend û xwedanenasiya me bi vî awayî be. Diyar bû, me xwe baş nas nedikir û diviyabû em hînê baştir nas bikin. Kî dizane belkî Xêrî rast digot. Xwedatî, xwedîtin bû. Heye ku di nava sînorên pêderxistin û pêhesînê yên teoriya kûantûmê de cîhanên haya me ji wan nîne hene û em xwe li nava zeviyên wan ên beyar bibînin. Jixwe sînorên me yên zanînê nedihatin zanîn. Her weha em xwedî wê hêzê nebûn ku li sînorên me yên nezanînê jî mikur bên. Em ji xwe hatibûn kirin. Çi bi serê me de anîbûn me nizanîbû. Em kiribûn ku em ji xwe

veciniqin. Kiribûn ku em xwe nas nekin. Em xwenenas bûn. Di cîhana me ya tarî de rohnî nebû. Çawa ku xwediyê qanûnên rohniyê Suhreverdî gotî; yê dibîne em nînin rohnî ye rêya me nîşan dike.

## ( 30 )

**Ev çend pere wê huzûra min bikire,**
**qet nebe ez dixwazim bi şev rehet razêm**

Paşîvê li cem Kurdan her tim vexwarina çayeke qaçax ango qedexekirî xweş e. Li cem gerîlla her wextê çay xweş e. Lê ji dema min çaya şîlanê ya Rojdayê nas kiriye, ji bo min jî çaya şîlanê ye. Rojda gelek nefspiçûk e, wexta min dibîne hema yekser destê xwe diavêje îskaneke din û bêyî bipirse ji min re çayeke şîlanê dadigire. Ew jî dizane ez êdî berdestiyê çaya wê me. Lê ez hînê nizanim bi rastî ez berdestiyê çaya Rojdayê me yan jî berdestiyê wê bi xwe me. Ji ber ku Rojda ew çend narîn e, vexwarina çayê bi wê re jî ew çend xweş û tiştekî peyda nabe. Piştî şîvê Rojdayê xwe dabû ber êgir û çaydankê wê yê şîlanê li ser agir bû. Yekser ji min re çaya şîlanê dagirt û got: “De were kurikê Ewrûpayê, ji bo tu me ji bîr nekî em çayeke şîlanê bidin te.” Bêguman kêfa min ji îkrama wê re hat, lê gotina ‘kurikê Ewrûpayê’ li min xweş nehat û min ev jê re got. Lê wê bi rûkeniya xwe bersiv da û got: “Tu çend qebûl nekî jî tu ji gelek aliyan ve ketiye bin tesîra jiyan û fikra Ewrûpayê.” Min jî yekser lê vegerand û got: “Ma xirab e, mirov hin tiştan ji Ewrûpayê bigire?” Ew jî ji bo bersivê amade bû û got: “Na ez nabêjim mirov hinek tiştan jê negire, yan jî nagire, lê taybetmendiyên egoîzmê li cem we zêde kirine.” Sohbeta bi Rojdayê re xweş bû. Mirov ji şêwazê wê nediêşiya. Her çend gelekî dijwar rexne bikira jî mirov pê nediêşiya. Em hînê wisa dipeyivîn hevalê Enwer hat destê xwe danî ser milê min û got: “Hevalên semîner bidana xwe amade nekirine, eger tu hez bikî tu dikarî li şûna wan semînerekê di warê çapemeniya Kurdî û karê xwe de bidî hevalan” Ez hinekî sekinîm û hinekî dudil bûm, bi rastî min ê karîbûya ders bidaya. Min hînê tiştek negotibû hevalê Enwer dewam kir û got: “Zêde nefikire, tu mecbûr nînî pirr bi rêkûpêk bidî, hema çi li bîra te hebe ji hevalan re bibêje, jixwe pirsên wan jî hebin tu bersivê bidî temam e.” Piştî Enwer hema yekser Rojdayê dora axaftinê girt û got: “Welleh te gelek tişt ji me girtin û tu hîn bûyî, de tu jî hinek tiştan ji me re bibêje û bide” Piştî van gotinan ez tam bêgavî bûm û bêdestî xwe min qebûl kir. Ez bi lez derketim jor çûm mangehê min deftera xwe anî ya ku hin agahiyên der barê karê min û karê televîzyonê de têde hebûn.

Ez wexta daketim jêr, heval bi tevahî rûniştibûn û li benda semînerê bûn. Hevalê Enwer jî li benda min bû. Ez û ew ê li dîwanê rûniştana. Min his kir ku heyecaneke mezin bi min girtiye. Ez fikirîm ku ez ê çawa dest pê bikim û çawa ji van mirovên leheng re bipeyivim. Em wextê derbasî dîwanê bûn tevahiya hevalan bi yekcarê rabûn ser xwe û min li Enwer nêrî û wî li min nêrî, em wisa sekinîn, paşê wî fêhm kir ez jî li benda wî me. Hevalê Enwer ji tevahiya hevalan re got: “Rûnin!” Paşê berê xwe da min û tenê got: “Kerem bike!”

Ez pêşî fikirîm behsa karê xwe bikim û bibêjim; heye ku ez bê hemdî gotinan dugîsinî bikim û ev yek jî pirrî caran we zivêr bike. Heye ku ez şopgerek û şopbirekî bi dilê we nebim. Ji ber ku rojnamevanî nêzî şopgeriyê ye. Eger hûn min baş bişopînin ez ê karibim we bibim ser şopê yan jî nêzî wê. Şopgerek her mû, ta û pirtikê li hewayê dilebite yan jî mîna bêdeng rawestiyaye xuya dike li ber çavan digire. Lê ez paşê fikirîm ku ez wisa dest pê bikim wê gotinên min ên bi vî rengî zêde bibin gotinên mirovekî şinnek, gewî û ji ser xwe çûyî. Wexta min serê xwe rakir min dît ku her kes li benda min e, ji bo ez tiştekî bibêjim. Min jî bi gotina: “Bêguman hewce nake ku mirov behsa bi kêrhatin û girîngiya televîzyonê bike” dest bi

axaftinê kir. Ji bo destpêkê ev hevokeke sivik û xirab nebû. Û min bi heman sivikiyê dewam kir: "Ji ber ku li ber çavan e, çawa dikare dîmenan û dengan bi hev re veguhezîne cihê em lê ne. Ji lewra televîzyon di sedsala me de hînê jî ji wan pêdiviyan e, hema bêje jiyan bêyî wê nabe. Kesê vê qutiya sihrî vedît Skoçiyekî bi navê John Logîe Baîrd e.[6] Baîrd di 26'ê Çileya 1926'an de vedîtina xwe bi Enstîtuya Qraliyetê da naskirin û di sala 1928an de dîmenên pêşî di ser Okyanûsa Atlas re derbasî aliyê din bûn. Ango dîmen ji Londonê derbasî New Yorkê bûn. Bi vî awayî Baîrd stasyona pêşî ya televîzyonê saz kir û ji bo BBC'yê dest bi weşanê kir.'

Ez di vê mijarê de hînê wisa sivik û dirêj dipeyivîm, min dît fermandarê me Cemîl destê xwe bilind kir. Min got: "Fermo heval." Hinekî bi dengekî nizm axivî û got: "Heval agahiyên hûn didin girîng in, lê em dixwazin hûn zêdetir der barê karê xwe û çapemeniya Kurd de agahiyan bidin me." Min fêhm kiribû, ne tenê Cemîl, hevalên din jî bi giranî hemfikir in ku ez behsa çapemeniya Kurd bikim. Lê min dixwest ez ji wan re bibêjim; mûcîtê televîzyonê Baîrd ku di sala 1946an de çavên xwe li jiyanê miçandin, tevahiya jiyana wî di nav xizaniyê de derbas bû, lê dema şîrketekê ji bo patenta televîzyonê 100.000 pound teklîfî wî kir, hîç nefikirî red kir û gotina xwe ya delal û zêrîn got: "Ev çend pere wê huzûra min bikire, qet nebe ez dixwazim bi şev rehet razêm." Lê min dît zêde keysa min tine ez behsa ew çend bûyeran an jî agahiyan bikim.

Min li nava çavê her kesî mêze kir û gotina ew pê kêfxweş bibin got: "Karê televîzyonê bi saya gerîllayan dimeşe." Min ê paşê behsa wê bikira çima ev yek wisa ye, lê diviyabû kurt û Kurmancî hinek agahiyên der barê karê çapameniya Kurdî de bidaya.

Min nexwest ez behsa yekemîn rojnameya Kurdan rojnameya Kurdistanê ya li Qahîrê dest bi weşanê kir bikim. Lê diviyabû ez bibêjim çapemeniya Kurd zêdetir li derve karîbû li ser lingê xwe bisekine û ji bo pêşketinê keysê bibîne. Bêguman gelek tişt hebûn her kesê amade dizanîbû, lê gelek tişt hebûn her kesî nizanîbû. Her kesî dizanîbû; MED-TV yekemîn televîzyona Kurdî di sala 1995an de dest bi weşana xwe kir. Wexta Kurdan dest bi weşana satalaytî kir, dewleta Tirk hînê nû destpê kiribû. Li rojhilata Navîn hê gelek dewletan dest bi weşanê nekiribû. Paşê ev ekrana ji bo Kurdan şoreşek îfade dikir, mîna kelemekî di çavên neyaran re çû. Ji lewra di sala 1998an de hat girtin. Paşê MEDYA-TV hat vekirin û paşê ew jî hat girtin û herî dawî li ser vê mîrateyê ROJ-TV weşana xwe dewam kir.

Erê, ne min got; gelek tişt hene her kes nizane. Belkî diviyabû min behsa wan bikira, lê ew jî min nizanîbû ez ê çawa bibêjim, bînim ziman. Lê min xwest ez behsa MED-TVê bikim. Ji ber ku ew hîmê çapemeniya Kurd bû, yan jî mirov dikare bibêje ew çavkanî û zanîngeh bû. Di encamê de em gelek kes ji wir bi firrê ketibûn. Û min destpê kir: "Di dîroka cîhanê de cihê televîzyonê zêde kevin nîne. Tevî ku Kurdistan bi sedsalan mêtingeh e, û gelê Kurd şerpeze hatiye hiştin jî li gorî dewletên li herêmê û dewletên dagirker Kurdan zû televîzyon nas kir. Dewleta Tirk di sala 1992'an de dest bi weşana televîzyonê ya satalaytî kir. Ereban jî di sala 1993an de destpê kir.

Gelê Kurd ê neçar guh dida radyoyên Êrîvan û Bexdayê. Li Başûrê Kurdistanê di serê salên 1990î de bû xwediyê ezmûnên herêmî yên televîzyonê. **Xebat-TV** jî di sala 1992'an de li Duhokê hat damezrandin. Lê belê gelê Kurd di 30 Adara 1995an de ku hîç xeyal nedikir, bi

---

[6] . John Logîe Baîrd di sala 1888an de li bajarê Helensbûrgê ji dayik bûye. Her çend Baîrd li dibistanê dersên wî baş nebûn jî li **Glasgow and West Scotland Technical Collegê** destûrnameya endezyariyê wergirt û li zanîngeha Glasgowê li ser zanistê dest bi dersan kir. Di dema şerê cîhanê yê yekemîn de navber da xwendina xwe. Serî li artêşê da ji bo bixebite lê nehat qebûlkirin. Di vê navberê de li hin cihan xebitî, lê belê ji ber pirsgirêkên tendurustiyê dest ji kar berda. Di sala 1922an de vegeriya cihwarê xwe Sussexê û dest bi karê tamîrê kir. Baîrd yekem car li vir li ser çêkirina televîzyonê fikirî. Her çend derdora wî henekê xwe pêkir jî ketibû serê wî ku ew ê karibe deng û dîmen bi derfetên teknîkî veguhezîne. Tevî ku rewşa wî ya aborî baş nebû jî pir xebitî û modêla yekemîn a televîzyonê yan jî Televîsorê çêkir. Bêguman televîzyona pêşî wek a îro nebû. Ji ber ku Baîrd televîzyona pêşî bi çend derziyên dirûnê, tenekeyeke mezin a biskuwîtan, lampeyeke bisiklêtan û ji şimaya morê pêkanî. Paşê xebat hînê bi heyecan hatin meşandin û Baîrd di xurdexaneya xwe de sala 1925an televîzyona xwe ya pêşî ya bi navê Stokey Bill serketî çêkir.'

20 kesên amator dest bi weşana televîzyonê ya satalaytî kir. Dest bi weşana **MED-TV**ê kir. Ya rastî MED-TVê ya bi 45 deqeyên testê dest bi weşanê kir, ne tenê Kurd, hewl dida bibe dengê kom û civakên li Rojhilata Navîn hemûyan. Ji bo vê jî bi tevahî bîrûbawerî, hindikahî û gelên li herêmê karîbûn di vê televîzyona Kurdistanî de cih bigirin. MED-TVê di 15ê Gulanê de bi rêkûpêk rojê 3 saetan dest bi weşana xwe kir û di 1ê Cotmeha sala 1995an de weşana xwe derxist 6 saetan. Bi MED-TVê ne tenê di warê çapemenî û ragihandinê de şoreşek pêk hatibû, her weha di warê siyasî, çandî û civakî de jî şoreşek qewimî. Her çend di vê qadê de hin ezmûneyên Kurdan ên herêmî hebûn jî, ev yekem car bû, deng û rengê Kurdan li ezmanên navneteweyî digihîştin hevdu û govend digirtin. Kurdistanî bi vê neynikê şa bûn, bi hev hesiyan û hev nas kirin. Sînor û bendên di navbera wan de hatibûn danîn bi vê ekranê rakirin. Kurdistaniyan bi vê qutîkê dengê xwe digihandin hevdu û fikrên xwe parve dikirin. Ji bo vê jî Kurdistaniyê li serê çiyê jî çêleka xwe ya bi tenê firot û pê sêlek kirî ji bo lê temaşe bike. Kurdan ji hev re behs dikirin çawa di filmê karton de çêlek û kîso bi zimanê Kurdî dipeyivin. Ji lewra jî fêhm nedikirin ka çima çêlek jî bi Kurdî dipeyivin, lê dewleta Tirk xwe nêzî vê yekê nake û heta qedexe dike. Ma tenê Kurd matmayî mabûn, na, bi wan re rojnamevanên navneteweyî jî matmayî mabûn û bala wan kişandibû televîzyonekê çawa bandor li ser gelekî kiriye. Rojnamevanên navneteweyî ku MED-TV weke televîzyona ciwanan bi nav dikirin, bi awayekî şaşmayî didîtin ku pîr û kal, zarok û ciwan, jin û mêr, ji heft heta heftê salî her kes ji serê sibê heta êvarê temaşe dike. Her kes bi hev re li filmên karton mêze dike.” Wexta min ev gotin, her kes bi hev re keniya. Min dît destên hevalan ji bo pirsan bilind bûn, tevî ku min negotibû; gelo pirsên kesî hene yan na. Ev di heman demê de dihat wê maneyê ku dereng bûye. Min dîsa mafê pirsê pêşî da hevalê Cemîl. Pirsa wî pirsa min bû ku min gotibû ez ê behs bikim çima bi saya gerîlla televîzyona Kurdî dikare weşanê bike. Min jî bi kurtî bersiv da û got: “Pişta mirov nebe” min hê neqedandibû her kesî merama min fêhmkiribû, bi dengekî bilind bû tiqtiqa kenê wan. Min jî hewce nedît ez temam bikim. Ji ber ku dereng bû min êdî bi kurtebir bersiv didan. Meraqeke zêde hebû. Ji kesan heta dengbêjan gelek pirs dihatin kirin. Li ser gotegotên hin pêşkêşvanan heta makyaja me, gelek pirs hatin kirin. Lê dereng bû û me ders bi derengî qedand.

Bêguman gelek tişt nehatibûn gotin û dilê min li cih nebû. Ji ber ku diviyabû gelek tişt bihata gotin. Bûyerên li pişt kamerayê jixwe hîç nehatibûn gotin. Li derketinê, Rojdayê bi henekî got: “Diyar e, hûn li ser pişta me weşanê dikin.” Min jî got: “Na, em li ser pişta we weşanê nakin, kesên li cem me xebitîn û tevlî nav refên gerîllayan bûne hene.” Wexta min wisa got matmayî ma û pirsî: “Kî heye, min qet nebihistiye?” Min jêre behsa hevala Stêrk kir. Wexta min wisa got, deng ber bi guhê Cemîl ket û got: “Ew heval niha li Cûdiyê fermandar e.” Ez bi heyecan bûm û min jê pirsî: “Ma tu wê nas dikî?” Cemîl bi awayekî jixwe razî got: “Erê, ew ji cem me çû, yanî me ew perwerde kir.”

Piştre operasyona li dijî Studyoyên MED-TVê hat bîra min. Di 18ê Îlona 1996an de hêzên dewleta Belçîkayê avêtin ser studyoyên ROJ-NV yên li navçe Denderleeuwê. Di serdegirtinê de ji 200î zêdetir cindermeyî cih girt û tevî mêvanan xebatkar hatin binçavkirin, studyo û arşîva televîzyona me hatin morkirin. 5 rêveberên televîzyonê 40 rojî girtî man. Di nava wan de Stêrk jî hebû. Dewleta Belçîkayê her weha dest danî ser 13 mîlyon mark ê şîrketa **ROJ-NV** û 5 mîlyon frankê Swîsreyê pereyê satalaytê desteser kirin. Jixwe nizanim hewce dike ku ez bibêjim, pereyên behskirî giş quriş bi quriş ji nava gelê Kurd ê xizan hatiye berhevkirin. Operasyona dewleta Belçîkayê bi navê **Spoutnîk (rêheval-Peyk)** pêk hat. Hevala Stêrk piştî vê operasyonê gelekî bi hêrs bûbû. Ji lewra hînê zêdetir bi biryar bûbû ji bo biçe gerîlla. Ji ber ku gelek caran dianî ziman ku kapîtalîzm qefeseke zêrîn e, mirov têde hepiskirî ne.

# 31

**Çemê biherike qirêj nabe**

Rojên perwerdeyê têrûtijî derbas dibin. Kêliyên mirov bi navê dema vala bi nav bike nînin. Ji lewra mirov nizane dem çawa dibihure. Lê qonaxa dawî ya perwerdeyê ji bo her endamê perwerdê pirr girîng e. Rojên dawî yên perwerdê qonaxa rapor nivîsandinê û platformên rexnekirin, rexnelixwegirtinê ne. Her kes pirr bi heyecan dinivîse. Mîna bawermendekî derkeve huzûra Xwedê çawa destnimêjê digire û xwe paqij dike, her wisa şagirtên dibistanê jî xwe amade dikin. Her kes bi awayekî nedîtî, bi berpirsiyariyeke mezin rapora xwe dinivisîne. Ez jî weke her kesî xwe didim aliyekî, hin têbînî û çavdêriyên xwe dinivisînim. Heval jî henekan dikin û dibêjin; Mamoste tu jî rapora xwe dinivisînî. Ev hevoka em pê dikenin, ya rastî min difikirîne û ez di ber xwe de dibêjim; rast e, divê ez jî rapora xwe binivisînim. Ez li fermandarê taximê me Cemîl dinêrim. Bi heyecaneke mezin li ser nivîsandina rapora xwe disekine. Ez xwe bi xwe dibêjim; Xwedê dizane heta niha çend rapor nivîsandine. Ez meraq dikim û dipirsim. Wî bersiveke ez li bendê nebûm da. Got: ‘Min di nava bîst sal gerîllatiya xwe de du caran rapor bi awayekî ciddî nivîsandiye. Ev jî ya sisiyan e. Min di ya duyemîn de ji serokatiyê re gotibû; ez naxwazim bi vî awayî ji te re raporê binivsînim. Pratîka min ê rapora min be. Kêfa Serokatiyê ji vê helwesta min re hatibû, lê dîsa jî ji hevalan re gotibû; bila binivsîne.’ Cemîl piştî van gotinên xwe dîsa li raporê vegeriya û xwe bi ser rûpelan de xûz kir. Min meraq kir û pirsî gelo çend rûpel nivîsandine. Bersiva wî dîsa ez matmayî hiştim. Cemîl sîûsê rûpel rapor nivîsandibû. Min jêre got: ‘Welleh tu jêhatî yî, te pirtûkek nivîsandiye.’ Ew keniya û got: ‘Ma ev çi ye. Ev tenê hin bûyerên girîng in, ez dinivsînim ji bo di arşîva partiyê de bimînin.’ Ez xwe nagirim û dîsa jê dipirsim; gelo piştî evqas sal ew jî ji bo rabûna platformê bi heyecan e. Cemîl li xwe mikur tê ku bi rastî bi heyecan e, ji ber ku li dîwanê wê Cemîl Bayik hebe. Piştî vê ez jî platforman meraq dikim.

Cemîl Bayik ji wan kêm kesan e, ji destpêka PKKê digihîje heta îro. Belkî ji vê be, ji PKKê re dibêjin; Partiya Şehîdan. Ji kongreya yekemîn a PKKê (1978) heta kongreya wê ya heştan (2002) çar kes li kongreya heştan hebûn. Yek jê jî Cemîl Bayik bû. Yên din jî Elî Heyder Kaytan, Dûran Kalkan û Sakîne Cansiz bûn. Ciwanên ku ji welatê xwe yê birçî hatibû hiştin û ewrên cehaletê yên reştarî li ser digeriyan, berê xwe dabûn paytexta ku ev dekûdolab li serê wan digerand. Paytextên desthilatdariyan zarokên qewmê çiyê ber bi xwe ve dikişandin. Cemîl Bayik yek ji wan kesan bû, berê xwe dabû paytexta Tirkiyê Enqerê. Xwestibû li wir bixwîne û di nava vê dewletê de cihekî bigire. Rengên bajêr ew ji Kurdistanê ber bi xwe ve kişandibûn. Cemîl Bayik ê di sala 1954’an de li Elezîzê ji dayik bûyî, heta salên heftêyî li Enqerê xortekî dîndar e. Piştî ku PKKê nas dike an jî bi navê wê demê li Apoyiyan rast tê li fikrên sosyalîzmê xwedî derdikeve. Li zanîngehan şoreşgerên Tirkiyeyî nas dike. Di sala 1972’an de li komkujiya Qizildereyê û piştre hatina darbeya eskerî ya 12’ê Adarê şahidiyê dike. Di nava wî agirê li zanîngehan de bi fikrên nû radibe û di nava Apoyiyan de li fikra Kurdistanê serwext dibe. Lîderên mezin ên şoreşgerên Tirkiyê yên mîna Denîz Gezmîş û Mahîr Çayan nas dike. Mêrxasî û hezkirina van şoreşgeran ji bo welêt dibîne û bawer dike ku ev kes berdevkên rastiyê ne. Dilê Cemîl Bayik jî bi van şoreşgeran germ dibe û darvekirina van şoreşgeran êşeke mezin dixe dilê wî û hevalên wî. Koma Apociyan vê êşa xwe dike rêxistin. Koma Apocî ji sala 1973’an heta 75’an kadroyên xwe bi rêkûpêk dike. Koma Apoyiyan xwe li dora komeleya xwendekarên zanîngehê ADYODê baş bi rêxistin dike. Zarokên Kurdan ên xwe li Enqereyê girtibûn hêdî hêdî li xwe hayil dibin. Her çend baş nizanîbûn jî bawer dikirin ku bayek wan ber bi welêt ve dikişîne. Dîsa pirr neçû pê derxistin ku welatê wan Kurdistan mêtingeh e. Ji lewra jî xwendekarên şoreşger ku piraniya wan Kurd bûn, 1977’an di civîna li Dîkmen a Enqerê de biryar dan vegerin Kurdistanê. 16 beşdarên civînê hebûn, yek jê jî Cemîl Bayik bû. Di bin serê dijmin û dagirkerên Kurdistanê de ev

biryara dîrokî tê dayîn. Ev koma bi navê Apoyiyan an jî Şoreşgerên Kurdistanê dihat naskirin li Kurdistanê baş reh ber dide û di sala 1978'an de biryara partîbûnê dide. Partiya Karkerên Kurdistanê PKK bi vî awayî di dîroka nêz a Kurdistanê de qonaxeke navê vejîn lê were kirin ji bo Kurdistaniyan dide destpêkirin. Cemîl Bayik jî di nava vê tevgerê de salên dûrûdirêj dibihurîne. Di nava PKKê de Cemîl Bayik yek ji kesên xwedî gotin e. Ji lewra jî ez jî dixwazim vê kesayetê hînê baştir nas bikim. Ji ber ku dizanim, PKK tevgerek e, li ser agir dimeşe û ji lewra jî kêm kes têde temendirêj in.

'Çemê biherike qirêj nabe. Ji bo rastiyan, ji bo xwe rastkirinê şaqûlek me heye, ew jî rexne ye. Rexnekirin û rexne li xwe girtin karê mirovê mezin e. Serdest timî rexne dikin, lê nikarin xwe li rexneyan rabigirin. Lê mîna Hz. Muhammed gotî, şerê mirov di nava xwe de dike cîhada ekber e, yanî şerê mezin e. Em gemarbûyînê xweş nabînin, lê em kengî xweş dibînin, wexta piştî wê paqijkirin hebe. Rexne ji bo me, piştî pratîkê xwepaqijkirin e. Eger tiştek mirovî nekuje mirov xurt dike. Rexne heye ku we biêşîne lê we xurt dike. Mirov li keviyên kendalan bi firrê dikeve. Yanî mirov di nava zehmetiyê de dipije. Divê mirov li ber xwe bide. Ji ber ku berxwedan mirov dibe serketinê, tu destê xwe jî berdî ber xwe tu yê biçî îxanetê. Bêdengî jî nabe. Kole bêdeng in. Keda wan hatiye desteserkirin. Hay ji xwe hebin! bila bêdengiya we nebe ya koleyan. Ji ber ku mafên we jî hatine desteserkirin. Ji lewra em ê bêdengiya we li vir qebûl nekin. Em Tevgereke wisa ne, ne ji bizinê, ji nêrî şîr tînin. Li vir hûn mîna daneyên li bin kevirên aş têne hêran, hûn kevir bin jî hûn ê bêne hêran. Ev riya me ye, yên nezan ji rê dernakevin, ji ber ku ti riyek wan nîne, yên zana nakevin rê, lê riyek wan heye. Em nekevin rê jî riyek me heye. Ango armancên me hene. Em ji hindikayiyê pirraniyê, ji pirtikekê gidîşekê diafirînin.'

Cemîl Bayik bi van gotinên xwe bal kişand ser girîngiya rexne û rexnelixwegirtinê berî destpêkirina platforman. Bi van gotinan re her kes amade dibe, xwe ji kêmasiyên xwe daweşîne. Bi vê re, heyecana destpêkeke nû dikeve dilê her kesî û di heman demê de fikar jî têne kirin ku bi sozên bêne dayîn re barê giran ê were hildan, wê karibe rake. Bêguman ji axaftinên bi mehan dihatin kirin û bi têgihiştina li dîrok û xwenasiyê barê ne sivik girantir dibû. Dîroka welatekî, dûrûdirêj, bi mehan hatibû guftûgokirin û li ser sedemên bindestiya gelê Kurd û gelên herêmê hûrûkûr hatibû sekinîn. Ji bo rastkirina vî gunehê dîrokî behsa gelek berxwedanên dîrokî jî hat kirin. Gelek şoreşên cîhanê ji bo çareseriyê mînak hatin nîşandan û ji kêmasiyên wan jî ders hatin derxistin. Bi vê giraniyê her kes radibû û li rûyê wan vê yekê xuya dikir. Li dora min zarokên dilsoz ên welatekî hebûn. Van zarokan xwe dikir agir û diavêt ser dijminên welatê min. Xwe dikirin mertal li dijî êrîşên dagirkerên welatê min. Xwe dikirin aveke tîna erdên tîbûyî bişkîne. Ji bo wekhevî û azadî bê Rojhilata Naverast a şaristaniyê lê destpêkiriye, hebûna xwe ya mezin canê xwe didan. Di nava vê komê de dilê min jî keliya û ez fikirîm gelo di navbera min û yan jî gelek kesên din û van zarokan de çi ferq heye? Çima hinek weha bêyî dudil bibin dikarîbûn bi ser devê topê de biçin û çima hin kesên din li cihê xwe rûniştîbin? Min dizanîbû her kes nabe yek. Belkî ev gotina min bi xwe jî bahaneya min bû, min diafirand û min ê pê dilê we hênik bikira. Erê, min di ber xwe de got; gelo ez çi dikarim bikim? Gelo hezkirina min a ji bo welatê min û zimanê Kurdî yê min îdîa dikir ez jê hez dikim çiqasî ji dil bû? Li hemberî zordestî û mêtingeriyê gelo ya min dikir çi bû? Jixwe wan jî em weke 'rewşenbîr' bi nav dikirin û zêde tiştek jî ji me nedixwestin. Tenê digotin hûn jî piştgiriya me bikin. Diyar bû ez jî di nava xwe de dikeliyam û belkî min jî li hemberî xwe rexne li xwe digirtin. Lê ez bi qasî zarokên çiyê bi cesaret nebûm rabim li hemberî her kesî li xwe mikur bêm.

Rexne û xwerexnekirinê bi rêveberên dibistanê destpê kir. Her kes pirr zêde bi heyecan bû. Li ser çongên her kesî defterên wan ên têbîniyan hebûn. Dîwanê bang li rêveberekî dibistanê kir da ku rabe li pêşberî hevalên xwe bisekine. Ew rabû çû li kêleka dîwanê sekinî, ber xwe girt û berê xwe da hevalên xwe yên rûniştî. Berê pêşî rêveberê rabûbû

xwe bi kurtî da naskirin, behsa hin karên xwe yên berê kir û di rewşa heyî de li ser kêmûkurtiyên xwe rawestiya. Paşê sekinî û xwest hevalên amade bi rexneyên xwe alîkariya wî bikin ji bo ew karibe kêmasiyên xwe temam bike. Dîwanê mafê nirxandin û rexneyan da şagirtên dibistanê. Yek bi yek rabûn rexne kirin û hin ji wan jî ji bo dema pêş pêşniyazê xwe kirin. Rexneyan bi saetan ajot û her kesî bi sebir guhdarî kir. Ji bo axaftinê sînor nebû. Kêm caran dîwanê di warê uslûbê de kesên rexnekar hişyar dikirin. Ji ber ku diviyabû her tişt di çarçoveya hevaltiyê de bimeşiya. Dîwanê jî rexneyên şagirtan nivîsandin û di dawiyê de nirxandina xwe kir. Her kesî zêdetir bala xwe dida rexne û nirxandinên dîwanê. Ji ber wê, bala min jî zêdetir diçe ser dîwanê:

‘Mirovê qels xwe dixapîne. Tu dixwazî her kes weke tu dixwazî te bibînin, lê belê ew tu çi yî, te wisa dibînin. Ji ber vê jî tu bahaneyên xwe bi xwe diafirînî. Dîsa jî tu nikarî xwe îqna bikî û bi vî awayî tu xwe di xwexapandinê de bist dikî û diçikînî.

Kesayeta nêzî bajêr li Kurdistanê tevlîhev e, ji ber ku di bin bandora dagirkeriyê de ye. Analîzên kesayetiyê di nav şoreşê de jî ji ber vê dagirkeriyê ne. Ne ku mirovên me xirab in, lê zemînê dijmin ji bo wan afirandiye xirab e. Kesayeta lîberal a opurtonîst divê li hember van kêmasiyan were terikandin. Eger ev yek neyê kirin wê sekter be. Ev taybetmendiyên serdestan in. Ji lewra divê bi awayê vê rêxistinê bi xwe re şer bike. Lê divê xwe texrîb neke. Ji bo vê yekê tarzê çareseriyê girîng e.

Kesayeteke çîna navîn e, pasîf e, ji xwe razî ye. Li ser zikê xwe dimeşe. Ji aliyê sîstemê ve hatiye mehandin. Yanî di hundirê xwe de sîstem qebûl kiriye, dawerivandiye hinavên xwe. Ez bi şaşiyê re nebûm yek, lê zêde li hember jî ranebûm. Ango xwe ne ji mizgeftê û ne jî ji dêrê dike. Li vir em nikarin behsa başiyê bikin.

Dibêje; ez bi destê jinê hatime mezinkirin, lê nayê wê maneyê tu dostê jinê yî. Ben-î Adem hemû bi destê jinê hatine mezinkirin, lê pirr eşkere bêbextî lê kirin.

Gelek xisletên ji civakê girtine aniye kiriye siyasî. Mirovê pirr biaqil ê sîstemê nêzî koletiyê ye. Lewma mirovê nîv-dîn ji me re pêwîst e.

Gilî û gazin zimanek e, ji ber ku zimanê kesên neçar e, dijmin li ser me ferz kiriye. Xwe li pişt nezaniyê vedişêre, xwe naêşîne.’

Ez li nirxandinên dîwanê heyran ma bûm. Hem rexne hemû pirr baş bi parzûnkê xwe dawerivandibû û hem jî karîbû ya dixwest bibêje baş anîbû ziman. Min fêhm nekiribû çawa karîbû evçend xisletan li ser kesekî bibêje.

Paşê ji yê rexne lê dihatin kirin, hat pirsîn bê ka helwesta wî çi ye. Ji dengê yê rexne lê hatibûn kirin diyar dibû ku rexne jê re hêsan nebûn. Dengê wî gelekî ketibû. Ji ber vê yekê jî dîwanê jê xwest dengê xwe bilind bike da ku hevalên wî karibin wî bibihîsin. Kesê rexne lê dihat kirin, di helwesta xwe de anî ziman ku çend rexneyan li cih nabîne. Ew rave kirin. Lê dîsa jî dîwanê tembîh lê kir ku ya rast ew e, rexneyan li ber çav bigire. Her çend wî got; ew rexneyê li cih nabîne jî dîwanê dubare jêre got; ya girîng rastî û nerastî nîne, ya girîng helwesta li hemberî rexneyan e. Piştre ji hevalan hat pirsîn; gelo bi vê helwesta xwe dikare sozê bide yan na. Ji bo vê yekê jî du kesan mafê axaftinê girt. Hevalekî got; dikare soz bide. Lê hevalê din got: ‘Ew dikare soz bide, lê ez dixwazim tiştekî bibêjim.’ Dîwanê ew hişyar kir ku zêde gotinê dirêj neke. Li ser vê, wî hevalî got: ‘Zilamek cixarê dixwaze bikişîne. Riya lê dimeşe ba ji hember tê. Ji bo cixarê vêxe pişta xwe dide bayê û piştî cixarê dikişîne xwe ji bîr dike li riya pêde biçe vegere ji riya hatiye dîsa vedigere. Niha ez dixwazim hevalê me jî weke vî zilamî xwe ji bîr neke û di vê çarçoveyê de soz bide.’ Piştî vê axaftinê, dîwan ji hevalê rabûbû hemberî platformê xwest soz bide. Piştî sozdanê her kesî li çepikan da. Kesê rabûbû bi awayekî nîvrehetbûyî û bi rûyekî diponije çû cihê xwe rûnişt. Dîwanê navber da dersê. Di dema bêhndanê de her kes weke her carê nebû. Ji her demê zêdetir niha her kes difikirî. Di dema rexneyan de dilê min jî hatibû ber devê min. Ez ditirsiyam, piştî ev çend rexneyan, mijar wê çawa ji hev were derxistin. Lê diyar bû her kes di vî warî de têra xwe perwerdekirî bû.

Ez çûm ji xwe re çayekê bigirim li wir Cemîl Bayik radiwestiya. Wexta çavên wî bi min ketin keniya û got: 'Ji sîstema me çi bi serê te dikeve?' Min hînê bersiv nedabû wî dewam kir: 'Em li vir kesayeta kurd a dijmin xistiye, ji nû ve radikin. Em nexweşiyên dagirkeran xistine bedena kesayeta kurd, derman dikin. Naxwe li Kurdistanê kes nikare têkoşînê bimeşîne.' Piştî ku wî qurtek li çaya xwe da û sekinî min jî hînê nû bersiv da û got: 'Ev platform mîna klînekeke psîkolojiyê ye.' Min hînê gotina xwe temam nekiribû ew keniya û got: 'Na, ew psîkolog jî nikarin me derman bikin. Em bi birînên xwe dizanin. Em bi destê xwe, xwe derman nekin kes nikare me derman bike.' Paşê dîsa qurtek li çaya xwe xist û bi lez got: 'Me baş bişopîne.' Paşê hînê firsenda axaftinê neda min û got: 'De lez bikin, em ê dest bi dersê bikin.'

Di vê dersê de hevaleke jin a di rêveberiyê de rabû. Ji kincên wê yên bi rêkûpêk diyar bû ku gelekî nazik nêzî rexneyan dibe. Mîna bawermendeke derkeve pêşberî Xwedê xwe bi rêkûpêk kiribû. Dîsa dîwanê mafê axaftinê da platformê û her kesê rabû rexneyên xwe kirin. Hevala rexne lê dihatin girtin, ji zarokatiya xwe ve di nava refan de cih girtibû û gelek tecrûbeyên xwe hebû. Pirr bi pakî û qencî behsa wê dihat kirin. Lê dîsa jî têra xwe hat rexnekirin. Min û hevalên din jî meraq kir ka wê dîwanê çi bibêje û me guhê xwe da nirxandina dîwanê;

'Ji ber ku pirr îdealîze dike, piştre zû dişkê. Ji ber ku ferdiyetparêz e her tiştî bi bûyerên li derveyî xwe rave dike. Her kes ji vê civakê tê, divê xwe li vir bişon, ev jî bi îdeolojiyê dibe. Dixwaze her tiştî pak bibîne, lê xwe nalivîne. Tu yê hem bixwazî û hem jî gavê neavêjî. Her kesek mexrûriyeteke xwe heye û ya me jî heye, ya me bi azadiyê ye. Kesê îradeya xwe nebe nikare behsa îradeyê bike, îrade jî bi îdeolojiyê dibe. Kesê nikaribe xwe biparêze nikare behsa xurûrê bike. Kesê protesto dike bi hin bahaneyan dest ji kar dikişîne. Ev yek jî bi xwe re teslîmiyetê tîne. Mirovê zêde gazinan bike di encamê de dibe gelac û fesad. Di diyalektîka me de guhertin û veguherîn esas e.'

Piştî vê nirxandinê, dîwanê li helwesta hevala jin pirsî. Hevala jin berê xwe da dîwanê û got: 'Heval ez ji zarokatiya ve li serê çiyê me. Min digot qey ez gundî me. Çawa ez dibim bûrjûwaziya piçûk ez fêhm nakim? Dîwan keniya û got: 'Niha te fêhm kir ku bûrjûwaziya piçûk gundî ye?'

Piştî hevala jin hevalekî din li pêşberî me ye. Heval gelek rexneyên dijwar lê dikin û bi meraq dîsa guhê xwe didin dîwanê:

'Ji ber ku feodal e nagire, dide. Axayek e, ji gundiyan re dibilîne. Ew li wan guhdarî nake. Terbiya malê dihêle ku ew nêzî malê bibe. Ev kesayet serbixwe nîne, girêdayî ye. Ji ber ku kesayet girêdayî ye, nikare xwe biguherîne. Kesê desthilat nikare li rexneyan guhdarî bike. Ew tenê rexne dike. Kesê feodal nabin karker dibin bêkar. Her girêdan koletî ye. Ji bo bikeve mentiqê vê tevgerê, divê ji mentiqê berê derkeve. Kengî ket mentiqê nû, kare ji berê sûd werbigire. Eger mirov xwendina xwe bixe xizmeta gelê xwe, wê wextê mirov nakeve bin tesîra pirtûka xwendiye. Ûslûbek wî heye, nikare xwe bide guhdarîkirin. Divê ji bîr neke ku fêhmkirin di ser zanînê re ye.

Eger wan tu fêhm nekirî, te ew fêhm bikira. Eger ew tevlî te nebûn, tu tevlî wan bibûna. Hûn yekê didin, lê belê nodûnehan digirin, ji bo hûn nebin egoîst divê hûn bidin.

Piştgiriya şervanan an jî qurbanan maneya xwe nîne, eger tu li cem wan cih bigirî manedar e. Hem ji xwe razî ye, hem jî gazinan dike. Şaşî jî dikare mamostetiyê bike. Behsa qenciyên hevalê xwe dike mîna wî kiribe. Tu xwe ji bîr dikî. Ma ne hevala me ya xwe kir guloka agir Viyanê got: 'Jibîrkirin îxanet e.' Hêza te nebe tu yê çawa fêhm bikî? Mirovê birçî, mirovên lawaz û qels hêvî û baweriyên xwe dixwin. Satilek bêbinî nayê tijî kirin. Tu bi bilindkirina dengê xwe nikarî xwe bidî guhdarîkirin. Hunerê rêbertiyê pêşbînî û dûrbînî ye.'

Dîwan jî li gorî rexneyên platformê hişk peyivîbû. Wexta dîwanê li helwesta wî pirsî, ez ditirsiyam ku ew heval nikaribe xwe li van rexneyan ragire. Lê belê ez dîsa xapiyabûm, ew gelek bi bêhnfirehî nêzî rexneyan bû û got: 'Ez hewl didim maneyê bidim ev çend rexneyên

dijwar.’ Ev helwesta wî ya rehet û ji xwe razî dîsa bala hevalan kişand û mafê axaftinê girtin dîsa ew rexne kirin.

Rexne û xwerexnekirinê bi vî awayî dewam kir. Mîna ku her kes li bêjing û seradê bêne xistin, di ber çavan re hatin derbaskirin. Hin hevalên hewldanên wan kêm hatin dîtin ji bo dewreke din a perwerdeyê hatin hiştin. Hin heval jî ji bo dewra din xurt bikin hatin hiştin.

‘Şoreş karek e, evîn e. Ji bo evînê jî divê xeyalên we û hêza we hebe. Evîndar li ser a xwe ye. Ma ne evîndar gotibû: Eger ez nebim çi qîmeta delaliya te heye. Evînên we û xeyalên we ji bo siberojê bang li we dikin û we dibin. Eger tu bi rastî bawer bikî, tu yê karibî hêza xwe bibînî. Eger tu hez bikî te bawer kiriye, nehezkirin nebawerkirin e. Em ê careke din mîna mirovê xwe ji gunehên xwe kirî, rabin ser kar û bi vê têgihiştinê navika xwe bi destê xwe bibirrin. Kesayeteke wisa karê têde bi sernekeve nîne. Ji we re serketin.’ Cemîl Bayik bi van gotinan dawî li dewreyê anî.

Li ber çavên me bûyerek diqewimî. Dilopên avê digihiştin hevdu û di cironekê re diherikîn merzîvê. Çawa ku rûsipiyên Mezopotamyayê gotî; wexta mirov li demarên zêr digere gelek axa bêkêr jî derdixîne, lê belê mirov xwe wisa digihîne demarê. Li vir bûyerek diqewimî. Gelek daneyên bêkêr li bin kevirê destar dihatin hêran û ji wan tiştên bi kêr dihatin çêkirin. Bêdengiya mîna li qebristanan a bi ser welatê me de hatibû kirin radibû. Her tişt ji nû ve ruh pê dihat. Dilên her kesî şad û bextewer bûn. Dilê kesî bi tiştekî nedima. Bextewerî û şadiya pêhesîna bi zanîn û têgihiştinê li hinarkê rûyê her kesî xwe danîbû. Îro kes mîna keyayê Kurdan Nûşîrewan xemgîn nîne. Ma ne ew bû, li pêşberî artêşa xwe disekine û digirî. Jê dipirsin çima digirî? Ew kesereke kûr dikişîne û dibêje: “Artêşa min bi qasî deryayekê ye, lê belê ez nikarim pêşî li mirinê bigirim.” Erê, artêşên mezin li cîhanê ji mirinê zêdetir tiştek nedikirin. Lê zarokên qewmê çiyê îro mîna keyayê xwe Nûşîrewan nagirîn û xemgîn nînin. Ji ber ku ew ji bo jiyanê şer dikin û li ser baweriya bi cihanîna demokrasî, ekolojî û jinê sond dixwin.

Ez hînê wisa diponijim, fermandar Cemîl destê xwe danî ser milê min û bi rûkenî got: “Lê me ji bîr kir ku em te jî rakin rexne û xwerexnekirinê.” Li ser vê gotina wî ez fikirîm ku çima min nikarîbû rexneyên li min bêne kirin meraq bikim û gelo min ê karîbûya rexne li xwe bikirana. Rastî kêmasiyên min çi bûn û diviyabû ez xwe sererast bikim?

Cemîl ji nû ve destê xwe avêt stûyê min û hinekî sekinî. Diyar bû dixwest tiştekî ji min re bibêje; lê wisa dudil bû. Paşê bi dengekî nizm got: “Ew hevala te pirsî bû, hevala Stêrk li Cûdiyê şehîd bûye. Îro hin heval ji wir hatin gotin.” Ez matmayî bûm. Min gewriya xwe daqurtand û pêjna rûyê wê yê delal hat ber çavên min. Cemîl dewam kir: “Li Cûdiyê fermandarê taximekî bû. Dijmin dor lê girtiye, ji bo hevalan rizgar bike, heta dawiyê şer kiriye û dawiyê ji bo nekeve destê dijmin, bombe bi xwe de teqandiye.

## ( 32 )

### HEMÛ STÊRK LI VÎ EZMANÎ KOM BÛNE

Mirov dibêje qey tevahiya stêrkan li vî ezmanî kom bûne. Fena elmasan an jî durran belkî jî şembelîlkan li ezmên aliqandî disekinin. Tu destê xwe dirêj bikî belkî tu bigihîjî. Pirrî caran hûn dubare dikin; Gotin û dîtin nabin yek, yan jî hûn dibêjin; Êdî mirin jî bê xem nake. Niha jî ez dibêjim; çavê mirov û çavê kamerayê nabin yek. Sînorên hissê asê ne. Her çav, guh û dil nikarin têre bibihurin. Her agir jî nabe yek. Her çay jî çay nîne. Agirê li bin tavhîvê û çaydanê li ser jî bi serê xwe tehmekê didin. Qurmê bin her zimanî, beyarên li her mejî nikarin

an jî nizanin tîna xwe bişkînin. Ji bo bikeve cezb û zikrê stûna dil bi hiss û hestan li ser hemana ye.

Li welatê wendabûyî, li bajarê xerîb û biyanî wendayek heye. Ez lê digerim. Gundî giş li qebristanê civiyane. Ez li mirî dipirsim. Kes bersivê nade min. Her kes belav dibe. Ez jî dixwazim biçim, lê serê min li kevirê qebrê dikeve. Erê, yê mirî ez im. Lê ez hînê hiss dikim, cismê min, bedena min ji ruh veqetiyaye. Yê mirî ez im. Ez miriyê van cîhanên min neafirandî me. Ez xerîb im, xerîbê van dinyayên yên min nînin. Di van leylanên xapînok de ez digerim. Ez dipirsim. Bihost bi bihost dipîvim. Kirasê li min nayê, diçirînim. Kirasê dînan bi niyeta bedlê efendiyan li min kirine. Jixwe min ji mirinê hîç bawer nekir. Ez wer dizanim ku mirov ji cîhanekê derbasî cîhaneke din dibe. Ji lewra ez ê her li ya xwe bigerim.

Çi ba û bahoz e, çi babelîsk û babîsok e, me digire ji derekê dibe dereke din. Çi ye me bi xwe re difirîne, heta carnan kaş û xir dike, digihîne lûtke û seriyên bêserûbinî. Ew çi agir e me disojîne, ew çi meraq û kakûnî ye, me dikeritîne. Ew çi raman û hiss e, me li pozê kendêl bi firrê dixîne?

## ( 33 )

**Gelek gotinên me hene bila bimînin demsaleke din,**<br>
**Belkî jî em ê wan li bazkê çivîkan bikin ji hev re bişînin,**<br>
**Em ê hesretên xwe li serê keviyên kendalan, ji bo evînan bi firrê bixînin,**<br>
**Çend can, çend rewşên nediyar, çend hesret, kul û keder bi firrê ketin,**<br>
**Veqetiyan ji bo careke din hevdu bibînin.**

Mirov mîna zerratan in, têne cem hev û ji bo li cihekî din bi awayekî din bigihîjin hev belav dibin. Kêliyên veqetînê zêdetir bi hiss û hestan barkirî ne. Lewma hem demkurt û hem jî demdirêj in. Ango wer zû diçin mirov dibêje qey hîç nalivin.

Heval û hogir ketin rêzê wê me bi rê bikin. Her silavek bi gotina serketinê dest dide ya din. Her rû dikene, di hin çavan de xem û hesret. Di reşikên hin çavan de hezkirinên hepiskirî. Evînên qedexekirî, dildariyên sînor li dora xwe danî, aramiyeke bi bepirsiyarî. Bendewarî û hêvî di kefên destan de destdiguherin.

Zîrek û Xemgîn dîsa li tenişta hev in. Tevahiya dersan ji hev neqetiyan. Her çend li ser kursiyekê û quncikekê li ber hev dan jî ya rastî ew zêde nêzî hevdu bûn.

Eger mirov Xemgîn bihejanda wê kulmek libên kizwanan jê bihatana xwarê. Wî tevahiya dersan hebên kizwanan ji bêrîka xwe derdixistin bi derziyekê qul dikirin û tevî morîkên rengîn dikirin tizbî. Camêr camêriya xwe kir û tizbiyek jî da min.

Zîrek bi serbilindî dibêje: “Min heşt salan lojîstîk bi hêstiran kişand çiyê.’ Bêguman wexta ew vê yekê bi sormanciya xwe dibêje; çîroka wî ya tevlîbûna Partiyê, çîroka wî ya dilêşane tê bîra min. Dayika wî li Hewlêrê li nexweşxaneyê dixebite. Jixwe bavê wî berê ji aliyê Seddam Husên ve hatiye kuştin. Rojekê diya wî wexta ji malê derdikeve ji aliyê reşkujekî li ser xaniyê hember ketiye kozikê tê kuştin. Şifêrê texsiyê reşkuj dikuje. Dayika wî li cihê xwe dikumişe. Paşê wê radikin nexweşxaneyê. Li nexweşxaneyê li ber ruh dide. Bi destê Zîrek digire û dibêje; Kurê min biçe cem hevalan, biçe cem PKKê. Li ser vê, Zîrek jî bi wê zaroktiya xwe tê hevalan dibîne û derdikeve serê çiyê.

Hevala Adar her rûken e û dibêje; Bi Xwedê êdî ez qebûl nakim. Divê ez jî êdî di pirtûkekê de cih bigirim. Ma min ew çend şer kir, heqê min nîne heval?

Li kêleka Adarê her tim Engîzek heye. Ji hev naqetin. Keçeke koçer e, bedew e, narîn e. Haya wê ji vê yekê heye. Lê bizdonekî ye. Zirxê çiyê li xwe kiriye. Ew jî dizane wilo nabe,

nameşe. Diyar e, gelek tiştên nikare bîne ziman, avêtine kewara dilê xwe. Lewma çavên wê mîna deryayeke kûr hêşîn in. Carnan jî mîna ezmanan esrarengîn in. Ji ber ku fermandar e, hinekî jî xwe giran dike. Ya rastî, mirov gelek alî û xisletên hevdu rexne dike, lê di dawiyê de mirov li gorî şert û mercan heq dide hevdu. Keçika koçer nexwendiye û dixwaze bixwîne. Lê diyar e, wezîfeyên nû li pêşiya wê ne, û ji bo rewşeke nû soz daye.

Gulê dîsa bi çavên kelogirî temaşe dike. Wexta piçûk bûye, dîtiye bavê wê li diya wê dide. Ew jî diçe xwe li diya xwe dipêçe û digirî. Paşê bavê wê tê li herduyan dide.

Mîras weke gelek caran dîsa bi ruhekî xeydok destê xwe dirêj dike. Wexta ku li Şamê pêlavan çêdike erebek jêre dibêje: “Xwezî ez kurd bûma û min li nav refên Hîzb Umal El-Kurdistanî şer bikira. Lê mixabin emrê min çû.” Mîras li ser vê gotinê û êsîrketina Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan berê xwe dide çiyê. Xerîb e. Ji xwe dûr ketiye. Ji civata xwe qut bûye. Lewma zêde bi tenê ye.

Rojda bi çavekî nazik û nazenîn li xwe temaşe dike. Ya rastî gelek taybetmendiyên wê yên xweş hene. Di dengê wê de diyar e gellekî şikestiye. Porekî wê yê dirêj heye. Tevî vê yekê her sibe porê xwe şeh dike û gulîkên xwe dihûne. Çavên wê yên hêşîn û cincoqî hene. Şanikek li binya lêva wê, li aliyê çepê heye ku xweş lê tê. Bejnek wê ya lihevhatî û gulokî heye. Pirr ciwan tevlî nav refan dibe û li gelek şax û kohên Kurdistanê digere. Tevî zor û zehmetiyan hemûyan nehiştiye ruhê wê çor bibe û zimanê xwe ji çepeliyê parastiye. Rojda mîna pîrejinekê ji gîha û pincarên çiyê fêhm dike. Her tim ji bêrîkek xwe gihayekî derdixe, bi serê çavan û dev li ken dibêje; Tu jî venaxwî? Bêguman mirov nikare bibêje; Na. Lê ji nav gîhayan a herî xweş û min jê hezkirî şîlan bû. Lê ji wê zêdetir Rojda bi xwe bû.

Siyabend bi destdirêjkirina xwe re dikene. Em giş dizanin bê ka ew çima dikene. Hîna ku em giş weke hevdu difikirin, ew sedema kenê me bi lêv dike û dibêje; Hûn li Ewrûpayê giliyên me nekin nebêjin beqa dixwe. Siyabend car caran qelîsêlkên beq û kevjalan çêdikirin. Rîçala wî ya dirîreşkan jî baş bû. Hevalan di çarçoveya têgihiştina li ekolojiyê de ew rexne dikirin û ew weke beqkuj bi nav dikirin. Erê, wî ji Ewrûpiyan neksa xwe kort dikir, lê ji bîr dikir ku herî zêde Ewrûpî beqan dixwin.

Ronahî piçûka perwerdê ye. Hevaleke şîrîn e. Hînê jî gelekî şermok e. Ji destpêkê ve palaska (piştbenda) min xwestibû. Lewma ez çawa çav li wê dikevim ez palaska xwe derdixim û didim wê. Bêguman gotina wê ya di dersê de tê bîra min: “Ez wexta diçûm çarşiyê birayekî min ê piçûk hebû, bi min re dişandin ji bo min biparêze. Lê ya rastî hêzek wî ya parastinê û tiştekî biparasta tinebû.” Em li ser vê gotina wê têra xwe keniyabûn. Lewma me tim pê henek dikir û digot: “Hevala Ronahî ka destê xwe bide em te bibin mangehê.”

Enwer Ûmyanûs navê birayê xwe yê şehîdbûyî li xwe kiriye. Ji malbata wî gelek kes di nava refên gerîlla de cih digirin. Fermandarê navdar ê gerîlla Ehmed Repo jî mervê wî ye. Çavên wî hêşîn in, dibiriqin. Porê serê wî gelekî weşiyaye. Tevî ku zêde bi emir nîne jî lê ya rastî mezin xuya dike. Kedkarekî baş e. Lê zêde nikare bipeyive. Wexta dipeyive jî pirr bi heyecan dibe. Rûken e. Destê xwe dirêj dike û dibêje: ‘Bimeşe ez ê bi we re bêm jor.’ Enwer di Desteya Perwerdeyê de cih digire. Lewma wê weke berpirsekî di rêkirina me de amade be. Tevî xwendin û nivîsandina xwe pirr qels bû jî wî têbîniyên xwe yên di dersê de hemû bi Kurdî dinivîsî. Rojekê deftera xwe anî û xwest ez jêre hin rêzên nivîsê yên xweş bi Kurdî li ser deynim. Ji ber ku dixwest Kurdiyeke xweş a wêjeyî li cem wî weke bîranînê bimîne. Min jêre nivîsandibû: ‘Pirr nebû me hevdu nas kiriye. Bi hevaltiya te kêfxweş bûm. Min dixwest zêdetir em hevdu nas bikin û bi hev re bijîn...’

Me destek ji destekî da destekî din. Me nîşaneyên dawî li rûyên hevdu li deftera bîranînan a dilê xwe neqişand. Me gotinên dawî yên bi ‘serketinê’ diqediyan weke bazbendekê xelatî hevdu kirin.

## ( 34 )

### DILÊ XWE LI ÇIYÊ BIHÊLIN

Di demeke pirr kin an jî li gorî xwe dirêj de em dibin xwediyê gelek bîranînan. Dem bihurî û belkî jî me ew bihurand. Ji ber ku her kesî bawer dikir ku perwerde gelekî baş bihurîbû û her kesî gelek tişt ji hevdu girtibûn. Her kesî zanîn û ezmûna xwe dabû hevdu. Bi vê jî her kesî hewl dabû ji nû ve bifikire û xwe di ber çavan re derbas bike. Min jî bi awayekî texmîn nekiribû xwe di vê gerîneka demê de dîtibû û ez jî ketibûm cironeka her kes têde diherikî. Belkî ez di şûna her kesî de nebûm an jî min xwe nexistibû, nikarîbû bixime şûna wan, lê dîsa li ser axa welatê xwe, min xwe nêzî hisa mezin a mirovahiyê kiribû. Bi gelek his û hestên mezin ez vediqetiyam. Berî veqetîn û xatirxwestinê, Cemîl Bayik xwest hinekî bi me re bipeyive. Li ser pêvajoya siyasî rawestiya, hinek bûyerên muhtemel biqewimin û tehlûkeyên heyî destnîşan kirin. Pirr eşkere fikarên xwe yên li ser pêvajoyê anîn ziman. Her weha hin zehmetiyên bi xwe pêre rûbirû maye bi dilnizmî got. Behsa rexneyên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ên li rêveberiya partiyê kirine û rewşa aloz a di nava rêxistinê de ya weke tasfiyekariyê bi nav dike anî ziman û got: “Ez mîna li ser agir bûm. Xew nediket çavê min. Diviyabû min biryarek bidaya. Ez sê roj û sê şevan fikirîm. Min biryar da ez mudaxele bikim. Naxwe tasfiyekarî wê serdest bibûya û wê rêxistin bifirota. Bêguman fikarên min hebûn. Min nizanîbû heval wê çawa nêzî vê mudaxeleya min bibin. Cemal, Karasû û Abbas tam destek dan. Kengî Riza Altûn jî got: ‘ez li cem rêxistinê me’, wê şevê ez razam heta roja din danê nîvro. Hevalên di ewlekariya min de meraq kiribûn û hatibûn li mangehê nêrtibûn ka tiştek bi min hatiye yan na.”

Cemîl Bayik fikarên xwe yên li hemberî operasyoneke muhtemel a dijmin jî anî ziman û got: “Eger hemû gotina xwe bikin yek, heye ku rêxistina me derbek xedar bixwe.” Hêza li derveyî çiyê jî weke hêzeke yedek bi nav kir û got: “Divê ev têkoşîn dewam bike.” Di dawiya vê gotina xwe de bêdeng bû û li erdê nêrî. Bi serê pozê pêlava xwe axê tev da. Diyar bû rewş lê giran dihat. Belkî jî serhatiyên salan yek bi yek di ber çavên wî re derbas dibûn. Ji rewşê fikarên wî hebûn û dixwest bi her derfet û îmkanî meydanê li têkoşînê fireh bike. Ji ber ku pîvana PKKê bû, mirov dikarîbû bi serê derziyê jî erd bikola.

Cemîl Bayik wexta dipeyive hissî dibe. Ez hîç li bendê nebûm mirovekî evqas dûrûdirêj di nava têkoşîna siyasî û eskerî de zû hissî bibe. Lê hay ji xwe hebû barekî giran ketiye stûyê wî û dizanîbû êdî ji xwe bêtir çarenûsa azadiya civateke Kurd temsîl dike. Lewma rexneya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan a gotibû: “Hevalan diviyabû wisa nikaribûya. Kirin ku ez wer his bikim ku hin kesan destavêtine min.” Dibêje; bi vê rexneyê pirr êşiyaye û yekem car di nav têkoşînê de giriyaye. Piştî van gotinên xwe jî bêdeng dibe û demekê wisa li ber xwe dinêre û paşê li fikir û gotinên me dipirse.

Em ê êdî ji Kanîqirêjê bi rê kevin. Ji bo rewşa dawî ya siyasî û eskerî binirxînin fermandarên gerîllayan Mûrad Karayilan û Mistafa Karasû jî li cihê bi rêketina me amade bûn. Em li maşînê suwar kirin û bi rê kirin. Me destên xwe li hevdu ba kir û Cemîl Bayik wexta maşîna me bi rê ket bi dengekî bilind got: “**Dilê xwe li çiyê bihêlin.”** Bi vê gotinê, mîna zinarên çiya bi ser me de bên, em ketin bin giraniya hissan û em bûn fena bixeniqin. Ez fikirîm, gelo me yê çawa dilê xwe li çiyê bihişta. Me pişta xwe dabû wan û weke gelek caran ji bo em dilê xwe xweş bikin, me yê dîsa ji derewa xwe ya neçariyê re şapinêzek bidîta. Gelo mîna Gurbetellî Ersozê gotibû me yê karîbûya dilê xwe li çiyê bineqişanda.

Bayên payîzê yên sar û tavika fediyokî pelên çilo hêdî hêdî zer dikin û ji dara wan qut dikin. Newal û dol zêdetir tarî û sêwî ne. Mîna dengên çeqel û wawîkên devê çeman

bêkesiyeke xizan xwe li çiyê ba dide. Her tişt xwe vedikişîne hêlîna xwe. Derve ji teyr û teba xalî dibe. Gur û wawîk li meydanê dimînin. Zûrîneke tenafir nabihîse li van çiyayên azadiyê sêwî ye, ew çend jî hewarek li ser riya tinebûnê.

Her gava tê avêtin mîna gaveke li paş ketibe. Her tim tiştek kêm e. Ne tiştek gelek tişt kêm dimînin. Dengê çirçirk û beqên li bin tavhîvê û meşa moriyan a di tavhîvê de kêm dimîne. Gotinên divê mîna notayan li ser xetên defterê li ta bêne kirin kêm in.

## ( 35 )

**Eger li Îrlandaya mêtingeh şoreş nebe,**
**li Ingilistanê şoreş xeyal e.**

Wexta mirov ji atmosfera çiyê ya dilbihar derdikeve û çav li Hewlêrê dikeve yan jî ber bi wê ve diçe strana hunermend Serhat tê bîra mirov. Awaza stranê li ser dilê mirov govendê digire. Kelha Hewlêrê ya ji tûxleyan mîna toza deştê hemûyî bimije xemgîr xuya dike. Çarşiya li pêşberî Kelhê weke Çarşiya Şewitî ya li Amedê ye. Hevalên li çiyê em bi maşînekê li Hewlêrê danîn û vegeriyan. Me texsiyeke din girt û em ê biçûna mala PKKê ya li Hewlêrê. Texsiya em lê suwarbûne, şifêrê wê pêşmergeyekî berê ye û yekser dipeyive: “Me bi salan şer kir niha yekî mekteb xwendiye bi hezaran dînar distîne.” Şifêr xweşsohbet e. Ew dibêje û em guhdarî dikin. “Kake min hîç murteh nîyim.” Min jî yekser jê pirsî: “Bo kake?” Şifêrê me jî bêyî bêhna xwe bide bersiv da: “Kake ê man be destî xoman nîn.” Diyar e, bi hêsanî fêhm kiriye em ji Bakur in, ji lewra gazinên xwe dike.

Piştî westandineke bêhndanê pê xweş be, em gihiştin mala PKKê ya li Hewlêrê. Li vê malê yek ji kadroyên kevin ê PKKê Metîn Aslan hebû. Xaniyê lê dimîne pirr baş nebe jî xweş e. Yan jî li gorî me ye. Em xwe lê dirêj dikin. Metîn Aslan yek ji wan kesan e, di destpêka PKKê de cih girtiye. Bi xwe Tirk e. Lê ew xwe weke sosyalîst bi nav dike. Her weha xwe weke şagirtê Kemal Pîr qebûl dike. Erê, me dixwest em hinekî bêhna xwe bidin, lê wî ji me re behsa bîranînên xwe yên li zindana Amedê kir û nehişt em pelikên çavên xwe daxînin. Metîn Aslan kal bûbû û nexweşiyên wî jî hebûn. Lewma xwe spart gopalê xwe û behsa zindana Amedê kir:

“Malbat hatibû serdana min. Wexta ez vegeriyam qawişê çawişekî bela xwe li min da. Paşê tevî bîst eskeran êrîş kir. Min jî xwe parast. Jixwe hinekî boksoriya min hebû. Min ji wan re got: ‘Eger hûn mêr in, yek bi yek wer in’. Paşê yuzbaşiyek hat. Got: ‘Ew kî ye, ji eskerê Tirk re gotiye bila yek bi yek wer in.’ Hevalê Kemal û Mazlûm gotin nebêje hewce nake. Min got tişt nabe. Li ser vê min got, ez im. Ez derketim holê bi qasî sed eskerî hebûn. Gotin: “De were şer bike.” Min got: “Ti derdê min bi we re nîne, yê bela xwe li min da ev çawişa ye.” Min çawiş îşaret kir û ew dawetî şer kir. Wî nizanîbû ez boksor im. Hevalan di hucreyan de dikirin qêrîn. Kemal aciz dibû û digot, ma ev der arenaya Romayê ye. Welhasil çawiş hat naverastê û min xwe avêt nava wî û seriyekî hişk li rûyê wî da.” Metîn Aslan wexta behsa vî beşî kir rabû ser xwe bi destan mîna wê wextê kir û got: “Paşê min du hulmik li pey hev li ser çavê wî dan, li erdê rast bû. Serê wî jî li betonê, li erdê ket. Paşê hemûyan êrîşî min

kir û ez avêtim qawişê.” Metîn Aslan wexta ev bi dawî kir, bi kêfxweşiyekê cixareya xwe pêça û ji cihê mayî pêde çû: “Di dema Esat Oktay de dîsa yuzbaşiyek hat. Ew jî hemşehriyê min bû. Ji Enqerê bû. Kafirek bû. Xweş êşkencekarek bû. Hat got, ew kî ye fortê xwe li eskerê Tirk dike. Min got, ez im. Got, helal be ji te re hemşehriyê min, lê em jî karê xwe dizanin. Lingên min bi jor ve daliqandin û têra xwe êşkence li min kirin. Ez nîvmirî birim qawişê. Min jêre got, tu çi bikî jî em ji baweriya xwe nayên xwarê, lewma tu nikarî bi me. Ya hûn dikin merdî nîne. Piştre ew ê min hulmik lêdabû ji nexweşxaneyê derket hat cem min lêborîna xwe xwest. Min ew qewirand. Kemal got, te şaş kir. Li ser vê yekê hîn pirr dûr neketibû min bang lê kir û got, li ser xatirê hevalan ez li te dibihurim. Lê ji bîr neke bi bîst kesan êrîşbirina ser kesekî merdî nîne. Vê gotina min bike felsefa jiyanê û here. Ya rastî paşê ji me re tim bi hurmet bû.”

Min jê pirsî, ma wê li ser van bîranînan nenivisîne, got: “Niha rewşa min a derûnî li cih nîne. Divê ez aram bim. Tu dibînî nexweşiya min giran e. Ez diêşim. Ma ez çawa nenivisînim. Soza min ji min re heye. Jixwe min li wê zindanê dît mirov mexlûqekî çawa ye ku çend dikare li ber xwe bide. Bi qasî şêst mirov li ber çavên min can dan. Em bi darê zorê dixistin hucreyekê û diavêtin serhevdu hingî li me didan kinc li ser me nedihiştin. Tenê derpiyê li ser me dima. Ew jî ji qûna me xwe bi xwe dihat xwarê. Hucreyên jêr giş mîz û gû bûn. Bedena me tev bûbû lûr û peq. Ava bi tursîl li me dikirin. Çermê me radibû. Ji bo nekevin gû bot dixistin pê. Em çawa nedimirin ez matmayî dimînim.”

Hewayeke zêde hisbarkirî li ser gotinên Metîn çêbû. Li ser vê yekê min got, ka rabe min li Hewlêrê bigerîne. Got, de rabe. Em çûn derve texsiyek sekinand û ji şofêr pirsî: “Heta çarşiya Kelheyê bi çend e?” Şifêr got: “Çar hezar e.” Metîn xwe bêzar kir û got: “Çima çar hezar, her tim sê hezar e, wexta xerîb bû, dibe çar hezar.” Şifêr ciwan bû û got: “Kake tûre mebe temam.” Paşê şifêr berê xwe da min û pirsî: “Bo em biradere tûrre debe?” Em suwar bûn û min ji şifêr re got: “Ew kurdê zaza ye, lewma ew çend hêrs dibe.” Şifêr paşê teyba xwe vekir. Strana ‘Berxwedan jiyan e, li kelha Amedê’ lêda. Metîn bêdeng bû. Haya şifêr jê nebû ku yek ji lehengê stranê rêwiyê wî ye. De bajo.....

Metîn ji malbateke Elewî ye. Li Enqerê maye. Elewiyê Tirkmen ê Sêwazê ye. Li dewrûbera wan gundên Kurdan ên Elewî hebûne. Gundekî xirîstiyanan bi navê Kilîsê jî nêzî wan hebûye. Gundê wan navê xwe Dişlix e, bi ser Kangalê ve ye.

Di dema lîseyê de bi fikrên çepgir radibe. Komek heval in, gelekî guftûgo dikin. Wê wextê pirr fraksiyon û rêxistinên çep nas dikin û bi tevahî li wan xweş tên. Ji xwe re dibêjin; weha nabe, nabe ku hemû rast bin, divê em karibin rêya xwe ya rast bibînin. Koma wan a ji çardeh, panzdeh kesan biryar dide kesekî meseleyan baş dizane bibînin û dersê jê bigirin. Bi dewrûberê dişêwirin û kesekî bi navê Lewend dibînin. Lê wî bi çend pirsan îmtîhan dikin û bi serê wan nakeve û heta Lewend jî qebûl dike ku wê nikaribe dersê bide wan û dibêje: “Ez jî kesekî nas dikim.” Kesê bi navê Kemal Pîr tê û hê di destpêkê de dikeve serê wan. Kemal ew çend dikeve serê wan, naxwazin wî ji destê xwe berdin, lewma jêre pêşniyar dikin ku xaniyekî jêre bigirin û her roj dersê êvaran jê bigirin. Kemal di heman demê de diçe dibistanê. Ji wan çar pênc salan mezintir e. Paşê ji Kemal re li Tûzlûçayirê xaniyekî piçûk bi 60 lîreyî digirin. Jêre kirêç dikin. Radixin û xweş dikin. Metîn dibêje: “Me 9 mehan li ber destê wî ders girt.” Şert datînin ji bo wexta Kemal dersê dide propagandaya rêxistin an jî rêya jê bawer dike, neke. Metîn dibêje; Kemal heta dawiyê bi vî şertî ve girêdayî ma.

Ders ji Gulana sala 1975an heta Sibata 1976an dewam dike. Li kêleka xaniyê wan dikana xwediyê xanî heye. Ji ber ku ew gelek caran heta derengiya şevê dersê dikin û guftûgo dikin, xwediyê xanî hêrs dibe û ji wan re dibêje: “Erê lawo razên, ez rabim ez ê di şoreşa we nim. Ez ji ber we nikarim biçim cem jina xwe jî yaw.”

Metîn dibêje rojekê me ji Kemal Pirsî ew der barê pirsgirêka Kurd de çi difikire. Kemal ji wan re dibêje: “Jixwe li ser vê mijarê Engels di nameya xwe de ya ji Marks re nivîsiye ev mesele rave kiriye.” Me jêre got: “Ma Engels di mijara Kurd de tiştek gotiye û

haya me jê nîne?” Kemal ji wan re dibêje: “Li Nivîsên Hilbijartî yên Engels binêrin.” Metîn dibêje: “Me rahişt pirtûka wî binê hevokekê hatibû xêzkirin û di hevokê de dinivîsand; **Eger li Îrlandaya mêtingeh şoreş nebe, li Ingilistanê şoreş xeyal e.”**

Kemal di heman demê de hin caran ji wan re dibêje: “Hevalno! Em wisa tenê bipeyivin em ê bibin lafazan, rabin em biçin çalakiyekê” û wan dibe hin civînên rastgiran sabote dikin. Wan dibe civînên hilbijartinan û carnan bi wan afîşan dadiliqîne.

Di nava koma Metîn Aslan de Şahîn Klavûz, Riza Altûn, Alî Dogan Yildirim (yekemîn kese di nava PKKê de jiyana xwe ji dest daye), Dogan Kiliçkaya û hin kesên navê wan nayê bîra wî hene.

Metîn Aslan keserekê dikişîne û dibêje: “Haya me hevalên komê ji hev de nebû ku Apocî her yekî ji me bi rêxistin dikin û carekê em li malekê civandin. Me her kesekî li wir hevdu dît em matmayî man. Ango em dîsa gişt li ser rêyekê li ser rêya Apocîtiyê gihiştibûn hevdu.” Çîroka Metîn bi gera me ya li nava çarşiya Hewlêrê naqede, lê Metîn zû dibetile û em li pêşiya Kelehê li cihekî ava mêwan difiroşe rûdinên.

## ( 36 )

### MIN NEDIXWEST BEDENA MIN JI GOTINA DILÊ MIN DERKETA

Bi gotina ‘Dilê xwe li çiyê bihêlin’ ez bi bazkên teyrên sîmir ên sedsalê li cihê xwe vedigeriyam. Li vê dinyayê ku mirov bi hesreta quncikeke azad in, min dilê xwe wenda kiribû. Ji bo bihosteke cih û hilmeke azad şerekî dijwar dihat meşandin. Cengawerên vê berxwedanê dilê xwe li zinaran dineqişandin. Belkî jî ya rast ew bû, dilê wan di destê wan de bû digeriyan. Li Rojhilata Naverast cenga Rusteman hêsan nebû. Li ser van erdan kêm caran Nûşîrewan radibûn. Pêxemberên mîna Manî û Mazdek emirqut bûn. Bêbextî pirr zû li mirovên qenc dihat kirin. Li şûna nûra nûran, tariya taristanan xwe berdabû ser dol, gelî, newal, gundik, gund û bajaran. Bedew û bedewiya mirovan li ber rêz digirt û bejna xwe li ber ditewand, tê recimandin û kevirkirin.

Herçî ez im, nizanim bedena xwe û dilê xwe ji hev bikim. Ji şêweyên bexteweriyê zêde xeberdar nînim. Lê erdnîgariya min behsa wê kir û ez lê mezin bûme, ji gelek reng û dengên xwe bûye. Ji lewra jî têra xwe xizan e. Qels û lawaz e. Bi hesret e. Belkî jî çavbirçî ye. Ji pirrê, doza hindikê dike. Qîma xwe bi xwe tîne. Gotin li cih be, çavnebar û çikûs e. Şikarteyê xwe nîne ji bo paşerojê.

Bi teyrên sedsalê yên hemdem di kêliya çavgirtin û vekirinê de ji Rojhilatê li Rojavayê me. Li bajarê wendabûyî, bedena min xerîb e. Dilê min wenda bûbû. Min nizanîbû min li ku hiştibû. Ez bi bedena xwe re dixeyidîm, çima dilê min wenda kiribû û heta hindik mabû min bedena xwe bi bêbextiyê gunehbar bikira. Min dizanîbû tiştek ji min kêm bûye, lê min nizanîbû çi ye. Min nizanîbû ku min dilê xwe wenda kiriye. Ya herî xirab jî min nizanîbû min li ku wenda kiriye. Paşê hêdî hêdî ez hînî tinebûna wî bûm. Lê min nizanîbû ez bêyî wî sax im an jî mirî me. Ez gelekî ponijîm, gelo ez ê karibim bêyî wî bijîm. Yan jî ez ê bêyî wî karibim bextewer bibim. Nizanim ez bi wî yan jî bêyî wî bextewer bûm. Gelo ez ê bêyî dilê xwe çiqasî ez bûma. Min mîna darikên niftikê pirsek ji pirsa din vêxist û serî li min giran bû. Min bi herdu destên xwe serçavê xwe girt. Demeke dirêj min herdu destên xwe ji serçavê xwe ranekirin. Ez ditirsiyam bêyî dilê xwe li jiyanê, li hawîrdorê temaşe bikim. Li vê Rojavaya hewcedariya min zêde bi kesî nebû, ez êdî ji xwe ditirsiyam. Ez ji xwe û her kesê dora xwe zivêr bûbûm. Hin kesan bi benê kûçikê xwe girtibû û bîraya li ber xwe vedixwarin. Çavên

wan mirarokî û mêşmirî bûbûn zoq li pêşiya xwe mêze dikirin. Kûçikên wan jî mîna ji kastîn ketibin nikarîbûn biewtin. Belkî jî akordên wan xira bûbûn, bi sedema ku demeke dirêj hewce nedîtibûn dengê xwe derxînin. Li quncikeke din kesekî din kûçikê xwe jî nîne û tenê cixarê dikişîne. Xanimek tê, çavên xwe li derdorê digerîne, ji bo cihekî vala û kêm kes lê hebe bibîne. Yekser telefona xwe ya destan derdixîne û mesajê li pey mesajê dinivsîne. Li quncika dawî jî yekî mîna dûmana cixarê daqurtîne cixarê dikişîne, serê xwe xistiye nava lebtopa xwe. Xwediyê barê jî vir de wir de baz dide, lê her carê li telefona xwe ya pişt makîneya hesabê vedigere û axaftina xwe ji cihê mayî dewam dike. Du kesên din ên têra xwe serxweş bûyî bi hev re dipeyivin, lê bêyî ku hevdu fêhm bikin. Her yek ji xwe re diaxive. Her kes xwe bi xwe bû. Jixwe zêde hewce bi yê din jî nebû.

Li vê dinyayê, ez ê bêdil min newêrîbû çavên xwe vekim, lê bi dengekî nexerîb ê dixwest li pêşberî min rûnê min neçar destên xwe ji ser çavên xwe rakirin. Min li hemberî xwe du çavên berjêrbûyî û gunehkar dîtin. Piştî demeke dirêj a bêdengiyê got: “Tu gelekî mayî.” Min dengê xwe nekir. Ji bêdengiya min wer fêhm kir ku ez wê fêhm dikim. Ji lewra dewam kir: “Dema tu li vir nebûyî...” lê dengê wê di ber wê de ma. Ya rastî min tevî wê bêdiliya xwe, ew fêhm dikir. Min nexwest zêde xwe biêşîne û min got: “Hewce nake tu xwe bêzar bikî, ez fêhm dikim.” Lê diyar bû fêhmkirina min têra wê nedikir û ji bo xwe be jî dixwest hinek tiştan bibêje. Piştî ku xwe hinekî da serhevdu dewam kir: “Wexta tu li vir nebûyî, min bi yekî re hin tiştên delûdînî kirin. Min nexwestibû wisa bikim, lê bedena min guh neda dilê min. Tu fêhm dikî ne wisa?” Ma min çawa fêhm nedikir. Ez ê bêdil, tenê xwedî beden, min çawa fêhm nedikir. Min serê xwe hejand bi maneya fêhm dikim û min jê pirsî: “Baş e, paşê bedena te guh da dilê te?” Serê xwe berjêr kir û got: “Bedena min tenê kêliyekê guh neda dilê min, lê ti carî ji ya dilê min derneket.” Li ser gotina wê ya dawî min got: “Baş e, wê wextê çi ye te bêzar dike?’ Hinekî bêdeng bû û got: “Ez jî baş nizanim. Lê min xwe baş his nekir. Belkî jî min nedixwest bedena min ti carî ji gotina dilê min derkeve.” Vê gotinê di guhên min de kir zingînî û ez gêj kirim. Ez mîna ku sewsî bibim rabûm ser xwe. Bi awayekî bişewişim ber bi mala xwe ve meşiyam. Mala min odeyeke piçûk bû. Ji xaniyên mîna yê min re li Elmanyayê dibêjin; ‘Mala xwendekaran.’ Wexta min destpêkê kirê kiribû û têde bi cih bûbûm, gelekî li xweşiya min çûbû. Li ber dilê min şîrîn bû. Min hundirê odeya xwe bi gelek alavên navmalê yên kurdî xemilandibû. Lê ev demek e, li ber çavê min dişibiya girtîgehekê. Berê min xwe di hundirê vê odeyê de ewle his dikir û belkî ji ber vê yekê bû, ez difikirîm ku ez li vir rehet û azad im. Min çi bixwesta qet nebe di hundirê vê odê de min li gorî dilê xwe dikir. Lê niha nizanim ji dema ku ji çiyê vegeriyame, her tişt bi çavekî din li min dinêre û ez jî bi çavekî din dibînim. Ez nizanim, lê dibe ku min ji dema dilê xwe wenda kiriye ev hatibe serê min. Weke hevala min gotibû: “Belkî jî min nedixwest bedena min ti carî ji gotina min derkeve.” Lê niha dilê min li devereke din û bedena min li vê girtîgehê bû. Bedena min bi serê xwe mabû û ruhê min jî her diçû jê zivêr dibû. Ruhê min bi bedena min re li hev nedikir û tebata wî nedihat. Ewçend lê giran bûbû, mîna ku bixwaze kêliyekê berî ya din jê xilas bibe tengav bûbû û tengijî bû. Ez li ser kursiyê rûniştim û min di pencerê re li derve nêrî. Li parka pêşberî mala min darên mezin hebûn. Li kolanên ji wan wêdetir mirov mîna moriyan dikeliyan. Êdî tarî ketibû erdê û mirov li ber rohniya lampeyan mîna reşkên şevê dilebitîn. Ji nişkê ve bala min çû ser deftera min ji Qahîreyê anîbû. Çavên min li sernivîsê aliqîn û ziq sekinîn: “Bê Xwedê Dibe, Bê Xwedî Nabe” Niha min jî xwe di hundirê vê odeyê de bi tenê his dikir. Li vê dinya ev çend mezin û mirov mîna moriyan li bedena wê geriyabûn, ez bi tenê bûm. Ne tenê bi tenê bûm, dilê min li derekê û bedena min jî li vir bû. Niha jî ruhê min bi bedena min a bûbû mîna beratê re li hev nedikir. Ruhê min ji vê qefesa xwe ya kokimî bêzar bûbû. Bi tevahî di vê odeyê de tengav bûbûn. Jixwe li vê dinyayê bi mîlyonan kurd hebûn û kesî ew nas nedikirin. Min li resmên komkujiyên bi dîwarê xwe ve kiribûn temaşe kir. Çavên zarokan ên bi hêvî û xemê têkel dibiriqîn. Çend caran xaniyên wan û gundên wan hatibûn hilweşandin. Dinyayê xwe li kerrî, korî û laliyê datanî. Li vê bazarê Kurd ji bo lihevkirinê

bexşîş bûn. Ma ne dîsa, weke gelek caran li ser televîzyona me bazar dikirin. Li vê dinya tijî hestîkoj rehetî ji mirovan û kurdan re tinebû. Ruhê min ê di berata laş de hilnedihat li qapaxa serê min dixist. Li deriyekî digeriya ji bo derkeve. Tayeke dijwar bi laşê min girt. Hebikên xwêdanê li ser eniya min dan der. Êdî bêhna min diçikiya. Diviyabû min ji ruhê xwe re deriyek vekira. Min li derve nêrî baxçeyê hember xalî û bêdeng bû. Kuliyên berfa pêşî ya salê hêdî hêdî dadiketin. Min rahişt kefiya xwe ya ji çiyê anîbû û daketim baxçe. Tevî ku kolanên hawîrdorê tijî mirov bûn û mîna moriyan dikeliyan jî baxçe bêdeng bû. Kes û kûs tinebû. Mîna bang li min bike dara mezin a çinarê di nava baxçe de jixwe razî radiwestiya. Min serê xwe rakir, ji serî heta binî li bejna darê temaşe kir. Ew jî di nava avahiyên çîmento yên hişk de asê mabû. Gelek hevalên wê ketibûn ber rê û avahiyan. Tenê çendek di vê navê de mabûn. Mirovên li vir ji bo bijîn li ber wan nediketin. Li kafeyên dewrûberê her vedixwarin. Li vir, kes di nava tahmên dinyewî de xeriqîbûn. Piraniya hewcedariyên wan ji Rojhilata Navîn, Afrîka û heta Asya Dûr dihatin. Hînê jî ji mêtingehên xwe yên berê dixwarin, dikotin. Li şûna serdema Ronesansê îro xemsarî û jixweçûyîn serdest bû. Ma ji bo bijîn bi rastî diviyabû her tiştî hevdu bixwarana? Dara çinarê ya mîna mêvandareke comerd disekinî, guliyên xwe bi bayê re hejandin mîna min fêhm bike û serê xwe ji min re bihejîne. Min kefiya xwe dirêjî guliyekî wê kir. Hîna gelekî li ser xwe bû. Kefiya min hişk zevt kir. Wexta min serê xwe dirêjî wê kir, kêfiya min baş şidiya. Tevahiya laşê min xwe dawişand û bedena min ruhê min hêdî hêdî berda. Min wê wextê kuliyên berfê li ser hinarkên rûyê xwe nû his kirin. Min xwe avêt kuliyekî berfê û ez lê suwar bûm. Ez jî êdî bi qasî kuliyên berfê sivik bûm. Ji nava wê kerrî, lalî û koriyê bi hewa ketim. Tevahiya şevê li dora darê geriyam. Kesî bedena min a mîna beratê nedît. Şeveqê avêt jî kes lê hayil nebû. Pîreke kurd a ji Mêrdînê ku gelek caran bêhna wê teng dibû dadiket baxçe, min dît dîsa hêdî hêdî bi nav baxçe ve dimeşe. Gopalê wê di destê wê de bû. Pişta wê hinekî xûz bûbû. Kengî çend gavên din avêtin û xwest bêhna xwe bide, hinekî xwe rast kir û serê xwe bilind kir. Çavên wê ziq li laşê min ket û hêdî li ser kursiya li parkê rûnişt. Mat ma. Mîna peykerekî bûzê cemidî di cihê xwe de sekinî. Di wê sermê de rondikên germ ji çavên wê hatin xwarê. Destê xwe yê çepê ku xwîn jê kişiyabûn û damarên wê bel bûbûn hêdîka rakir û li çonga xwe xist. Bi dengekî pir nizm ku bi qasî ew jî bi zehmetî bibihîse, di ber xwe de got; “Lawo, lawo, lawo...” Her çû dinya gewr bû. Pêre koma mirovan a li pêşberî laşê min jî mezin bû. Piraniya wan bi çavên xemgîr li min dinêrîn. Fêhm nedikirin ka çima min bedena xwe bi dar ve kiriye. Lê pîra min behsa wê kir a ji Mêrdînê fena serhatiya min hemû fêhm kiribe hînê jî li çonga xwe dixist. Piştî kêliyekê êdî jê nedihat. Ew li diyarekî nasnekirî bû. Dewleta Tirk a dagirker gundê wan şewitandibû. Kurê wê ew bi xwe re anîbû van diyarên ew hîç nas nake. Pirr zû fêhm kiribû ku mirin ji wê re çêtire ji vê xerîbiyê. Lê bi ya kurê xwe kiribû û hatibû van deverên jêre nabe cih û war. Ji vê hesretê, pirî caran ji bo bêhna xwe vede dadiket vî baxçeyî. Gelek caran destê xwe diavêt kevirên gulover ên li binya daran û wer jê dihat ku ew gûzên ketine binya darê ne. Kengî lê hayil dibû ku ew kevir in, îcar ji hêrsa kevir li serê xwe dixistin. Pîrê li pêşberî min bi çavên melûlî û xemgîr li bedena min temaşe dikir. Ez jî êdî bi hêsayî li serhatiya Pîrê têdigihiştim. Di reşika çavê wê de her tişt eyan û beyan bû. Kengî polêsan laşê min ji darê kir û birin, koma li nava baxçe belav bû. Pîrê hînê li ser kursiyê bi tena serê xwe rûdinişt. Bîstek çû kurê wê hat ew bir mala ku ji bo wê girtîgehek bû. Min xem, hesret û kederên wê jî li kuliyên berfê kirin.

# 37

**‘Ez ê qut bibêm, tu dirêj fahm bike**
**Di rê û îqrarî me da hatinê însên ê tazî ye û**
**ê nûrî heq e.’**[7]

Li Zagrosan kuliyên berfê dibariyan. Her yek ji wan li perê periyekê bûn. Wer bi hosteyî li perê xwe kiribûn, wer bi nazikî dihewandin, wer xweş xwe li ba dikirin yek li ya din nediket. Jixwe yek li ya din biketa wê pergalê wan belav bûbûya. Bi kuliyên berfê re xem, derd, keser û evînên hezar salan dibariyan. Bi wan re kul û keder, hesret û kovanên Pîrê û ruhê min dibariya.

Li Zagrosan roj diçû ava. Tariyê xwe hêdî hêdî ber dida tevahiya çaviyên erdê. Li van çiyayên li tevahiya Kurdistanê rêzbûne û xwe spartine hevdu, mirovatiyê gundên pêşî ava kirine. Şaristaniyê cara pêşî konê xwe li qûntara van çiyayan veda. Belkî jî zarokên roj û agir cara pêşî li vir destê xwe avêtin qevdê genim, bi vî awayî roşan û cejin li ber çemên ji ava berfê hatin pîrozkirin. Di çîrokên li keviyên van pal û binaran de têne gotin; ji serê mar û moriyan bigirin her tişt heye. Çiyayên asê û qehîm in. Mîna ku kelhe û bircên parastinê bin. Ji Bakurê Kurdistanê xwe dirêjî Rojhilat û Başûr dikin. Mîna rehan xwe li dilê Kurdistanê digerînin. Ji ber dewlemendî û bereketa van erdan çend artêşên çavnebar xwe li van deran qewimandin tarûmar bûn. Ti kesî nikarîbû hêlîna Teyrê Sîmir a li van çiyan biherimîne. Ji ber ku fermana ketina van çiyayên aliyekî xwe bihişt û aliyê din dojeh, bi Xwedayên van deveran dibin. Yên guh nedin van fermanan naleta li Kêla Şînê hatiye danîn li wan dibare. Rondikên çavên Skenderê Mekodonî hînê li van deveran diherikin.

Li Zagrosan roj çû ava. Tariya dijberê rohniya rojê her der zevt kir. Lê Zagros mîna bibêje, ez girê zayînê me, ji moriyên li erdê bigire heta pirçûmûkên li hewa re dilê xwe vekir, himbêz kir. Agirê şivanan mîna stêrkên li ezmanan daliqandî li zozanên bilind diteyisin. Dengê ewtiniya kûçikên şivanan, tevî dengê bilûrê û çirçirkên li ser çiloyan, bi şirrîna ava diherike re ahengeke xwezayî datînin.

Li Zagrosan roj çûbû ava. Tarî li kar bû. Her tiştê ku di hinavê wê de ji bo siberojê dilebitî, diliviya, li ber xwe dida. Di nava sînorên ji têlên rêsayî û mayînan de qantirên qaçaxfiroşan derbas dibûn. Bi teqînekê re kerr û lal, zindî û mirî, her tişt li cihê xwe vediciniqin. Kêliyekê her tişt bêdeng dibe. Paşê balafirşikêneke gerîllayan xummînê bi hawîrdorê dixîne. Gurrîn bi kewên gozel dikevin difirrin. Zûrîn bi gurr û çeqelan dikeve.

Li Zagrosan şev tarî ye. Her kes ji cihê xwe rabû û ber bi şikefta Şanîdarê ve meşiya. Ez jî tevlî wan bûm. Ji derdorê bêhna gîha û pincarên biharê dihat. Çavên min mîna yên guran dibiriqîn. Bi bayê brûskê ez dimeşiyam. Min ji xwe guman dikir, gelo bi rastî ev ê jêhatî ez bûm. Pirr neçû, ez gihiştim ber devê şikeftê. Li ber devê şikefta Şanîdarê Dayika Pîroz rûniştibû. Li ber wê jî agirekî piçûk vêketîbû. Li hundirê şikeftê jî agirek hildibû. Her kesê dihat destûr ji Dayika Pîroz dixwest û derbasî hundirê şikeftê dibû. Min jî destûr xwest û ketim hundir. Li hundir kal û pîr, ciwan û lewend, rûsipî û aqilmend, sofî û derwêş li aliyekî rûniştibûn,  bilûrvan û pîrên erbanê, sazbend û daholvan jî li aliyê din rûniştibûn.

Li Zagrosan şev nîvê şevê bû. Civat li şikefta Şanîdarê geriyabû. Ji Stêrkê bigirin heta Rojdayê, ji Mezlûman heta Egîdan, dost û nas, heval û hogir, destbirak û hevalbend her kes amade bû. Her kes ji kirasê xwe derketibû û uryan bû. Fena heqî û rastiyê zelal li ber

---

[7] Ji DÎWAN-A HEQ beşê Cemî Tazî (Uryan) Sirrê Heqîqetê ya Pîr Alî Balî

çavan bûn. Li dora agir digeriyan. Li ber bilûr û erbaneyê, bi dengê dilan û nefesê, bi gotinên mishef û kitêban, bi gotinên nenivîsandî û dilan daye destê dilan, bi xweşzar û şekirlêvan şev zîz dibû, civat digeriya.

Li Zagrosan şeveqê avêt. Agirê me sotik û perengên xwe diçirûsîn mîna baweriya di dilê mirovan de hil didan. Bedenên me serwext û mest bûbûn. Li ber ahenga gotin û agir stewiyabûn. Bi evîn û hesretê beridîbûn. Bi liv û lebatê, bi zikir û cezbê seridîbûn. Her tişt êdî derew bû li vê cîhanê bi tenê evîn, xwestin û bawerkirin heq bû. Surra şeveqê li sotikên dilê me xwe bada û mîna ramûsana rojê bîne, mîna tevzînokekê bi bedenên me ket. Em tev di cihê xwe de ricifîn û lerizîn. Me hêdî destên xwe berdan ber xwe û me çavên xwe vekirin.

Li Zagrosan roj hilat. Tîrêjên rojê li devê şikefta Şanîdarê dan. Dayika Pîroz himhimek pê ket û weke perperokekê firiya. Her kes mîna xwe di parzûnkan de dawerivandibe, fena şujikê tenik û zirav bûbû. Êdî ew mirov bûn ku sîha wan nedida erdê û êdî ew xasên xwedê bûn. Nola ji nû ve bivejin dilebitîn. Tîrêjên rojê çavên wan dikuskusandin. Mîna marê ji kirasê xwe derkeve û weke perperoka ji qozeyê derkeve xwedî liv û lebata vejînê bûn. Li ber tîrêjên rojê weke şembelîlkan hêdî hêdî heliyan, li perîkên tîrêjan suwar bûn û çûn.